**Omer DILSOZ:** *Di sala 1978'ê de li gundê Gûzereşê ku bi ser Culemêrgê ve ye, çavên xwe li dinyayê vekirin. Li gund dest bi xwendinê kir. Lîse li Culemêrgê qedand. Di sala 2003'yan de romana wî ya yekemîn Hêviyên Birîndar ji weşanên Aramê derket. Di sala 2005'ê de romana duyem a Dilsoz Bêhna Axê ji weşanên Berçemê der çûye. Her wiha ev pirtûka li ber destê we ye [Neynika Dilî (şêr ji bo warê xwe têdikoşin)] romana Dilsoz a sêyemîn e.*

*Her weha gelek helbest, nivîs û pexşanên Omer Dilsoz di kovarên wekî Nûbihar, Nûbûn, Peyv, kovara W, rojnameya Azadiya Welat û Tûrik de hatine weşandin.*

*Berhemên Dilsoz ev in:*
*Hêviyên Birîndar (roman-2003 / Aram)*
*Bêhna Axê (roman -2005 / Berçem)*
*Bila Gotineke MinûTe jî Hebe (Helbest- 2007/ Berçem)*

Weşanên Aram:

**NEYNIKA DILÎ**
Omer DILSOZ

**Edîtor:**
Azad ZAL

**Sererastkirin:**
Serwet DENÎZ

**Berg û Rûpelsazî:**
Azad ZAL

**Çapa Yekem:**
2008

**Çapxane**
..............

**ISBN:**

Omer DILSOZ

# NEYNIKA DILÎ

Şêr ji bo warê xwe têdikoşin

Weşanên Aram

# Naverok


| | |
|---|---|
| Dîmena yekemîn “margestî” | 9 |
| Dîmena duyemîn “hêvîşikestî” | 27 |
| Dîmena sêyemîn “azadîxwazî” | 38 |
| Dîmena çaremîn “dûkêl” | 61 |
| Dîmena pêncemîn “evînperestî” | 83 |
| Dîmena şeşemîn “hetikberî” | 103 |
| Dîmena heftemîn “kevneçîrok” | 113 |
| Dîmena heştemîn “çûyîn” | 128 |
| Dîmena nehemîn “rev” | 139 |
| Dîmena dehemîn “rondik” | 155 |
| Dîmena yazdemîn “tolhildan” | 174 |
| Dîmena duwazdemîn “miraznedîtî” | 195 |
| Dîmena sêzdemîn “berzebûn” | 211 |
| Ferhengok | 227 |

*"Çermê gayî, di avê nayî*
*Heft heyvan wê nimiyayî*
*Bi kêr û gwîzan wê navnayî*
*Di kunderziyê re rakêşayî*
*Li dorên gencê werînayî*
*Xanî (Xanê Lepzêrîn) kire birc û beden û avayî*
*Û binyatê Kela Dimdim lê deynayî…"*
*(Ji Kela Dimdim)*

*Xanê Lepzêrîn li ser gencê ava kir Dimdim*
*Neynika Dilî jî li ser kavilên Xanê hate raçandin/rêsandin*

*Ez vê pirtûkê ji dayika xwe ya hêja re dikim diyarî*

# Dîmena yekemîn
# “margestî”

*Xewna kor*
*Çirûskek ji dîmenê*

Ez bi tikî tenê bûm. Li dûriyê, li bajarekî ku ji ber bêmerhametiya mirovan pisîkan nedikarî lê vehewin. Li bajarekî ku mirov bêyî ku li rûyê hev binêrin bi hev re dipeyivin. Li bajarekî ku bûye stargeha mişextiyan. Bajarekî ku mirov tê de har dibin, ku bi milyonan mirov tê de hebin lê kesî hay ji kesî nebe. Li bajarekî ku her tişt tê de vehewe.

Ez piştî gelek west û zehmetiyan hatibûm vî bajarî. Ji bo ku ez her tiştî ji bîr bikim min xwe avêtibû ber hembêza sar a vî bajarê mirovxur. Ji bo ku min êşên xwe ji nava xwe bireniyana û –heke gotin lê be- ji seranpê, ji nû ve min xwe biafiranda, ji bo ku min xwe li vir berze bikira ez hatibûm û min xwe berdabû nav rehên bêxwîn ên vî bajarî. Ev bajarekî gelekî mezin bû: Birayê min Ehmedê Xanî li vir xwendibû; jixwe ev mal û ev kar bi xêra ku nasên wî bûne, min peyda kiribûn.

Ez li odeyeke sar a qata çarê ya kevnexaniyekî dimam. Hefteyê pênc rojan ez li kargehekê dixebitîm û min di depoya kargehê de karê nijinandina kaseyên vala dikir.

Rojeke hûnik a payîzê bû. Roja min a bêhn-vedanê bû; xaniyê min ê ku bi giştî sê ode bûn ji serşok û destşoya ku di nav hev de bûn û ji mutbex û odeya min dihate pê. Ode teng bû; textê min ê nivistinê li ber pencereyê bû, li nik texteyî jî cilên min hebûn, çend gavan wê de soba elektrîkê hebû û li taqên odeyê jî min wêneyê Ehmed, bavê xwe, dayika xwe û

xwe hilawîstibûn. Li rex cilên min jî Qurana bi xwîn a bavê min û ajandaya kekê min Ehmed hebûn. Ez çu carê bêyî wan nediçûm cihekî, ew wekî emaneteke pîroz her tim bi min re bûn…

Roj li nîvro bû û berî ku ez ber bi otogarê ve biçûma û min berê xwe bida kevnewarê xwe Culemêrgê, ji bo çend kêliyan, çawa çêbû nizanim, lê demildest xeweke bêyom ruh û giyanê min rapêçabû.

**

Ez bi dengekî zirav re veciniqîbûm. Çend caran min li derdora xwe nihêrî, her ku diçû ew deng berztir dihat. Dûre ew deng dibû gelek deng, dibû lêsera dengan û ev deng bi hev re, wekî bangivêreke bêrêgeh bi ser hişê min ê xewar re diherikîn. Gelekî tirsiyabûm. Çavên min di serê min de beloq mabûn û dev li min beş bûbû û wisa devê min mabû vekirî.

Min li odeya xwe nihêrî; di çend kêliyan de jûr seranser bi awirvedaneke şikestî li ber çavên xwe gerand: Her tişt li wê derê belavkirî û bêserober bû... Rîsiyên pêndek û pîrebûkan ji ber binbanî şor bûbûn xwarê. Taqên odeyê gelekî qirêjî bûbûn; kişla wê rengê xwe avêtibû, ew êdî ne spî, bi gelemperî zer û xwelîkî bûbûn. Bêhneke nexweş a giran jî ketibû odeyê. Lê wê gavê bêhna nexweş li bîra min nebû.

Erê neynika min...

Erê neynika min a xweşewîst; min dûre di nava tirsa wan dengên sawîn de piçekî pişta xwe rast kir, xwe jêk anî derê û bi gavên giran, hingê ez hêdîka ber bi quncikê herî tarî ve meşiyam; piştre demildest min xwe avêt erdê, heçko xwe ji barana guleyan biparêzim, wisa, min serê xwe kir nav kefa destên xwe û xwe bi erdê ve dewisand. Wisa bû, heçko dinya bi ser serê min de dihat xwarê. Heçko erd û asîman bi serê min de hildiweşiyan, wisa, min xwe bi ser hev de melisandibû.

Wê kêlîkê min têhna tirsê li patika stûyê xwe radibihîst.

Hingê, heçko bi hezaran cam têne şikandin dengine wisa bi ser min de dibariyan. Wê gavê min xwe melisandibû û serê xwe xistibû nav her du lepên xwe û çu tişt nedihat bîra min. Tenê min dixwest xwe ji qirçeqirça şikestina caman rizgar bikim. Hingê laşê min tevde direcifî, ji tirsa min dixwest erd biqelişe da ku xwe tê de veşêrim. Piştre, di bin çavên xwe re min hêdîka serê xwe rakir, demildest çavên min bi çirûskeke biçûk likumîn...

Ji wê derê ve çirûsîna tiştekî li ser awirên min zeliqîbûn... Lê, ev ne tîrêja rojê bû. Bo çend kêlîkan di ber xwe de fikirîm: Roj, ronahî; hêvî û hebûn... Hetav; tîrêj û çirûsîna wê ya serincrakêş. Ew qet venaşêre rûçikê jiyanê, aşkera dike her dem; her tiştî... Bo çend kêlîkan ez ji benikê tirsa xwe veresiyam, hingê li xwe varqilîm, wê demê ez pê hesiyam ku çu deng nayên, çu cam jî naşikên û çu kes min gulebaran jî nake. Hingê, hêdîka bi ser hemdê xwe ve hatim û min şade da; dûre jî min dilopên xwîdanê bi huçikê xwe ve, ji eniya xwe vemaliştin. Erê, ez li mala xwe bûm, li odeya xwe bi tikî tenê bûm û piştî bîskeke dîtir ez ê ji malê derketima û min ê berê xwe bida otogarê û ez ê ber bi welatê dilê xwe ve, bi hêviya heye ku min dildara ber dilê xwe Bîşenga xwe ya narîn bidîta, biketima rê. Êdî sebra min nemabû.

Min bi gavên giran xwe gihandibû ber neynika xwe. Erê, neynika min a biriqok, ez bi heyî û neyiyê xwe, bi xeml û rapêça xwe, bi tevn û rîsê xwe, bi xêr û gunehên xwe li ber te çikiliyabûm. Min ê li xwe binihêrta ka ez çi tevn û rîs im... Her weha tîrêja rojê jî ji te diçirûsî.

Piştî ku min toza li ser neynikê bi huçikê xwe vemalişt, min wê rojê, berî ku berê xwe bidim otogarê û ber bi Bîşenga xwe ya bejnçiyayî ve bikevim rê, min di neynika dilê xwe re li xwe nihêrî; ez kî bûm, çi bûm, ji ku hatibûm û çîroka min a

jiyanê çi bû, ji bo çi ez niha li dûriyê, bi tena serê xwe, di vê odeya gemarî de dimam?

Awêneya min a spehîtirîn; çima min wisa xuya dikir, te digot qey ji bîwareke dî ya gerdûnê hatiye? Çima rûyê min wisa xuya dikir, te digot qey di bin barekî giran de felişiyaye? Ez li ber kîjan teql û verêjên jiyanê ketibûm; min xwe ji te dipirsî: Neynika min ez kî bûm?

Ez...

Navê min Mustefa bû. Lê dayika min ji hezkirinê digot, Mistê; bes nemam û xêrnexwazên min ji çavnebariyê navê min kiribûn Misto. Bi her hal, her yekî li gorî ku dixwest bibîne ez bi nav dikirim. Lê Bîşenga ber dilê min, ji her kesî/ê xweşiktir navê min digot, wê gava ku digot Mistê, bi sedan Mustefa ji nav devê wê dibariyan.

Di wê kêliya ku ez ê piştî demeke dîtir cara çarem tenê ji bo dîtina Bîşenga delal biçûma kevnewarê xwe; ji ber ku ez sê carên dîtir çûbûm û ez bêyî ku wê bibînim bi şûnde vegeriyabûm, îcar jî dudiliyeke kurtedemî xwe berdabû nav hişê min. Mistê, tu çima wisa yî? Min di ber xwe de, ji xwe re digot û piştî kurtedemeke dudiliyê çûyina dawiyê hatibû bîra min.

***

Ez ji devereke dûr hatibûm. Gelekî westiyabûm. Dilê min bi cotkî lêdida; min ê ew bidîta: Bîşeng. Hesreta wê dilê min dax dabû. Ez ji bo wê hatibûm. Ji bo dîtina çavên wê yên xweşik. Min hemû gotinên xweşik ji bo wê veşartibûn. Heta bi ‘her sivor bi giraniya xwe’ min ji bo Bîşenga hewda dilê xwe diyariyeke biçûk jî bi xwe re anîbû. Ew jî, kaseteke Şivan Perwer bû ku wê gelek jê hez dikir. Ez gelekî westiyabûm û ji cihekî gelekî dûr hatibûm. Min bêriya axa ku ew li ser geriyaye, ava ku wê jê vexwariye, bayê ku biskên wê liba kirine, tava ku ew germ kiriye, kiribû. Bi kurtebirî, min bêriya her tiştê wê kiribû û rûyê

wê yê spehî li ber çavên min zindî dibû. Bêhna wê dihat min. Ez ji bo dîtina wê hatibûm û dilê min bi cotkî lêdida.

Roj li nîvro bû. Ji bilî çend ewrên stewr hema bêje asîman sayî bû. Bayekî hûnik ê payîzê diveziya. Xwezayê kirasekî zer li xwe kiribû. Dexl û derametê salê hatibû rakirin. Serê lodên giyayî hatibûn girtin û kadîn tijî bûbûn. Ez ê gaveke din biketima rê. Min ê xwe bigihanda ber deriyê mala wê. Dilê min bi cotkî lêdida. Li ber xwedîkê gava ku min li xwe dinihêrî ez pê dihesiyam ku dest û lingên min dilerizin. Ez gelekî bi kelecan bûm û ji welatekî dûr hatibûm. Ji bo dîtina Bîşenga hewşa dilê xwe... Bîşeng li ber dilê min wekî kulekê dikeliya. Min ê ew bidîta; dilê min bi cotkî lêdida û piyên min hêdî hêdî bedena min a westiyayî ber bi taxa wê ve dibir. Di hişê min de bi sedan pirs hebûn; lê tiştê herî bêhtir min meraq dikir dîtina wê bû. Gelo Bîşenga delal qet guherîbû? Gelo min ê keseke çawa li hemberî xwe bidîta? Gelo ew hê jî ew Bîşenga berê bû? Gelo dê wê çawa ez pêşwazî bikirima; ew ê bi dîtina min kêfxweş bibûya? Ma hê jî dilê wê mabû wekî dilê caran?

Ez ji bajarekî dûr hatibûm. Li ser zimanê min gotina straneke ku nehatiye nivîsandin hebû; min hêdî hêdî di ber xwe de dinihwêrand: *"....Heylo dilo, tu ji bo çi ji dilan vemayî? Ji ber ku dil wêran e; lewma bêhêlîn mayî!... Xunavê avêtiye eniyê; nizanim ji şermê ye an ji evînê!..."* Hingê dema berî xatirxwestina dawiyê hat bîra min. Erê bêhneke dîtir ez ê ji wir dûrketima û min ê evîna wê di dilê xwe de çal bikira û berê xwe bida riya nehatê. Lê niha ez vegeriyabûm û ji bo dîtina Bîşengê ber bi taxa wê ve diçûm; dilê min bi cotkî lêdida. Ew wekî stêrkeke dûr li ber çavên min xuya dibû. Min bêhna wê seh dikir. Min bi qasî dinyayekê; na na, bi qasî gerdûnê bêriya wê kiribû. Ji bo wê hatibûm û bi pêngavên hêminî ber bi mala wê ve dimeşiyam. Belkî jî wê qet hay ji hatina min nebû. Belkî wê gavê li bin aşên xirab jî ez nedihatim bîra Bîşenga hewda dilê xwe. Lê bi hemû dilan, di nava kelekela hesreteke mezin de ez ber bi wê ve diçûm. Ji bo

dîtina wê; ew wekî bizoteke agirî li ser dilê min dikeliya. Dilê min ji kesera wê dikizirî û piyên min ên xav ên ku sist digihîştin erdê bedena min a westiyayî ber bi wê ve dikişand. Nizanim ew hazir bû ji bo dîtina min?

Roj li nîvro bû. Taveke netînde xwe berdida ser jîngehê. Lê ez dicemidîm; dilerizîn dest û piyên min. Bes ne ji sermayê, pêlepaşkî ji kelecanê. Ji kelecana îhtimala dîtina Bîşenga hêja. Dilê min bi cotkî lêdida û ez ber bi taxa wê ve dimeşiyam bi pêngavên hêminî. Hestekê di navbera tirs û kelecanê de ruhê min pêçabû. Ez ditirsiyam; ditirsiyam ji dîtina wê. Dizanim, wê ji suprîzan hez nedikir û hinekî ji min dilmayî bû jî. Dilê wê ji min mabû. Gelo dê wê çawa ez pêşwazî bikirima? Gelo hê jî ew dilmayî bû? Hê jî... Heke wê derî li rûyê min dadabûya? Heke... Bi hekeyan re ez dimeşiyam; xunavê avêtibû ser eniya min û dilê min bi cotkî lêdida. Ez hem ditirsiyam hem jî bi sedan meraqan mêjiyê min dixwar.

Ez ji riyeke dûr hatibûm. Ji bo dîtina Bîşengê. Bi sedan çîrokên hevgihîştinê min hûnandibûn li ser dîtina wê: Gelo bi kîjan çîrokê min ê ew bidîta? Di kîjan çîrokê de em ê bigihîştina hev? An nexwe hema çîrokên min tenê dê di nava hişê min de bimana û tê de biheliyana? An nexwe tevnê çîroka xwe wê li ser daveke dîtir rêstibû? Min nedizanî û ez digel kesera dilê xwe ber bi taxa wê ve dimeşiyam. Min ê ew bidîta; dilê min bi cotkî lêdida. Kelecana min di lûtkê de bû. Dilê min wekî masiyekî ji avê derketî diperpitî.

Payîz bû. Payîza dereng... Zivistan hatibû ber derî. Sir ûserma dinyayê şikestibû. Av sar bûbûn. Belgên zerbûyî lib bi lib ji daran diweşiyan. Beyar zer bûbûn. Daristan beyar bûbûn. Bih gihîştibûn û dekakê salê yê mayî êdî tirşetam bûbû. Doşav dihate kelandin. Gûz tev hatibûn daweşandin. Keçên ciwan dexil dida bayî. Genimok hatibûn kerefekirin. Bênder vala bûbûn û li ber malan gidîşên êzingan hatibûn nijinandin. Joriya

çiyayan xwe radestî befira salê ya yekem kiribû jî. Ew spî bûbûn. Karên dawiyê yên salane dihatin kirin. Jinan navmaliyên xwe amade dikirin. Mêran ardû û sotemeniya zivistanê dida hev. Ez ber bi mala wê ve diçûm; dilê min bi cotkî lêdida, bi kelecan bûm ez; min ê piştî demeke dirêj careke din ew bidîta. Min bêhna wê seh dikir; li ser dilê min dipijiya. Keftûlefteke bêpayan ez vegirtibûm. Ew li ber çavên min zindî dibû û ez bi dilekî hilawistî ber bi wê ve diçûm; dilê min bi cotkî lêdida.

Ez ji cihekî dûr û deraz hatibûm. Ji bo dîtina wê... Gelekî westiyabûm. Bi kelecan bûm. Dilê min dicemidî; min ê qeşaya dilê xwe bi tîna çavên wê germ bikira. Ez gelekî bi tenê mabûm; li derbederiyê ez gelekî westiyabûm. Gelekî şikestîbûm. Gelekî kovanî bûbûm. Min gelek bêriya Bîşenga xwe ya delal kiribû; ji dayika xwe bêhtir, ji axa xwe bêhtir, ji zaroktiya xwe bêhtir... Ji her kesî/ê bêhtir ew her kêliya jiyana min a derbederiyê wekî janekê di kûrahiya dilê min de dikelijiya. Ez ber bi wê ve diçûm; dilê min bi cotkî lêdida.

Roj li nîvro bû. Ez êdî gihîştibûm pişt deriyê wê. Mala wê gelekî hatibû guhartin; wexta ez çûbûm ew di xaniyê axîn de dijiya. Li ser banê wê jî karîte, li nava odeyên wê jî berik û li ser banê wê jî bagurdan hebû. Wekî yê me... Lê gelek dem di ser re derbas bûbû; hatibû guhartin her tişt. Li rûberî maleke cuda bûbûm; xaniyekî du sê qat ê ji çîmentoyê. Deriyê derve asin bû û li pişta derî wekî berê ne tu pêlav hebûn; ne jî gêzika ku wê her dem ew der pê dimalişt xuya dikir. Hingê ez xwîs bûbûm û min ji bergeha dîtibû bawer nekiribû an jî min nedixwest bawer bikim. Çend caran bi dudilî min ceriband ku destê xwe deynim ser bişkoka zengilê derî, lê tiştekî di nava min de ez vegerandibûm. Min li zengilê derî nexistibû; dilê min êdî bi cotkî lênedida. Hemû gotinên xweşik ên ku min ji Bîşenga xwe ya hêja re veşartibûn demildest ji bîra min çûbûn. Li wir, li pişt deriyê mala wê ya nû ew diyariya biçûk a erzan ku min ji

bajarekî dûr jê re kiribû û wekî emaneteke pîroz bi xwe re anîbû, ji destê min ketibû. Piştre min ew avêtibû wê çopdanka vala ya piçekî wêdetir radiwestiya. Tam gava ku ez ê zivirîbûma min dil kiribû ku careke din li zengilê derî bixim lê ligel ku min tiliya xwe danîbû ser jî min ew neşidandibû û ez ne bi dilekî bi sed bêdilî ji ber deriyê mala wê bi dûr ketibûm. Bêyî ku Bîşengê bibînim.

Ez ji welatekî dûr hatibûm. Ji bo dîtina wê; lê ez li pişt deriyê wê, bêyî ku wê bibînim paşve zivirîbûm û min kesera xwe di dilê xwe de çal kiribû. Wê gavê ez fikirîbûm ku êdî ew tune ye; ne li dûrî min, ne jî nêzî min; ne li nav xewnên min, ne jî li ber çavê min.

***

Erê neynika min a hêja, li wê derê pişta gotinên min şikestibû û hêviya destpêkeke nû cara sêyem li ser dilê min tepisiyabû.

Ez ê bêyî dilê xwe ji kevnewarê xwe veqetiyama, bêyî xatirxwestinê min ê dîsa berê xwe bida vî bajarê mezin: Stenbola Tirkiyeyê. Lê tiştekî ez li wir digirtim, wê kêliyê, berî ku ez berê xwe bidim vî bajarî, bîranînên tal ez gihandibûm zaroktiya min a winda: Dem û heyamên ku hêj tovê vê êşa giran li dilê min nehatibû çandin. Heyamên ku hêj vî dilî Bîşeng nekiribû sertaca xwe.

**

Ez li gundê Xanê hatibûm dinyayê: Xana Sêgundan. Xanê sê gund bû, di sêgoşeya du eşîrên mezin Pinyaniş û Ertûşê de dima; tixûbê her du eşîran bû. Li milekî wê Sermedar û li milekî Gare hebû. Li ser paxila wê sê rûbar diherikîn; yek rûbarê Sermedarî ku ji Çelê Duguh diza, yek rûbarê Keşkanê ku ji sûlavên Sersûlê dihate xwarê û yê dîtir jî rûbarê Navdeştê bû, ku ji serokaniya Kanîkundikê diza û milekî wê jî ji Geraşîn

têr dibû. Her sê rûbar li Gundê Mizgeft, li Dûpirkê digihîştin hev û ber bi Tengiyan ve diherikîn û di wê newala kûr de li Sergelî, li bin aqederê ji pêş çavan winda dibû û ber bi Gûzereşê ve diherikî û diçû. Li nik koşka aqederê, ku ji seleberên mezin hatibû çêkirin, her wiha jê re pireber jî dihat gotin, li wir, kaniyeke gelekî tezî û cemidî hebû, jê re digotin, Kaniya Ofê. Ji wir heta Birêlkî ku rojhilatê Xana Sêgundan bû, mişt bû ji fêkiyên cur bi cur; bi taybetî jî ji sêvan. Sêvên Xanê gelekî xweş bûn.

Her wiha sê gundên Xanê; Gundê Axayî, Gundê Mizgeftê û Gundê Keşkanê bûn. Em li Gundê Mizgeftê dijiyan. Bavê min melayê Mizgeftê bû, navê wî Ebdurehman bû, ji ber ku çûbû hecê her kesî/ê jê re digot Hecî Ebdurehman, dayika min ji Gundê Axayî bû, navê wê Kewser bû, Kewsera keça Emer axa, lê –ji ber ku wekî kevokekê spehî bû- her kesî/ê jê re digot Kotir; em pênc xwîşk û bira bûn. Du birayên min ji min mezintir bûn: Tajdîn û Ehmed, her du xwîşkên min jî ji min biçûktir bûn, ew cêwî bûn û navê wan jî Ronahî û Bînahî bû. Gelek avahiyên gundê Mizgeftê qesr bûn, li gundê Axayî jî çend qesr hebûn, lê li Keşkanê qesr tune bûn. Ew cihekî pagan bû, têkel bû, li wê derê bêhtir mitrib, qereçî, mişext û gelek kesên ku ji cihên cuda cuda hatibûn, akincî bûbûn. Ji bilî Keşkanê, Xanê tijî dehl û rez bû. Gelek darên fêkî lê hebûn, cihekî avî bû û her cure çandinî lê dihat kirin.

Neynika min!...

Her tiştê min li wî gundê ku li ber hembêza asîman bû; wî gundê ku stêrk bi şevan lê direqisîn; wî gundê hêşîn ê bi dehl û dirî, xwerû gûz, sêv, hirmî; wî gundê ku ava wê wekî rondikên çavan zelal, wekî şîrî spî û wekî hingivî şirîn; wî gundê avî yê ku mirovî tê de xwe wekî defa bayî sivik û wekî beza hespekî kihêl azad seh dikir, dest pê kir.

*

Min gava ku fam bi dinyayê kir û jê pê ve, tiştê ewil ez pê hesiyabûm ew bû ku ez kesekî nehez û tiral bûm, lewma jî di nava malbatê de gelek nedihatim hezkirin. Dayika min, ji me hemûyan bêhtir ji Ehmed hez dikir, her digot ew ê bibe miroveki jêhatî û dê bibe serkêşekî kurdan. Ez ji hemû birayên xwe kirêtir bûm; serê min bi çukil, kepê min pan, diranên min peç, birûyên min stûr û mezin, rû û dêmên min jî reş û qemer bûn û bejna min jî kin bû. Lê Tajdîn û Ehmed her du jî gelekî lawîn û cindî bûn; bejna her duyan jî têra xwe bilind û darêtî, rû û dêmên wan, dev û difnên wan gelekî lihev hatibûn û mirovî guneh dikir li wan binihêre. Porên wan boz î xemirûkî bûn, rengê çermê wan spî û çavên her duyan jî belek bûn. Xwîşkên min jî gelekî xweşik bûn, mirovî ew ji hev dernedixistin; gelek caran me ew têkel hev dikirin. Lê ez, ez kirêtê birayan bûm, lê belê ji bo ku li ber dilê min bide, gelek caran dayika min digot, "Kirêtê dergûşê dibe lawîn û cindiyê mêraniyê, lê lawînê dergûşê gelek caran dibe pûçemêr jî."

Hingê hêj dilê min li ser sêla evîna Bîşengê neşewitîbû, hê ji bilî her sê gundên Xanê, zozanên Gare, Geraşîn, Kepirk, Zomik, Meydanê û Sermedarî min çu derên dîtir nedîtibûn. Hê jî, zilamê bextxirab, bêbext û durû Salo ku navê wî yê rast Salîm bû, nehatibû nav jiyana min. Piştî çend salên dîtir, li Gundê Keşkanê min ê ew binasiya û hêj destpêkê dilê min dê li wî germ nebûya û tovê hevrikiyeke bêeman dê li nav zeviya jiyana me bihata çandin.

Belê Neynika min a xweşik!...

Rojeke xweş a payîzê bû; hema bêje rojek ji rojên havînê mabû. Piştî barîna sê şevan hetaveke geş û tînde li ser Xanê dibişirî. Berfa nû ku ser û sertarên kêrî û milên çiyayên dormandorê Xanê bi rengê spî hine kiribû, agahiya zivistaneke dijwar dida. Hemû dekak û çandinî hatibû rakirin, serî li lod û dihên giyayî hatibû girtin, kadîn tijî miştê zivistanê bûbû. Li ser

şaneşîna qesra me, em hemû pêkve li ber wê hetava geş rûniştibûn. Ronahî û Bînahiyê peyalên me yên çayê dadigirtin, dayika min û bavê min li ser mînderên xwe rûniştibûn û di ber qurtên çayê re berfa li serê Gareyî temaşe dikirin. Tajdîn û Ehmed di ber çayê re satranc dileyîstin û ez jî li ser doşkê şaneşînê piçekî veder rûniştibûm û min piyên xwe tê de berdabûn xwarê û ew hêdî hêdî dihejandin. Dayika min digot, hinek arvanê me maye, divê em van genimokan zû ziwa bikin û bibin aşî, nexwe em ê tengav bibin; bavê min digot, darên mizgeftê kêm bûne, divê ez biçim Birêlkî hinek daran bînim, Ehmed û Tajdîn jî qîreqîra wan bû; yekî digot ew mala fêrzinê ye, yê dîtir digot kiş e û wan xwe di ber santrancê re winda kiribû. Ronahî û Bînahî jî di ber dagirtina peyalên çayê re, li ser dawetê diaxivîn û yekê digot, bo vê dawetê ez ê fîstanê sor li xwe bikim, ya dîtir digot, naxêr, te daweta borî li xwe kiribû vê carê dora min e. Hingê dayika min jî ji nişkê ve têkilî axaftina wan dibû û digot, netirsin, ez ê sibê biçim dikanê ji her yekê ji we re fîstanekî sor bikirim. Piştre jî bi sivikî digirnijî û digot, "Ma ez dihêlim ku her du delalên min li nav alemê ji xwe şerm bikin."

Wê gavê min piyên xwe di ser doşkê şaneşînê de berdabûn xwarê û min li dîmena Xanê temaşe dikir: Li ber derê qesra me ya duqatî baxçeyekî mezin hebû, di nav baxçeyî de birkeke avê hebû û baxçe mişt bû ji darên fêkiyan: Sêv, bih, gêsik, hirmî, xox, mişmiş, hulîk û gêlasan. Li her derê baxçeyî spîndar li ber çavên mirovî diketin, mêwa tirî jî hilkişiyabû ser spîndaran. Li dawiya baxçeyî, li nik pejanê baxçeyî jî çend darên gûzan hebûn; çend sivore bi lez û bez li ser darên gûzan dihatin û diçûn. Dengê çivîkên ku li ser bîşenga li dor birkê kom bûbûn jî, ji aliyekî dîtir ve dihat bihîstin; çûkan bi xwe re dileyîst. Li ser guliyên spîndaran çend kelereşk û qijik jî difiriyan. Belgên daran hema hema giş weşiyabûn, ji bilî çend bih û sêvên payîzî çu fêkî bi daran ve nemabûn. Hingê bîra min hatibû xewna min a wê şevê, piştî dudiliyeke kin min berê

xwe dabû bavê xwe û xewna xwe giş ji serî heta binî jê re gotibû.

Di xewna xwe de min dîtibû ku Xanê kavil bûbû.

**

*Ez li Xanê bûm: Lê Xana Sêgundan bûbû warekî dîtir; çu tişt wekî hingê nemabû. Her sê gundên Xanê tev bûbûn kavil, mizgeft, qesir li wir tune bûn; tenê dîwarek li cihê mizgeftê hatibû lêkirin û çend kincir û pate bi şivikekê ve pê ve daleqandibûn; her dem kund û pepûkan lê dixwend. Ji bilî çend biyên li Dûpirkê ku li dora rûbarî mabûn, Xanê rût û riwa bûbû. Li nava deştê, li cihê dehl û darên fêkî, gûnî, gêndel û tevrî şîn bûbûn. Rûbarê Navdeştê miçiqîbû û nizar û berojê Xanê ku tev bi dar û daristan bû, rût û beyar bûbûn; ji her derê renî û aşît verestibûn û gelek semt û cih hatibûn guhartin, mirovî digot qey ev warekî dîtir e. Pirebera Berpîrsamî heriftibû. Xana ku li Berê Gengaşan cihê civîn û civatên xaniyan bû, di bin xirebesta reniyan de bêseroşûn bûbû. Hindî ez li der û doran digeriyam, ne min nasek didît, ne maleke ava, ne jî tiştek ji Xanê, heke ji çiya û semtên wê nebûya min ê bigota qey ev der ne Xanê ye.*

*

Bavê min, pir bi baldarî guhê xwe dabû xewna min, piştre bêyî ku tiştekî bêje axîneke kûr ji dilê wî hatibû û paşê, hêdîka ji ser mîndera xwe rabûbû û berê xwe dabû mizgeftê; wexta banga nîvroyê bû. Çend sofî û rihspiyên gundî bi gavên hêminî, hêdî hêdî ber bi mizgeftê ve diçûn. Banga nîvroyê bi ser me de hatibû.

Heyho neynika min heyho!

Berî ku ez ber bi otogarê ve biçûma min ê her tiştê xwe bi te re parve bikira. Gelo sedemeke min a vegera kevnewarî mabû? Ez ê ji bo çi vegeriyama, ma tenê ji bo dîtina Bîşenga narîn?

Ez ê piştî bîskeke dîtir ber bi bayê dilê xwe ve biçûma. Jixwe li vî bajarê mezin êdî jiyan li min teng bûbû, min ê berê xwe bida kevnewarê xwe û min ê ji bo dîtina her du çavên belek ên Bîşenga berdilê xwe, dem û heyamên êş û kovanan pêpes bikira. Ez ê bi dilekî şikestî, bi jiyaneke vemayî, bi xweziyên pûçbûyî, ber bi bayê dilê xwe ve biçûma. Min bi qasî cîhanekê, na na bi qasî gerdûnê bêriya her du çavên Bîşengê kiribû.

***

Erê awêneya min, di ser wê êvarê de sal bihurîbûn. Tajdînê me zewicîbû, me daweteke nedîtî ku çu carê ji bîra xaniyan neçe jê re gêrandibû. Piştî dawetê, rojeke xweş a biharê, dema ez ji bo çinîna pincarî û berhevkirina kivarikan bi zarokên gundî re çûbûm Keşkanê ji ber ku min li wê derê ji xwe re hêlîneke kewê dîtibû û min nedabû Salo ku ew çend salan ji min mezintir bû, ez û ew pevçûbûn û wî serê min şikandibû û piştre jî heta Gundê Mizgeftê dabû dû min. Ji ber vê yekê bavê min ez gelekî azirandibûm û gotibû, “Nehatiye dîtin ku yek ji me ji ber keşkeniyan bireve, hebe hebe, dawiya dinyayê hatiye; bi Xwedê, ev elametê hindê ye ku Xanê dê wêran bibe”, her wiha dayika min jî ji aliyekî ve gelekî bi ser min ve hatibû û gotibû, “Heta ku tu tola xwe venekî neyê malê.”, ji ber wê yekê jî ez sê rojan ji malê mişext bûbûm, li Gundê Axayî li mala xalê xwe mabûm. Piştre jî, xalê min ez dê bi xwe re bibirama Zozanê Geraşînê.

Geraşîn zozanekî gelekî xweş bû, mirovî li wir, çar demsal bi hev re dijiyan. Zozanê Geraşînê li dora gola şîn hatibû danîn. Li ser golê werdek û qaz hebûn; li rexûrûyên wê asmîn û beybûn, nêrgiz û binevş, alal û sosin, nesrîn û gulgever bi hev re şîn dibûn. Ji her derê wê kaniyek hiltavêt, mêrgên wê bi hezaran êş di giyanê mirovî de dikuştin; hûnebayê wê mirov wekî pilîtê li balan difirand. Ez hefteyekê li zomê mabûm; bêhna min gelekî teng bûbû, ku ev cara yekem bû ez ji mala xwe bi dûr diketim.

Kêfa min gelekî bi berxikan dihat nexasim danê bi ber êvarkî ve wexta ku şivanan ew ji çerê dianîn, dîmeneke gelekî xweşik û spehî ji bezebeza wan dihate pê. Tîrêjên rojê yên beravabûnê ku ji wir ve li hindava çiyayan wekî sêleke sor xuya dikir û mirovî bi çavên rûs dikarî lê binihêre bi şidiyayî li ser dûkêla ji beza berxikan radibû dibariyan.

Û roja berxbirê...

Berxbir... Cejna zozanî; mîhrîcana bêrîvan û şivanan. Şahî, kêf, xweşî... Aliyê erênî û xweşbîn ê jiyanê... Digel her tiştî tenê rojekê be jî xweserbûn... Tamijandina jiyanê û di heman katê de tomarkirina wan deman di quleteyna jêrhişî de. Jêrhiş; arşîveke berdest, ji raboriyê dîmeneke geş û hêjayî bibîranînê. Rastiyek ji jiyana mirov a winda û bizoteke gur ji ariya dil, ji kela axînan… Berxbir; av, ax û şahî têkil hev dibû. Qulîçke dihatin vedan, pêşbirk li dar diketin, hespên kihêl dihatin zînkirin û berêkdana bezê dest pê dikir.

Bêrîvanan wê rojê dev ji kavanîtiyê berdida û bi kilê suphanî kildidan çavên xwe, şeh dikirin porê xwe û vedihûnandin kezî û biskên xwe û wek rapêça dawetê xwe radipêçan, dûre kom dibûn li rexên golan. Li rexê wê ava mend û sar, zelal û şînespî ya ji guhanên keviyan hêdî hêdî didilopiya. Wê rojê tîrêjên rojê dibûn bêrîvan û didotin guhanên tijî av ên kevî û kevîlokan. Bawer bike neynika min; wê rojê tav gelekî cuda dibiriqî, av gelekî tamxoştir bû; ne wek her roj bû, heçko her tişt xweştir û geştir bûbe. Her kes cuda bû; xalê min, jinxala min û hemû zozanî...

Hemûyan jî li gorî derfetên xwe xemla xwe kiribû; ji ber ku ew roj roja kêfxweşiyê bû. Her tişt xweş û geş bû. Cejneke kevneşopî bû, na, nexêr mîhrîcan bû ew roj, geşt û seyran bû. Dikeniyan hemû rû û sîma. Hemû mirûz geş bûn, dengê mirovan bi nermahî û dilovanî dihat ber guhê min.

Xalê min digot, "Berxê nêr ji bo kêrê ye." Wê rojê beranên tovî dibûn qurban; xwîn diherikî, xwîn diherikî û têkilî golê dibû û hingê ava Geraşînê ya zelal şêlû dikir. Bêhna xwînê, termên qurbanan li rex golê, li ser best û kelekan raxistibûn û vizîna mêşan bû, ya kermozan bû li her derê. Berxik yek bi yek dihatin qelexkirin û dûre jî di golê de dihatin şûştin. Ava golê êdî bi gelemperî şêlû dibû, lê piştre berxik hem lawaz dixuyan, hem jî kejtir û spîtir. Kizîna goştê dipijiya jî bêhneke xweş belavî derdorê kiribû. Dûkêl radibû ber asîmanan.

Wê rojê, diranên min ên peç ji girnijîna min a jidil dibiriqîn, rûyê min ê qemer ji tîrêjên tavê qenc sor bûbû û xwî û xunavê eniya min vedimalişt. Hinarîkên min geş bûbûn, rû û dêmên min vebûbûn û bîbikên çavên min geş bûbûn, diteyisîn. Rast bû, neynika min, wê rojê; ez dikeniyam û wekî hemû zarokan li ser mêrg û çîmenên Geraşînê dibeziyam. Piştre xalê min tivinga xwe derxistibû û li bin palikê li joriya zomê, ji min re kêlek danîbû û gotibû, "Xwarzê, heke te ew kêl şikand, ez ê te xelat bikim." Wê rojê her tişt bi dilê min bû; ji bextê min ê çê, min kêlên xwe êxistibûn.

*

Û xelata serkeftinê; bez, siwarî... li hespekî.

Siwarî... Bezandina hespekî, bi çarbaskî; wekî fira teyrekê, wekî vejenîna birûskekê û bêdûmahîk azadî... Azadiyeke bêsînor... serxwebûn... êdî her tişt tu yî, tu!... Tu serdestê lixavê bî êdî bajo kihêlê, bila te bifirîne li balan. Têkiliya di navbera hesp û siwêr de; têkiliyeke cuda ye. Wek evînekê ye bezîn, bezandin. Hesp aşiq e, siwar jî maşûq; aşiq ango evîndar, maşûqê xwe ango xweşdiviya xwe diqudsîne, wê pîroz, evra û azad dike. Heta wê rojê ez qet bi serê xwe li hespî siwar nebûbûm. Destên min dilerizîn, lingên min diricifîn; hesp bi min têdigihijî dema ku lingê min li bin zikê wî dilerizîn. Lê ew dê bibeziya; ji bo wî bazdan her tişt bû. Ew, ji bo bezînê dijî,

nexasim heke li zozanekî deşt be, hewa xweş be û her dever têrxwer be. Ew, her çend hêşînahiyê bibîne dê bi bayî re pêşbaziyê bike. Êdî ez li ser zînî bûm û serê hevsarî di destê min de bû û di ber re jî xalê min digot: "Xwe rihet bihêle, nexwe hesp dê te bifirîne!" Lewre min lingên xwe piçekî ji bin zikê wî sist kiribûn û çawa min piçekî xwe hejand, ew bi rê ketibû. Meşa qilkanî ya hespekî... Dengê çingîna nalan, meşa wî ya mexrûr û azadiya te. Tu her tişt î, her tişt di destê te de ye. Hesp berê lingên xwe dişarîne, xwe germ dike bi meşa hêdî da ku hazirî bezînê bibe. Hingê jî çarbazkî: Çingîna nalan dibe dû û moraneke xurt û ba te bêhtir dipêçe. Êdî tu bi hewayê re difirî. Tirs namînin di dilê te de û tu hindî bêjî, bêdûmahîk azad î! Tu û bextewariyê êdî êk in. Hesp bext e. Bextxweşî ye. Her weha hesp evîn e. Ew te bi xwe re dibe êdî, -wekî evîndarekê te digihîne asoyên bextewariyê. Tu dibî davek ji bûşiyên wî yên xweşik û li ba dibî, li balan dikevî ber bi perên ewran ve difirî êdî. Azad î, ser bi xwe yî, serdest î tu!. Hevsar di nav destê te de ye û hema hesp û bext digel liveke te amade ne.

Çavên min ji rondikan tijî bûbûn, helbet ne ji giriyê; ji ramûsandina hewayê; ji hembêzkirina xwezayê, ji azadiyê; ji xweazadhiskirinê. Lewre jî wê rojê mişextbûna min a ji malê jî nehatibû bîra min, ew jî ji bîra min çûbû; ez bi hebûna xwe ya li ser rûyê erdê hesiyabûm. Êdî ez jî di dinyaya xwe ya xweser de hebûm. Ez mezin bûbûm êdî.

Piştre, dotira rojê, hêj tarîgewrikê ez hişyar bûbûm; xalê min ji bin konî derketibû, jinxala min, li ber deriyê konî, meşka xwe bi sêpê û şeqlaqan ve hilawistibû û ew dikeya. Hêdî hêdî dihejand. Pê re jî bi dengekî nizim di ber meşka xwe re dinihwêrand:

*"Hay meşkê!... Hay jarê!...*
*Meşka nêriyê çar salî*
*Jê bêt rizqê tifalî*

*Hesûd bimînin xalî.*

*Hay meşkê!... Hay jarê!..*
*Meşka beranê şaxbadayî*
*Firkek bêrîvanan lê dayî*
*Ji bo mêvanê dildayî.*

*Hay meşkê!...Hay jarê!...*
*Meşka me rijiyayî*
*Bêrîvanan lê paldayî*
*Mêvanê me birsî mayî."*
Dûre jî dest bi lorandina heyranokekê kiribû:
*"Heyraan hey jarooooo!....*

*heyran kurê xelkî ye*
*bejna heyranî çendî cindî ye*
*lew min heyran divêtin*
*(heyran birayê ...... ye)*
*mala heyranî li taxa jêrî ye.*

*heyran keça maqûlan e*
*bejna heyranê şitla rihan e*
*lew min heyran divêtin*
*heyran stêrka berbangan e.*
*Heyran gula nav zoman e.*

Lê, ji hemûyan bêhtir dengê bilûra kûr a şivanan, lawij û pîrepayîzokên wan ên ku şevînên dirêj dikuştin, dibûn sebra wan çiya û şikêrên kovî. Heyho heyho!... Ez çi bêjim, çi bihêlim?! Ji duhiya min, ji îroya min çi mane, çi pûç bûne, an jî

pûç (kirine)? Çendan ez kiryar, çendan ez kirdar bûme?! Heyho heyho!... Ji ku derê ber bi ku derê ve; çend girê û asteng, çend reng û deng?!... Bawer bike neynika min a xweşkûk, felekê berpêng da ber min, ez westandim, na nexêr vewestandim, (ra)westandim, xitimandim, peritandim, perçiqandim û helandim, helandim bi navê Xwedê ez helandim!... Heyho heyhoo!... "Tê sotin, nayê gotin..." Nayê gotin ka çiqas zehmet e jiyîn û jiyar!...

*

Ew spêdeya min a dawîn bû li Geraşînê, danê têşdewgan ez ê dîsa vegeriyama Xanê. Ew hefteyek bû ku ez mişext bûbûm û bi xalê xwe re bêyî ku dayika min, bavê min pê bihese çûbûm zozanî û min demeke têrtijî li wê derê bihurandibû. Ev dema dizîkî di tama xwe de, di nav bîranînên min de mabû. Jixwe piştre bi çend mehan zozan ji binî ve hatibûn qedexekirin. Lê hêj felaketên mezin, evîna ku di dilê min de fetisiyabû; kuştina bavê min, revîna jinbiraya min, sotina Xanê û ji qehran felcbûna dayika min... Eve hemû hê nû, piştî bêhnvedaneke mişext a li Geraşînê, pêl bi pêl wekî ewrekî bed û bêyom, wekî koremarekî jehrîn, wekî lomeyeke jiyanê dê bi ser min de daweşiyana.

****

# Dîmena duyemîn
# "hêvîşikestî"

*Şikest dîza sebrê*
*Vêket agirê kerbê*

Di ser wê hefteyê re sal bihurîbûn. Qereqola leşkeran hatibû Keşkanê, yekem car yekî keşkanî bûbû serkêşê Xanê û piştî wê roja pincarçinînê gelek carên dîtir ez û Salo pevçûnbûn lê her gavê jî wî zora min biribû. Du zarokên Tajdîn çêbûbûn, Ehmed çûbû ber xwendinê; dayika min digot, çûye evraz; ango bajarekî rojavayê Tirkiyeyê.

**

Şeveke sar a zivistanê bû. Gelek befir barîbû û her wiha her ku diçû berfê bênavber jî lê dikir. Em, wek malbat ji bilî Ehmed, hingorê êvarê giş li odeya qesrê ya mezin rûniştibûn. Dayika min behsa Ehmed dikir, zarokên Tajdîn Rojbîn û Rondik ku her du jî keç bûn, li wê derê, ji xwe re dileyîstin. Ez wê rojê bi zekemê ketibûm. Min xwe dabû ber argûnê û min xwe germ dikir.

Befir hê jî lepe lepe dibariya. Jûra me germ bû. Bavê min li serê dîwanê rûniştibû, Quran danîbû ser rehlî û ew dixwend. Dayika min li nik Rondik û Rojbînê bû, bi wan ve mijûl dibû. Tajdîn û jina xwe jî, li aliyê çepê yê odeyê rûniştibûn; bi pistepist di ber xwe de diaxivîn. Ronahî û Bînahî jî dîsa bi

dagirtina çayê mijûl bûn; yekê peyale dadigirtin a dîtir jî ew li ber me digerandin.

Befir bênavber dibariya. Derve gelekî sar bû. Min li ber argûnê pal vedabû. Hêdî hêdî bi niqulozên xewê re têdikoşiyam. Xeweke bêdem a şirîn xwe avêtibû ser dilê min. Ji nişka ve cam şikestibû û bi şikestina camê re ez di cihê xwe de veciniqîbûm. Hingê bavê min ji cihê xwe rabûbû, Qurana wî hê jî vekirî bû, nêzî pencereyê bûbû...

Befir bêrawestan dibariya. Şeveke sar a zivistanê bû, ez bi persîvê ketibûm; bi bapêşê. Min li ber argûnê pal vedabû û bi niqulozên xewê re têdikoşiyam. Wê kêlîkê dengê çend teqlan li dû hev hat bihîstin. Bavê min, hêdîka li ser piyê xwe zivirî, heçko xatirê xwe ji me bixwaze, wisa li me nihêrî, mirûzê wî tirş bûbû û xunaveke sar avêtibû ser rûyê wî. Piştre hêdîka wekî qiriyana spîndarekê, na na wekî heriftina çiyayekî dirêjî nava odeyê bû. Cam dişikestin, cam dişikestin û cam dişikestin. Peşkên xwînê belavî ser Quranê bûbûn, Qurana wî hê jî vekirî bû û peşkên xwînê pekiyabûn ser.

Befir dibariya, qîjîn û hawara dayika min û şikestina caman bi hev re deng vedidan. Her kes behitîbû. Her tişt rawestiyabû wê kêlîkê. Bavê min bi sê guleyan hatibû kuştin, li wê derê, li nava odeya qesrê, ew bejna wekî çiyayekî li ser devî, li nav gola xwînê raxistî bû û dayika min li ser dikir hawar û hawaaaaaaaaaaar!...

Befirê bênavber lê dikir. Bavê min, di şevetariya sermaya çilê zivistanê de, li pêş çavên me, li nav gola xwînê bûbû term. Wê gavê, wê şeva bêyom dayika min li hindava termê bavê min dikir hawar û bangîn, digot: "Wî mala minê, wî Ebdurehmanê mino, wele te çiraya mala me bi yekcarî vemirand. Ebdurehmano, canemergo, bavê Ehmedo!, kê destên xwe xilandin; kê çi ji me dixwest, kê kuçikê me vemirand, hawaaaaaaaaarrr!..."

Befir bêmirwetî bi ser jîngehê de dibariya. Şeveke bêyom bû, sar bû, li Gundê Mizgeftê hawaar bû, di nava çend deqeyan de der û cîran bir bi bir ber bi qesra me ve hatibûn. Hawar zû gihîşt, xebera reş zû belav dibû. Tajdîn bi hawarkî rabû da ku li dû mêrkujan biçe, ez li ber argûnê hişk bûbûm, wirtîn ji min nedihat. Lê, gelek befir dihat, her der tarî bûbû, şûnpê zû ji berfê tijî dibûn, dews winda dibûn, piştre Tajdîn got ku ew sê kes bûn, ber bi qereqola Keşkanê ve diçûn û li wir, li pêş çavên min winda bûn.

Befir dibariya. Şeveke reş a zivistanê bû. Bavê min hê jî li nav odeyê, li nav gola xwînê bû; bêruh, bê liv û tevger, li ser devî raxistî bû. Dayika min xwe bi ser dadabû û bi her du çavan xwîn digiriya; her du xwîşkên min jî pê re dikirin hawaar. Peyale hê jî li nava jûrê bûn. Tajdîn hinekî dilsartir bû û gundî pêşwazî dikirin. Ez hê jî li ber argûnê bûm û li wê derê bêdeng, req û hişk bûbûm. Rondik û Rojbînê dayika xwe hembêz kiribûn û ew her sê, li kuncekî dîtir ê jûrê digiriyan.

Wê şeva bêyom, li Gundê Mizgeftê dengê girînê; dengê qîjîn û hawarê, têhna tirsê, zêmar û hawara dayika min digihîşt ber banê felekê. Wê şevê tenê têhna tirsê û bêhna xwînê hebûn. Wê şeva îniyê, piştî ku bavê min, li xutbê bi kurdî xutbe xwendibû û behsa edalet, maf û azadiyan kiribû, tenê piştî danekî rojê, piştî çar pênc saetan, li mala xwe, li pêş çavên me hemûyan, bi sê guleyan, bi bêbextî hatibû kuştin. Dilopek av jî nexwestibû. Berikên bêbext û bêwext yekser li qefesa singa wî çikilîbûn û dil û mêlakên wî di devê wî re avêtibûn.

Befir dibariya. Gundî hema bêje gişt li mala me berhev bûbûn. Tajdîn li nav mêvanan serê xwe danîbû ser milê camêrekî û bi giriyekî ter ê bêdeng hildiçû. Jinên cîranan jî bi milên dayika min girtibûn û pê re digiriyan. Ji çu kesî/ê gotinek jî nedihat. Feqî Huseyn ku feqiyê bavê min bû û her roj pêkve dihatin nik me, li ser meseleyên dînî û yên dinyayê diaxivîn ku

bavê min dersa ilmî didayê, li ber serê termê seydayê xwe rûniştibû û telqîn dixwend. Piştre li dîwanê nihêrî û got, "Seyda Ebdurehman şehîd e, divê em wî wiha bi cil û bergan veşêrin. Şehîd nayên şûştin, melek wan dişon." Piştre jî gotibû ku dawiya zilmê her zewal e. Feqî gotibû, "Ev xwînmijên ku seyda qetil kirine rojekê dê bi zewalê bikevin, Xwedê me hemûyan bide ser xatirê şehîdên xwe!..."

Befir her dibariya; wisa bû, te digot qey Xwedê hemû berfa dinyayê daye vê derê. Heta hingorê şevê sê caran ban hatibûn malîn.

Wê şevê kêliyekê tenê jî xewê dilê min negirtibû. Heta sibê, ez wisa hişkbûyî li ber argûnê mabûm. Hin caran ku çavên min hêdî hêdî dimiçiqîn jî, demildest bi dengê şikestina caman re hişyar dibûm. Bavê min li wir, bi betaniyeyê pêçayî, li nava odeyê bê liv û lebat nivistî bû. Min nexwest bawer bikim ku ew êdî mirî ye, ya ji min ve, piştî bîskeke dîtir dê rabûya ser xwe, Qurana xwe bigirta û piştî nimêjê dê ji me re çîrokên kevn bigota. Lê, dem diçû, şev dimir, mêvan û hawarî ji bilî cîranên nêz yek bi yek radibûn û diçûn mala xwe, lê ew hê jî di bin wê betaniyê de bû û qet nediliviya. Her cara ku çavên min bi termê wî diketin, kela girî di gewriya min de asê dibû û rondikên germ dilop bi dilop ji rûyê min gêr dibûn xwarê.

Befir dibariya. Bi bîra min dihat çîroka ku şeva berê, bavê min, dema ku li ber bixêriyê rûniştibû ji me re gotibû. Ji ber ku ew çîrok jî li ser mirinê bû.

****

Çîroka bavê min wiha bû:

"*Keça delal a ciwan wê şevê di xewna xwe de weha dîtibû: Stêreke geş li asîman dirijiya û di heman demê de spîndara li ber derê mala wan dişikest û ji binî diqiriya. Digel vê yekê heyv û roj jî 'ku pêkve li ser rûbarê li kêleka mala wan leylan didan;' ji nişka ve tarî dibûn û*

*vedimirîn. Hingê kevokeke spî ji ber banê mala wan difiriya û ber bi ewran ve diçû; hingê ewr digiriyan û her wisa mehîna wan jî dişêhiya. Her wiha, piştî ku ew ji vê xewna balkêş hişyar bûbû, di nava xwîdanê de mabû, lêv lê ziriyabûn û gelek tirsiyabû; lewre jî xewna xwe bi strankî ji bavê xwe re vegotibû. Herçî gotina wê qediyabû bavî lê vedigerand û digot: "Keça min Xwedê xêr ke!", heta ku wê xewna xwe hemû ji bavê xwe re vegot, bavê zana û têgihîştî piştî ku ahîneke kûr û jidil berda bala xwe dabû keça xwe û wiha gotibû:*

"*Keça min, hindî stêra te didît dirijiya ew umrê te yê rêvasîn e.*
*Ji ber ku jiyê rêvasê kurt e, bextê wê yê reş her û her lê xayîn e.*
*Ew spîndara te didît diqiriya bejna te ya narîn e.*
*Ew heyv û roja te didît vedimiriyan çavê te yê belekîn e.*
*Ew kevoka spî ya difiriya giyana te ya şirîn e.*
*Ew mehîna dişêhiya dayika te ya gorbihûştîn e.*
*Û ew ewrê li hindava serî digiriya jî babê te yê dilbirîn e!...*"

***

Ew çend sal bûn ku tiştên nebixêr li Xanê diqewimîn. Ew çend sal bûn ku Xana Sêgundan bûbû warê dubendî, hevrikî û berberiyeke bêeman. Ew çend sal bûn ku çu roj nediborîn ku li Xanê bûyereke diltezîn neqewime. Xal û xwarza, mam û biraza, pismam û binam hemû kes, her kes bûbûn neyarên hev. Heçko Xwedê xifsa xwe lê kiribe, xanî wan salan wisa li dij hev tûj bûbûn. Li bîra me, ew yekem car bû ku li Xanê xwîn dirijiya, ku mêr dihatin kuştin; jixwe ji roja ku qereqol hatiye Keşkanê pê de êdî dubendî ketibû nava xaniyan. Keşkanî bi piştevaniya qereqolê bûbûn şûr li ser stûyê xaniyan. Bûbûn strî û ketibûn çavên xaniyan. Bûbûn kul û ketibûn dilê xaniyan. Bûbûn jehr û ketibûn xwîna xaniyan. Bûbûn dûpişk û mar û ketibûn pêsîra xaniyan.

*

Piştî kuştina bavê min em bê sermiyan mabûn. Bi mehan kes nedikeniya; mêvanên serxweşiyê ji mala me xalî nedibûn. Dayika min her roj çengek rondik dirijand; heta, guliyên wê yên sor bi sê mehan nîvenîv spî bûbûn, rûyê wê daçûyî bû û gelekî lawaz bûbû. Ehmed hê jî bi gotina dayika min li evraz, ji kuştina bavê min bêhay bû. Tajdîn bûbû sermiyanê malê, hemû kar û barê malê wî digêra.

Piştî kuştina bavê min her roj ez bi dilekî şikestî di ber goristanê re derbas dibûm. Diçûm ber kêla wî û min serê xwe pê ve dadida û mistek rondik dibarand. Ez qet hînî nebûna wî nebûbûm, her dem min digot, qey ew ê piştî bîskeke dîtir bêt, lê roj diçûn, şev û şevexwînên dirêj ên kanûnê bi dawî dibûn, lê ew qet û qet diyar nedibû. Dayika min, piştî hefteyekê cilên wî gişt birin dane birayê xwe û gotê, "Van cilan bibe Ertûşê bila bidin feqîr û hejarekî..."

Piştî kuştina bavê min ez her roj bi dilekî xemgîn, bi hêviyeke birîndarbûyî di ber goristanê re derbas dibûm. Min piştî xwendina fatîheyekê serê xwe bi kêla wî vedida û min nifir li mêrkujên wî dikirin. Her ku çavên min bi goristanê diketin min pêjna bavê xwe seh dikir, xîsikên giriyê di hefka min de asê dibûn û rondikên min dilop bi dilop ji rûyê min dihatin xwarê.

Piştî kuştina bavê min bi rastî jî çiraya mala me bi yekcarî vemirîbû; kenê ji ser rûyê me koç kiribû, henek û stran dîsan nehatibûn ser zimanê me. Dayika min her roj, piştî nimêja sibê, yekrê diçû ser gora bavê min û heta tavdana spêdê li wir dima; piştre dihat lerxîniya xwe dikir û paşê ber bi Gundê Axayî ve diçû. Nedixwest li wan deran bimîne, bêhna wê pir ditengijî. Tajdîn heyamekê piştî kuştina bavê min bûbû melayê gundî. Lê kes li dora wî nediciviya, kesî/ê çu pûte pê nedida. Ne sofî û feqeyên bavê min bi rexê wî ve diçûn, ne jî kesekî dîtir; hema bêje Tajdînê me tenê bûbû melayê nimêjkirinê, piştî nimêjê, muezînê wî jî carekê min nedît nehate malê û bi wî re çayek

venexwar. Tenê jina wî bi melatiya wî kêfxweş bûbû.

Piştî kuştina bavê min bêdengiyeke kerr kete ser qesra me. Şaneşîna me tenê bûbû leyîzgeha Rondik û Rojbînê. Bihar hat, bû havîn û Ehmed ji bajarên rojava vegeriya.

Rojeke germ a havînê bû. Taveke tînde nefes li mirov diçikand, defeke bayî jî nedihat. Ehmed bi mînîbusa gund hatibû û bi dilekî rihet, bêyî ku hay ji tiştekî hebe, ber bi qesrê ve meşiyabû. Ez, dayika min, Tajdîn û Rondik û Rojbîn li şaneşînê rûniştibûn. Ji bilî dengê Rondik û Rojbînê ew der kerr bû; tenê li nav baxçeyî, li ser daran dengê çivîkan dihat bihîstin. Tû gihîştibûn û çend libên tûyan ku ji tûya ber malê daweşiyabûn, ketibûn ser şaneşînê.

Ehmed li nav derê şaneşînê, çenteyekî reş pê re, bi rûyekî biken, bi kêfxweşiya gihîştina malê xuya kir. Em hemû bi pêş ve rabûn. Çavên wî yekser li cihê bavê min geriyabûn, nizanim wê gavê di hişê xwe de çi fikirîbû, lê tiştek negot, dayika min ji bo ku çavê xwe ji çavên wî birevîne her tişt kir. Bi dengekî kelegirî ripo ew hembêz kir, paşê, serê wî şidand singa xwe û bêhnekê wisa ma; heta wê gavê wisa yek ji me hembêz nekiribû. Ehmed jî hînî tiştekî wisa nebûbû, lê bi qasî çend deqeyan wisa ma; piştre, hate ser hemdê xwe û got, “Keçê Ronahî, Bînahî ka nanî bînin, va ye birayê we hatiye.”, “Dayê ez têr im.” Demildest lê vegerand Ehmed. Piştre jî em hemû li şaneşînê rûniştibûn, piştî ku ez rabûm min şerbikek dewê sibitkirî da Ehmed, ez li cihekî veder ku berê min nekeve wî rûniştibûm. Her kes bêdeng bû.

Wê roja germ a havînê, li ser şaneşînê, piştî ku min dît ku her kes çavên xwe ji nav çavên Ehmed direvîne; her kes, di ber xwe de bi bêdengî difikirî, kêrê dev venedikirin. Wekî aşê av jê hatiye birîn her kes wisa bêdeng û bêpêjn rûniştibû. Hingê, Ehmed got, “Dayê, kanî ez bavo nabînim?”, aha wê kêlîkê dîza sebrê şikestibû û bêdengiya şaneşînê bûbû mala nihar û behiyê.

Hemû birîn, hemû kulên ku hêdî hêdî dihatin pêçaftin, wekî ku tîr li birînê biçikile, wisa hemû birîn ji nû ve helişkiftibûn; hemû kul ji serî ve der bûbûn. Dayika min bi giriyekî bilind got, "Ehmedo, xerîbê min!, bavê te hat kuştin. Mala me xirab bû, çiraya me vemirî, stêrka me rijiya; bêbextan mala me wêran kir!"

Ehmed serê xwe xist nav her du destên xwe û heçko hemû xweziyên wî li ser dilê wî bimînin, wisa di giriya xwe de hilçûyî bû.

***

Di ser wê rojê re gelek sal bihurîbûn. Ehmed zanîngeha xwe qedandibû û berê xwe dabû Xanê. Daweta wî bû. Piştî kuştina bavê min bi salan şûnde, piştî ku ez bûbûm ciwanekî nûgihayî ku piştî du salan dê biçûma leşkeriyê, li qesra me yekem car dengê stranan dihat bihîstin. Birîn her çend nehatibûn jibîrkirin jî, hêdî hêdî em hemû hînî nebûna bavê min dibûn.

Her wiha yekem car bû ku keçeke biyanî dê bihata mala me û ew ê bibûya jinbiraya min. Dayika min digot, "Ehmedê Xanî, kurê min ê herî bikêrhatî û bijarte ye; divê ez daweteke wisa jê re bigerînim ku heta bi hetayê wekî destanekê li ser devê dengbêj û aşiq û evîndarên xaniyan bihête vegotin. Ku fesad û nemam bi yekcarê bipeqin." Her wiha min careke dî ji dayika xwe bihîstibû ku digot, "Biyanî verot goştê ranî, bi derengî pêşemanî", lê min hingê çi wate nedabû vê gotinê, lê belê piştî salan min ê rastiya wê jî fêm kiribûya. Heke dayika min ewende ji Ehmed hez nekira, çu carê dilê wê nebû ku jineke biyanî bête mala me û bibe bûka wê. Lê wê ew çend ji Ehmed hez dikir, ji ber hindê nedixwest dilê wî bihêle û bi hemû biryar û kiryarên wî razî bû.

***

Berî ku ez Bîşengê binasim, li Xanê, hingê hêj du sal mabûn ku ez bibirima leşkeriyê, roja dawetê bû: Rojeke hûnik a payîzê. Belgên dar û dehlan hêdî hêdî diweşiyan, gelek jê zer bûbûn. Fêkî gişt stewiyabûn, dexl û derametê salê hatibû rakirin. Gêre hatibûn kirin û coxîn û bênder tenê bûbûn cihê dihên pûşî.

Roja daweta birayê min Ehmed bû; Ehmedê Xanî. Dawet li nik me payîzan dihatin gerandin. Piştî ku hemû kar û barê çandiniyê diqediya, piştî ku zevî vala dibûn, piştî ku hemû malanî komî ser hev dibûn, hingê demsala dawetan dest pê dikir.

Roja daweta kekê min ê xweşewîst Ehmed bû. Kar û barê dawetê bi rojan berê dihat terxankirin. Hemû, gundî yek bi yek, mal bi mal dihatin vexwendin. Ji bo daweta kekê min dayika min sê beranên tovî dabûn serjêkirin.

Roja dawetê bû. Piştî kuştina bavê min ew yekem car bû ku ji qesra me dengê stranan dihate bihîstin. Dayika min biskên xwe badabûn, keziyên xwe vehûnandibûn, fîstanekî rengspehî yê kurdanî li bejna xwe kiribû. Reşkofiya tixûbanî avêtibû serê xwe, kemereke zîvîn ku bavê min berî salan jê re kirîbû jî li navtenga xwe girêdabû. Dayika min piştî kuştina bavê min yekem car çavên xwe kildabûn.

Roja dawetê bû. Dengê dahol û zirneyê ji Gundê Mizgeftê bilind dibû; ji Gundê Axayî, ji Keşkanê dawetî bir bi bir ber bi zeviya ber deriyê qesra me ve dimeşiyan. Li wir, govendeke mezin ku bi qasî sêsed zilamî hebû, hatibû girêdan.

Roja daweta birayê min ê ji min mezintir bû. Dayika min bi rûkenî, li serê govenda jinan direqisî; stran digotin, digot, "Ehmedê min zava ye, dinya xirab bibe ne xema min e; Ehmed miroveKî çak e, ez gelekî ji wî hez dikim." Dayika min wisa kêfxweş bûbû te digot qey bavê min ji gorê bi şûn ve rabûye.

Roja dawetê bû. Ewrekî avis li asîman diçerxand, bayekî hûnik diveziya; payîz bû, dexl û derametê salê hatibû rakirin, payîz bû û daweta birayê min Ehmed bû. Govend bi şidiyayî digeriya; hemû dawetî bi xeml û rapêça kurdanî bûn. Govend digeriya, du camêr li nava gera govendê direqisiyan.

Roja dawetê bû. Ez bi tenê mabûm. Wê rojê yekem car ez bi têhna tenêtiyê hesiyabûm. Her çend bejna min hinekî bilind bûbû û wekî zaroktiyê kirêt jî nemabûm, lê ez mirovekî xwîngerm nebûm. Gelek caran yên li derdorê ji min re digotin, "Mustefa tu gelekî darse yî." Wan digot, "Darê te giran e, tu mirovekî kirêt î." Lewma jî ez hinekî kovî bûbûm û min xweş bi xweş têkilî çênedikirin. Baweriya min bi min nedihat. Ez ji xwe piştrast nebûm. Ditirsiyam. Min ji xwe hez nedikir, ez qet nediçûm ber xwedîkê û ez ditirsiyam li xwe binêrim.

Roja daweta kekê min î hêja Ehmedê Xanî bû. Hemû gênc û ciwanên Xanê bi kêfa dilê xwe bûn, ciwanan li ber dîwaran bi dizîka jivan bi destgirtiyên xwe re çêdikirin. Lê çu keça xaniyan ji min hez nedikir; ez bi tena serê xwe mabûm di daweta birayê xwe de. Keçên deverê gelekî ji xwecihiyan hez nedikirin, çavên wan bêhtir li derve bûn. Ji deraniyan hez dikirin, ev yek her dem li bin hişê min dibû meraqeke xurt û pirseke bêbersiv. Gelek caran, gava ku min ev yek digot, yên li derdorê ji min re digot, "Kuro, tu mirovekî kirêt î, li hincetan negere, tu terêf î, dargiran î, nehez î, xwîngerm nîn î", erê neynika min, ji wê rojê ve ez çi gava diçûm ber awêneyê û çi gava min li rûyê xwe dinihêrî, qijînekê bi ser min de digirt; ez ji xwe dikerixîm.

Roja dawetê bû. Payîz bû, berfa salê ya yekem serê çiyayên Xanê pêçabû. Av sar bûbûn, dexil hatibû rakirin, serê dih û lodên giya hatibû girtin, bi şev hewa sar dibû. Daweta Ehmedê me bû, piştî kuştina bavê min yekem car bû ku li qesra me dengê stranan bilind dibû. Bi şev heta berspêdê li qesra me

dengê stran, ken û kêfxweşiyê bilind dibû. Rû dikeniyan. Dayika min, bi wî dengê xwe yê zelal stran digotin; xanî gişt stranbêj bûn: Dengê hemû xaniyan xweş bû, yê ku stran nedizanîn, xaniyan digot, "Hebe nebe ev ne ji berê me ye."

Roja daweta kekê min ê delal Ehmed bû. Payîz bû; roja duyem a dawetê jî qediyabû, her kes, bi têra dilê xwe reqisîbû; dengê dengbêjan ketibû; daholvan û bilûrbêj westiyabûn. Ez wê rojê bi tenêtiya xwe hesiyabûm. Kela ciwaniyê li rehên min rabûbû pêdarê. Bêhna tolaziyê li difna min ketibû, lê min çu têkilî çênekiribûn. Kesê çi pûte bi min nedida, ez bi wê de, li kuncekî veder ê dawetê, li ser bengeha zeviyê bi tena serê xwe rûniştibûm. Carina diçûm cihê daweta jinan, min seh dikir ka karek heye, ku nebûya ez dîsa vedigeriyam cihê xwe û li wir min li govendê temaşe dikir. Carina diketim refên govendê; ez jî direqisîm; heta ji ber ku ez birayê zavayî bûm, stran bi min didan gotin, ez li nava govendê didam reqisandin, lê tiştek kêm bû. Têhna tenêtiyê ruhê min rapêçabû û bêhna min diçikiya.

Roja dawetê bû. Payîz bû. Ez wê rojê yekem car bû ku bi xweşikî û spehîtiya jinê hesiyabûm. Çavên min tim li ser jinan digeriyan lê wan berê xwe nedida min, çu pûte bi min nedikirin. Diçûm ku derê, çi li nik daweta jinan, çi ya mêran; ku li devera me edet bû, jin û mêran têkel dawet nedikir; çimkî dibû cergebez, jixwe çûyîna nik daweta jinan bo ciwanan qedexe bû, lê ji ber ku em xwedanê dawetê bûn, ji bo xizmetê ez diçûm; çi gava ez diçûm wê derê min ji serê govendê heta binê wê li keçan dinihêrî, hemû bi min pir xweşik dihatin. Pir germ bûn; xwîna min dikeliya, ez di hejdesaliya xwe de bûm û wê rojê, wê roja ku piştî kuştina bavê min yekem car bû şadî û şadimanî dihate ber derê qesra me, dayika min stran digotin, aha wê rojê ez bi têhna tenêtiyê hesiyabûm.

****

# Dîmena sêyemîn “azadîxwazî”

*Bêhna birsê*
*Têhna tirsê*

Piştî çarêkeke dîtir ez ê ber bi otogarê ve biçûma û ji bo dîtina Bîşenga xwe ya delal, ji bo êşa çavê xwe, birîna dilê xwe min ê berê xwe bida kevnewarê xwe. Min ê xwe bi mij û morana kevnewarê xwe wer kira; min ê dîsa pê li birîna dil bikira û ji bo kewandina birîna xwe, ji bo bidawîanîna kesera dilê xwe ez ê biçûma kevnewarê xwe; li cih û warê ku hemû xweziyên dilê min lê mane, hemû keserên min lê fetisiyane; cihê ku ken li ser rûyê min bûye têhna tirsê, bûye bêhna birsê, bûya hêlîvanka xeman û bûye êşeke jande ku her û her di kakilê dilê min de jan vedideç Tenê ji bo dîtina Bîşenga narîn, keça ku hemû kulên min di bişirîneke wê de dibûn hêviyeke germ.

Erê Neynika min a biriqok, erê awêneya min a xemên ku di bîbikên çavên min de derizîne, tîne pêş, ez ê biçûma û min ê qirêja bîranînên xwe bi awirên şengebiya hewda dilê xwe jarav bikira.

***

Erê Neynika min, rast bû, îcar hate bîra min; piştî daweta Ehmed bi du salan, îcar havîneke germ bû, Xanê disincirî. Tû û sêvtalk stewiyabûn. Giya bejnekê çûbû; birinc li nav zeviyan bi ser avê ketibûn, garis û genimokan rengê xwe dabû zeviyan,

dekak hatibûn danîn; şitilên xiyar, bacan, bacanreşk, filfil û îsotan xwe girtibûn û lobiyan rîşiyên xwe rakêşabûn. Ew çend şev bûn ku min di xewna xwe de şikeft didîtin, bi şevan ruhê min li nav şikeftan digeriya. Min tabîr û şîroveya van xewnan gelekî meraq dikir, lê kes tune bû ku ji min re şîrove bike, heke bavê min sax bûya hergîz wî dê ji min re şîrove bikira.

Li Xanê rehên dubendiyê gelekî kûr bûbûn.

Ehmed ketibû nav kar û barên siyasetê, çend ciwanên gundî dabûn nik xwe û dest bi gêrandina karê siyasî kiribû. Gelek caran gef li wan hatibû xwarin, çend caran hatibû girtin, fermandarê qereqola Keşkanê tim gef lê dixwarin; derav lê teng bûbû. Salo bûbû serkêşê cerdevanan û hilma dubendiyê ji nava Xanê radibû.

Rojeke germ a havînê Ehmed bi birek ciwan re berê xwe dabû çiyayan. Bi gotina dayika min, ew bi rastîn jî bûbû serkêşekî kurdan. Dayika min bi çûyîna wî her çend gelekî xemgîn bûbe jî, her dem bi serbilindî behsa wî dikir û digote jina wî, “Ji ber te reviyaye.”

Jina Ehmed, keçeke bajarî bû; bi quretî li me dinihêrî, çu kar nedikir, gelek caran li ber devê dayika min dida; keçikeke zana û xwenda bû lê bi gotina dayika min, “taşikrûteke bêmerêz” bû. Gelekî xwedîtî bû, hêj ew çend meh bûn ku hatibû mala me, xwe ji me gelekî bi jorvetir didît û li gorî rêz û rêgezên qesra me tevnedigeriya. Dilê xwe ji me radikir û carinan jî diket bin Ehmed û dida bin hingilên wî, lê wî çu carê bi wan gotinên wê nedikir, çimkî, Ehmed gelekî ji malbata xwe jî hez dikir, zû bi zû nedihişt ji ber arîşeyên biçûk serêşiyên mezin çêbibin, mirov zû bi zû li hev tanîn û arîşe çareser dikirin. Lewma jî dayika min ji Dilşayê re digot, “Weleh lêvbizotê, tu ne jina malan î, ez pîvaza rizî jî bi te nadim, lê ez çi bikim, tu jina Ehmedê min î, ji bo xatirê Ehmedê xwe heke hewce bike ez dê xidamiya te jî bikim.”

Navê jina Ehmed Dilşa bû; bejna wê normal bû, rûyê wê gilover bû, porê xwe her roj bi rengekî dîtir xena û biryatîn dikir lê ji birûyên wê xuya dibû ku porê wê reş bûye. Ew keçika bajarî bû, zana bû lê zikreş bû. Heke jidil tiştek bikira dê gelekî baş bikira lê ji ber zikreşiyê tiliya birî jî nedipêça.

Ehmed berî ku biçe çiya û bibe şervanê azadiyê, gelekî rû dida min, dixwest ez jî bi hatin û çûyîna dinyayê serwext bibim. Gelek caran heta derengê şevê bi me re sohbet dikir, behsa pêşketinên cîhanê û ravêjên jiyanê dikir. Ajandayeke wî hebû; tim lê dinivîsî, berî ku biçe bi rojekê ew ajanda dabû min û gotibû, “Baweriya min bi te tê, vê li cihekî ewle veşêre, bila çu kes cihê wê nizanibe.” Min jî bi gotina wî kiribû. Ehmed hingorê şevekê wek dawiyê li ser şaneşîna qesrê xatirê xwe ji me hamûyan xwest û çû û di tariya şevê de winda bû. Herî dawiyê dengê wî û hevalên wî dihat, piştre me dê bizanibûya ku heke wê şevê neçûbûya Saloyê bêbext kemîn li ber girêdabû, dê ew bi leşkerên qereqolê bida kuştin. Lê Ehmed jîr bû, zana bû, xwenda bû, berdilê dayikê bû, wekî êkaneyê malê bû, me hemûyan jî gelek jê hez dikir, ezîzê li ber dilê me hemûyan bû. Lê ew çû; jina xwe, Dilşaya xwe li wir hişt û piştî ku destê dayika min ramûsî, piştî ku ew gotinên dawiyê ji me re kirin, çû û di reşetariya şeveke germ a Xanê de winda bû.

Wê şevê dengê sîsirkan bêdengiya şevê diçirand. Tû dîsa ketibûn ser şaneşînê, mijmij zer bûbûn, sêvên navdar ên Xanê gihîştibûn, lê ew çû. Wê şevê Rondik û Rojbîn zû razabûn, Ronahî û Bînahî bi berhevkirina cihêzê xwe mijûl bûn; neqş û tevnên xwe dirêstin. Berî kêlîka xatirxwestinê wiha digot:

*

*Dayê, birano, xwîçêgorî, Dilşaya min a spehî! Ez va ye diçim, belkî eve hevdîtina me ya dawiyê be. Kî dizane, mirin wekî sîberê bi mirov re digere. Ez dizanim, dilê we dibêje neçe, erê dilê min jî naxwaze ji we veqete; hûn berî her tiştî malbata min in; hûn goşt û hestiyên min in. Ez*

*bi we re heme, lê ez ji bo we jî diçim. Ji bo hezkirina we; ji bo ku siberojê hûn li ser vê axê bi serfirazî bijîn, ji bo zarok û mindalên sava, ji bo ku kuştin li vî welatî bi dawî bibe. Ji bo ku em jî wekî însan li ser axa xwe azad û serbixwe bijîn: Ji bo ku em jî bibin xwedan welat, al, ax û gotin. Ji bo ku li şûna rondikên çavan, xwîna canemergan biharên azad û serbest li ser vê axê akincî bibin.*

*Dayê, dayika min a xweşewîst! Ez dizanim, bi vê çûyîna bêwext herî bêhtir tu diêşî. Bi vê çûyîna bêdem herî bêhtir cegera te disoje. Lê, şîrê xwe li min helal bike, ji bo min çu tişt ji hindê xweştir nîn e ku ez kurê dayikeke wekî te ezîz im. Ji bo min cihê serfiraziyê ye ku ez Ehmedê Kewserê me, ku min dayikeke wisa dilovan û hêja heye. Ez çu carê şîrê ku te daye min ji bîr nakim, ez ê her dem ji bo ku dayika min, welatê min di siberojên geştir de bijîn têbikoşim.*

*Birano, Xwîşkino! Hûn xwîşk û birayên herî hêja yên li ser rûyê vê dinyayê ne. Ez gelekî pê kêfxweş im ku Xwedê xwîşk û birayên wekî we hêja û dilqenc dane min. Ez ji bo azadiya we, ji bo ku siberojê zarokên we li ser vê axê azad bin, ji bo ku li hemberî dîrokê serbilind bin diçim. Bawer dikim ku hûn bi min têdigihin.*

*Dilşa, gizîna yekem a li ber dilê min!, ez dizanim, ev çûyina min a bêwext herî bêhtir dilê te dax dide, lê ez mecbûr im biçim. Lê belê vê yekê ji bîr neke ku evîna te her dem dê li nava dilê min zindî be; her dem tu dê li ber dilê min bî. Çavxezala min, ji bîr neke ku şêr ji bo warê xwe têdikoşin. Divê hinek ji me milê xwe bidin bin vî barî, erê, ez dizanim, tiştê herî nexweş veqetîna bêwext e; xatirxwestin e, lê ji bo ku di ayîndeyeke geş de, kulîlkên rengîn li vî welatî şîn bibin, ji bo ku li şûna rondikên çavan ken, li şûna bêhna birsê jiyan, li şûna kavilan warekî ava, li şûna xeman û cudabûnên bêwext baxçe û gulistanên evîn û evîndariyê ava bibin, divê hinek ji me xwe gorî bikin. Ev, hilbijartinek e, ancax ên ku ji xwe bêhtir, ji axa xwe, ji miletê xwe hez dikin, dikarin xwe bidin ber vî barî.*

*

Piştî van gotinan Ehmed bi birek ciwan re ber bi çiyayên Kurdistanê ve xwe dabû rê. Hingê dayika min li wê derê, li ser şaneşînê ne bi dilekî bi hezar bêdiliyê, awireke melûl li Ehmed veda û hêdîka bi kelogirîn di ber xwe de kire pistepist: "Şêr ji bo warê xwe têdikoşin; şêr ji bo warê xwe tê...." Lê Ehmed çûbû, Ehmedê Xanî berê xwe dabû çiyayê Xanê, ber bi Geraşînê, ji wir jî bi ser Gareyî re berê xwe dabû riyeke bêveger.

*Wextekê*
*Evînî hebû*
*Xwîngerm bû*
*Wek zarokekî*
*Delodîn bû*
*Tijî jîn bû*
*Çû*
*Çû*
*Çû…*

*Winda bû.*

*Lê şopa xwe hişt*
*Êşa wî li dil venişt*
*Li nav xwîna min rûnişt*

*Wextekê*
*Ew hebû*
*Dilgerm bû*
*Wek şêrekî*
*Bi heybet bû*
*Gelekî zîrek bû*

*Çû*

*Çû*

*Çû…*

*Winda bû.*

*Lê navê xwe hişt*
*Li nav bîranînên min rûnişt*
*Bi çûna xwe jîna me kuşt*

***

Wan rojan leşker û cerdevan gelekî bi ser me de dihatin; her roj Saloyê bêbext rêdikir ku gotinekê ji me derxe, şekir dida zarokan da ku wan bide axaftin, lê gava ku Ehmed çûbû hemû zarok di xew de bûn. Dilşa wan rojan gelekî bi tenê mabû; ew jinbiraya min a bajarî bû, piştî çûyîna Ehmed her çend hefteyan carekê diçû bajêr, hin caran bi rojan venedigeriya.

***

Piştî wê şevê, berê payîzê ez biribûm leşkeriyê. Ez biribûm hemberî birayê xwe yê hêja, ez ê li çeper û sengera dij birayê xwe bibûma leşker.

*

***Celeban û celeban em çûn malava,***

***Celeban û celeban xatir û malava...***

Û çûyîn... Ber bi asoyên bêhêviyê ve birêketin...

Tarîgewrika wê spêdeyê gelekî cuda bû. Stêrkên berbangê ber bi xatirxwestinê bûn, helesorika li ser gopikê rojava hema xwe nîşanî me dida û ligel defa bayekî hûnik ê serê

payîza zû yê piçekî sar, xwe bi dilovaniya keratiya spêdeyê berdida ser gundî. Ji wê ve, dengê dîk û keleşêran ê kûr bi ser hişê me yê xewar de dibariya; çavên me bi kotekî ji xewê vedibûn, hê jî hilma xewê di devê me re radibû û ber bi jorê ve hildikişiya. Hişê me xewîn bû hêj, lê em rabûbûn. Ew spêdeya zû û xweş bi hemû bedewiya xwe li benda me bû. Dengê şirika ava birka li nav baxçeyî yê zîz, ku têhneke sar û hûnik di hişê mirov de diweşand jî bi hemû spehîtiya xwe mêvanê spêdeya me, gêncên ku dê biçûna leşkeriyê bû.

*

Xweza vediwejiya; canemerg û lûleperên bêhnxweş ên payîzî hêdî hêdî vedibûn û çend belgên zerbûyî yên daristanan hêdî hêdî diweşiyan. Xwîs û xunavê avêtibû ser rûzemînî. Ew, wekî dilê min ê xemgîn xunavî bûbû.

Tîrêj dibûn lehî û bi ser gund de diqulipîn; hêdî hêdî têhn vedida xwezayê, reng vedida jiyanê û geşe dida siruştê. Hingê xurînî hatibû ber me; du totik nanê kurore, tirareke jajî, çend pirtên penêrî û şerbikek şîrê germ... Ji bilî Tajdîn û dayika min, hemû kes hêj razayî bûn.

Rojê dest bi jiyanê kiribû; jiyanê roj hembêz kiribû û der bûbû êdî verêja rojane ya cîhana me. Lê ew roj gelekî cuda bû, qet ji bîra min naçe ew roj, ew spêdeya cuda, ew sîtavka ku wê rojê bi ser min de hatibû û ew dilkuliya wê rojê ya giran. Tenê çend pariyên nanî di gewriya min re derbas bûbûn; min nikaribû taştê bixwim. Ji ber rêwîngiya bêdilî xwarin di gewriya min re nediçû xwarê.

Wê spêdeyê ji her kesî/ê bêtir dayika min diket ber awirên min. Hestek dilsoj a veqetîna ji dayikê ya mirovekî bêçare çawa ye? Çawa bû? Aha, wê spêdeyê ez wisa bûm; wisa bûn hestên min ên birîndar û dilsoj. Çu gavan heta wê rojê, hêj reng û rûyê dayikê ewende li ber çavên min geş û spehî, şîrîn

û xweyanî diyar nebûbû. Wê spêdeyê her tişt cuda bû; xweyanîtir bû; reng geştir bûn, deng zelaltir bûn û av, ax, rûbar, çiya... Her tişt, gund gelek cudatir bû li ber çavên min. Min bergeh heçko cudatir didîtin. Her ji çi be, nizanim, lê wê kêlîkê min mirina xwe dixwest lê min nedixwest ji gundî derkevim, heçko hestekî germ ez bi axê ve girêdidam, aha tiştekî wisa di ruhê min de rabûbû destkolê. Her tişt bi min şîrîn hatibû.

Nexasim dayik!

Dayika min a dilovan, sebra dilê min, ronahiya li ber çavên min, evîna yekta ya li ser perda dilê min; hawar û bangîna jiyana min! Dayika xweşkûktirîn û spehîtirîn! Ew, ruhê min. Ew, giyana min. Ew, her tiştê min... Ango dayika min! Aha, piştî çend kêliyan ez ê bê dilê xwe jê veqetiyama û min ê berê xwe bida oxira nediyar, ez ê biçûma leşkeriyê û min ê li dijî kekê xwe yê hêja, êkaneyê ber dilê me hemûyan şer bikira.

Awirên Tajdîn û dayika min zivirîbûn ser min.

Ez ê biçûma leşkeriyê, wê gavê tiştê herî dawiyê ku min dixwest bikim, ew çûyîna bêwext û bêdil bû. Tajdîn bi bişirîneke sar got, “Heta tu çavên xwe vekî û bimiçiqînî dê biqede jî.” Lê ji rûyê wî xuya bû ku wî bi xwe jî ji vê gotinê bawer nekiribû. Dayika min deng nekir û piştî ku min destê wê ramûsabû, em deh ciwan bi hev re, li mînîbûsê siwar bûbûn û me berê xwe dabû oxireke bêyom.

*

Bergehên xweşik; dîmenên rengîn ên di rê de... Di pişt camê re temaşekirina bergehan hêj xweşiktir e. Bergeh bi wî awayî spehîtir dixuyên her ji çi be. Wexta rawestîbe tiştek hîn bedew xuya nake, lê dema ku bi liv û tevger be, hingê ew tevger wê bedewtir dikin. Aha, tiştekî wisa ye rengînî û bedewiya yekta ya bergehên dema rêwîtiyê li rex rê, li dormanên rê; yên dûr û nêzik. Mirov ji temaşekirinê têr nabe; hin dever bi deşt û leylan,

hin dever bi gelî û newal û hin dever jî bi çem û rûbar, bi gol û derya ne. Gava tu di nik re derbas bûyî êdî her tişt li pey te dimîne. Tu diçî, namînî li nik wan, li ser hinekî nahizirî; jixwe çu ji wan jî hin namînin li ber çavên te. Hemû bergehên di rê de demdemî ne; koçer in tev, tenê ji bo kêliyekê xwe nîşanî te didin, lê napêçin jiyana te û naxemilînin xeyalên te.

*

Neynika min a delal!...

Wê rojê, dema ku ez bê dilê xwe ber bi rêwîtiyeke li ser pira mirin û jiyanê ve diçûm, di şibaka mînîbusê re min li bergehên xweşik dinihêrî: Ez di ber bergehên xweşik ên deşt, milik, palik, şikêr, çiya, panav û asoyên sorgevezî gava ku tîrêjên tavê li ser leylan dida re dibihurîm, hingê çend rêzikên ku min ji nav rûpelên ajandaya Ehmed wergirtibûn, li ber çavên min ketibûn, wî wiha lê nivîsandibû:

"***Zor e dosto, zor e li ber pêlên dijwariyê kenîn!"***

*Ne hêsan e di dijwariyê de kenîn. Ken divê ji dil bêt. Divê pê re geş bibin hemû ra û rîşên mirov. Gava ku mirov kenî divê bi kenê mirov pezkûvî kedî bibin, mar ji kuna xwe derkevin, çeqel kemîna xwe betal bikin. Gava ku mirov kenî divê bi kenê mirov hezar bihar li ser dêmên mirov vegeşin; heta dawiyê xuya bikin diranên mirov, ji çirûska çavên mirov çivîk û perperik bikevin semahç. Lê li vî welatê tiştê em herî bêhtir jê mane, lê bûne biyanî ken e; ji roja ku kenê ji ser rûyê me bar kir, ji wê rojê ve ye em ketine stûkura hev û hev û du dixwin. Ji bo ji nû ve dîtina kenê xwe yê berze em ketin riyeke dûvdirêj û me ji kupê janan ken afirandin û bi rondikên sar tevî refên kenên xwe yên berze bûn. Em ew kes bûn êdî, ew kesên ku kenê wan dibû rondik û li ser rûyê wan ziwa dibû. Nexasim, kesên ku rondik li ser rûyê wan ziwa dibin, bêyî ku rûyê xwe tirş bikin kulan dadiqurtînin. Ew, bendemanî û jivanên xwe davêjin pişta xwe û ber bi kela dilê xwe ve dimeşin. Lê çu carê jî serê xwe li ber nemerdan natewînin! Ji ber ku ew dizanin bikenin jî.*

*Zanabûn; têgihîştin û serwextbûn... Nemaze di bîra dilan de melevanbûn, di şerê jiyanê de pêlevanbûn. Canbaziya dilê mirov xwe hiltavêje û helawistî ye hest û bestên mirov. Diherike nava dil lêmişta bestan, ne pend, ne şîret çu mifayê nade delodîniya raperiyayî.Diçî tu, difirî tu, dimeşî tu; digel defa bayê bîranînan...*

"*Her giyayek li ser reh û ripinê xwe şîn dibe" dibêjin gelek caran di nava axaftinan de dayik û dapîrên me. Aya çi ne ruh û binîşên me? Ji ku derdikevin? Çendî kûr in? Lê rastiyekê deriyê xwe ji min re vedikir hêdî hêdî; jiyan tecrûbe bû, tecrûbe jî jiyan. Jiyan nasîn bû, nasîn ji hev vavartin. qenc û neqenc, reş û spî, gewr û şîn... reng û deng. Venasîna cudahî û ferqiyatê bû jiyan; her roja paştir dê tiştekî nûtir, ji duhî/rabirdûyê cudatir raberî te bike jiyan.*

***

Belê neynika min, ez li leşkeriyê bûm. Êdî hemû jiyana li gund ji bo min li paş mabû. Ez nexwenda bûm, -tenê min pênc salan mekteb xwendibû, ji bilî Mewlûd, Nûbara Biçûkan, tenê min beşeke Fetrul Qerîbê xwendibû û xwendina bi kurdî jî ez ji birayê xwe Ehmed hîn bibûm, gava ku havînê dihate gundî bi xwe re Rojnameya Welat û Kovara Rewşen û çend pirtûkên bi kurdî dianîn- kesekî gundî bûm; heta wê heyamê min ji bilî Xana Sêgundan û zozanên li derdora wê çu der nedîtibûn. Sînorên dinyaya min tenê Xanê û derdora wê bû. Min bi tirkî baş nedizanî, ez kirêt bûm û ji bilî kar û barê navmalê; çinîna giyayî, avdana zeviyan min tiştek nedizanî. Ez gelekî li paş mabûm. Hingê hêj min Bîşeng nas nekiribû.

***

Piştî perwerdehiya ecemiyê berê min dabûn gundekî Kurdistanê. Ez êdî, wek leşkerekî piyade, li gundekî bi ser Şirnexê, li qereqoleke nêzî sînor leşker bûm. Qereqol li girê li joriya gundî hatibû avakirin. Em bi giştî sed leşker bûn, fermandarê me miroveki gelek zalim û bêwijdan bû; navê wî yê

rastîn Selçuk bû, lê li derdorê her kesî ew bi navê Nemrûdî nas dikir.

Ji demsalan havîn. Ev çend meh bûn ku ez li vê qereqola li ser pira mirinê leşker bûm. Êdî piçekî çavên min vebûbûn. Ez bi mantiqê leşkeriyê hinekî serwext bûbûm. Roj diçûn. Dem diborî. Bes, ji bo teskereyê hêj gelek mabû. Êdî belgên dar û dehlan bi giştî tarî bûbûn. Hewa pir germ bûbû. Di wan çeperên wekî xendekan de me nobet digirt.

Li wê derê qural û qanûn tune bûn. Her tişt Nemrûd bû; qanûn jî, mehkeme jî. Her tişt li gorî kêfa –heke gotin lê begunên wî bû. Bi gotineke wî re tofan radibûn û her wisa berevajî bi gotineke wî jî xwîn radiwestiya.

"Heke ji kurmê darê nebe çu zewala darê nabe" her ji çi be, li vê qereqolê her ku min necamêrên miletfiroş didîtin, ev gotin dihat bîra min. Nemaze malbata Qeroyê çavkor... Ew sîxurên Nemrûd ên domdar bûn. Qero ku temenê wî li dora şêşt salî bû, xwedî jineke bedew bû, jina wî bi qasî pazdeh bîst salan jê biçûktir bû û keçeke wan jî hebû, ew jî li dora hejde saliyê bû.

Qero: Zilamê bêbext ê ku bêtexsîr birayên xwe, mirovên xwe, gundiyên xwe; heta ku nijadê xwe difirot. Qeroyê ku çavê wî kor, pişta wî xwîs. Qeroyê ku xwîna miletê xwe difirot namerdekî bi navê Nemird. Nemird; an jî Nemrûd nebirnavê fermandarê qereqolê bû. Ew ê ku bi rijandina xwînê re har dibû û zewq jê werdigirt. Zilamekî bejndirêj, çavşîn û tertere bû. Gava ku hêrs dibû çavên wî sor dibûn. Har dibû. Wekî gurê xwîndîtî êrîşî derdora xwe dikir.

Jina Qeroyê çavkor: Nesrîna doxînsist, dayika keçeke xama bû. Jineke dêmgeş, bejnzirav û çavbelek... Li gorî gotinên hin gundiyan wê qet ji mêrê xwe hez nedikir. Bi xurtî dabûyê, lewra jî doxînsistî dikir. Ew jî, rojên ku Qero nehata dihat

qereqolê. Her roj giliyek. Her roj agahiyek. Lewma, di hefteyekê de qet nebe du sê caran em diçûn kemînê û me li gêdûka li ser tixûbî kemîn girêdida. Bazirgan, qaçaxçî û rêwîng gelek caran diketin kemîna me; lê fermandarê qereqolê bi şertê ku nîvê kara xwe bidin wî, ew ji nedîtî ve dihatin.

Û keça wan: Nêrgiza bêsiûd. Ew, keça berhema vê zewaca sosret. Keça ku bûbû sermiyana dilê dayika bêîqbal. Ew gelekî li ber bêsiûdiya xwe diket. Trajediyeke nedîtî... Her roj mijara ji navtengê jêr ve ya leşkeran ew bûn. Min nedikarî tiştekî bibêjim lê nemaze di dilê xwe de, vê rewşê bandoreke pir xirab li min dikir. Her roj leşkerên mayîn ev rewşa wan wekî tahnekê li nav çavên min didan. Ez pê biçûk dixistim. Lê tiştek ji destê min nedihat.

Piştî rojan agahiyeke sosret li nava qereqolê ji guhekî derbasî guhê din dibû. Jixwe li gund heke çivîkek jî bifiriya demildest di kelekeliya xwe de agahî digihîşt qereqolê. Li gorî agahiya ku vê carê gihîştibû; keça ji vê zewaca bêsiûd afirîbû û di nava vê bextreşiyê de mezin bûbû, êdî raperiyabû. Çûbû. Berê jî ji vî gundî gelek kes çûbûn; lê ev yekem car bû ku keçek diçû, hem jî keça sîxurê gundî. Hingê ez di ber xwe de fikirîbûm û min ev texmîn kiribû; hebe nebe ev keç ji qedera xwe ya reş reviyaye. Piştre jî, min xwe datanî cihê wê, ez dihizirîm ku heke ez bûma min ê jî wisa bikira. Piştre jî min di ber xwe de dua dikir, min digot: “Ya Rebî, Xwedê bike, çu carê em li wan neteşqilîn. Yek jê birayê min bû, Xwedêyo, min ê çawa li hemberî birayê xwe, Ehmedê Xanî, berdilê me hemûyan; şêrê ku ji bo warê xwe têdikoşiya şer bikira”.

Li ser wî çiyayî, li warê Nemrûdê zalim ê xwedênenas, li dijî gelê xwe; li dijî doza miletê xwe ya mafdar, di nav refên leşkeran de ez... Mustefa. Ciwanê nexwenda yê ku bavê wî bi kuştineke kiryar nediyar hatiye kuştin û kekê wî berê xwe daye çiyayan û bûye serkêşê şervanên kurd. Hawara Xwedê; bêyî

qeza û bela, bêyî ku li tûşî rûreşiyekê bihatima min ê çawa ew roj biqedandina. Ez gelekî ditirsiyam.

*

Her êvarê, berî ku rojê xatirê xwe ji wan çiyayan bixwesta; piştî îctîmayê petek bîra, an jî peyaleke konyakê didan me, da ku em –qaşo- li hember tirsa pevçûnê dilêr bibin, da ku ji tirsan nemirin. Her şev, bi nîvsermestî, di bin tirs û sehma dengan de, li nav kozikên wekî çaleke kûr, şevexwînên dirêj... Her çi şeva ku me li dû xwe vedihêla, me digot: "Şikur ji bo Xwedê, îşev jî bi saxlemî em gihîştin sibê, vêca, heta sibehî xwedan Xwedê ye!" Tirseke wisa. Her dem têhna berikekê, siya ruhîstin li ber guhê me digeriya. Ka kengî, li kîjan milî; êrîşeke çawa û ka dê îcar guleyê mêjiyê kê ji me birijanda? Tirs. Kuştin. Kemîngirêdan. Leqayîbûna bi yekîneke serhildêran re û pêlêkirina mayînekê. Evana her dem di mêjiyê me de bûn. Êdî derbaskirina rojê, qedandina nobeteke din û kudandina şevê bi saxlemî, tenê evana bûbûn arîşeyên mêjiyê me. Li derve çi dibû, kê, çi dikir, li bajaran, li tevahiya welatî çi diqewimî, çi diguherî? Ji bo me qet ne xem bû. Tenê tirsa ketina ber xezeba Nemrûd hebû. Ji ber ku herçî diket lepên wî êdî fermana serê wî bû.

Qero her roj li qereqolê bû. Soz dida Nemrûd ku keça xwe bigire û bîne teslîmî edaleta (!) Nemrûd bike. Bavekê dê keça xwe bi destê xwe baniya û teslîmî lepên gurên har bikira. Gelo ma tiştekî wisa dibû? Ma ew bav xwedî wijdaneke çawa bû? Qey çu wijdana wî nebû? Wijdan çi ye? Tiştekî çawa ye? Li ku ye? Çi dike? Xwedî şiyaneke çawa ye? Heyho neynika min, heyho; li wê derê, di wê qereqola Nemrûd de min çi dît û çi nedît? Bawer bike, çu şiyana peyvan nîn e ku vê çendê der bike.

Bazara li ser tixûban…

Bazara ku pariyê herî mezin diket devê Nemrûd.

Fermandarê qereqolê, serkêşê 'tîma F' a ku xwîna mirovan dimêt. Gundî. Yên me; mirovên ji vê axê. Kesên dilpak, niyetqenc bes zêde çavnebar. Kesên kêmxwenda, bêderfet, kovî û di navbera me û serhildêran de asêbûyî. Bes, herî bêhtir ketine ber tofana buxtanê ya ku Qeroyê bêbext ê ku wekî Saloyê gundê me bû, bi ser wan de radikir. Di rastiya wî gundî de gundê me, di rastiya wê de jî rastiya cografyaya me diteyîsî. Rastiya me ya bi sedan salan gihîştiye wê rojê. Rastiya ku berê te û hevrêyên te dixist singê hev. Rastiya ku tu di lepê wan de wekî mişkê ketiye dafika pişîngê, bêgav û bêmefer digevizandî. Rastiya me. Rastiya min. Rastiya Mustefayê Xanî yê leşker ê ku li qereqoleke li ser tixûbî, di bin çavdêriya Nemrûdekî de digeviziya...

Tîrêjên rojê hêdî hêdî vedimirîn. Reşetariyeke ji perda sîbera êvarî xwe dahêlabû nava wan dol û newalên kûr ên ku te digot qey bêbinî ne. Wan şikêr û qontarên çiyayên bilind ên dû hev hatibûn çikilandin, xwe ji tarîtiya êvarê re amade dikir. Hêj ji mêj ve elektrîkên ku li doranên qereqolê hatibûn pêçan, vêxistibûn jî. Êvareke reş, stêr li asîman direqisîn. Dengê wawik û sîsirkan li derdorê deng vedida. Ji mêj ve me şîva xwe xwaribû û êdî em ketibûn kozikên xwe. Kozikên me nîvmetreyî kûr bûn. Rexên wan hatibûn nixumandin. Li pêşiya wan jî ronahiya boş a projektorê hebû, ku bi qasî sed metreyan pêşiya me ronî dikir. Gund diket pişt me, me ji wê sengerê ve ew nedidît. Li singa çeperên me qul hebûn ku ew jî cihê lûliya tivingên me bûn. Kamerayeke şevbîn a termal jî her tim li ber çavên me bû. Me çiyayên derdorê pê raçav dikirin. Ez û Yavuz, wê şevê bi hev re bûn. Ew, ji bajarekî rojavayê Tirkiyeyê bû. Wê şevê, di şevexwîna dirêj de li ber têhna tirsê Yavuzê îzmîrî ji min re serboriyên xwe vedigotin:

"Bajarê me li perava deryayê ye. Derya pir mezin e. Heçko asîman li ser rûzemîn hatibe raxistin, wisa ye. Bêbinî ye. Hindî ku çavê mirov qeter dike her derya ye; her av e, her şîn

e. Wekî çavên Arzûyê ne. Tu dizanî, ev bûn du sal ku ez û wê ji hev hez dikin. Di nameya xwe ya dawîn de behsa wan dem û jivanên me yên raboriyê kiriye. Hingê agir bi dilê min ket Mustefa! Xwezî ji xêra Xwedê re, bi silametî...."

Hingê ji nişka ve, ji aliyê rojava ve sê berikên guriyê; dû hev heçko stêr dirijin, wisa bi ser me de rijiyan. Û deng: Teq! Teq! Teq!... Dûre, hirînek, gurmîneke boş derdor vegirt. Êdî gotina Yavuz di qirika wî de mabû. Reşetariya êvarî ya bêdeng çiriyabû êdî. Ji çar milan ve, wekî xîzê berik bi himbiz bi ser me de dibariyan. Bi hewa ve fîzînî diket fîşekan. Leyîza berikan!... Kilîskên agirî, bêhna barûdê û dengê tivingan li çarmedor olan dida. Sehma mirinê. Tirsa kuştinê. Bi destên dilerizîn ve, bi hişekî nîvserxweş destê min li ser celebka reşaşê ku li ser G3 hatibû nivîsandin û leşkeran di nava xwe de jê re digot "marê reş" bû. Min dikir nedikir min nedikarî celebkê biguvêşim. Leşkerê rex min, ango Yavuz di kuna çeperê re derxistibû lûliya MG3'ê û ew dilûriya. Wî jî nizanibû ka çawa, bi kîjan milî ve direşîne; tenê zincîr li dû zincîrê direşand. Wisa ji ser hişê xwe çûbû. Bê hemdê xwe, ji tirsa mirinê tiliya xwe ji ser celebkê ranedikir. Kela şer lêdabû. Tirsa mirinê vegirtibû. Ez, li tenişta wî, di bin toz û dûkêla ku ji kozikê radibû de melisîbûm. Bi çarlepkî, min destên xwe dabûn ber guhên xwe û wisa bêdeng, bêbizav nivistî bûm. Hingê, ji nişka ve axînek hatibû guhê min, bi tirkî got, 'Ay Ana!' û wî dengî li nava kozika me deng vedida. Ez recifîm. Hingê, di dû wê nalîna kûr de tirmînek li tenişta min hat. Min qet xwe nelivand. Lê laşê min giran bûbû û çend dilopên ron bi ser min de pekiyabûn. Lewra, hingê bê dilê xwe ez li paş xwe zivirîbûm. Çi dibînim ku termê Yavuz li nava sengerê raxistî ye. Xwîn jê diçû. Hilm jê bilind dibû. Bes, deng jê nedihat. Ew, li wir di nava kozikê de diperpitî. Guleya bîjî yekser li depê singa wî qelibîbû û dilê wî qelaştibû. Hingê agir bi dilê min ket. Kezeba min şewitî. Demildest ez rabûm, min laşê wî venêrt, bes êdî pir dereng bû. Tiştek negot, qurtek av jî nexwest; wisa di navbera çav û

birûyan de çû, mir, hat kuştin. Bo çend kêliyan hişê min ew şeva sar a Xanê, dema ku wisa xwîna bavê min rijiyabû ser rehlê wî yê Quranê hatibû ber çavên min. Wê demê tezingeke sar bi ser min de çûbû xwarê. Gava ez hatibûm ser hemdê xwe, termê Yavuzê îzmîrî li rex min bêruh raxistî bû. Hingê min kire girîn, ez fikirîm: "Xwedêyo ji ber çi? Ji bo çi ev kuştin? Ev ciwanên teretol, hêj di bihara umrê xwe de diçin. Tên kuştin. Ji bo çi? Kî kê dikuje?" Hingê li ber çavê min zindî bûbûn çend rojên kurt ên bi wî re. Her yek ji me, ji deverekê hatibû. Bes, ma kê dizanibû ka dê ew li tenişta min, bi berikeke serhildêrên welatê min bête kuştin. Dibû ku ew berik li şûna wî li min jî biketa. Hingê niha yê ku li erdê deşt, bêbizav nivistî ez bûma. Xwedêyo, sehmê serê min girtibû. Jixwe heta hingê, ji min re behsa destgirtiya xwe dikir. Rêzikên nameya Arzûyê ji min re dixwendin. Bes, destgirtiya wî dê wekî gelek kesên din, çend rojên din paşve, li şûna name, yan jî telefonekê rûberî termê wî bibûya. Her wiha di heman demê de Dilşaya jinbiraya min jî hatibû bîra min; "Xwedê neke, heke tiştek bi serê Ehmedê me bihata, dê wê çi bikira: Belkî cendekê wî jî nedîta. Xwedêyo ev çi jiyan e? Li her du milan kuştineke bêmefer..." hingê, hizrên kûr û bişewat hişê min bi xwe re dibirin û mîna kulmek jan li ser dilê min dinişt û jan vedidan hemû kovanên min!

Hêj spêdeya zû Nemrûd berê me qulipandibû nava gundî. Berî ku gundî deriyên malên xwe vekin, şivan berê pezê xwe bidin nav çerwarî, gavan berê garana xwe bide kêrî û milan, berî ku bêrî biçin ber bêrê, zarok derkevin ber deriyan û ji xwe re bileyîzin, berî ku gundî pariyên pêxwarina xwe bicûn, qurtên çaya xwe daqurtînin û dest bi roja nû bikin... Em li nava gundî bûn. Li çar milan, qor bi qor yekîneyên me belavî derdorê bûbûn. Her tîmek li milekî; tivingên xwe bi çeprastkî girêdayî, tam bitecîzat li nav gundî bûn. Li ber penceran, zarokên biçûk bi tiliyan em nîşanî hev didan; em nîşanî dayik û bavên xwe didan. Bes, tavilê dayik û bavên wan ew ji pêş me dibirin û vedişartin. Bêdengiyeke bermirinê ya bêyom û pêreş gund vepêçabû.

Ew gund, gundekî pêhevraz bû; xane helqe bi helqe li pişt hev paldabûn. Li xwarê û danga gundî rûbarekî boş diherikî. Berahiya gundî berdayî, li pişta gundî jî qereqol hebû. Zevî hatibûn çandin: Darên fêkî, bax û rezên tirî, baxçeyên sêv û xoxan dixulxulîn. Simbilên geniman dan girtibûn. Genimokan ûşî girtibûn. Xiyar, bacan û dikakên dîtir jî tam di kamlana xwe de bûn. Lê, wê spêdeyê tev ketibûn bin tofana Nemrûd; na ketibûn nava agirê Nemird.

Ew, wekî hirçê birîndar daketibû nava gundî. Cigareya xwe di nava diranên xwe de şidandibû û rapêça xwe li xwe kiribû. Hingê bi gavên lez daket, diranên xwe şidandin û kir qîrîn: "Bikevin malan, li her derê başebaş bigerin!" Dengê wî yê bisehm û qert bi ser gundî de diçû xwarê. Ligel fermandana wî leşker rêz bi rêz ketibûn malan. Ez jî ketibûm malekê. Min gote hevalê bi xwe re: "Tu li ber derî raweste ez ê bikevim hundir." Wî bêtexsîr pejirandibû. Ew xanî hinekî dişibiya qesra me ya gundî. Hêj di derî de kirên bi dilê min ketibû. Bîrhatinên min tev zindî bûbûn. Çawa derî hatibû vekirin, serejineke wekî dayika min rastî min hatibû. Hingê min kir ku biçûma destî û jê re bigota, "Dayê, di bextê te de me, li min ranegire; ez jî bindest im". Lê min nekir. Heye ku ji şerma dinyayê be. Jixwe tiştekî wisa hem xeter bû, hem jî ne edetî bû. Çend zarokên hûrik li nava malê bûn; hemû şîrojo û sava... Bi ketina min a xanî re hemû çav zivirîbûn ser min. Zilamekî navsere li gel wê jina ku dişibiya dayika min û li dorê jî çend zarokên biçûk... Agir bi dilê min ketibû. Hemû çavan bi meraq li min dinihêrî; stûyê wan bi ser milê wan de xwar bûbû. Nexşeya têhna tirsê xwe dabû nav çavên wan. Ditirsiyan. Biguman bûn. Zarokeke sava jî bê navber, di dergûşê de digiriya. Dayika wê her çend lorik jê re vedistiran jî, her ku diçû giriya wê tal dibû. Ez jî –nî dilekî- li wan deran digeriyam. Hevalê bi min re jî li ber derî li benda min bû. Ew zarok digiriya, dayika wê dikir nedikir nedikarî wê haş bike, êdî neçar mabû ku landikê veke, bes çawa vekir; keleşnîkovekê diyar kir, ku zarok li ser raza bû. Ma zaroka

sava çawa li ser wî barê hesinê sar raketa! Lewma digiriya. Hingê, çavên wê jina ciwan ku kifş bû ku bûka malê ye, xwîs bûbûn, mabûne beloq û devê wê beş bûbû. Di cihê xwe de behitîbû. Hema demildest wê rengê xwe avêtibû. Hingê hemû awirên tijî tirs ber bi min ve zivirîbûn. Lê min bi xwe nekarî û bi kurdî min ji wan re got: "Netirsin, di bextê we de me, ji min netirsin. Ez jî kurd im. Zarokê vê axê me. Dayika min, çi bikim, bi xurtî ez anîme leşkeriyê. Li min biborin." Digel van gotinên min, îfadeya li ser awirên wan guherîbû. Qermûçikên li ser dêmên wan cihê xwe ji girnijînê re hiştibûn. Bêhna wan fireh bûbû. Mirûzê wan geş bûbû. Ewrên li ser asîmanê eniya wan kombûyî tev belav bûbû. Êdî asîmanê dilê wan sayî bûbû. Hingê ew a ku dişibiya dayika min ji nişka ve xwe bi stûyê min wer kir û ez hembêz kirim; her wekî dayikek lawê xwe hembêz bike. Min jî destê wê maçî kir. Paşê, min gotê: "Dereng e, divê ez biçim." Li mala ku ez bi nifiran ketibûmê bi duayan dihatim birêkirin. Min gote hevalê xwe: "Ca em biçin ev mal paqij e."

Hingê;

Li wê derê, di wan rojên nexweş de, piştî şeva ku deh leşker li qereqola em tê de bûn hatibûn kuştin, piştî lêgerîna gund, leşker rêz bi rêz ji malan derdiketin. Her birekê bi xwe re çend kes girtîbûn. Her weha çend çek û sîleh jî bi wan re hatibûn girtin. Bi pihên û bi dijûn leşkeran her wekî ajotina sewalan gundiyên berşik rapal didan û pihên didan û dabûn pêşiya xwe û tanîn. Li pêş çavên jin û zarokên wan... Welwele li gund ketibû. Dengê qîrîn û nalînan diçû ber asîmanê heftê.

Rojeke nexweş.

Li pêş çavên te, yên ji xwîna te dihatin lêdan, rapaldan bes te nedikarî deng bikî. Dilê min dişewitî.

Jixwe gava ku çavên min bi bira ku ji mala Qero derdiketin ketibû, ev şewat hêj gurtir bûbû. Hingê min dît ku

keçeke destgirêdayî, ku leng dimeşiya, porê wê yê reş li nav çavên wê qijqijî bû bi werîsekî hatibû girêdan. Serê wî werîsî di destê Qero de bû û bi pihên û kotekî keça xwe bi dû xwe re dikişand. Nemrûd jî cigare di nav tiliyan de, li kêleka Qero, bi wî kenê xwe yê hovane qure qure dimeşiya. Postayê wî tecîzata wî tanî. Du leşker jî, bi dû wan ve lûliyên tivingên xwe dabûn pişta wê keçê û ew tanîn. Bavê wê bi xwe ew tanî da ku teslîmî qereqolê bike. Hingê çavê min diketin ser rûberê keça Qero Nêrgiza birîndar; cil û bergên wê yên gerîlayî hê jî lê bûn. Di nava wê xemlê de dişibiya kevokeke baskşikestî, dilengiya. Nedikarî bifire û mixabin wekî sewaleke kovî bavê wê werîs xistibû dest û stûyê wê û ew davêt hembêza çeqelên çavbirçî. Hingê, ya ji destê min hatî, demildest min çavên xwe girtibûn. Lê, ji nişka ve ez bi qîjînên jina Qero ya doxînsist veciniqîbûm. Hawara wê diçû ber felekê. Bi dû keça xwe re, bi pêxwasî dibeziya. Dinaliya. Feryad dikir. Ji dengê wê çiya, ax û ber digiriyan. Çawa be cegera wê bû; tekane keça wê bû. Bi qîjîneke poşmanî dikir hawar û bangîn. Bes, kesek tune bû ku di hawara wê de bihata.

Êdî em vekişiyabûn qereqolê. Ji qereqolê dengê girtiyan diçû ber felekê. Êşkence û lêdanên pir giran li wan dihatin kirin. Rûyê Nemrûd dikeniya; bi edayeke serkeftî, destê xwe dabûn pişt xwe û li ber derê qereqolê dimeşiya. Keça Qero jî li odeyeke nependî, di hucreyeke teng de, ku ketina wê ji me re qedexe bû, hatibû girêdan. Êdî ji 'tîma F' re kar derketibû. Wan ê dilê xwe bi girtiyan hûnik bikira. Jixwe yek jî jê keç bû, ev bêhtir diçû xweşa wan. Wan ê hemû hinêrên xwe yên sadîstane biceribandina. –qaşo- dê tola leşkerên ku hatine kuştin bistendina. Li pêş çavên min; dengê wan li ber guhê min û ez neçar bûm, min nedikarî tiştekî bikim. Bêşiyan bûm ez. Bêşiyan.

Wê şevê, xew neketibû çavên min. Dengê qîjînên keça Qero bi ser qereqolê de diçûn xwarê. Hingê kirên bi dilê min

diket. Şewat diket hinavên min, “Ho Xwedê! Ho Yezdan! Ez çi bikim? Ez dikarim çi bikim? Bikevim nava wan û berê MG3’ê bidimê û lê bireşînim? Bes, kanê ew dilêrî!” Ez, Mistoyê ji tivingê kovî... Mirovê hestzirav û diltenik... Bihêle mirovan, dilê min nedigirt ku moriyekê, pêşûyekê bikujim.” Di nava van hizr û fikaran de, bi hişekî xewreviyayî, bi hestek herişî, bi ramaneke perçiqî; bi dilekî kul min di ber xwe de rondik dibarandin. Rondikên bêgaviyê. Rondikên neşiyanê. Rondikên perîşaniyê. Perîşaniya vê rûreşiyê. Ez, leşker bûm. Leşkerê xwînmijan. Ez leşkerê Nemrûd bûm. Di nav refên Nemrûd de min agirê şewitandina Îbrahîm gur dikir, “Ya Xwedê! Ya Rebî! Ya Xudanê Mirazan! Ya Delîlê Bêdelîlan! Delîlek! Tu delîveyekê bide min!” Duayên herî germ ên li gel rondikan li ser zimanê min dipekiyan.

Bi şevan heman deng. Bi rojan heman xewnereşk. Rojên wekhev ên herî nexweş careke din dubare dibûn. Ji bo çi ku nexweşî be zeman nizane biherike! Ji bo çi demên xweş wisa jîkurt in? Ev çi rêgez in? Ev çi duserî ye? Tenê, wan rojan agahiyek ji nava gundî digihîşt nava qereqolê ez kêfxweş, lê yên dîtir kêfnexweş dikir. Jina Qeroyê çavkor ew kuştibû û bi wî umrê xwe berê xwe dabû çiyayan. Xwe spartibû ser bextê çiyayan. Ez di ber xwe de fikirîbûm, min wisa texmîn kiribû ew ji bo hindê çûye da ku tola keça xwe veke. Da ku gunehên xwe bide efûkirin. Bêrûmet jiyabû, da ku qet nebe birûmet bimire.

***

Erê Neynika min, li vê qereqola ku li ser xêza mirin û jiyanê bû, roj nediborîn. Ji gundî tenê nameyek ji min re hatibû, ku her wiha nameya min hatibû vekirin û di nameyê de silavên her kesî/ê hebûn. Digot, hal û hewalê gundî baş e, çu nexweşî nîn in.

*

Neynika min a xweşkûk, qet ji bîra min naçe ew êvar.

Ew êvara ku dotira rojê ez dê bihatama teskereyê. Ew êvara ku dê dotira rojê konvoy rabûya û ez ji nav wê dojehê bifilitandima. Ew çend roj bûn ku leşkeriya min bi dawî hatibû, bes; ji ber ku karwanê veguhastinê nehatibû, min rojên zêde leşkerî dikir. A rastir bi min didan kirin. Destê bin kevirî. Tenê mafekî te hebû 'bêdengî' wekî din, tu çendî mafdar bûya jî, her dîsa tu sûcdar bûyî. Felsefeyeke pêlepaşkî. Mantiqeke vajî. Ramaneke hişk. Heywax neynika min heywax! Tu dizanî qet ji bîra min naçe ew êvar. Tu dizanî çima; ji ber ku min her tişt bi çavên serê xwe dît, ew besî min bû. Min dît ya, ka çawa hildiweşe textê Nemrûdî, çawa pirtiyên wî bi ba dikevin û li hewa dibijikin. Min dît ya, ka çawa têk diçin zalim û xwînmij û çawa bi ser dikevin mezlûm û bindest; ew besî min e!

Yanî;

Qet ji bîra min naçe ew êvar! Her ji çi be, wê êvarê tîrêjan bi rûkenî xatirê xwe ji wan çiyayan dixwest. Her wekî mizgîniyekê dê bi xwe re bînin, wisa bi lezûbez di keftûlefta xatirxwestinê de bûn. Ji gundî dengê banga mela li latên hindava me deng vedida. Koxê nobetê yê hindava qereqolê bêdeng bû. Livûlebata leşkeran nedihat. Te digot qey kesek li wir nîn e, wisa bû. Ya herî girîng berê lûleya MG3'ê li koma leşkeran dinihêrî. Îctîma amade bû. Çawîşê nobedar amadehiya tekmîlê dikir. Ez, li wê kozika nêzî qereqolê nobedar bûm. Çavên min li îctîmayê bûn. Nemrûd bi gavên giran ber bi safên rêzgirtî yên leşkeran ve dimeşiya. Reşetarî ketibû erdê. Berê, dengê vizînekê, na fîzînekê hat û dûre 'peq!' dengekî gelekî berz... Dengê roketekê. Ji girê jor, ji koxê nobedaran. Û dûre şêlika gulebarana MG3'ê. Ew li me zivirîbû. Wê berik bi ser me de direşandin. Hingê, ew roketa yekem li ûrê werimî yê Nemrûd ketibû û parçeyên wî li gel dengê teqîna meşka wî bi ser qereqolê de weşiyabûn. Ew tune bû êdî. Textê Nemrûd hatibû êxistin, pûtên wî hatibûn şikandin û agirê wî hatibû vemirandin êdî. Wê şeva ku dê dotira rojê ez bihatima

teskereyê, wê şeva ku min digot, Şikûr ji Xwedê re ku min bêyî qeza û bela leşkeriya xwe kuta kir, aha wê şeva ku min gelekî bêriya Xanê kiribû û ji bo hasilbûna mirada min tenê ew şev mabû, aha wê şevê tam, şeş saetan ez di bin gulebarana şervanan de mabûm. Wê şevê belkî jî kekê min ê hêja Ehmed bi xwe jî di gel de bû, ez tam şeş saetan di bin agirê ku ji her çar aliyan ve wekî taviya baranê bi ser me de dibariya mabûm.

Ew qereqola mezin êdî bûbû kavil, dû û dûkêla şewatê jê radibû û termên gelek leşkeran li erdê hatibûn raxistin. Nalenal ketibû wî çiyayî. Qereqol ji binî ve hatibû şewitandin. Bi dîl û êşkenca xwe ve hatibû pûçkirin. Tevî textê Nemrûd... Tevî hemû zilma wî... Zilm êdî hatibû şewitandin.

Roja paştir...

Roja piştî serfiraziya serhildêrên welatê min, ez, jihişçûyî, di bin toz û xweliyê de, di kozikê de bi dengê firokê re hişyar bûbûm. Çend leşkerên ku dîtibûn ku va ye ez bi awayekî şerpeze ji nav kozikê derdikevim ber bi min ve beziyabûn. Hingê çavên min ew şêlû didîtin; geh mezin dibûn, geh biçûk, geh sernişîv dibûn, geh serevraz, geh jî wekî teşiyê li ber çavên min dizivirîn. Hingê ez bi giranbûna lingên xwe hesiyabûm. Min nedişiya wan bixirînim. Min ew ranedibihîstin. Gelekî giran bûn. Çawa destê min ket ser, tiştek pê ve zeliqîbû. Hingê min lê nihêrî ku xwîn e. Wê kêlikê dilê min ji pişta min vedibû, min digot qey ez bi guleya şervanan hatime birîndarkirin, lê piştre ez pê hesiyabûm ku ew xwîna leşkerekî bû, ku li kêleka min nobet digirt, jixwe bi kuştina wî, min jî xwe di bin termê wî de veşartibû û wisa kiribû heçko ez bêruh im.

Erê awêneya min a spehî; ew rojên ku ez di navbera mirin û jiyanê de dihatim û diçûm, ew rojên bêhna mirinê li paşstûyê min dida, ew rojên xwerû reşe û xewnereşk, ew rojên ku ez bi xewnereşkên wê qereqolê re digeviziyam, wê roja ku leşkeriya min qediyabû bi dawî bûbûn.

Erê xwedîka min erê! Çendî dijwar bûn ew roj; ew rojên ku ez di navbera mirin û jiyanê de dihatim û diçûm, ew roj bi dawî bûbûn û ez wekî miriyekî ku ji nû ve bête dinyayê, bi kêfxweşiyeke ew qas mezin gihîştibûm Xanê. Ji demsalan payîz bû; gêre hatibûn kirin, dexl û deramet hatibû rakirin û berfê heta serê Kela Keşkanê jî xwe dahêlabû xwarê. Avên cuh û kaniyan sar bûbûn, belgên daran hema bêje giş weşiyabûn û Xanê bi hemû bedewiya xwe li benda zivistaneke dûr û dirêj bû. Zivistanên Xanê gelekî dijwar bûn; herî kêm çar pênc mehan, heta nîvê nîsanê befir li erdê dima.

Têhna tirsê min heta şanikên xwe seh kiribû. Bêhna birsê li ber derî bû.

****

# Dîmena çaremîn
# “dûkêl”

*Kulan êş dihewandin*
*Janan jehr dibarandin*

Piştî deh duwazdeh deqeyên dîtir ez ê ber bi kela dilê xwe ve biçûma û min ê bi lepolepkî xwe berdaba nav kovanên kevn û min ê birînên xwe dîsa kul bikirina. Ez ê bi dilêriyeke xeşîmane biçûma nav agirê dilî û min ê xwe tê werkira. Ev têwerbûneke gelekî dilsoj bû, lê her tişt ji bo xatirê evîneke li ser dilî mayî, evîneke bêmiraz bû ya ku di teşta kulan de hatiye siwêrandin. Ez ê tenê ji bo dîtina Bîşenga xwe biçûma û min ê careke dîtir wek diyarî kaseteke Şivan Perwer ku Bîşengê gelek jê hez dikir, jê re bibira. Ez ê piştî deh duwanzdeh deqeyan biçûma otogarê û min ê ji bo kevnewarê xwe bilêta xwe bikiriya û min ê xwe berî pêlên dil-lerzika xwe bidaya.

***

Erê neynika min, payîz bû, sir û sermaya zivistanê li ber derî bû. Sobe hatibûn danîn, argûn hatibûn vêxistin, kesên ku ji bo kar û barî ji malê derketibûn li gund vegeriyabûn. Dawet hatibûn kirin û Xana Sêgundan di nava hilm û rikeberiyeke serxurî de, çaverêyî zivistanê mabû.

Piştî hefteyan min hê jî bawer nedikir ku ez ji wê dojehê rizgar bûme, her tim, ew dîmenên nexweş li ber çavên min zindî

dibûn; bi şevan bi min wisa dihat heçko dinya bi ser serê min de tê xwarê, heçko cam dişikên, cam dişikên û cam dişikên: Erê neynika min a xweşkûk, cam dişikestin. Bi sedan, bi hezaran cam dişikestin.

Zivistan li ber derî bû, Xana Sêgundan di nav bêdengiyeke bêyom de bû; xwîsê erd digirt, spêdeyê gava em hişyar dibûn, birka li nav baxçeyê me diqerisî; qeşayê digirt. Wan rojan hişkesermayekê jîngeh vegirtibû, sir û sermayê rûyê mirovî disot.

Erê neynika min, wan rojên piştî leşkeriyê, bêyomiyê bi hemû bêmirwetiya xwe dîsa li deriyê me dida, dîsa şîn û girîn, kuştin û bêbextî li derdora me digeriya. Wê berêvara ku ewrên reş û tarî asîman tijî kiribû, wê berêvara ku tîrêjên bêtîn ên tavê hêdî hêdî li aliyê rojavayê dişikestin, aha wê rojê, dengê bafirokan qirpên xistibû dest û lingên me.

Berêvareke sar a payîza dereng bû. Zivistan li ber derî bû; daran belgên xwe weşandibûn, aha wê berêvarê dayika min bi rûyekî bi endîşe, bi dilzîziyeke xemgîn, li nava odeya qesrê dihat û diçû; nêzî pencereyê dibû û digot, “Kurê min, Mistê ka ji min re qurtek av bîne, devê min ziwa bûye; gumanek kete dilê min, nizanim çi ye lê, tirsekê ez pêçame.” Piştî ku min şerbikê avê dayê, hêdî li ber guhê min got, “Tu dizanî an na, du rojan berê gava ku ez çûbûm Gundê Axayî Ehmed bi birek hevalên xwe re li wê derê bû, li daristana pişt gundî min ew dîtin. Ev firoke min ditirsînin, Xwedê neke...” Hingê tirseke bêsedem xwe berî dilê min dabû, çawa min li rûyê dayika xwe nihêrîbû min dîtibû ku gelekî bi endîşe ye. Guliyên wê yên nîvenîv spîbûyî di bin dersûka wê ya spî de şor bûbûn ser sûretê wê yê hinekî jar. Toqeke zirav xistibû ber biskên xwe û bejna wê ya ne gelek bilind û ne jî gelek kin, kirasekî kitan dihewand û ew qet li cihê xwe nedisekinî; wekî mirîşka li hêlîvanka xwe digere, wisa li nava odeyê dihat û diçû.

Berêvareke sar a payîzê bû. Xana Sêgundan bêdeng bû, li derve sermayeke tûj hebû. Ji sermayê dibe, çu kesî/ê li derve xuya nedikir. Tajdîn ji bo nimêja mexrebê derketibû derve û çûbû mizgeftê, jina wî, Esmayê jî li mutbexê şîv çêdikir; Ronahî û Bînahî jî li nik wê bûn. Rondik û Rojbîn ku yek çar salî, ya dîtir şeş salî hebû, li ber argûnê rûniştibûn, ew ji xwe re bi kaban dileyîstin; nehewî dikirin, li cihê xwe ranediwestiyan, qet nedihewiyan. Jina Ehmed Dilşaya bajarî jî, li quncekî odeyê rûniştibû û li ser ranên wê pirtûkek hebû, ew dixwend. Odeya qesrê germ bû, argûn vêketibû, ez jî li nik dayika xwe, li ber pencereya ku li aliyê Dûpirkê dinihêrî, li ser pê, çikiliyabûm.

Payîza dereng bû; tîrêjên rojê hêdî hêdî diçûn ava, taveke netînde li cama qesrê dixist, hin pirtên ewrê reş û tarî jî li dora tavê digeriyan lê cihê ku tav lê, sayî bû. Dayika min ji nişka ve ji odeya qesrê derketibû, çûbû ser şaneşînê, hewayeke sar li derve hebû, lê ligel wê yekê jî, ew li wir, bi dilekî bi waswas, ligel dil-lerzika bêwate, dihat û diçû. Ez jî dûre derketibûm, ji ber ku temenê wê hingê li dora pêncî salî bû, lê wekî şêst salî xuya dikir, çimkî piştî kuştina bavê min xem û kovanan ew êxistibû, pişta wê şikandibû; ji bo ku bi sermayê nekeve, min bêdilî gotê, “Dayê, li derve sar e, were hundir”, hingê bi bişirîneke bêdilî li min nihêrîbû û gotibû, “Mistê, kurê min; bêhna min peqiya, tiştek di dilê min de heye, dilê min tiştekî dibêje min lê nizanim çiye; ji te re dibêjim, Ehmed li Birêlkî bû, eve ji êvara Xwedê de ye, bafirokên wan xwînxwaran ber bi wî rexî ve diçerxînin, remlê dikin; dilê min dibêje, Xwedê neke, qey bêbextê Saloyan pê hesiyabe û giliyê wan kiribe. Heyho heyho kurê min, sax nahêlin nesax binalin, tu dibînî, van bextreşên bêdîn û bêîman her roj ji bo qurişek pere qûnên jinên xwe difiroşin. Mistê, ji bîr neke, şêr ji bo warê xwe şerî dikin, heke îro pêjna şêran birr bû, eve qiyameta serê me ye; bi navê Xwedê, bi serê Ehmedê xwe yê nazdar kim, ev qûndekên xwefiroş dê fermana roma reş li ser serê me rakin!” Piştî van gotinan dayika min, bi awirên dayikeke dilmayî li rûyê min

nihêrî: Difna wê sor bûbû, çavên wê yên piçekî bi zerî ve bûbûn kaniya rondikên sar, dibe ku ji sermayê be, her wiha ji wan çavan têhna hezkirineke veşartî ya dayikane diçirûsiya. Hingê tav li ser û sertara Birêlkî jî çûbû ava û dengê bafirokan betal bûbû. Piştre ez û dayika xwe her du ketibûn hundir û dengê banga mexrebê bi ser me de hatibû.

Piştî ku Tajdîn ji mizgeftê vegeriyabû me şîva xwe xwaribû: Wê şevê jinbiraya min ji me re girara şêliman ku çend perasûyên goştê hişk-kirî li ser hebûn patibû û pê re jî xoşava sêv û bihan û çend totikên nanê kuroreyî anîbûn. Piştî vexwarina çayê, banga eyşayê dabû ser şeva me û piştre jî xeweke giran xwe berdabû giyanê min, ez razabûm.

**

Spêdeya zû, hêj tarîgewrikê ez bi qîrîn û hawara dayika xwe re hişyar bûbûm, berê min di ber xwe de gotibû, belkî ev xewn be, lê piştre dengê girîn û zêmarê diçû ber banê felekê. Piştî kuştina bavê min bi salan, dîsa hawar bi mala me diket. Hingê, bi xafilxefkî, bi leza birûskekê, bi tanka bincil û derpiyan ez ji nav nivînên xwe derketim û turisiyabûm û min xwe li ber derî girtibû.

Spêdeyeke zû bû, tav hêj derneketibû, bi şev befireke toz bariyabû û erd giş spî kiribû. Li nav hewşê, hawar û fîgan bû. Li dora cendekekî hemû malbata min kom bûbû, der û cîran giş li wir bûn, xalê min ji Gundê Axayî hatibû û ew û jinxala min li kêleka dayika min bûn, milên wê girtibûn; dayika min bi kotekî xwe li ser piyan digirt. Li aliyê dîtir ê cendekî, li hindava serê wî Dilşayê xwe bi cendekî werkiribû û qîjîn û hawara wê bi ser Xanê de diçû xwarê. Tajdîn û xwîşkên min bi wê de, behitî, di halê xwe de digiriyan. Rojbîn û Rondik li nik dayika xwe çend metreyan wêdetir, bêyî ku haya wan ji tiştên diqewimîn hebe, xwe bi damenên dayika xwe werkirî, ji xwe re dileyîstin. Dayika wan digiriya.

Piştî kuştina bavê min bi salan şûnde, li nav hewşa qesra me, cendekekî canemerg li nav bataniyekê pêçabû. Piyên min ez ber bi cendekî ve biribûm; min xwe negirtibû û min bawer nedikir ku ew hatiye kuştin lewma min dixwest her tiştî bi çavên serê xwe bibînim. Hingê, wê spêdeya zû, berî tîşkdana tavê, spêdeya ku berfeke toz bariyabû, min li ser rûyê wî vedabû: Min cendek nenasîbû; çavên wî ji qoqirkê derxistibûn, lêv û difin lê birîbûn, guhên wî jê kiribûn, diranên wî lib bi lib jê hilkêşabûn, li bejn û bala wî tam derba bîst û çar berikan hebû; gurçik û mêlakên wî, ûr û rovîkên wî jê rijiyabûn. Neynûkên dest û piyên wî lib bi lib jê hilanîbûn. Gewriya wî tijî kindir kiribûn.

Dayika min li ber serê êkaneyê berdilê xwe, li ber serê Ehmedê Xanî ku êvara berê li Birêlkî piştî operasyoneke bêbext, ligel duwazdeh hevalên xwe hatibû kuştin û cendekên her yazdeyan li çalekê hatibû binaxkirin, lê heye ku naskirî ye, lewma jî tenê cendekê Ehmed li riya navbera Birêlkî û Pîrxidirê avêtibûn kêleka rê, xalê min jî her roj di wê rê re diçû Bazê, an jî Talê bazirganiyê, hingê wî li wê gedûka teng termê xwarzayê xwe dîtibû û wî jî, demildest termê wî li erebeya xwe kiribû û anîbû ber deriyê mala me, dikire hawaarr. Dayika min ji me hemûyan bêhtir ji wî hez dikir; ew ji deh yazdeh saliya xwe ve her tim li der û kolanan bû. Berê ji bo xwendinê çûbû Culemêrgê, tenê havînan me ew didît, piştre çend salan ji bo xwendina bilind çûbû Stenbolê û piştî ku ew hesreta giran bi dawî bûbû, me daweteke nedîtî jê re gêrandibû, lê tenê piştî sê çar salan dîsa Ehmed çûbû; vê carê çûbû riya nehatê, vê carê, berê xwe dabû çiyayên Kurdistanê û bûbû serkêşê şervanan; dayika min berê tim digot, “Kurê min dê bibe serkêşê kurdan”.

Wê spêdeya zû, wê spêdeya bêyom dengê zêmar û hawara dayika min digihîşt ber erşê ezîm. Dayika min dikire hawar, digot: “Rebiyo, Xwedêyo; xwezî ez mirî bûma, xwezî min mirina terotolê xwe, zavayê serê salê, berxikê ber dilê dado,

Ehmedê xwe nedîta! Ehmedo lawo, bila dayik gorî serê te bûya! Bila her du çavên dayika te kor bûna! Bila dayika te roja ev roj cendekê te bi vî halî nedîta! bila ji xêra Xwedê re, her du guhên dayika te ker bûna, bila dayika reben kuştina te nebihîsta! Ehmedê min lawo, ma tu çi bûyî, ma te tirseke çawa êxistibû dilê wan xwînmijan ku çavên Ehmedê min ji qoqirkê dirxistine! Guhên Ehmedê min jê kirîne!..." Dayika min, bi dengekî bilind, dikire hawar û digot:

*Hey Xanêwo, Xana rengîn*
*Li rex û rûyên te hemû kanî û solîn*
*Ehmedê min hê zava bû,*
*Serkêşê kurdan bû,*
*Mêrê bi sed mêran bû*
*Evro roja Xwedê, tête ber dayika reben termê bi xwîn*

*Deşta Xanê çendî pan e*
*Rex û rûyên wê tev bi zozan e*
*Ehmedê min lê mêvan e*
*Roja evro, payîza bêyom*
*Li ser serê Ehmedê min rabûye ferman e*
*Dayê çi fermaneke giran e*
*Bavo çi fermaneke bêeman e*
*Ehmedê min kuşt bêbextê romiyan e.*

*Ehmedo rabe, lawîno rabe*
*Dilê dayika kore û Dilşaya reben neke xopan e...*
*Nexe behra kul û xeman e*

*Dayika xwe nehêle kovanî, li ser kupê axê, nobedara li ber kêlî ferşên giran e.*

Wê spêdeya reş, wê payîza dereng, li nava hewşa qesra me, piştî kuştina bavê min bi salan, piştî vegera min a ji leşkeriyê bi hefteyan, ewrên xemê, bayên janê, bêhna mirinê, têhna xwînê, bêbextî û bextreşî dîsa li ber deriyê mala me bû. Mezinên me gotibûn, "Mirov dimirin, xeber dibirin"; wê spêdeya ku hemû xeber biriyabûn, wê sibeha ku tozikeke berfê erd vegirtibû, wê roja reş û bêyom, şîn û nihar dîsa bûbû mêvanê mala me. Wê spêdê, bavê min dîsa bi hezar carî dihate kuştin, wê spêdê rûbarê xem û kul û kovanan dîsa berê xwe dida ser dilê me. Wê spêdê ma pariyekî nanî dê di gewriya kê re biçûya xwarê, hawar bû li ser serê me; heta nîv saetê ji Gundê Axayî, ji Gundê Keşkanê bir bi bir gundî ber bi qesra me ya li Gundê Mizgeftê ve herikîbûn. Şerma dinyayê bû, mirin nexweş bû, xebera reş jî zû belav dibû; her kes, dost û neyar her kes hatibû mala me. Dost û dijmin her kes digiriya. Dost û dijmin her kes dinaliya. Dost û dijmin her kesî/ê dikir hawar û fîgan. Wê spêdeya pêreş û bêyom, her kes, hemû gundî li nik me bûn.

Ez çu carê, ji bo kuştina bavê xwe jî hin negiriyabûm, niqulîskên giriyê hefka min asê kiribû. Rondikên bi xwîn ji çavên min dibariyan, dinya li min heriftî bû, dar û ber, çiya û banî bi ser min de dihatin xwarê û dîsa cam dişikestin, cam dişikestin, cam dişi... Wê rojê, wê spêdê, bi tanka bincilan, ligel wê sermaya tûj, bi kêlîkekê jî ez ji hindava serê cendekê Ehmed ranedibûm. Min her digot, eve xewnek e, lê, ew bû, rast bû, xewn nebû; cendekê parçe parçe kirî, cendekê ku ancax hov û dirindeyên ku qet dilopeke têhna mirovatiyê di dilê wan de nemaye, dikarin welê bikin, cendekê ku gava çavên mirovî pê diketin, pêlên janê li dilê min radibûn pêdarê, cendekê ku gava çavên mirovî pê diketin, kerb û kîna dilê mirovî dibû lêsereke har, cendekê ku çûçikên hêlînan bo digiriyan... Erê, Ehmedê Xanî, ezîzê li ber dilê me hemûyan, palpişt û zanayê me hemûyan bi hovanî hatibû kuştin; wê spêdê ez du caran êtîm mabûm. Wê rojê hezar caran bavê min dihat vekuştin.

Piştre me cendek anîbû ser şaneşînê, dayika min ji girînê ji ser hişê xwe çûbû, serê xwe danîbû ser cendekê Ehmed û wisa xwe pê dadabû, di ber re jî digot: Min jî bikujin, kurê min bêyî min nexin bin axê, min jî bikujin; ma ez ji bo çi dijîm, min jî biku... Di nav girîn û hawarê de navberekê, ji aliyê Keşkanê ve Saloyê bêbext bi gavên sivik, bi çek û cil û bergên cerdevanan ve ber bi qesra me ve dihat. Di navbera çav û birûyan de ji pêlûskên şaneşînê serketibû jorî û piştî ku bi rûxemgîniyeke sexte sersaxî bi me dabû, ber bi Tajdîn û xalê min ve zivirîbû û bi dengekî nizim gotibû: "Ezbenî, fermandarê qereqolê zivêr bûye, dibêje bila wî cendekî zû veşêrin, ew terorîst e, nexwe em mecbûr in dest têwerdin." Xalê min û Tajdîn ripo ji cihê xwe rabûbûn, mistên xwe guvaştibûn û tam dê li dev û difna wî bixistina, dayika min hatibû ser hemdê xwe û gotibû: "Kuro Salo, kuro tûlê cendirmeyan, hey wan cendirmeyan û hemû şervanan jin û makên te gayo, kuro bîjiyê bin teraşan, zû ji pêş çavên min bifindiqe, nexwe ez dê kîrê hindî seyên li dinyayê li quzê jin, xwîşk û dayika te bişidînim! Tûûû, lanet li wî kîrî yê tu jê bûyî, lanet li wê dayikê ya tu aniye dinyayê, zû biqeşehe ji pêş çavên min.." Hingê demildest dayika min mistek li dev û difnên wî dabû, piştre jî, Tajdîn û xalê min heta kerî cihê xwe yê berê dîtî li wî xistibûn û piştre jî gotibûnê, "Tu û fermandarê qereqolê bi xwe û hindî êke xwe ve bêminet in". Piştre Salo ji wê derê bi dûr ketibû û ber bi Keşkanê ve, bi gavên lezgîn çûbû. Dûre jî çu deng jê derneketibû.

*

Ber bi danê têjdegan ve, li ser şaneşîna me, li hindava serê cendekê Ehmed, feqiyê bavê min, Feqî Huseyn; piştî kuştina bavê min, ji bilî cejn û dawetan ev yekem car bû dîsa dihat li ser şaneşîna me rûdinişt. Piştî axîneke kûr, li civatê hemûyî yek bi yek nihêrîbû, piştre jî, çend caran destên xwe di ser rihên xwe yên spî yên dirêjbûyî re anî û biribû; dûre jî, bi

dengekî sakîn û bi edayeke şareza, li gorî usûlê dest bi axaftinê kir û got:

"*Gelî xaniyan, îro rojeke reş e li Xanê, bi şehadeta kurê seydayê min ê şehîd û gorbihuşt Ebdurehmanê Xanî û Kewsera keça Emer Axa, dilê me hemûyan gelekî êşiyaye. Belê, bêhna xwe fireh bikin, ew wekî ku jiya mir, wî ev mertebe heq kiribû. Me hemûyan şehîdê nemir baş nas dikir, ew camêrekî bi şertî xwe bû; lê Xwedê ew girt nik xwe. Gelî xwîşk û birayên hêja, ev dinya her wiha ye, ji kesî/ê re nemaye û namîne jî, mirov tovê axê ne; em hemû dê bimirin, lê helbet hemû mirin jî ne wekî hev in, mirinên wiha bi bêbextî, mirinên wiha ku cendek jî bên hilhilandin, gelekî dilsojtir in. Camêrino, divê em ji bîr nekin ku îmam Hemzeyê mamê Pêxemberî jî, li meydana şerî wiha bi dilsojî hatibû kuştin; dil û mêlakên wî jê hatibûn derxistin. Ev dinya wiha ye, Ehmedê kurê Kewserê bi mêrxwasî şehîd bû, em, piştî nimêja nîvroyê wî li tenişta bavê wî binax bikin. Serê me hemûyan sax bit, el fatîha!...*"

*

Piştî nimêja nîvroyê behîdar li malên der û cîranan hatibûn ragirtin û piştî firavînê darbesta Ehmed ber bi goristana Berpîrsamî ve ketibû rê. Taveke bêtêhn hebû, hişkebayekî zîk dihat, asîman mizewr bû, şêniyeke qelebalix hatibû. Cendek li ser milan ber bi oxira xwe ya bêdawî ve diçû, ber bi bêhnvedangeha xwe ya dawîn ve diçû, ber bi îsgeha xwe ya herî dawîn ve diçû. Zilam li pêşiyê, jin li paşiyê; her kes bêdeng, li pişt darbestê ber bi rêkirina dawîn a rêwîngê bêwexer ve dimeşiya. Hemû çav tijî rondik bûn, hemû dil bi kul bûn, hemû gotin mirî bûn. Li aliyê dîtir ê çemî, li ser girikan leşkeran bi çavên zil li darbestê dinêrî. Berê lûleyên tivingên xwe ber bi komê ve zivirandibûn, darbest bi cawekî kesk û sor û zer hatibû pêçan.

Cendek gihîştibû mala xwe ya dawin, li kêleka gora bavê min gora Ehmed hatibû kolan, niha jî, darbest li ser devê gorê bû. Dayika min, hingê bi dengekî bilind digiriya û zêmar dikir: Ebdurehmano, canemergo, xêr ji xwe nedîtiyo, kuştiyê destê

zalimano! Lew şevê dî, heta spêdê tu dihatî xewna min, lew tu li serê dîlanê bi şal û şapikên merezî, bi xemla zavatiyê direqisî; lew tu li hindava kupê goştî rawestiyayî bûyî, gava min ji te dipirsî, lew te digot, "Eve haziriya daweta min e, sibê mêvanê min tê", qey mêvanê te kurê te yê canemerg bû, qey mêvanê te Ehmedê min ê kuştiyê bi destê bêdînan bû…

Rojeke reş bû. Piştî nimêja cenazeyî, cendek hatibû definkirin û gor baş hatibû vepandin, axa wê hatibû dewisandin û piştre jî, her kes, bi dilekî şikestî, serê hemûyan di ber de daketî, ber bi mala behîdariyê ve çûbûn. Behîdariyê sê çar rojan dewam kiribû.

*

Piştî kuştina Ehmed, erê neynika min piştî wê roja reş û nexweş, kuleke hêj kûrtir li dilê me hemûyan vebûbû. Êdî jiyana li Xanê ji bo me bûbû wekî mirinê; her roj roja me bi barandina çengeke rondikan dest pê dikir. Dayika min, her roj, diçû ser gorên cot rûdinişt û heta êvarî digiriya. Piştî kuştina Ehmed dayika min dersûkeke reş avête serê xwe û ku ji bêgaviyê nebûya qet nedipeyivî. Mit û bêdeng mabû.

Piştî kuştina Ehmed wê zivistanê heta nîvê kanûnê jî kuliyek befirê li erdî neketibû. Gelek caran, dayika min, berêvaran, li ser şaneşînê gava ku çay vedixwar, di ber xwe de digot: "Xwedêyo, her tu dizanî, te ev êşên giran dane min; tu sebr û sebatê bide min! Îsal çi saleke bed û bêyom e, eve çilê zivistanê ye, hê jî erd reş in; pez diçe li berojan diçêre; sala reş bêyom e, Rebiyo, ma êdî çi pêreşî mane?" Wê salê, heta çilê zivistanê, tenê ew hişkeberfa ku wê spêdeya termê Ehmed hatiye ber deriyê me, bariya bû.

Di wan rojên reş de, Xwedê zarokeke dîtir dabû jinbiraya min Esmayê, ew çend sal bûn ku kesera wan her tim zarokekî kur bû, heta niha du keçên wan hebûn; dayika min yekser navê

kurê Esmayê kiribû Ebdurehman û di ber re jî digot, “Ebdurehmanê biçûk, heke te zanîbûya ka tu di dewr û dewraneke çawa de hatiye dinyayê bawer dikim tu nedihatî”, piştre jî digot, “Tobe tobe, bi xêr hatî, ma yê tu dayî ji me çêtir dizane ka tu ji bo çi dayî; erê erê, divê cuha av lê çûyî, her dem av lê biçe; berdewama vê malbatê dê ji fêşik û riwêşta te be.”

*

Ebdurehmanê biçûk tenê hêj di çilka xwe de bû, dîsa êvareke reş û tarî, ku mirovî digot, îşev dê befir bibare, dîsa bêbextî û malwêraniyê berê xwe dida çarmedorên qesra me. Piştî nimêja eşayê, ji ber ku em niharî bûn me televizyon venedikir, hê zû, her kesek li ser xemên xwe dinivist. Jixwe piştî ev qas jan û bextreşiyê sohbetan ji qesra me koç kiribû.

Wê şevê jî, me nivîn raxistibûn û her kes hêdî hêdî radibû ku biçe bikeve nav nivînên xwe û li ser xemên xwe binive. Di wê keftûleftê de, dîsa şêlika guleyan bi ser qesra me de dibariya; dîsa hemû cam dişikestin. Wey li wî yê ku demildest xwe nedavête quncikekî odeyê, li cihê dûrî pencereyê da ku berik lê nekevin. Aha, wê şevê, di wê kêşmekêşê de min li quncê paşiya odeyê xwe hildemisandibû ser hev û destên xwe dabûn ber guhên xwe û ji tirsa lerz ketibû hinavên min.

Têhna tirsê wekî babelîskekê hemû giyanê min rapêçabû.

Piştî kuştina Ehmed tenê bi çend hefteyan, îcar, leşkerên ku kerba xwe ji kuştina wî negirtibûn, leşkerên ku ji ber ku me darbest bi pateyên kesk û sor û zer xemilandibû, pir zivêr bûbûn, îcar, di şeveke reş û tarî ya kanûnê de avêtibûn ser qesra me; Qesra Hecî Ebdurehmanê Xanî, ku berî çend salan bi bêbextî, dîsa di şeveke wiha ya reş û tarî ya kanûnê de hatibû kuştin.

Kuştinê êdî rûyê xwe yê kirêt nîşanî me dabû. Êdî ew li nav qesra me akincî bûbû û her çi roja paştir bêhtir berê xwe dida me; em êdî bi kuştinê gelekî nas bûbûn. Êdî kuştin bûbû

xelata jiyana me.

Bi qasî saetekê em di bin barana berikan de mabûn. Kesî/ê hay ji kesî/ê nemabû, hemû camên mala me hatibûn şikandin. Piştre bêdengiyeke sar ketibû nava qesrê, ode pir sar bûbû. Piştî birbûna gulebaranê bi çend deqeyan, min fanûs vêxistibû, wê demê her kes ber bi fanûsê ve hatibû; gava ku me her kes sax dîtibû, bayekî hûnik xwe berdabû dilê me. Dilşa û dayika min ji odeya xwe derketibûn, piştî kuştina Ehmed êdî ew li odeyekê radizan. Ronahî û Bînahî jî ji odeya xwe derketibûn, ez li odeya mezin a rûniştinê radizam, Tajdîn û Esma û zarokên xwe jî li odeyeke dîtir radiketin.

Her kes, hatibû odeya rûniştinê ku ez lê radizam, hemû cam şikestibûn. Landika Ebdurehmanê biçûk hê jî li nava odeyê bû, her kesî/ê, di wê keftûleftê de ew ji bîr kiribû. Deng jê nedihat, te digot qey di xewa dêwan de ye. Piştî ku em hemû li nik dayika min kom bûn, çavên wê bi dergûşê ketibûn. Piştre hêdîka li me zivirî û got: “Wî bireşê! Ez nemayê, qey ev landik li vê derê bû?” Ligel van gotinan Esmayê kire qîjîn û bi leza bayî bi ser dergûşê vedabû: Bêdengî û kêfxweşiya kin a saxmayînê wê kêlîkê bizdiya bû. Zarokê berşîr, Ebdurehmanê biçûk, keser û duaya dayik û bavên dilsoj ên bêdûnde, wê kêlîkê bûbû janeke zirav û ketibû reh û demarên şevê. Ebdurehmanê biçûk, bêyî fam bi dinyayê bike, bêyî ku mezin bibe û xwe li ser piyên xwe bigire, bêyî hînî ken û axaftinê bibe, bêyî bijî, hêj di çilka xwe de li ber guleyên bêbext bûbû bêjing, bûbû serad, bûbû moxil; tam pênc gule li bejna ku ancax bi qasî bihostekê bû, dabûn.

*

Dîsa li Xana Sêgundan hawar bû, dîsa li Gundê Mizgeftê dengê qîjîn û girînê diçû ber banê felekê, qesra me ku hêj nihariyên Ehmedê terotol lê bidawî nebûbûn, dîsa dibû dergehê şîn û taziyê; dîsa dibû hêlîna xem û rondikan, dîsa dibû

wargeha şerxweşî û behîdaran. Wê şevê dîsa befir bariyabû lê îcar bi qasî metreyekê û her ku diçû jî befir dibariya. Hemû camên me şikestibûn, em wê şevê hemû li nav malên der û cîranan belav bûbûn. Tiştê ku hê jî li Xanê dijiya mirovperwerî û mêvanhewînî bû; her dem deriyên malên wan ji mêvanan re vekirî bûn, pêlûskên xaniyên Gundê Mizgeftê çu carê ji mêvanan xalî nedibûn.

Roja paştir, heta nîvro me bi kotekî karibû cihê gorê bikolin; Ebdurehmanê biçûk jî, li tenişta bapîr û mamê xwe ku wî hêj ew nenasîbûn û dê çu carê jî nenasiya; hatibû binaxkirin. Wî dê çu carê nezanibûya ka çi qewimiye û çima li tenişta kesê ku bi navê wî hatiye binavkirin hatiye veşartin…

***

Erê neynika min, rûbarê xeman bûbû şape û reniyeke mezin û bi ser qesra me de hatibû xwarê. Jiyan li me bûbû jehr, kuştinê hêlîna xwe li nava qesra me danîbû; ji zarokê çilrojî bigire heta sermiyanê malê bavê êtîman bavê min û êkaneyê ber dilê me hemûyan; xwenda û zanayê binemala me, serkêşê kurdan, şêrê ku ji bo warê xwe şer dikir, hemû yek bi yek, heçko Xwedê xezeba xwe li me barandibe, heçko yekê nifirek li me kiribe û gotibe; "Xwedê bike, çu carê ken nekeve vê malê", aha, bêyomiyeke wisa em bi çarmedor dorpêç kiribûn. Hebûna me tirsa hinekan bû, hebûna me li hinekan giran dihat…

**

Ew zivistana wê salê wisa bi şîn û girîn derbas bûbû. Biharê bi dilekî zîz hêdî hêdî xwe nîşanî me dabû. Dol û berdol, şîvik û newal, panav û guhor têrxwer bûbûn: Col û keriyên pezî lê ketibûn mexelî. Berfê xwe hilkêşabû ser û sertarên çiyayan û heliz û kerkol, gêndel û çevirê rengê xwe dabû bermil û kêriyên jorî; li dolan keviyên befirê hêdî hêdî diheliyan. Rêvas û kuvark,

mendê û siyabo hêdî hêdî dibû pêxwarina sifreyên me. Li nava gundî jî, zevî hatibûn ribsekirin û vewejandin, dûre cot hatibûn kirin û cih bi cih tov li zeviyan hatibû reşandin. Kulîlkên sêv, xox, mişmiş û gulşîlanan vebûbûn û bûbûn qiblegeha mêşên hingivî. Kerikên gûzan hêdî hêdî kifş dibûn û dehl û daristanên li çarmedorên gundî jî tarî bûbûn; gelekî xweşik xemilîbûn; ji heyvan nîvê nîsanê bû; av li bîşî, dehl û û rêlan, li dar û beran geriyabû.

Wê salê bihar zû hatibû.

Rojeke xweş a biharê bû. Ji bilî çend pirtên ewrê avis asîman çikî sayî bû. Çîkçîka çivîkan ji nav baxçeyê me bilind dibû, bêhneke xweş ji kulîlkan dihat. Baxçe rengoreng xemilîbû. Ronahî û Bînahî li wê derê di ber xwe de diaxivîn, Rojbîn û Rondik bi spîkirina rêvasan mijûl bûn, ku roja berê bavê wan çûbû Gareyî û ji me re hin rêvas anîbûn, Esmayê çay dadigirt, dayika min berê wê li baxçeyî bû û kûr û hûr diponijî; hin caran dikir axîn û di ber xwe de digot: “Ehmedo, Ebdurehmano, bihar e; kulîlk vebûne, heval û hogirên we diçine geşt û seyranan, belê hindî Kewsera dilbirîn çavê xwe digerîne nagerîne hewe di nav de nabîne”.

Rojeke geş a biharê bû. Tav çend qulacan bilind bûbû, hûnebayekî nerm bi ser jîngehê de diveziya, bêhna kulîlk û çîçekan li derdorê belav dibû. Nizar û beroj gişt şîn bûbûn, li joriya çiyayan hê jî befir mabû. Her sê rûbarên Xanê boş bûbûn û bi sermestî diherikîn. Ez wê rojê li kêleka dayika xwe rûniştibûm, min peyala wê ya çayê vediguhast. Hingê erebeyeke jîp a reş di ber qesra me re bihurî û di ser pira Navdeştê re derbas bû û ber bi Keşkanê ve diçû. Hingê piştî ku libeke şekirê avêt devê xwe dayika min li min nêrî û got: “Mistê,” min lê vedigerand, “Lebê dayê,”, piçekî bişirî û dewam kir: “Heyho Mistê heyho! Hindî mirov bimîne her dê bibîne, ma tu nabînî kurê min, serderî çemiyan, bûne binderî; binderî jî rabûn, bûne

serderî, bi Xwedê, ev elametê qiyametê ye; kurê min, bawer bike dawiya dinyayê ye, qiyamet dê rabe! Ma tu nabînî kurê bîjîavêjkê Keşkanî îro bûye nîr li ser serê me, erê erê kurê min; heko dinyanedîtî jî bûne tiştek bawer bike ew dê dinyayê bixwin; kurê min, ew fêşka şeytanî ne, bi Xwedê çu carê bi wan bawerî nabe, ew serve serve li rûyê mirov dikenin, lê binve binve jî koka mirovî direnin."

Bihareke geş bû li Xana Sêgundan. Dayika min fîstanekî yekreng li xwe kiribû, dersûkeke reş avêtibû serê xwe û li ser rûyê wê bişirîneke kelogirîn veniştibû. Bi dengekî nerm û nizim ji min re behsa meseleyên dinyayê dikir. Piştre jî, navberekê bi awirvedaneke kûr li rûyê min nihêrî û got: "Mistê, qewlê te yê dawetê jî hatiye." Ez qet li benda tiştekî wisa nebûm, wê dewam kir: "Dinya wiha ye kurê min, mirov dimirin, tên kuştin, rast e kula wan çu carê ji dilê mirovî dernakeve lê yên ku mane jî mecbûr in bijîn". Piştre jî kenekî sar kete ser rûyê wê û got: "Ê kurê min, çi dibêjî, te dilê xwe daye ser kê, em ji te re bixwazin?"

Rojeke xweş a biharê bû. Dayika min li benda gotina min bû, lê min gelekî şerm kiribû, ez qet li benda pirseke wisa nebûm. Divê min bersivek dabûya dayika xwe, ew li benda min bû; hingê piştî ku min çend caran gotina xwe vecût, min li rûyê dayika xwe nihêrî û got: "Dayê, ez nizanim, min çu kes berçav nekiriye." Hingê dayika min peyaleya di destê xwe de danî, bi sivikî bişkurî û got: Mistê, ji dayika xwe şerm neke, ka tu tiliya xwe dirêjî kê bikî, em ê sibê ji bo te bixwazin, ma me jî ji bilî te kî maye!" Hingê serê wê di ber de şor bûbû û çend rondikên dizok ji çavên wê hatibûn xwarê. Piştre bi dengekî bilind gazî Ronahiyê kir da ku şerbikek av jê re bîne, got: "Zû be keça min, devê min ziwa bûye." Dûre jî li min nihêrî û got: "Mistê, heta payîzê divê tu keçekê ji xwe re peydð bikî, keç mişe ne, hema tu yekê ji xwe re berçav bike, em ê jî hema di gavê de ji te re bixwazin, dûre jî daweteke qelew ji te re bigerînin, li ber

xwîşkên xwe nebe pejan, wekî çiya di riya wan de neçikile, ji niha ve xwazgîniyên wan tên ha!" Hingê min jî berê xwe da wan; Ronahî li hindava serê me bû, piştî ku dayika min şerbik ji destê wê girt, min gotê, "Ronahî, hema bi dilê xwe bike, qet bi min ve asê nekin!" Bînahiyê ji wê de li min vegerand û got: "Erê erê, tu dê ji xwe re keça çarsim paşayî bînî…", min jî gotina wê lê vegerand: "Tu dibêjî qey hema hemû kurên gundî ji ber te û xwîşka te ya remûzat pêlûskên qesra me mehandin!" Hingê ji nişka ve dayika min li min vegerandibû: "Erê wele, keçên min babetê maqûlan in, lê pa tu dê çi ki xwe bikî, remûzato, kepseviyo, bizotê bin agirî, zû ji nav riya keçên min rabe!..." Piştî van gotinên dayika min, hestekî sar ez vegirtibûm û bêdeng, ez ji cihê xwe rabûbûm û ji şaneşînê daketibûm û çûbûm Dûpirkê, li cihê ku her sê rûbar digihên hev rûniştibûm. Min li binavhevketina sê rûbaran temaşe dikir.

**

Piştî wê rojê tenê bi rojan, piştî kuştina Ehmed bi çend mehan, li gundê Mizgeft dîsa ferman bû. Rojeke geş a biharê bû, avetîrk bûn; her roj baran dibarî, piştî barîna hefteyekê ya bênavber taveke geş a tînde li ser Xanê dibişirî.

Fermana Gundê Mizgeftê bû.

Piştî gulebarankirina qesra me û kuştina Ebdurrehmanê biçûk hemû gundî û der û cîranên me xwe dabûn pişta me û bûbûn alîkarê me; çend caran çûbûn bajêr giliyê qereqolê kiribûn, lê seyî çu carê goştê seyî nedixwar, lewma fermandarê qereqolê bi piştevaniya cerdevanan sond xwaribû ku li Gundê Mizgeftê kevir li ser kevirî nehêlin.

Piştî van aloziyan, çend ciwan û canhêlên gundê Mizgeftê bi şev çûbûn Keşkanê, Salo li pêş çavên dayik û bavên wî têr kutabûn û piştre jî jê re gotibûn, "Kuro tûlê cendirmeyan, heta duhî we bi kûteyên me zikê xwe têr dikir,

ma hûn bûne çi ku îro hûn tên zordestiyê li ser serê me dikin." Piştre jî, Salo bi fen û fûtekê ew ciwan dabûne girtin, piştî ku ew ciwan hatibûn berdan jî, yekrê wan berê xwe dabû çiyayan. Vê yekê jî têra hindê kiribû ku qereqol biavêje ser gundî.

Êvara zû bû, tarî hêj hema ketibû erdê; ji nava zeviyan dengê weqweqa beqan bi ser Xanê de diçû xwarê. Me li ser şaneşînê şîva xwe xwaribû û tam me dê çay vexwara, wekî xîzê berik bi ser me de bariyan. Hema her kes ji aliyekî de reviya. Em gişt bi saxlemî gihîştibûn qata jêrîn a qesrê. Her der tarî bûbû, çu ronahî vekirî nemabûn; agir bi ser serê me de dibariya. Çend saetan gulebaranê dewam kir û piştre piştî ku hemû camên qesrê hatibûn şikandin, gulebaran rawestiyabû. Hemû gund hatibû gulebarankirin.

Spêdeyê em bi dengê leşkeran hişyar bûbûn.

Gund bi çarmedor hatibû dorpêçkirin. Bi sedan leşker, komandoyên ku me çu carê li wê derê nedîtibûn hatibûn, xuya bû ku ji cihekî din hatibûn. Ji Gûzereşê, ji Ertûşê, ji Talê, ji Bazê bi sedan leşkerî girtibûn ser Gundê Mizgeftê. Bi pihên û dijûn, bi lêdan û rapaldanê hemû gundî yek bi yek li Dûpirkê dihatin berhevkirin. Di nîv saetê de hemû gundî li wir hatibûn komkirin. Li her çar rexûçanên me tijî leşker bûn, bi sedan erebeyên wan hatibûn, berî ku em ji xewa spêdê hişyar bibin dorhêl li me girtibûn; hemû gundî, bi zar û zêc, bi pîr û kal, bi jin û mêr, bi ciwan û cehêl, hemû li meydana Dûpirkê hatibûn komkirin. Wey li wî yê dikire hawar, qûndarên tivingên leşkeran li ser kemax û teniştên jinan, ciwanan, pîr û kalan radibûn û lê diketin. Welwele li Gundê Mizgeftê ketibû.

Spêdeyeke zû ya biharê bû. Hewa piçekî sar bû, tîrêjên tavê hêdî hêdî bi ser serhed û sertarên Birêlkî ve, li me dibişirî. Erd şil bûbû. Wê kêlikê, fermandarekî ku li ser milê wî stêrkek hebû bi dengekî bilind, bi tirkî digot: "Toplanýn!" Piştî ku em hemû kom bûn, ketin rêzê û bêdeng bûn, fermandarekî ku

heyvek û stêrkek li ser milê wî bûn, dest bi axaftinê kiribû:

"*Gelî xaniyan, eve encama kiryarên we ye, we kir û dîza sebra me şikest. Her roj der barê we de tiştek dihat gotin, giliyek digihîşt me; ev dewlet gelekî mezin e û çu carê nahêle ku terorîst û piştevanên wan serê xwe rakin, em ê serê terorîstan biperçiqînin. Lê hûn qet alîkariya me nakin, duhî jî birek ciwanên we rêkirine nav refên terorîstan. Em musada vê yekê nakin.*

*Gelî xaniyan, ji min tiştekî nexwazin, dua bikin ku hê jî hûn hemû sax in, tenê ez ê musada tiştekî bikim; her kes dikare sê tiştên ku ji bo we gelek mihîm in, cil û bergên xwe, pere û zîneta xwe ji mala xwe derxe û bigire nik xwe, piştre jî biçe kîjan cehenemê ne xema min e; piştî saetekê ez ê agirî bi malên we xim!...*"

Tenê saetek dema min hebû.

Hingê yekser ajandaya Ehmed û Qurana ku xwîna bavê min rijiyabû ser hatibûn bîra min, bi bayê bezê, ligel cil û bergên xwe min ew girtibûn nik xwe û vegeriyabûm Dûpirkê. Li derdorê bezebez bû, roj saetekê bilind bûbû; bi qasî sêsed kes, jin û mêr, zar û zêc, pîr û kal, ciwan û navsere li Dûpirkê bi cil û bergên xwe ve, di bin hisara leşkeran de rûniştibûn. Ew der wekî meydana mehşerê bû, kesî/ê hay ji kesî/ê nemabû. Dengê giriya zarokan diçû ber banê felekê, gelek pîrejin û pîremêr jihişçûyî ketibûn erdê, rondik dibûn lehî di çavên mirovan de.

Rojeke biharê bû. Ji mehan serê gulanê bû; Gundê Mizgeftê wekî bûkekê xemilîbû. Ez hingê di bîst û du saliya xwe de bûm. Tajdîn, Esma û Rondik û Rojbîn, li nik hev rûniştibûn, dayika min û Dilşa piçekî wêdetir bûn, Ronahî û Bînahiyê cil û bergên xwe vedinêrtin, ew jî nêzî wan rûniştibûn, ez jî, li navbera hemûyan li ser çenteyê xwe yê ku min ji leşkeriyê ji xwe re anîbû rûniştibûm.

Gundê Mizgeft dişewitî.

Qesra me, qesrên gundê Mizgeftê, mizgefta kevn a gundî ku aliyekî wê wek medrese bû feqiyan tê de ders didît, dar û dehl, baxçeyên fêkiyan, dar û barên nûbişkiftî, hemû dişewitîn. Dûkêleke reş û tarî bi ser Xanê de bilind dibû, dengê qirçîna şewatê, qîjîn û qurîna sewalên ku hêj di govan de bûn, digihîşt ber banê felekê. Civîk ref bi ref ji nav şewatê difiriyan, direviyan; sivore, teyr û hudhud, hemû, ref bi ref, ji agirî direviyan. Dû û dûkêleke reş ji qesra me bilind dibû. Hemû çav zivirîbûn ser şewatê, girîn û hawar têkil hev dibûn; leşker li dora miletî bû, hinekan xwe radikêşa û hewl dida rabin û ber bi şewatê ve biçin, pîrejinekê ji wê de digot, "Min berdin, min berdin; min negirin, bihêlin ez jî bi gundê xwe re bişewitim", lê leşkeran ew digirtin. Rapal didan. Lê diheyitand, didexisandin, didan ber kulm û pihênan. Gelek kes ji ser hemdê xwe çûbû.

Dayika min serê xwe danîbû ser stûyê xwe, geh li goristana Berpîrsamî dinêrî, geh jî li şewata gundê Mizgeftê; rondikên wê dilop bi dilop ji ser rûyê wê gêrdibûn xwarê. Dilşayê jî serê xwe danîbû ser paxila dayika min û ew jî bêdeng digiriya. Tajdîn û Esmayê, Ronahî û Bînahiyê, Rondik û Rojbînê dikirin hawar. Navberekê Rondik bi girî hate nik dayika min û got, "Dayê mîza min tê?" dayika min jî bi dengekî berz lê heyitand û got: "Here bimîze devê wan bênamûsên li rexûçanên me!"

Hawar li Gundê Mizgeft ketibû. Ferman bû; fermana roma reş hatibû ser me, qesra me dişewitî; di nava dûkêleke reş û tarî de winda bûbû. Keşkanî derketibûn ser banên xwe û bi awirên zîq li me dinihêrîn, kê dizanî belkî jî kêfa wan dihat; gava min ew dîtin, min bi îşareta çavan ew nîşanî dayika xwe dabûn, hingê wê gotibû, "Leşxurên me dîsa li derdora kelexî kom bûne, bila çavên wan ronî bin, ew dê bêne kelepûrî bidin hev lê bawer nakim ku dê ji vê şewatê tiştek ji wan re bimîne, erê erê, vê carê ew bi xusaret in."

Piştre jî, di nava wê şewatê de, berê me dabûn Gundê Axayî, heta Berê Gengaşan, heta ber derê Xana navdar, em di bin hisara leşkeran de bûn, wekî garanê em anîbûn, piştre jî, ew, li wir, li erebeyên xwe siwar bûbûn, paşve zivirîbûn û ber bi Gûzereşê ve çûbûn.

Rojeke tal a biharê bû; mala me dişewitî, gundê me dişewitî, bîranînên me dişewitîn, em dişewitîn, em… Di wê şewata tûj de, dayika min bi dengê xwe yê zelal û zîz distrand:

*Hey herê dilo, tu bo çi wisa (yê) bi kul û xem î*
*Vê serê sibê, tu bo çi wisa (yê) ji rê vedimînî*
*Weten şirîn e, lew wesa (yê) kûr lê dimeyzînî*
*Kula te sotina Xanê ye, an hêlana gora mêr û kurî?*

*Hey herê dilo, ka bêje bo çi bikim girî*
*Ma dil maye, da bisojit ji ber vî agirî*
*Welat şirîn e dilo, tu bo çi neşê jê dûr bibî*
*Ma çi yê te lê maye, ji bilî cotên li bin wî girî*

*Hey herê dilo, wê li min hatî bihar e, çi xweş bihar e*
*Hetavê daye camên qesrê, çendî bi min sar e*
*Roja vê rojê, bêbextan mala me sot, li me hawar e*
*Em ê çi bikin dilo, ne me kes e, ne cih û war e*

**

Dûkêla Gundê Mizgeftê ji wê derê ve gelekî baş xuya dikir, her tişt şewitîbû; li şûnê tenê kavilên şewitî, xwelî û xelemor mabû. Bîranînên me, bîst û yek salên min, li wir, di wê berbanga bêyom a biharê de şewitîbûn. Birîna bavê min dîsa kul bûbû, birîna li ser hemû birînan kula Ehmedê ber dilê me hemûyan, dîsa jan vedida, dîsa ba û bagerên xem û kovanan

bi ser me de dihatin xwarê. Îcar her tişt dişewitî, jiyanek, gundek, şaristaniyek, ango sê nifş bi hev re dişewitîn. Ax, av û hewaya Gundê Mizgeftê bi hev re dişewitîn; rondik li ser çavên dayikên mal-lêsotî dişewitîn. Bişkurîna germ a zarokên sava yên berşîr ku bi wan awirên xwe yên germ ve dixwestin wateyekê bidin tiştên diqewimin, bi bêmirwetî dişewitî. Pêleyîzên destên zarokan, xewnên evîndarên Gundê Mizgeftê li ber çavên miradşikestiyên bêçare dişewitî. Mal û warê min bi bêberevanî, bi xwîndarî dişewitî. Fêkiyên ku hîn kerik digirtin, dexl û derametê ku hîn çîlên xwe berdidan dilê axê, hêlînên çivîkên li bin sîvanên xaniyan, hêlînên qijik û teyrên li ser guliyên gûz û spîndaran, hêlînên simore û darkokeyên li qurmê kevnegûz û kevnetûyan, kunmorî û moristangên moriyan, pisîkên bêwar, mişkên talanker, tajiyên nêçîrê, seyên tûle û kûçikên şivan, berx û karikên sava yên devbizmik, kavir, belindir, şek, hogij, beranên şaxbadayî û keriyê mihan, gîsk, kwîr, nêriyên fal, tiştîrk û birê bizinan, garana golik, sengol, canega, ga, nengon, mange û çêlan, karwanê mahîn, kurîsk, canîhesp, cehşik, hesp, ker, maker û hêstiran, hemû bi hev re, bêyî ku bizanibin çima, dişewitîn.

Bêhna şewatê jîngeh fetisandibû.

Xwelî, tenê xwelî mabû; bêhna xweliyê li her derê Xanê belav bûbû. Mal ji hev belav dibûn, kesî/ê xwedanî li kesî/ê nedikir, her yek bi rexê xwe ve diçû. Her kesî/ê lêzimên wî/ê li Gundê Axayî hebûn; jixwe Gundê Mizgeftê û Gundê Axayî ji heman ocaxê bûn, hemû xal û xwarza, mam û birazayên hev bûn. Lê, piraniya Gundê Axayî jî bûbûn cerdevanên dewletê, her çend ji wî gundî jî hinek kes tevlî refên şervanan bûbin jî, bi qasî Gundê Mizgeftê nebû. Li Gundê Mizgeftê çu mal nemabûn ku kesek an du jê derneketibûn derve.

Hingê, di nava hefteyekê de kêm kes li wan deran mabûn; hinan xwe di sînoran wer kiribû û çûbûn li kampa

Etrûşê bi cih bûbûn, hinan berê xwe dabû ser bext û torê felekê û xwe di nav geremola bajaran wer kiribû, hinan jî berê xwe dabû Culemêrg, Gever, Wan û Mêrsînê û heta hinekan jî xwe gihandibû Stenbolê.

Me jî xwe avêtibû ser bextê xalanên xwe: Xalê min ê Ferzende bi bayê bezê gihîştibû hawara me û heta ku me delîlek bidîta deriyên qesra xwe ji me re vekiribûn. Wî digot: Li vir bin, ez ê zeviyên xwe nîvenîv bidim we, bila li gerdena xwarzayên min, li xwîşka min a hêja aza be û wekî şîrê dayikê li we helal be, lê dayika min li ber nehatibû; ew yek qebûl nekiribû û gotibû, "Êdî jiyana Xanê li min heram be. Piştî Ehmedê xwe, piştî Ebdurehman, piştî wan, piştî ku gundê me hate şewitandin, êdî çu wateya jiyana li wir nemaye. Heke em bimînin jî, ew bêbext bawer nakim ku belaya xwe ji me vekin; ew ê berhingarî serê me bibin, heyho xwîçêgorî heyho, nebêje me dê ev roj jî bidîtina! binderî bûne serderî; serderî bûne binderî, êdî cihê me li vir nemaye."

*

Berî ku ez Bîşengê binasim, piştî şewitandin û kavilkirina Gundê Mizgeftê bi çend mehan, Tajdînê me bi alîkariya nas û lêziman li Culemêrgê bûbû mela û me jî xwe li wir dîtibû. Jiyana bajaran ji bo min gelekî zor û zehmet bû, ji ber ku ji bilî karê hemalî û rêncberiyê min çu tişt nedizanî…

Dergehên jiyaneke nû li ber me vedibûn.

****

# Dîmena pêncemîn
# “evînperestî”

*Tovê evînê*

*Çirûskeke geş bo jiyanê*

Piştî neh deh deqeyên dîtir min ê berê xwe bida otogarê û destê xwe bikira binê parzûngê kulên xwe. Ez ê ber bi êşgeha xwe ve biçûma û min ê xwe di behra xeman wer kira. Ev dê têwerbûneke gelekî bi hezîmet bûya. Ji bo ku êşên xwe bikewînim û ji awireke germ a evîneke dildemayî çirûskeke jiyanê binoşim, min ê bi çavmiçiqandî xwe li ber dergehê yara xewnên xwe, Bîşenga narîn û nazelîn bigirta.

***

Erê neynika min, ji demsalan dawiya havînê bû; rojeke sayî û germ di nav xwîdan û bêhntengiyê de me xwe spartibû ser bextê bajarê êşan, bajarê jibîrçûyî, bajarê ku tenê navê wî bajar lê ji gundekî paşvemayîtir, bajarê evînê, bajarê çiya û befir û bahozê, bajarê ku ji her derê wê kaniyek dizê lê bêav, bajarê ku riyên wê kavil, bajarê ku tenê riyek diçê, bajarê xwedan Medreseyeke kevn û Keleheke ku bûye qereqola leşkeriyê, bajarê ku her êvara îniyê û êvara duşemê li nava sûka wê marşa milî ya tirkî lê tê xwendin û milet bêdilî li ser piyan tê rawestandin, bajarê ku tenê sûkeke wê heye, bajarê ku ji miletî bêhtir polîsên sivîl lê, bajarê bêfabrîqe, bêzanîngeh, bajarê ku sûk û çarsûya wê bûye mexelê çêlan, bajarê ku li çarmedorên wê wekî zindaneke servekirî çeperên nobedariyê lê, bajarê ku

her tişt, herî dawiyê digihîjê, bajarê ku bayên li rojava vedimirin nû lê radibin, bajarê ku ji her tiştî bêhtir goristan lê, ku hemû girên wê goristan, bajarê Gulîreş Baba, bajarê Bîşengê; Culemêrga navçiyayî, Hekariya Mîran.

Piştî her hejiyanê plan û hesab ji nû ve tên sererastkirin û piştî her heriftinê jî her tişt bi seranpê ji nû ve tê dariştin.

Piştî ewende mirin û sotinê, piştî xweliyê, li jiyaneke ku bêyî te tu tê werbûyî, ji nav xweliya sar li hêviyên xwe digeriyam, erê neynika min, hêvî çirûskeke wisa bû, ku heke di pencereya dilî re rewnaq veda êdî jiyan bi seranser pê geş dibû. Hêvî kaniya jiyanê bû.

Ez, Mustefayê kirêt, kesê ku di jiyana xwe de tenê dexisandin dîtiye, li serê vîrajeke nû ya jiyanê li xwe digeriyam. Niha, êdî Gundê Mizgeftê û bîst û yek salên min li wir bûbûn xweliyeke sar û gîsiya wê birînê wekî derbeke xencerkirî li ser dilê min jan vedida.

**

Rojên giran li benda min bûn. Bajaran mirov diguhartin; li wir mifayê çavê çepê ji yê rastê re çênedibû. Malbata me, piştî sê goran, piştî kavilên şewitandî, gihîştibû bajêr û lê akincî bûbû. Li taxa Kanîkewkan me ji xwe re avahiyek ava kiribû.

Tajdîn li mizgeftekê dest bi melatiya xwe kiribû, şikûr ji Xwedê re, bi meaşê wî çavên me ji ber destê alemê birdibûn. Lê, ma meaşekî dê têra çi bikira; deynên avakirina avahiyê, deynên erdî, deynê ard, şekir, xwê, rûnî, heqê av, elektrîk, komir, dar û telefonê...?

Piştî em hatin bajêr dayika min hema yekcarê ketibû, kenê ji rûyê wê koç kiribû û her roj bi bêdengî heta êvarî li wan deran rûdinişt û ji xwe re digiriya. Xwîşkên min Bînahî û Ronahî jî li ber bayê bajarî ketibûn; hemû derdê wan ew bû ku

demekê beriya demekê di nav çerxa jiyana bajarvaniyê de cihê xwe bigirin. Bînahî diçû mala memûrekî bermaliya wan dikir; li zarokê wan dinihêrî û paqijiya wan dikir. Ronahî jî diçû kargeha HÎSAŞ'ê, li wir berik radiçandin; karê wê jî ew bû. Ji me hemûyan bêhtir Dilşa li jiyana bajêr melevan bû; jixwe ew keçeke bajarî bû, xelkê bajarekî rojava bû, ku evîna Ehmed nebûya ne mimkûn bû ku wê xwe li van deran ragirta; hingê ez difikirîm û min di ber xwe de digot, "Xwedêyo, ma agirê evînê çawa ye, ma evîn çi tişt e ku keçeke bajarî dixe nav babelîska xwe û tîne gundekî?"

Wê rojê gelekî dest-teng bûn. Wan rojan ez her roj berî tarîgewrika spêdê hişyar dibûm û bi bayê bezê, piştî ku min pariyek nanî ka dixwar an nedixwar diçûm ser rê, li benda danperan radiwestiyam da ku pê biçim gelî û li wir, an erebeya xîzê bar bikim, an ji yekê re daran bibirim, an jî xwe bavêjim ser paxila çiyayê Simbî û li wir ji xwe re, pincarê biçinim û bînim çarsûyê bifiroşim da ku pê nanê rojê derxim. Karbidestan gelekî bêmerwetî li me dikir, keysa xwe bi me dianîn û bi heqdesteke gelekî kêm karê xwe bi me didan kirin. Jixwe gelek caran dora rêncberiyê jî nedigihîşt me, di vir de jî, kî xurt bû, kî nasê karbidestan bû, şansê wî bêhtir bû.

Zivistanê jî ez diçûm ber kamyonên komirê digeriyam, ka kîngê dê kamyona komirê bihata da ku ez komirê vala bikim û nanê rojê jê derxim. Heta êvarê çavên min di serê min de beloq dibûn, xwîdanê laşê min vedimalişt lê min nîvê heqê westiyana xwe jî wernedigirt.

***

Roj diçûn, sal diborîn; her wiha bi bihurîna salan re umrê me jî pîr dibû. Êdî rojên tengav hêdî hêdî li pey mabûn, em bi hemû rê û rêbazên bajarî hariste bûbûn. Nas û dostên me çêbûbûn. Dayika min, hêdî hêdî kulên xwe li kûrahiya dilê xwe çal kiribûn û heçko her tişt qebûl kiribe, ji êşan westiyabe, wisa

li gorî bayên jiyanê tevdigeriya. Xwîşkên min reng û şemala xwe guhartibûn, zimanê xwe hêdî hêdî vedihêlan û bi tirkiyeke şikestî diaxivîn. Jinbiraya min Dilşayê xem û şîna xwe li pey xwe hiştibû û bi çarlepî destê xwe li bin barê jiyanê alandibû. Her roj bêhnên xweş bi xwe dadikirin, bisk û guliyên xwe şeh dikirin, birûyên xwe rast dikirin, rûj li lêvên xwe dihusîn û diçû, êvarê dereng vedigeriya malê. Rojbînê dest bi dibistanê kiribû û Rondikê jî hêdî hêdî haziriya wê dikir. Tajdîn bi seranpê guherîbû; bûbû dîndarekî fanatîk, nedihişt ku Esma bête odeya me ya rûniştinê, her dem rûyê wê nîvenîv nixumandî bû, mirovî tenê çavên wê didîtin, ew jî hînî tirkiyeke şikestî bûbû. Di wan rojan de, dayika min ji derketina Dilşayê zivêr dibû, jê re digot, "Min li vir bi tenê nehêle, tu van rojan min paşguh dikî, keça min, min nehêle." lê Dilşa ji vê helwesta dayika min gelekî zivêr dibû û digot, "Dev ji min berde, êdî mayê te di min naçe, dilê min çi bixwaze ez ê wisa bikim, bes e!" Aha, neynika min tam di wan rojan de ku umrê min nêzî bîst û çar saliyê dibû, dilê min yekem car, bi dîtina kesekê radibû pêdarê, pê li min dilerizîn û ji heyecanê gotin di devê min de lal dibûn û rûyê min ji şermê sor dibû…

Evîneke bêdem bi ruhê min ê westiyayî vedabû.

*

Rojeke sar a zivistanê bû, meha Remezanê bû; ez bi rojî bûm û wê rojê roja erefê bû. Ji bo mexrebê tenê saetek mabû, wê kêlîkê ez li malê, li pişt sobê rûniştibûm. Ji bilî Dilşayê her kes li malê bû, Rondik û Rojbîn geh derdiketin derve, geh diketin hundir, şeklame û biskiwîtên xwe dihejmartin; Ronahî û Bînahî jî li kuncekî veder li dor torbekî cilan ku zengînekî ji bo xêra bavê xwe birêkiribûn, rûniştibûn, li cil û bergan vedinêrtin ka yên li gorî wan tê de hene an na. Esma û Tajdîn -ku Tajdîn ev çend sal bû navê xwe kiribû Tacettîn- li mutbexê bûn, dengê wan nedihat bihîstin, bawer im li ser meseleyên dînî

û pirsgirêkên komeleya ku Tajdînê me hemû dema wî, piştî danên nimêjkirinê li wir diborîn, dipeyivîn. Hingê ez bi zirîna telefonê veciniqîbûm û piştî dudiliyekê min telefon rakiribû. Camêrekî nas, li min geriyabû û heçko bibe wesîleya xêreke gelekî mezin, ji min re gotibû, "Misto, şoleke baş heye, kamyoneke komirê hatiye, min ew zeft kir, min got bila pare ji bo xelkê neçin, jixwe kes ji te pêdivîtir nîn e, ka tu çi dibêjî?" Min jî gotibû, "Heke dê pareyî pêşîn bide va ye ez têmç" Wî gotibû, "Erê erê, min ew serwext kiriye."

Bi zikê birçî, bi rojî min heta piştî banga eşayê komir vala kiribû. Ez ji piyan ketibûm, ser û çavên min, rû û dêmên min gişt bûbûn tenî. Gelekî sar bû, li derve hişkebayekî sar bi perperûşkên befirê re liba dibûn û bi ser ser û guhên min de dihatin xwarê. Pêlava min diriyayî bû û goreyên min şil bûbûn. Destên min diqerisîn û zikê min birçî bû; ez hê jî bi rojî bûm. Sibê eyd bû. Piştî ku karbidestî pareyên min dane min, ez hêdîka bi gavên sistoşor ber bi malê ve ketibûm rê.

Pir sar bû. Şev bû, befir û bagerê bênavber lê dikir. Ez bi gavên bêhêvî nêzî malê bûbûm, gihîştibûm taxa Bîşengê. Jixwe taxa wan li ser riya taxa me bû. Xaniyê wan jî ji axê bû, lê ne ku tenikhal bûn, na, berevajî, ji ber ku xwecihên Culemêrgê yên kevn bûn, hêj di xaniyê xwe yê kevn de diman.

Befirê rûyê min dialîst, xwe diavêt ser çavê min, hin caran min ji bêgaviya befirê çavên xwe digirtin; ez birçî bûm û ser û guhên min ji komirê reş bûbûn. Ew bi qasî salekê bû, min Bîşeng nas dikir, gelek caran gava ez diçûm malê, li ser riya xwe min ew didît, nizanim çawa çêbûbû lê piştî demekê tiştekî ez ber bi wê ve radikêşam. Çi gava çavên min bi wê diketin, ripîn ji dilê min diçû, bi hezaran hêvî li kakilê dilê min şîn dibûn.

Êvareke sar a zivistanê bû. Befir dibariya, sar bû, roja berî cejnê bû, ez birçî bûm, ji birçîna çavên min dizivirîn, min digot, qey ez nebawer im bikaribim bigihîjim malê. Ez nêzî

mala Bîşengê bûbûm, ligel wê birçîtiyê, ligel wê westê, ligel wê sermayê ew ketibû bîra min û dilê min î xeşîm dest bi destkolê kiribû. Dinya tarî bû, çavên mirovî çend metre qeter nedikir, ewende tarî bûbû, te digot qey wî mijê reş û tarî bajêr daqurtandiye.

Êvareke reştarî ya zivistanê bû. Li ber deriyê mala Bîşengê ber bi mala xwe ve diçûm, ez birçî bûm û tevî ku banga mexrebê dabû jî hêj min fitara xwe nekiribû. Nebêje Bîşeng ji dikanê dihat, tam ez ji mala wan bihurîbûm, ew derdikete pêşiya min. Ligel silavdaneke serpê, bi rûyekî ken, bêyî ku bi wî halê min min biçûk bibîne, got, "Mistê, xuya ye tu gelek westiyayî, ka çayeke me vexwe piştre here." Ez qet li benda vê gotinê nebûm, min deng nekir, birçîtî û hemû west ji bîra min çûbû, min bi dilekî tijî evîn, li rûyê wê nihêrî: Bejna wê bilind bû, çav û birû gelekî li hev hatibûn, bişirîneke germ li ser dêmên wê vedigeşiya, porê dirêj ê ku dişibiya davên şengebiyeke nazelîn ji guliyên befirê şil bûbûn û daketibûn nav çavên wê, kincekî rengîn ê xweşik û zarîf jî bejna wê dixemiland.

Befir dibariya, sar bû û ez û Bîşeng li serpê, li nêzî mala wan, di bin dêvandina perperûşkên befirê de rawestiyabûn. Li min nihêrî, got, "Mistê, kes li malê nîn e, êvara eydê ye, yên me gişt çûne nik mamê min wan, ew heta hingorî jî venagerin, şerm neke, ma tu ji min jî şerm dikî?" Min deng nekir, hingê Bîşengê got, "Ca biçin, kerem ke!" Ew li pêşiyê, ez li dû wê, dilê min li depê singa min dida û ez ber bi pêlûskên mala wê ve diçûm. Sar bû, cil û bergên min ji komirê tarî bûbûn, reng û rûyê min reş bûbû, hingê Bîşeng rawestiya û bi paş xwe ve zivirî û li min nihêrî: Ez direcifîm. Nizanim ji şermê bû, an ji heyecanê bû, an ji sermayê bû, an ji birsê bû, nizanim belkî jî ji hemûyan bû, lê herî bêhtir ji evîndariyê bû. Destên min girtin: Wê kêlîkê destên wê ji destên min sartir bûn, lê wan destên sar dilê min -heçko wê gavê ez fincaneke çaya germ bi ser devê

xwe de kim, wisa germ kiribû, ruhê min germijîbû, li min germ bûbû û hemû qeşa û cemeda hinavên min cihê xwe ji hest û dillerzikeke navbera kêf û tirsê re hiştibû.

Wê êvara berî eydê, ez bê dilê xwe di bin bayê şerma dilê xwe de, li dû Bîşenga ber dilê xwe ketibûm nava mala wan: Dewsa piyên min ên qirêjî li berikên wan xuya dibû. Ji şerma min dixwest wê kêlîkê li wê derê erd biqelişe û ez lê çal bibim. Piştî ku em gihîştin odeya wan a rûniştinê, ligel ku pir rica jî kir ku ez li ser qanepe an jî dîwanê rûnêm, lê dîsan jî ez li nêzî derî, li erdê, li ser mînderê rûniştim. Nava xaniyê wan gelekî xweş bû. Du zarok li hundir rûniştibûn, li televizyonê temaşe dikirin. Heçko qet hay ji hatina me nebin, wisa bêdeng bûn. Min piyên xwe xistibûn bin xwe û ez di nava xwîdana şermê de, heçko gelekî tengav bûbim, wisa rûniştibûm. Tiliya piyê min ji goreya min derdiket. Min wê gavê ji xwe re dua dikirin ku tiştek biqewime, elektrîk bihête birîn da ku ez ji wir biçim. Herî bêhtir min nedixwest kesek bihêt, wê kêlîkê ji şerma dinyayê, ji şerma fihêtbûnê min evîna xwe jî ji bîra xwe biribû.

Wê rojê her tiştî ji nişka ve rûdabû. Roja dawîn a rojiyê bû, berî banga mexrebê bi saetekê telefon hatibû û piştî valakirina kamyona komirê jî, niha Bîşengê ez vexwendibûm mala xwe. Piştî çarêkekê, di destî de tepsiyeke xwarinê ketibû odeyê. Cilên li ser xwe guhartibûn, porê xwe yê şil berdabû ser milên xwe, hingê ew li dora hejdesaliyê hebû, gelekî xweşik bû. Min yekem car ew ew qas ji nêz ve dîtibû, berê min tim ji dûr ve lê dinêrî; heta hevnasîna me jî tenê tesadûfek bû; rojeke biharê bû, du salan berî wê êvarê, rojeke sayî ya biharê gava ku ew û çend hevalên xwe ji bo geştê hatibûn joriya mala me -ku li joriya mala me, ew kendal û berpala çiyayê pişta Kanîkewkan bihara zû gelekî xweş dibû, ciwanên bajarî gelek caran dihatin wê derê geştê- min ew li wir dîtibû, çavên min tim mabûn li ser, heta min di dilê xwe de gotibû, “Xwezî min ev keç ji nêz ve nas kiribûya” piştre jî, wê hatibû li deriyê me xistibû û av ji min

xwestibû. Hingê min pirsa navê wê kiribû, wê jî navê min pirsîbû, wisa çend caran me ji hev navê hev pirsîbû; me her duyan jî heçko nasên hev bin, serhişkî kiribû û navê xwe ji hev re negotibû, lê piştî ku min navê xwe gotibû wê jî yê xwe gotibû û piştî ku min surehiyek av dabûyê, bi girnijîneke germ xatir ji min xwestibû û çûbû. Lê piştre di pişt camê re, bi nepenî min lê nihêrîbû û kelegermeke bêwate li giyanê min hilavêtibû.

Wê êvara cuda, wê êvara ku ji şerma min birsa xwe ji bîr kiribû, li mala Bîşenga ber dilê xwe, piştî tesadûfeke baş û xweş, bi kotekî min du sê pariyên xwarinê ji ber xatirê wê xwaribû û piştre bi gavên sivik, bi lez û bez ji mala wê derketibûm û min berê xwe dabû mala xwe. Di rê de gelek hizrên têvel di mejiyê min de direqisîn. Min wê gavê dixwest li ber neynikekê li rûyê xwe binihêrim, min wê kêlîkê xweziya xwe bi lawîniyê anîbû, min di ber xwe de gotibû, "Xwezî ez wisa kirêt nebûma" piştre bi bîra min hatibûn gotinên ku ji zaroktiyê ve li ser kirêtiya min, ên li derdora min ji min re digotin. Wê êvarê di bin barîna befirê de bi hezaran cam di zêhna min de dişikestin, dengên kirêtiyê deng vedida, piştre min dil bi xwe disot, min dixwest ez bi demeke dî, bi rû û şemaleke dî, rastî Bîşengê bihatima. Wê êvarê di rê de min nefret ji xwe kiribû û ew hêviya "Dûvê zemanan dirêj e" a ku ligel her tiştî hêviyekê vedihewîne, di hişê min de dihat lêdan û dişikest. Wê êvara berî eydê, wê hevnasîna nêz, wê êvara piştî wê westa giran, dîtina rûyê xweşkûk û spehî yê yarê, wekî xewneke birîndar ku mirov hem dixwaze careke dî bibîne, hem jî naxwaze wek wê dîtina dîtî bibîne, min xweziya xwe bi kuştina kirêtiya Mistê dianî.

Wê êvarê di riya malê de, bi hişekî şêlû gava ku ez bi gavên hêminî ber bi taxa xwe ve diçûm, befireke nerm dibariya. Hizra min li ser çend kurtedemên xweş ên ku ez ne li bendê bûm, bêserober, bêhazirî tûşî bûbûm bû. Hizreke nîvtirs mejiyê min dixwar; ez ditirsiyam ku ew êdî li rûyê min nenihêre, ji ber ku ez li gorî wê gelekî feqîr bûm, min nedixwest ku ew min

wiha bibîne. Lê, wekî dîtir jî, piştî Ehmed ev yekem car bû ku gava kesek bi min re diaxivî, li nava çavên min dinihêrî, ji çirûska çavên wê têhneke germ diçirûsî; min gava li kûrahiya çavên wê dinêrî, ez bi hebûna xwe dihesiyam.

Tiştekî efsûnî yê Bîşengê hebû ku ez ber bi xwe ve dikişandim.

**

Wê şevê heta derengî şevê ez bi xeyala wê hevdîtina bêwext re hevşa dibûm. Hemû kiteyên wan çend deqeyên bi wê re min dianîn bîra xwe û min ew dem ji nû ve dijîn. Min xweziya xwe bi halekî baştir dianî û xeyala hevdîtineke halxweştir, bi serobertir di hişê xwe de dirêst. Min ê ew bi demeke ku ez tam amade, min xwe biseroberkirî bidîta û kê dizanî belkî min curet jî bikira ku hestên xwe pê re hevpar bikirina.

Wê şevê îsgeha hemû xeyalên min ên ku ji hev vedirestin, Bîşeng bû.

Spêdeyê ez ji her roj zûtir hişyar bûbûm û min yekser xwe li ber neynikê, li serşokê girtibû. Sibeha eydê bû. Min ji her carê cudatir li neynikê nihêrtibû û min ji her carê kûrtir li rûyê xwe nihêrîbû. Hingê ez pê hesiyabûm ku ez gelekî kirêt nîn im, hingê ez pê hesiyabûm ku ez ji gelek kesên li derdora min ku keçên herî xweşkûk bi dû wan ve dibeziyan lawîntir im, lê ji ber ku ji zaroktiyê ve her kesî/ê ez kirêt didîtim, bêyî ku ez der barê xwe de biryara xwe bidim, min qinyata giştî qebûl kiribû û ji ber hindê jî min ji xwe hez nedikir.

Wê spêdeya cejnê, roja roşanê, li ber neynikê min li rûyê xwe, min li hemû gîr û xêzikên rûyê xwe nihêrtibû.

Min di her gîr û xêzika rûyê xwe de xweziyeke kuştî dîtibû û gava min li çavên xwe, li mijang û birûyên xwe, li dev

û difna xwe, li lamik û eniya xwe nihêrîbû; ez bi gelek cudahiyên xwe, gelek spehîtiyên xwe hesiyabûm, min xwe ji her carê cudatir û xwesertir dîtibû. Wê berbanga zû, berî ku ez biçûma nimêja eydê, hêj yên malê kes hişyar nebûbû, li ber awêneya xwe, li serşokê min li têhna dilê xwe guhdarî kiribû û min pêjna Bîşengê tê de seh kiribû.

Di rûyê xwe de min Bîşeng dîtibû, ji ber ku wê wekî min li min dinihêrî; di her awira wê de min têhna jiyanê seh kiribû û ez bi xwe hesiyabûm: Bi heyî û neyiyê xwe, bi kêmasî û zêdehiya xwe, bi biçûkî û mezinahiya xwe, bi her tiştî ve, bi xwe hesiyabûm. Erê, min li nik Bîşengê xwe didît û ez pê dihesiyam ku ew xwe ji min jorvetir nabîne û min jî ji çu kesê jêrvetir nabîne, hingê baweriya min bi min qewî dibû.

Ez heta wê rojê çu carê ewçend li ber neynikê ranewestiyabûm. Hingê min li rûyê xwe dinihêrî û min xwe di xwe de keşf dikir. Erê, ez ji Mustefayê ku min heta wê rojê nas kiribû cudatir bûm, ez gelekî xweser bûm, min di rûyê xwe de xwe dîtibû û ez pê hesiyabûm ku rûyekî min î xweser ku naşibe yê çu kesî, ku tenê aîdê min e, heye. Hingê rêzikên Ehmedê Xanî, birayê min ê ku bi destê namerdan bi xwîndarî, bi dirindeyî hatiye kuştin, hatibûn bîra min; Ehmed li rûpeleke ajandaya xwe ya ku ji bo min gelekî pîroz bû û min wekî çavên xwe li wê û Qurana ku xwîna bavê min rijiyabû ser dinihêrî, wiha nivîsandibû:

***Di rûyê te de li rûgeha rûyê xwe yê nepenî digerim***

"*...hilbijartina mirov a dilînî kesayetiya mirov dide dest*"

*Li rûyan dinêrim. Li rûyên mirovan. Li veşarteya rûyistana rûyan digerim. Xemgînî, hezkirin, nefret û xem hemû di rûyê mirovan de veşartî ne. Belkî jî nepenîtiya mirovan tev xwe di rûyê mirovan ê nepenî de veşartibe... Lê her rûyek rastiyek e. Di nava ew qas rastiyan de li rastiya xwe digerim. Hingê dibêjim gelo rastiya min di kîjan rûyî de veşartî ye?*

*Rûyê ku ez lê digerim rûyê kê ye? Hingê careke din dipirsim, "Gelo ma mirov mecbûr e ku li rûyekî bigere?*

*Peyka hestên min li rêgeheke vala dizivire û digere. Diçe. Di nav ew qas rastiyan de li rastiya xwe digere. Rastiya xwe di rûyekî zelal de, di rûyekî ku rastiya min lê niştiye de, di rûyekî mê yê ku rastiya min lê veşartî ye de li rûyê xwe yê nepenî digerim. Ji ber ku rûyê hezkiriya mirov rastiya encamên serboriya jiyana mirovî ye. Kesayetiya mirov e. Kûratiya hest û zêhna mirov e. Hemû çal û hîmên zêhnî, hest û ramanên mirov di rûyê xweşdiviyê de veşartî ne. Mirov ji kê hez bike mirov wisa ye. Mirov çawa hez bike rûyê mirov ê nepenî wisa ye. Hezkirî rûyê mirov ê veşartî ye. Ji ber ku hevyar ji axa hev in; wisa, heçko bi heman axê hatine hevîrkirin. Ji ber ku havênê hezkiriyan ji heman riwêştê ye.*

*Lê digerim. Di nava ewende rûyên xweşik û xapînok de li rastiya rûyê xwe yê veşartî digerim. Neynika rûyê mirovan çavên wan in; awirvedana wan e. Çav neynika dil e. Rûyê nepenî di kûrahiya çavan de veşartî ye. Li çavên mirovan dinihêrim. Her çavek rastiyek e. Di nava ew qas rastiyan de li rastiya xwe digerim. Li velerza dilê xwe digerim. Di velerza dilê min de hemû tirs û xweziyên min, hemû şikestek û destkeftiyên min, hemû ders û tecrûbeyên min veşartî ne. Li hiş û bîra xwe vedigerim û di nav de digerim; li qonaxên jiyana xwe digerim… Şer û hevrikiyên xwe li ser mêzîna mantiqa xwe dipîvim; kêm zêde digihîjim wan. Tê de rûyê min ê nepenî heye û hingê ew li ber min xuya dibe; li ser wî gîsî û kul hene, birînên ku hê jî jan didin hene, şahî û kêfxweşiyên biçûk û mezin hene. Dûr û nêzik kes û kesayet hene; protîp hene, modeltîp hene û hemû jî bi tevna tirsê hatine pêçan. Tirs hene; lewma gava ku li rûyan dinihêrim tirsên xwe dibînim. Ji lew re zû bi zû tu rû dilê min germ nakin û hestên min bi çu awirvedanan bi pêlan nakevin. Hingê satalayta min rêgeha xwe diguhêze û ber bi rûyistaneke nediyar ve diçe.*

*Li rûyê kê digerim gelo? Li rûyekî çawa? Kîjan rû xewn û xeyala min e? Ez di kîjan rûyî de veşartî me? Di rûyê kê de? Li rûyistana rûyan li rastiya xwe digerim. Li rûyê xwe yê nepenî… Ji zêhna xwe*

*dipirsim, ji raboriya xwe dipirsim û ji xweziyên xwe dipirsim. Ji rûyê xwe dipirsim. Rûyê min ji min ditirse; ez ji rûyê xwe ditirsim. Rûyê min dişikê û wekî guleke bêavmayî hêdî hêdî diçilmise. Ez hê jî li rûyê xwe yê nepenî digerim di nava rûyistana rûyan de. Lê rûyê xwe yê nepenî nabînim. Rûgeha rûyê min hê jî li ber min winda ye. Hê jî satalayta hestên min li valahiya rûyistanê digere û hê jî negihîştiye rêgeha rûyê min ê nepenî.*

*Li rûyê xwe yê heyî dinihêrim; dipirsim di ber xwe de, gelo ez li spehîtiyê digerim? An jî spehîbûnê? Qey ez li zelaliyê digerim an zelalbûnê? Nexwe ez li rastiyê digerim an jî rastbûyinê? Ma ez li jêhatiniyê digerim an jî jêhatîbûnê? Ez li rûyê çi digerim; di kîjan rûyî de li xwe digerim? Rastiyên min, xewn û xeyalên min, îdealên min, spehîtiya min, jîriya min… Kîjan? Hingê ez li kêmasiyên xwe digerim; di nav bîr û hafizaya xwe werdibim. Radikim û datînim lê rûyê min ê nepenî hê jî ne xuya ye. Qey ez li kêmasiyên rûyê xwe yê heyî digerim?*

*Hezkirina mirov rastiya mirov a herî masûmane ye. Hezkirin hişîmendiyeke di tama zaroktiyê de ye. Hingê qey mirov li rûyê xwe yê zaroktiyê digere. Rûyê zarok ê xweşik û zelal… Qey mirov li çavgeşiya zarokekî digere? Ma dibe? Dipirsim. Li nava rûyistanê dikevim wekî parsekekî rû bi rû li te digerim. Li rûyê xwe yê nepenî… Ma mirov li keserên xwe digere? Qey mirov gerokê wan tiştan e yên ku mirov nekariye bijî? An jî encama hemûyan e lêgerîna mirov? Qey mirov li parçeyên rûyê xwe digere? Ma rûyê mirovekî çend parçeye? (…)*

*Hê jî dipirsim. Lê difikirim; li bersiva pirsên xwe digerim. Li parçeyên rûyê xwe digerim. Parçeyê zaroktiyê, parçeyê ciwantiyê û parçayên din. Parçeyê li nav malbatê, parçeyê li nav civatê, parçeyê li nav jîngehê û parçeyên dîtir… Hemû parçeyên rûyê xwe yê nepenî… Îxanet, bêbextî, keser, kul, hejarî, dewisandin, tenêtî û azwerî… Li rûyê xwe yê ku dê min ji tirsa tunebûnê rizgar bike û ber û fêkiyê min li ser jîngehê belav bike, digerim. Di nava ev qas parçeyên rûyistana rûyan de li rûyê xwe yê dîtir digerim. Ew rûyê ku dê vî agirê tenêtiyê di nava ruhê min de vemirîne û rûyê min ê nepenî bibîne…*

*Li rûyên geş dinêrim. Kêf û şahî, hezkirin û tîna jiyanê min*

*dipêçe. Xeman ji bîr dikim. Tavilê geş dibe rûyê min ê nepenî. Sînyalên hiş û mejiyê min hemû dilebitin; ruhê min vedigeşe û rûyê min ê nepenî li benda çirûskekê disekine. Hingê rûyê geş bi min xweş tê. Evîn mirov bi dû xwe ve dibe; te dikêşe xwe wekî gerasîska avê… Lê heke ji aliyên din ew tîrêj venejenî tu radiwestî û êdî hestên te ji wê rêgehê derdikevin û hingê tu di rûyekî din de li rûyê xwe yê nepenî digerî.*

*Hê jî nizanim rûyê min ê nepenî di rûyê kîjan gulê de veşartî ye. Lê gelek caran ez wî rûyî radibihîzim, seh dikim, pê dihesim; têhn û pêjna wî dibihîzim. Gelek caran ew ji xeyalekê dûrtir dibe, hin caran jî hilma wî li pişt guhê xwe radibihîzim. Jixwe gava ku ez tûşî şikestinekê têm bi dilekî daxwaztijî li wî rûyê xwe digerim. Dixwazim ku li nik min be lê qet nabînim û hingê tenêtî wekî êşeke giran xwe berî ruhê min dide. Hingê di nava rûyistana rûyan de hemû rû ji min re dibin sehm û ez di hemû rûyan de tenêtiyê radibihîzim. Tenê li rûyê xwe yê nepenî digerim lê min hê jî ew nedîtiye.*

*Her rûyekî nêzik ku di jiyana mirov a civakî de bi rengekî bi mirov re têkildar dibe parçeyekî ji xwe dide rûyê mirov. Hingê rûyê mirov ê heyî ji derdora xwe bi sedan parçeyan distîne û ji wan jî teşe digire. Lê rûyê mirov ê nepenî ji van vedertir e; tenê di kûrahiya ruh û mejiyê mirov de hêlîna xwe çêdike. Ew ji hemû spehîtî, xwezî û keserên mirov pêk tê lê çu caran jî ew rûyê mirov dibîne van pêdiviyên mirov hemûyan çareser nake. Tenê hezkirî kilîta deriyê çareseriyan e. Ango hezkirî hilmeke germ a vejandina hestên mirov ên xweşbîn e. Yanî baweşîneke hûnik e bo hênik-kirina kelegerm û kelejana tenêtiyê ya ruh û mejiyê mirov e.*

*Peyka dilê min li rûyistana rûyê nepenî digere. Di hin rûyan de tîneke germ, di hinan de sehmeke har, di hinan de piştrastiyê, di hinan de hêvîşikestinê, di hinan de xemsariyê, di hinan de bêbextiyê, di hinan de bêsiûdiyê, di hinan de nankoriyê û di hinan de jî kêfxweşiyê dibîne. Ji hemûyan jî parçeyekî distîne. Her wiha li nik hemûyan jî li 'te' ya ku di rûyê min ê nepenî de xwe veşartiye digere.*

*Umrê min ji lêgerînê westiya lê ez hê jî li rûyê xwe yê nepenî digerim. Carina gelekî nêz dibim lê hê jî min ew nedîtiye. Dizanim ku*

*ew gelekî ne dûrî min e, lê nabînim ka li ku ye û ew rûyê ez lê digerim rûyê kê ye? Peyka hestên min hê jî li valahiya rûyistanê dizivire û li rûgeha xwe digere. Rêgeha rûyistana rûyê min ê nepenî gizîna dilê min e.*

*Gizîn û çîzîna dilê mirov di kîjan rûyî de veşarî ye? Kîjan awirên germ, bişirîna şîrîn, axaftina nerm gizînê dixe dilê mirov? Ji ber çi tiştî gizîn bi dilê mirov dikeve? Antenên dilê xwe li ba dikim û satalayta dilê xwe li valahiya rûyistanê girêdidim; gelo li kîjan rûyî veşartî ye gizîna dilê min? Çi tişt dibe sedema raperîna hest û dilînên mirov? Pîvan û rêgezên gizîna dil çi ne? Li xwe digerim; dikevin nav reh û rîşên xwe û tê de diçim xwarê. Ji raboriyê çend keser û xweziyên xwe yên dewisandî dibînim. Gelek xweziyên ku min hingê gelek xwestibû bi dest bixim lê ku min bi dest nexistibûn tên bîra min. Hingê gizîn dikeve dilê min; difikirim ku hê jî şikestina wan xweziyan wekî kulekê di kûrahiya dilê min de jan vedide. Hê jî wekî xewneke nîvcomayî hestên min dixwazin min li wan deman vegerînin û di nava wan xweziyan de rûyê min ê nepenî nîşanî min bidin. Lê ne ez ez ê berê me, ne jî xweziyên min; ne jî dil maye dilê caran. Hingê rûyê min ê nepenî hê jî li 'xwe' digere. Hê jî di rûyê mirovan de li rûyê te yê ku rûyê min ê nepenî tê de veşartî ye, digerim.*

*…tu hê jî wekî sîtavkekê geh xuya dibî, geh jî winda dibî.*

**

Ez gelek li ser van rêzikên Ehmed fikirîbûm, hingê ez têgihîştibûm ka Dilşaya bajarî çima li pey Ehmed hatiye û bi evîna wî geviziye; ma kîjan mirovî dikarî li hemberî van gotinên efsûnî xwe berze nekira. Belkî jî hezkirin, xweberzekirineke delodînane bû. Piştî ku min ev nivîs xwendî, ez gelekî lê hizirîbûm ka ez li çiyê Bîşengê digerim, di rûyê wê de çi dibînim ku xwe tê de berze dikim.

Erê awêneya min a spehî, di çavên Bîşengê de min spehîtiyeke zelal a xwerû, di kenê wê de min hêviyên tepisandî yên Mustefayê vederkirî yê ku tim ji teniştê ve li jiyanê temaşekirî, didît. Min li nik Bîşengê bi rastîn jî xwe didît; ez bi

dil-lerzikê diketim.

Êdî di jiyana min de kesek hebû ku bagerên dilê min li nik wê dişikestin û aramiyeke dilveker xwe vedida ser kerba min û ez asûde dibûm.

Erê neynika min, çu xweseriyên min nebûn, min ji bilî hemalî û rêncberiyê çu kar jî nadizanîn. Ez ne dewlemend bûm, ne jî xwenda, ne çi etîketên min hebûn, ne jî kariyereke berbiçav; tenê di nava çerxa heyî de ez wekî moriyeke lawaz bûm, di nava hengameyên jiyanê de ne dengê min û ne jî peyva min hebû. Bi zikekî têr, bi dehan birçî dimam, gelek caran bi kûte, kurtêl û bermahiyên xelkê ve min zikê xwe têr dikir. Min çu carê hin pare nebûn ku ji xwe re cilekî nû bikirim, pêlaveke xweşik a nû bikim piyê xwe û bikaribim bi dû bayê dilê xwe tevbigerim. Lê ligel vê jî Bîşengê qedir dida min, pûte bi min dida û ez wek însan didîtim; wekî însanekî normal… Heta hingê çu kesî/ê bi wî çavî li min nenihêrîbû, lewma li nik Bîşengê ez bi hebûna xwe dihesiyam. Wê, ez wekî heyî qebûl dikirim; guhdariya min dikir, ji min re dergehên dilê xwe vedikirin; pir samîmî û jidil bi min re têkildar dibû û pûte bi min dida. Lewma min xwe li nik wê didît; heta ku min ew nedîta bayê dilê min neditewiya.

Ew êdî bûbû sedema jiyana min.

Ew rojên min ên herî xweş bûn. Wan rojan ez bi rastî jî bi tam û çêja jiyanê hesiyabûm. Bîşenga delal, bûbû stêrka geş a jiyana min, bûbû aramgeha dilê min, bûbû nimêjgeha evîna dilê min. Min li nik wê her tişt ji bîr dikir; hemû êş û kulên min, xweliya Gundê Mizgeftê, termê parçekirî yê Ehmedê Xanî, landika li ber çavên min bi guleyan hatiye peritandin, rûyê bavê min gava ku singa wî dibû moxil li ber guleyên kesên nediyar, êşa mista Saloyê bêbext, hemû ji bîra min diçûn; gava çavên min bi wan çavên xezalî diketin, hûnebayekî nerm li ser hestên min digobiliya û bawerzînên hênik ez mest dikirim. Gava çavên

min bi wê diketin, hemû gisiyên jande yên li ser dilê min serpeçûm dibûn û li şûnê Mistêyeke nû bi bextewariyeke bêtarîf digevizî; ez li nik wê gelekî dilxweş dibûm. Hemû reh û demarên min bi xwîna evîna wê diherikîn; heta şane û atomên xwe ez têwer bûbûm, ez bi kenê li ser lêvên tenik ên Bîşengê evînxurî bûbûm.

Evînxuriya dilgeş hemû janên dilê min dikewandin û jehra jiyanê dikire xoşaveke şirîn a tamhingvînî ku min her roj ji awirên wê yên germ dinoşî.

Ew êdî bûbû kaniya hêviyên min.

Wan rojan min ew zehf didît. Êdî ji xwe bêhtir ez bi wê re dijiyam. Hemû xeyalên min li ser wê bûn, her tiştê wê êdî bûbû xema min jî. Çi dike, ji çi hez dike, kenê wê bi çi tê, ji kîjan stran, stranbêj, fîlm, hunermend, şanoger, siyesetmedarî hez dike, exlaqê wê li ser çi ye, ji kîjan xwarinê hez dike, ji kîjanê hez nake, ji çi zivêr dibe, çav dide çi, modela jiyana wê çiye; hemû min dizanîn û ji ber ku wê hez jê dikir, tiştên min jê hez nedikirin jî li ber çavên min germ bûbûn. Min xwe di kaniya çavên wê de berze kiribû. Çend caran min hewl dabû ku bizanibim ka dilê wê li ser kurikekî heye an na, lê bêcesaretiyê zora min biribû.

**

Piştî wê êvara berî eydê bi mehan, rojeke geş a biharê bû. Piştî dudiliyeke mezin min biryar dabû ku ez biçim her tiştî jê re bêjim. Wê şevê heta derengî şevê ez li ser fikirîbûm ka min ê çi jê re bigota û çawa deriyên dilê xwe jê re vekira. Roja paştir, ez neçûbûm gelî û min ji xwe re hincetek peyda kiribû û heta nêzî êvarê li ser ka dê çi jê re bêjim hizirîbûm.

Wan rojan min nedixwest li malê bimînim, piştî hin felaketên mezin îcar jî ewrên rûreşiyê li hindava mala me digeriyan. Tajdînê me bi temamî xwe berdabû nav kar û barên

komeleya xwe, hema bêje bi çavê gawiran li me hemûyan dinihêrî. Digot, "Ev der dar-ul herb e, milet giş di şîrkê de ye; civak hemû xariyaye, mizgeft bûne mescîd-îl dirar, 'Heta ku hukmê Xwedê li ser rûyê erdê serwer bibe' em ê bi kufrê re têbikoşin…" Gelek caran civînên wan li mala me çêdibûn. Tajdîn her roj heta derengî şevê em nesîhet dikirin û weez didan me, hemû taqên xanî bi ayetan xemilandibûn, nedihişt ku em baş li televizyonê temaşe bikin, keçên wî Rondik û Rojbîn hêj heft neh salî bûn, nedihişt bêyî dersûk derkevin ser şaneşînê jî. Jina wî me kêm caran didît, ew di navbera mutbex û odeya xwe de asê bûbû. Li bajêr kurek li Tajdîn û Esmayê zêde bûbû, navê wî kiribû Muas, Tajdîn digot, "Bila navê eshabiyan lê be", Muasê biçûk, hêj saleke xwe tijî nekiribû. Her wiha bajêr ew Tajdînê dînemêr kuştibû û li şûnê Tajdînekî wekî bajaran nermijok û cuda hatibû.

Dayika min wan rojan careke dîtir dosyaya min a kevn vekiribû û ew sohbeta ku li Xanê, berî şewitandina Gundê Mizgeftê ji min re kiribû, dîsa dikir û digot, "Mistê, berxê min; me tu tenê mayî, tu dibînî vî bajarê mirovxwer bi Tajdîn jî vedaye, ew jî sewdaser bûye; êdî heke ew bi xwe ser jê neke goştî jî naxwe, bavê te alimekî şertî xwe bû, bêhempa bû, heft ilim dizanibûn, lê wî çu carê wekî van ehmeqan nedigot, eve çi ye; qey ji me re dînekî nû derdixin. Kurê min, nebî tu bi dû van şeytanokan biçî, aqilê xwe bide serê xwe, heke hewce bike em ê xwîşkeke te jî bikin pêguhork bo te. Divê tu jî êdî bi jin û mal bî, nexwe dê di destê jinbira û birayê xwe de şerpeze bibî; bi çavê rojê, bi gora Ehmed û Ebdurehman, bi Xwedê kes xwedaniyê li te nake, tu dê li kolanan bikevî. Kurê min, min navê bêyî ku dawetekê ji bo te bigerînim bimirim. Vê keserê li ser dilê dayika xwe nehêle. Ma me jî ji te pê ve kesê xwe nemaye."

Dilşaya jinbiraya min û mal gelekî ji hev dûr bûbûn, gelek caran diçû, bi hefteyan şûnde vedigeriya. Ew hîn ciwan bû,

temenê wê hingê li dora bist û şeş saliyê hebû. Ne dilê dayika min digirt ku jê re bigota, tu serbest î bizewice; ne jî dilê wê digirt bigota, na, destê me ji te nabe, li gorî edetên me em ê te li Mustefa mahr bikin jî, hema bêje ew li meydanê mabû. Lê dayika min pê nexweş bû ku ji nik wê biçûya, tim jê re digot, "Keça min, bêhna Ehmedê min ji te tê." Dilşa gelekî ji Tajdîn zivêr dibû, ditengijî, gelek caran di ber xwe de digiriya û ji malê diçû. Ji ber ku Tajdîn mayê xwe bi karê her kesî/ê dikir, xwêya hemû giraran bû; çi dibû wî hema demildest ayetek bi ser de dianî.

Me gelek bêriya mela Tajdînê berê kiribû.

Her wiha xwîşkên min ên cêwî tam gihîştibûn, hingê temenê wan nêzî bîstê hebû, tam di kemlana ciwaniya xwe de bûn; xwîna wan dikelijî, wexta gulêna wan hatibû, kê dizanî belkî di dilê wan de bi hezaran hêviyên evîneke sade hebûn. Lê ew keçikên gundî bûn, wekî masiyê li ber pêlên har ên behrê bikeve û xwe li qeraxeke dêm bibîne, ew jî wisa di rûnê xwe de diqeliyan. Kurên bajarî bi wan qayil nedibûn, tenê ew ji bo ganekê diviyan. Helbet wan jî dixwest ku mêrekî qenc bê û jiyana xwe bi wan re dabîn bike. Ew cêwî bûn, xweşik jî bûn, bejnên her duyan darêtî bûn, sing û berê wan gir, porê wan boz, lêv û kepiyê wan lihevhatî, çavên wan reş î xezalî… Feqîr bûn, lewma cilên kevn ên ji ber xelkê mane ancax dikaribûn li xwe bikirana, lê dilê her duyan jî pak û paqij bû, hestên wan germ û her du jî birçiyê evînekê bûn. Lewma jî bi hêsanî dikarîn bihatana xapandin. Dayika min her dem digot, "Feqîrî jeng e" em, wekî malbateke karesatdîtî di nava vê jenga feqîriyê de digeviziyan.

Her wiha xwîşka min Ronahî hê jî diçû HÎSAŞ'ê û Bînahiyê heta hingê gelek mal guhartibûn lê navmaliya wê hê jî dewam dikir. Şekl û şemala wê gelekî guherîbû, ew li ber bayê bajarvaniyê ketibû, lê li nik wê ew kultura jiyana bajaran tune

bû, lewma jî karakterên bajarî baş nedinasîn. Asoya wê ya herî mezin, modela mêrî, zilamê ku li nav mala wan dixebitî bû, jin jî jina wî; lewma jî, rojekê mêrê ku ew li nav mala wan dima çûbû tewara wê û wê jî xwe bi destê wî ve berdabû û piştî çendekê her kesî/ê digot ku Bînahiya Kewserê ducanî bûye. Piştî heyamekê jî jina malê pê hesiyabû, hingê demildest xwîşka min pêneqûn kiribû û ji mala xwe piştder kiribû û avêtibû ber derî. Mêrê wê jî piştî ku xwîşka min kirêtkiribû henekên xwe pê kiribûn û jê re gotibû, "Ganeke xweş bû, çawa be rojekê te dê xwe bida gayîn, ma çi xirabî tê de heye, me her duyan jî têra xwe tam jê wergirt." Piştî vê şikestina yekem xwîşka min bi temamî dest ji xwe berdabû û her wekî tola xwe ji jiyanê bistîne, wisa bûbû qehpika bin xelkî. Lê ji bilî me her kesî/ê ev yek dizanî. Helbet rastî ne mimkûn bû bihata veşartin, ew dişibiya gûyê bin befirê, te çi bikira te nedikarî wî stare bikî.

Rûreşiyê bi hemû bêmirwetiya xwe bi ser mala me de digirt.

*

Rojeke xweş a biharê bû, wê rojê ez neçûbûm gelî, dilê min bi cotkî lêdida, ez ê piştî çend saetan biçûma nik Bîşengê û min dil hebû ku devê tûrikê dilê xwe jê re vekira. Ez pir bi heyecan bûm. Danê berêvarî bû, tîrêjên rojê yên tînde li ser Culemêrgê dibişirîn. Joriya çiyayan gişt belekiyên befirê bûn, darên spîndaran ku dîmena bajêr giş ji wan dixemilî, kemilîbûn. Çivîkan li ser spîndarên biçûk ên sê çar salî ku me li ber deriyê xwe çandibûn, dikire çîkeçîk. Li tenûra ber deriyê me, çend jinên taxê hebûn ku nanê xwe dipatin, yekê mezirge di destî de bû girikên hevîrî li tenûra şariyayî dida, yeke dîtir jî girik li ser şikevê çêdikirin, çend jinên din ên li dora wan jî, bi talî ji hev re gazin dikirin. Çend zarokên biçûk ên bêserober jî li dora wan nehewî dikirin.

Wê gavê li ser şaneşînê me çay vedixwar, aqilê min li ser

Bîşengê bû, dayika min bêdeng rûniştibû; Rojbîn û Rondik li tenişta min rûniştibûn, ji min re bi kurmanciya hekariyê ya nazik diaxivîn. Wê kêlîka ku Bînahî ji derê şaneşînê kete hundir her tişt qewimî. Cilekî peyazî li ser Bînahiyê bû, porê xwe yê dirêj berdabû ser milên xwe û rûj li lêvên xwe dabûn bes lê nehatibû.

Dayika min rabû, ber bi Bînahiyê ve çû, keziyên wê girtin û çavên xwe miçiqandin û devê xwe vekir, ew bi dû xwe li erdê rakişand û got: "Keçê dêlika dardevî, ka bêje ez çi bi te bikim, te bi kîjan diranan bikirînim, bi kîjan sêpê ve te bigurim; ez ê bizotên hemû dinyayê li quzê te biheşînim, kîrê ker û berazan li te biheşînim, keçê qehpika bin xelkî, tu bi kîjan rûyî ve têyî malê, keçê dêlegurê, te çi siyanet bo me nehêla, te hetik û ara me bire guliyên daran; vêca bêje, ez te bi kîjan kêra nebir a ko ser jê bikim, ez ê bizotê bi agir li himbana te biheşînim; hey stûşikestiyê, hey porkurê, hey nemayê, hey fêşika berazan; sond dixwim, ez te li ser vê dinê sax nahêlim. Dêlika quzdiriyayî te em li nav alemê rûreş kirin, te hetika me bir, ma ji îro pê ve em dê çawa derkevin nav xelkî, em dê çawa serê xwe li ber tanên alemê rakin? Ma te çi heq li ser me hebû, te em wiha rezîl û şermezar kirin, te namûsa me li bin piyên bênamûsan perçiqand, hey bênamûsa bêşeref!..." Hingê zarokên biçûk ji wê de, bêyî ku bizanibin ka çi diqewime dikirin qîrîn û digotin, "Bînahiyê Bînê, ker bikin qûnê!"

Hingê jinên ser tenûrê bi bayê bezê gihîştibûn hawara xwîşka min, Rojbîn û Rondik li nik min behitîbûn, Bînahî li erdê, dev û difna wê tijî xwîn bû, jinên cîranan milên dayika min zeft kiribûn, ew haş dikirin, dijûnên dayika min li ser taxê deng vedidan.

Mirovî li bajaran haysiyeta xwe ji dest dida, evîn li nav striyên rûreşiyê di dilê min ê birîndar de diêşiya.

****

# Dîmena şeşemîn “hetikberî”

*Rûbarê xeman*
*Maka kul û kovanan*

Piştî heft heşt deqeyên dî ez ê ber bi otogarê ve biçûma û min ê ne bi dilekî, bi sed bêdiliyê berê xwe bida kevnewarê xwe û her weha xwe bavêta nav pêl û sîpelên rûbarê xeman û bigota, “Kê der zirav e bila ji wê derê re bibizde” û min ê xwe tê wer kira.

***

Payîz bû. Meha îlonê bi hemû spehîtiya xwe mirov hembêz dikir. Hewa ne gelekî sar bû, ne jî ew kelegerma fetisok a havînê mabû. Zeratiya pelex û pûşê behiyayî rengê xwe dabû çiya û baniyan. Fêkî gişt gihîştibûn û mirov di îlonê de têrotijî dibû.

Payîza zû bû. Wan rojan ez bi danperan re rojê du sê seferan diçûm geliyê Culemêrgê û me xîz bar dikir. Her serê seferê pênc milyon lîreyê tirkî didan me. Roja me dikir panzde lîra, vê jî têra gelek pêdiviyên me dikir.

Payîz bû. Ez her êvarê piştî sefera sêyem, piştî ew qas west û mandîbûnê -min dem ji xwe re veder dikir- û diçûm nik

Bîşengê. Çi gava min ew didît, ez çav bi wê diketim ji bîra min diçûn hemû kul û kovanên malê. Ne xirecirên nav malê, ne rûreşiya malbatî ku Bînahî ducanî bûbû, ne jî westiyana min li bîra min dima, hema bi dîtina Bîşengê, bi çavpêketina wî rûyê spehî, wî kenê mexrûr, wî bejn û bala narîn asûdehiyeke bêpayan ruhê min vedigeşand.

Rojên min hema bêje giş wek hev derbas dibûn; ez her roj di heman vedorên jiyanê de, li heman labîrentan diziviriyam; hemû west û bêtabiya min bi dîtina du çavên tijîjîn bi dawî dibû.

Êvar bû. Ji mêj ve reşetariyê kirasê xwe li xwe kiribû û bajarê navçiya vegirtibû. Êvarên vî bajarî her tim bisehm bûn. Aha wê êvara zû, ez, Mustefayê rêncber, bi dilekî geş, bi gavên hêmin ber bi mala me ve dimeşiyam. Li kendalê taxa Kanîkewkan bi ser diketim. Çend jin û mêrên navsere tevî zarokên xwe bi piştî ve, di ber min re diborîn û bi kendalî hildikişiyan û ber bi malên xwe ve diçûn. Hingê çend rêzikên ku şeva berê min ji ajandaya Ehmedê canemerg jiber kiribûn, min ew di ber xwe de dubare dikirin û di ber re jî lê difikirîm, “Gelo Ehmed çawa kariye tercûmaniya gizîn û kizîna dilê min kiriye? Gelo Gulhezar kî bûye, erê, çavên Dilşayê reş bûn, heye ku ew bi xwe be.” Wî wiha li ajandayê nivîsandibû:

**“***Gulhezar, hezar reng gul vedibin di reşika çavên te de.*

*Ax Gulhezar, çi gava ez çav bi te dikevim*

*Ji bîr dikim hemû kulên xwe…”*

Payîz bû. Êvar bû, wekî her kesî/ê ez jî ber bi mala xwe ve diçûm. Wekî her roj. Piyên min gewdeyê min ê westiyayî gihandibû malê; dergehê ku ber bi şaneşînê ve vedibû, dergehekî kevn ê ji depan bû, ez hêdîka di dergehî re ketim hundir, ronahiya şaneşînê vemirî bû, min jî pêlavên xwe êxistin, wê gavê îskên girî bi guhên min ketin. Sîberek li wir bû; min

piçekî dî bala xwe dayê ku Bînahî ye, digiriya. Hingê ji hundir dengê jinbiraya min Dilşa û dayika min dihat, dayika min digot, "Bila ew bindiriyayî neyê pêş çavên min, bila ew bîjîavêjk nekeve vê malê, nanê wê jî heram e; bila ew qehpik li pêş çavên min nekeve!…" Dilşayê jî bi dengekî sakîn û nizim, bi zarekî nerm li dayika min vedigerand, "Dayika Kewser, tiştê bihurî borî ye, li dû neçe, çi bibe jî ew her keça te ye; ma çi gunehê wê hebû, ew sebavê xelkî çûye tewarê, ma wê çi dizanî; wê her kes wekî xwe saf û pak dizanî, ew hêj nû ji gundî hatibû, hînî bajêr nebûbû; wisa bi keça xwe neke." Lê her ku Dilşayê wisa digot dayika min bêhtir tal dibû û her ku diçû dengê xwe bilindtir dikir, diqîriya, "Nexêr, ew bîjîavêjk keça min nîn e, ez şîrê xwe lê helal nakim, bila gerdena wê asê bibe! Wê çi hetik û ar ji me re nehiştin, wê em fihêt kirin, bila ew çaşnîker neyê pêş çavên min…Ewê dêlikê ez kuştiiiiim! Hawaaar bêlome, ya rebî, tu neyne serê dar û beran jî, ya rebî, tu şîrheraman, quzdiriyayiyan berhingarî gurên çiyayan jî neke!..."

Ez behitîbûm. Li ser piyên xwe rawestiyabûm û çavên min bi kûrbînî ketibûn ser Bînahiyê; xwîşka min a cêwî, bi tena serê xwe, li ser şaneşînê di bin dengê dayika min û Dilşayê de, serçemiyayî, porqijbûyî wekî taviya baranê digiriya.

Çavên min man li ser wê. Kuleke tal li qirika min asê bû; min kir ku tifa xwe daqurtînim lê tif di devê min de ziwa bûbû. Hingê qehbetiya di ruhê me hemûyan de hate bîra min; a rastîn, em hemû qehpik bûn. Ya rastîn, qehbikî li çarenûsa me hemûyan risiyabû. Ew Mustefayê di hundirê min de, gava ez dihizirîm gelekî ji Bînahiyê qehbetir bû. Wê xwe bi zilamekî jixwemestir dabû gayîn, lê wê ne ji bo ganê xwe dabû gayîn, wê hez kiribû; çimkî hezkirina yekem a keçan ji evîniya wan a pak bû, wê dilê xwe jê re vekiribû, bes wî teresbavî tenê ji navrana wê hez kiribû. Xwîşka min, bi dilekî paqij xwe berdabû nava dilê gelek xewn û xeyalên germ, wê wisa bawer kiribû ku ew ê ji vê jiyana ku ew xwe layiqê wê nabîne û ji ber şerekî ku

qet haya wê jê nîn e têketiyê, rizgar bûya.

Wê êvara payîzê ya li ser şaneşîna me ji min re bûye jehr, Bînahiya xwîşka min ku wê rojê çûbû kurtaj bûbû û zarokê xwe ji ber xwe biribû, lewma jî dayika min ew li ber derî hiştibû, li ser şaneşînê bi her du çavan xwîn digiriya. Ronahî carina heta nav derî dihat, çav bi wê dikir û ji ber tirsa dayika min ji nişkê ve wekî tûselê ku tûşî aloziyekê tê, ji nişka ve serê xwe dixe nav qebûşkê xwe, wê jî wisa serê xwe dixist hundir û wê roja tengav nediwêriya li nik cêwiya xwe mabûya.

Ez hê jî li ser şaneşînê reqbûyî, çavên min li ser Bînahiyê heçko bixwazim biçim destê wê bigirim û wê teselî bikim, hişê min jî di nav pêlên cuda cuda de serobin dibû: Ji aliyekî ve hişê min ez dibirim gelek salan berê, kuştina bavê min dîsa û dîsa dî di hişê min de nû dibû û ji hingê ve qehbetiya jiyanê rûberî me dibû; ji aliyekî ve jî hişê min li çirûska hêviya min, li Bîşengê digeriya û min dixwest ji her tiştî ber bi wê ve birevim da ku hemû kulên min bikewin; her wiha ji aliyekî dîtir ve jî, hişê min ez dibirim ser cotgorên Ehmed û bavê min û min wisa bawer dikir ku heke îro ew sax bûna belkî em tûşî van rûreşiyan nebûna.

*

Hêj berî çend deqeyan ez li nik Bîşengê bûm û her tişt xweş bû. Jiyan hebû û di wan kêlîkên jiyanê de rûyê geş ê jiyanê li min dikeniya.

Serê payîzê bû. Rojeke ne germ, ne jî sar a payîzê bû; tê bîra min ku wê rojê betlane bû, lê an şemî bû an jî yekşemî baş nayê hizra min; wê rojê, piştî sefera sêyem, piştî ku ez çûm malê, min cilên şolî guhartin û bi ava tezî serê xwe şûşt; min cilên xwe yên keşxwehiyê li xwe kiribûn û ez bi heyecaneke germ ber bi mala Bîşengê ve çûbûm. Min ew li ber derî dîtibû; dîsa ji bilî wê kes li malê nebû. Cilekî reng-geş lê bû, porê xwe

bi patikê girêdabû, lê çend dav şor bûbûn ser rûyê wê. Pir sade bû; kenekî mexrûr li ser rûyê wê xwe dida der. Li stranên Şivan Perwer guhdarî dikir, dengê stranan bi ser taxa wan de diçû xwarê. Ku ez dîtim got,"Ay Mistê, ca were were.." Piştî bixêrhatin û xoşbêjeke edetî, ez li ser kursîka kevn a li ber deriyê wan rûniştim. Piştre got, "Ca raweste, min girara kutilkan lênaye, îro yên me careke dîtir çûne nik mamê min wan, ez tenê li malê bûm, ez ji te re bînim ca tu dê hez jê bikî?" Min deng nekir, hingê gotineke dayika min ku hêj em li Xanê bûn, wê ji Ehmed re gotibû, hate bîra min; dayika min gotibû, "Kurê min, dibêjin; avê bînin ji kaniyan, jinan bînin ji esliyan", hingê Ehmed bi henekî lê vegerandibû, "Dadê, erê rast e, lê em ê çawa bizanibin ka kîjan jin eslî ye, kîjan jî bêesl e?" Wê demê dayika min gotibû, "Lawê min, xisletên esliyan ji dûr ve kifş in; li xwarina wan binêre; xwarina bi destê jinên eslî siviktir e, çi bilênin jî, tamsivik e, lê xwarina bi destê jinên bêesil tamgiran e."

Xwarina bi destê şengebiya hewda dilê min bi rastî jî gelekî xweş bû. Piştî xwarinê, ji bo ku biçe çaya ku dema çûbû xwarinê danîbû ser venêre, kete hundir, piştî çend deqeyan bi çaydank û peyale ve derket û hate nik min; me bi hev re çay vedixwar. Hingê li rûyê min nihêrî, bişirîneke germ bû mêvanê rûyê wê, paşê got, "Mistê, tu zanî, kasêteke nû ya Şivanî derketiye." Hingê min xweziya xwe bi hindê anî ku min ew kasêt jê re diyarî bikira, lê ez qet hînî tiştên orjînal nebûm. Her tiştê min herî kêm destê sêyem bû, kasêt her dem min ji ber radikirin, cil û pêlav jî hin ji xêr û xêratan ji me re dihatin, hin jî me ji nik etaran dikirîn.

Erê, ez bibiryar bûm, min ê ji Bîşenga ber dilê xwe re, yara xwe ya ku min çu carê ya ber dilê xwe jê re negotibû, ew kasêt bikiriya.

***

Erê neynika min, jiyan li min bûbû jehr; pirs û pirsgirêkên mala me qet kêm nedibûn, hema heçko hinekan nifir li me kiribe, mala me wisa bûbû lîsê hemû kulan. Hingê piştî ku Dilşayê Bînahî bire hundir, min dîsa bi çavên tijî rondik hawara xwe gihand ajandaya Ehmed, erê neynika min, ca binêre wî jehr û ketina bi jehrê çend xweşkok vegotiye:

*"Dil ji bo 'te' evîn pîr kirin*
*Min pîva, min şêla*
*Min êş li bêndera dil kirin*
*Dil gêra, dil hêra,*
*Dil bo 'te' evîn pîr kirin*

*Ez ji te direviyam û min xwe disparte 'te'ya nava dilê xwe. Hingê tu ji min dûr dibûyî lê her wiha di nava dilê min de jî xwecih dibûyî. Te jehr berdida nava dilê min. Ew awirên te yên ji kîn û hêrsa jiyanê têkçûyî li dilê min digeziya. Wekî dûpişkekê. Hingê dilop bi dilop dilê min ji jehra te vedixwar. Min nedikarî te ji bîra xwe birenim; bîrdanka min bi te hatibû dagirkirin. Dilê min bi jehra te avis dibû hêdî hêdî. Te tovê jehrê li nava dilê min çandibû. Ez roj bi roj diheliyam. Wekî berfa tavê lêdayî. Li keviya dilê min ji axîn û kovanan kulîlkên jehrîn serê xwe radikir. Gotin bi jehrê vedireşiyan ji devê min û jehr şîn dibû li nav dilistana min.*

*Hingê ez direviyam ji jehra te û ji 'te' ber bi te ve direviyam. Ber bi 'te'ya nava dilê xwe ve… Ber bi 'te' ya xwe ve… 'Tu'ya min gelekî ji 'tu'ya 'te' cudatir bû. Ez ber bi wê 'tu'yê ve diçûm. Ew, welatê min ê herî hêmin bû. Ewle bû. Bagerên dilê min li wir lûsiyan. Agirên gur li wir vedimiriyan. Ez li wir, li nik 'te'ya di nava dilê min de tovreşandî aram û asûde dibûm. Ez bi jehra evîna te aram û tena dibûm. Dihewiyam. Min ji jehra evîna te dilê xwe têr dikir. Wê, têhniya dilê xwe dişikand. Tovê jehra te li dilistana min rehên xwe dadihêlan û dilê min pê diwerimî. Bi jehrê diket. Lê jehra te her ku xwe berî reh û rêçikên dilistana min dida, ruhê min bêhtir şa dibû. Jehra te ya ji bêbextiya jiyanê barbûyî, li nava dilê min êş mezin dikirin. Êş mêjot dikirin. Dilê min*

*ê tî û damayî ji memikên jehrê zikê xwe diwerimand û sîbereke spîtale rengê xwe dida bergehên jiyana min. Êdî min her tişt li pişt wê spîtaleyê bi rengê jehrê didît. Her tam û tîn jî bi êş û jana wê seh dikir.*

*Dil bi jehra te evîn kuştin. Evîn beyirandin. Evîn pîr kirin. Evîn ji bîr kirin. Dil bi jehra te 'xwe' ji bîr kir, tûvil avêt û rengê 'xwe' ji xwe kir. Dil bi rengê te xwe pêça. Bi jehra te avis bû, lê tu caran bi evîna -bêevîniya- te neza. Dil ji te revî û xwe sparte min, ez ji dil revîm û min xwe sparte 'te'ya di nava dilê xwe de. Te ez jehr dam. Te kula jiyanê li dilê min siwar kir û dilop bi dilop jehra xwe li nava dilê min belav kir. Ez bi evîna te gêj bûm; min qet hay ji xwe nema û ez ji xwe geriyam. Min ji xwe bêhtir, ji te bawer kir; rastiyan çavên min vemaliştin, lê min çavên xwe ji rastiyan badan û berî jehra te dan. Evîna te ez kor kirim. Evîna –bêevîniya- te ez xapandin. Hingê dil bi jehra te gêj bûbû. Te pişta xwe da min. Te jehra xwe berda nav dilê min. Te dilê xwe bi jehra jiyanê bar kiribû; te ew jehr anî, weriband, kire tîr, da ber kevanê gotinan û berî dilê min da. Tîr lê çikilî. Ji ber ku dilê min xav bû. Ji ber ku dilê min bêwar bû. Ji ber ku dilê min tî bû, av diviya. Dilê min birçiyê evîneke saf bû, hezkirin diviya. Lewma bi te xapiya. Bi jehrê ket û naliya. Êşiya. Kul bû. Geviziya… Te dilê min da ber 'tîrên jehrê' û tovê tirsê te li nava dilistana min çand. Wisa, ez ji xwe ditirsiyam. Ez ji xwe direviyam û min xwe sparte 'te'ya ku min bi evîna xwe ya kovî vaftîzkirî, bi hestên xwe yên bêguneh mêjotkirî, bi xweziyên xwe yên zarokane pîrozkirî…*

*Ez bi jehra te gevizîm bi şev û rojan. Çi gava min çavên xwe danîn ser hev, jehra te êş berdan nava dilê min. Ez gelek li jehrkujan geriyam; min ji çavên xezalan ava jiyanê vexwar, nebû. Min kulên xwe bi awazên bilbilan nivandin, nebû. Min ji xunava ser pelên gulan şerbet noşî, dîsa nebû. Min ji kerbê xwîna xwe vexwar, careke din nebû. Ez careke din ji 'te' ber bi 'te'ya li dilistana xwe ve reviyam lê negihîştimê. Her ku nêzî te bûm, ji te dûr ketim. Piyên min giran bûn; jehra te ruhê min pêça û ez li cihê xwe perpitîm.*

*Perpitîm… Şev û roj wekî tirşebayekî lerzok di ser min re hatin*

*û çûn. Jehr li hemû laşê min geziya. Dilê min pê werimî. Kulekê li nava dilê min zîl da; gewde bû û bû pitikeke (sava) bê dest û pê, bê ser û çav. Ez bi bîjiyê kulan avis ketim. Bîjiyekî bê dayik û bê bav… Bîjiyekî jande yê ku her roj parçeyek ji gewdeyê min dimêt. Her roj çinîkek ji goştê min vedirot. Hestiyê min dikojî. Her roj mistek ji xwîna min vedixwarç Her roj di nava dilê min de hêvî û xweziyeke zaroktiyê ji min dikuşt. Ew bîjiyê evîna te bû. Ew bîjiyê revaneya te bû. Tu gunehê herî mezin ê demên min ên bêdem… Tu tirsa herî kirêt a jiyana min a bi jeng… Tu jeng û jehra ciwaniya umrê min ê têrnedîtî… Tu xirabiya herî mezin a heyamên min ên ji evîneke saf û pak bawerkirî…(yî)*

*Peritîm. Ji hêrandina kulan peritî dilê min. Ji şêlandina xeman… Ji pîvandina keseran… Ji gêrandina êşan… Hêvî û xweziyên min ên feqîr û stûxwar wekî gulnixwîneke (şilêr) bi jehra xwe giriyan. Di giriya xwe de di xew re çûn û di kela xwe de pijiyan. Dil li ser pel û bizotên keseran hate biraştin. Kizirî. Di xweliya xwe de xewinîn hemû hêviyên min ên pêpeskirî. Jehra te ez pûç kirim. Wekî pûşê behiyayî liba kirim û li coxîna jiyanê raxistim; hingê te ez li bin sim û nalên ker û hespên serberdayî pelixandim.*

*Wê demê li keviya terazina dilê min çûçikên beytik dest bi germkirina ava şowarê kiribûn jî. Ji ber ku îşev ji nava stêrkan dê stêrkeke dîtir jî birijiya. Lewma ewran qet xwe ji rûyê asîman vedikêşa… -Ma tu nabêjî qey ew barana bêwerz bêsedem dibariya? Belkî jî, da ku peritiyê ji jehra evîneke bêsiûd di agirê xwe de neşewite. Qet nebe, da ku koma hestiyan li bin kêlekê bên çalkirin, qet nebe; belkî rojekê rêwîngeke xêrxwaz bêt û axa gorê vepê. Hingê ez ê van rêzikan vereşînim ji jehra te:*

*"Rûbarên xeman diherikîn li ser dilistana min*
*Rûpelên dîrokê xwe vedikêşan ji ber pênûsê*
*Zeman ziwade bû li ber hilavêtina dilê min*
*Tu diçûyî û vedigirt kêliya gora min xwîsê*

*Çîroka agirê bêdû dihat gotin li ser tenûrê*

*Gava ku xewn û xeyalên me tev dibûn bizotên sor*
*Kula hezar salan xwe berdida ser dengê bilûrê*
*Dinaliya li nav xweliya xwe ya sar mirî û gor"*

*Bi gazin bûm. Lê min baş dizanî jî, hemû gazinên min di bêdengiyê de winda dibûn û li min vedigeriyan. Her çend di hundirê min de qiyamet jî radibûn, tenê rondikên min li ser rûyê min hişk dibûn. Ji çirûska çavên min misteke jehrê dibariya. Rondikên min jî bi evîna –bêevîniya- te lewitîbûn û hatibûn jehrdan. Êdî her çend kêliya gora min xwîsê vegirta jî, kesê nedizanî ku ew jehra te berdaye nava dilê min hê jî di hestiyên min de maye û ev jî kelvedana wê ye! Ma dê kîjan biaqilî aqilê xwe bixwara da ku têbigihîje ku kelvedana evîneke kûr di goristanê de jî her û her tîn vedide… Ma ji qestî kulîlkên zer ên jehrîn li dor gora min şînhatî ne? Lewma ez ji te direviyam, min xwe dispart xwe lê li wir jî tu sebata min nebû, ji wir direviyam û îcar min xwe davêt ser bextê 'te'ya di nava dilê xwe de. Li wir dil bi jehra te ditebitî.*

*Te kîna salan li dilê xwe bar kiribû. Tu bi rik û serhişkiya salan a ku te li dilê xwe pengandibû, bi ser dilê min ê pak û paqij de dibariyayî. Hemû êşên jiyanê; bêbextî, bextreşî, serxurî, tev te li awirên xwe nijinandibûn û bi ser min de dihatî xwarê. Wekî dûpişkeke tengav te demildest ew jehr tev berî dilê min dida. Min nizanî ka çi dibe lê jehra te li malzoraka dilê min venûsiyabû û êdî dil bi jehra te avis ketibû.*

*Navê wî bîjî jî kiribû 'êş'.*

**

Ji bextê min ê çê, min wê êvarê li nik Bîşengê şîv xwaribû, nexwe ez jî dê wekî hemû malanên xwe birçî mabûma; wê şevê kesî/ê tiştek nexwar. Wekî mala miriyan, peyvek ji devê kesî/ê derneket.

Payîz bû, hewa ne sar bû, ne jî germ; hingorê şevê piştî ku Tajdîn û jina xwe ketin jûra xwe, dayika min em hemû li xwe kom kirin û got, "Zarokên min ên xweşdivî, werin li

tenişta min birûnin, ez ê îşev ji we re çîrokekê bêjim, eynî wekî berê; da ku hûn hemû bizanibin ka em kî ne û niha bûne çi. Delalên min, bi serê we hemûyan dikim, ji roja ku ev çîrokên me mirin wê rojê em hemû hatin kirêtkirin.” Em hemû, eynî wekî zaroktiyê li çarmedorên dayika min kom bûn û wê dest bi çîroka xwe kir:

Hebû nebû…

*****

# Dîmena heftemîn
# “kevneçîrok”

*Dîmenek ji duhiya me*

*Bêhna çîrokên tahmjiyan*

Piştî şeş heft deqeyên dîtir min ê berê xwe bida otogarê û ji bo careke dî qirêja hestên xwe bi ava çîrokên dayika xwe yên bi wê re ketine hembêza axê jarav bikim û li ber tîrojka evîna Bîşengê ya ku di dilê min de mayî, bibim misteke rondikan.

***

Erê neynika min a rastgo, hemû çîrokên dayika min ên herî dirêj bi gotina ‘Hebû nebû’ dest pê dikirin.

Em hemû li rexûrûyên dayika min bûn, hingê temenê wê gihîştibû şêstê û guliyên wê tev kej bûbûn, destên wê yên bi qermiçik û gîr û xirkên li rûyê wê, daşikestina bejna wê tev govanê pîratiya wê bûn. Rojbîn li hembêza wê li aliyê rastê, Rondik li aliyê çepê bû, Ronahî û Bînahî jî li kêleka rastê, ez û Dilşa li kêleka çepê rûniştibûn, piştî ku dayika min bi baldarî yek bi yek berê xwe da me hemûyan, dest bi çîroka xwe kir.

Hebû nebû…

**

*Şirkak û Kotirk*

*Hebû nebû.... Dibêjin li çiyayekî şirkakek hebû. Rojekê gelekî tengav bû. Ji demsalan zivistan bû. Her der bi ba û bahoz bû. Gerasîska bagerê li wê şirkakê da û bir ew avêt şikeftekê. Lê nihêrî ku kotirkek di şikeftê de ye, şirkakê gotê, ‘Bextê Xwedê tu min xilas bikî, ez mirim,*

*sirê ez birim.” Kotirkê gotê, “Hindî hûn şirkak in hûn heft ziman in. Dûmahîkê tu dê bêbextiyê li gel min bikî, baweriya min bi te nayê ji lew re jî ez te xwedî nakim.” Şirkakê xwe melûl kir, bi kelogirîn lê vegerand, “bextê te me min çu hêlîn nîn in, tu min xwedî bikî nexwe ez ê sirêbirim û bimirim.” Kotirkê li ser têjikên xwe dadabû. Dilê wê bi şirkakê şewitî û gotê, “Were di hêlîna min de bi cih bibe, cihekî têra te jî heye. Lê şirkak erinî û got, “Îla ez ê bikevim bin şamperên te nexwe ez ê bimirim.” Dilê kotirkê careke din bi halê şirkakê şewitî û ew da bin şamperên xwe. Heta roja paştir li wir ma. Dotira rojê kotirkê got, “Şirkak vêca bager jî rawestiyaye êdî tu dikarî biçî.” Lê şirkak erinî û got, “Wa tu çi dibêjî, tu kê ji hêlîna kê derdixî, ez û tu jin û mêrên hev in.” Kotirkê lê vegerand, “Eman û zeman tu çi dibêjî, em kotirk in hûn şirkak in. Teyrê me ne yek e, tu çi dibêjî?” Şirkak li ser ya xwe rawestiya, erinî û lê zêde kir, “Ne, bi Xwedê tu jina min î kotirk. Ez ketî me, di nav bagerê gevizîme, çeng û baskên min şikestî ne lewma tu min nahewînî.”*

*Dûmahiya dûmahiyê çûne nik kundê dadger da ku ew doza wan safî bike. Hemû meseleya xwe bo kundê dadger got, careke dîtir li wê derê jî berî hev ketin. Hingê kotirkê got, “Bila şirkak berê biaxive.” Hingê şirkakê got, “Tu min dibînî, tûzê min dibînî ez çi lê hatime. Li kotirkê binêre ew çi xweşik e lê ez li ber babelîskê ketime, per û baskên min şikestî ne vêca niha dibêje qet here ez te nas nakim, nêzî min nebe.” Kundê dadger berê xwe da kotirkê û got, “Kotirkê de rabe li gel mêrê xwe here.” Hingê kotirkê lê vegerand, “Qazî, ma ne divê tu pirsiyara min jî bikî. Wisa hema bi gotina wî tenê çênabe. Her carekê em ji heman celebê teyran nîn in. Pa ez ê çawa bi şirkakê re bizewicim?” Hingê şirkakê got, “Carekê dewarek sekitî bû li deverekê, hemû teyrên deroberê li kelaxê dewarê kom bûbûn, tu ketiye bin dest û piyên wan, hingê te hawar xwestibû û te gotibû ‘kî min rizgar bike ez ê şû wî bikim’ her wisa min tu ji bin dest û piyan derxistî û te jî şû min kir.” Hingê kotirkê berê xwe da kundê dadgêr û got, “Aha Qazî de li derewa wî binihêre, hindî em kotirk in xwarina me dexil e, genim e û tiştê wisa ye her carekê em goştî naxwin. Em ne goştxur in, pa çi şixulê min li ser kelax û melaxan heye?” Hingê şirkakê dewam kir got, “Heke tu bawer nekî, ez ê ji te re çîrokeke jinan bêjim da ku tu bawer bikî, bi rastî bextê jinan çu nîn e Qazî!”*

*Çîroka şirkakê wisa bû, "Li cihekî miroveki feqîr hebû. Xwedanê du biçûkan bû. Karê wî darvanî bû, her roj spêdê werîsê xwe hildigirt diçû daristanê dar dibirîn û ew tanîn difirotin û pê debara zarokên xwe dikir. Rojekê, carekê ji nav caran, çûçikek dît, di ber xwe de got, 'Ez ê vê çûçikê bi xwe re bibim da ku zarokeke min pê kêfxweş bibe.' Hingê çûçik bi zar hat û bi darvanî re axift û gotê, 'Tu min azad bike, berde, sê têjikên min hene niha li benda min in û zikê wan birçî ye. Heke tu min berdî ez ê sibê ji bo te berik û dendikekê bînim û deynim ser vî kevirî, here wê ji xwe re bibe dê heta dawiya umrê te jiyara te pê bêt." Di ber re şirkakê got, "Vêca Qazî bextê jinan ev e." Wê demê kotirkê lê vegerand û got, "Jin hemû jin nîn in, hindî jin in hin ciwan in, hin melhemên birînan in, hin jî kuromên kuroran in." Her wiha şirkakê çîroka xwe berdewam kir û got, "Roja paştir darvan vegeriya cihê ku çûçikê bo wî gotibû. Dît ku her wekî çûçikê bo gotiye berik jê re aniye, hingê hate bîrê ku roja berê çûçikê jê re gotibû, 'gava ku tu wê dibî bibe li nava baxçeyê xwe biçîne, bila li nêzî dîwarî nebe û rexên wê jî bi teraşan zeft bike.' Wî jî berik anî û teraş jî pê re anîn û li nava hewşa xwe çand. Dotira rojê çawa ji xewê hişyar bû dît ku ew berik bûye dareke mezin û bi ser hemû darên din ketiye. Fêkiyekî biçûk î gilover bi serê darê ve hatibû. Wî jê vekir û bir sûkê. Herçî kesê lê rast hat jê re got, 'Ev çi ye? Kî dê vî tiştê ku kes nizane ka çi ye bikire?' Her wiha gelek geriya û westiya hingê tam dê jê geriyaba cihûyek rastî wî hat û got, 'Bide ez ê bikirim, ez ê berdêla wan jî sed zêran bidim te.' Hingê ji darvan ve ku cihû xwe pê dikene, lê cihû ew fêkî dinasî. Bi heyretmayî li cihûî nihêrî û got, 'Çi sed zêr...' Cihû lê vegerand, 'Heke ne qayil bî dê dused zêran bidim te... sêsedan' Wî jî hema got, 'kerem ke' û ew fêkiyê nenas firote cihû û bi wan sêsed zêran jî tijî goşt, fêkî, mêwe û cil û berg ji zarokên xwe re kirîn û vegeriya mala xwe. Hingê cihû gotê, 'Te çend ji van hebin her roj ji min re bîne ez ê her roj liba wê bi sêsed zêran ji te bikirim.' Dotira rojê lê nihêrî ku bi tayekî din ê darê ve du lib çêbûne, ew jî birin dane cihû û şeşsed zêrên xwe hilgirtin. Dûmahîkê wê darê şeş ta dan, her tayekê du ji wî fêkiyê nenas pêve dihat. Her roj dibir ew didan cihû û zêrên xwe distandin. Ji bilî cihû kesî/ê nedizanî ka ew çi tişt in. Rojekê cihû gotê, 'Ez dizanim ka tu van ji ku tînî. Ez dizanim ew dar ji çi*

*çêbûye; ez û tu şertî bigirin?' Wî got, 'baş e' lê belê hindî ew cihû li derdorê geriya, hindî pirsiyar kir nezanî ka ew dar ji çi çêbûye. Dûmahîkê cihû çû ji jina feqîrî (darvanî) pirsî, lê jina wî got, 'Weleh ez jî nizanim mêrê min negotiye min. Ya ez dizanim hema rojekê berikek çandibû û dotira rojê ew berik bû dar û ev tişt pêve çêbûn.' Cihû dest bi raçandina tevna bêbextiyê kir û roja paştir hat gote jina darvanî, 'Mêrê te ji te hez nake, heke hez kiribûya dê ji te re bigota ka ev berik ji ku aniye. Na na, ew ê ji xwe re jineke din bîne. Ya baş ew e ku tu ji mêrê xwe bipirsî. Hingê tu yê bizanibî ka bi rastî jî ji te hez dike anana.' Hingê jina darvanî gelek bi ser wî de hat û wî jî got, 'Wele çûçikekê berikek dabû min piştî ku min ew anî çand ev tişt pêve çêbûn.' Hingê cihû çû gote darvanî, 'Heke min sir û raza wê darê zanî tu yê darê bidî min lê heke min nezanî ez ê hemû malê xwe bidim te.' Piştî çend rojan ku cihû li dora darvanî zivirî û hemû malê xwe da wî, paşê rojekê got, 'Çûçikekê daye te.' û hemû mesele her wekî jina darvanî bo gotibû wî jî bo darvanî vegot. Şert cihû qazanc kir, lê gote darvanî ji ser mala xwe ranebe. Rojekê cihû çû nik jina darvanî û jê re got, 'Em bi hev re mêrê te bikujin. Kelaxê wî jî li nav hewşê veşêrin da ku kes pê nizanibe.' Her weha jina wî û cihû pêkve feqîr kuştin û dûre cihû li ser mala wî rûnişt.*

*Darvanî du zarok hebûn, rojekê hatin ji dayika xwe pirsiyara bavê xwe kirin. Ji cîranan jî pirsiyar kirin. Lê kesî/ê nezanî û kesî/ê bavê wan nîşanî wan neda ji ber ku kesî/ê nezanî ka çi bi serê wî hatiye. Heke rojekê, hefteyekê, heke heyvekê bavê wan çû... Rojekê cihû gote jina xwe, 'Em biçin teyrê dewletê bidizin, bînin serjê bikin û goştê wî bixwin, piştre em ê bibin serkêşên vî bajarî. Ez bibim padîşah û tu jî sultan.' Rojekê her du kurên darvanî zû vegeriyabûn malê, yê mezin piçekî fahma bû, li pişt derî guhê xwe didê ku cihû ji jina xwe re wiha dibêje, 'Kurên te dê mezin bibin û dê pê bihesin ku me bavê wan kuştiye hema her ji niha ve em wan bikujin û li nik bavê wan veşêrin.' Hingê birayê mezin ji birayê xwe yê biçûk re mesele vegot, hingê lê nihêrt ku goştê teyrî kelandiye û daniye ser kulekê, pencere jî vekirî ye. Destê xwe avêt goştî hingê serik, dil û mêlak ketin destî; hindî serik û mêlak bû da birayê xwe yê biçûk û wî ew xwarin, lê wî dil di nava patekê de veşart û kir berîka xwe. Ji wê rojê pêve hindî ku spêdê hişyar dibû didît ku sed zêr li pişt serî ne. Lê eve bo kesî/ê negot.*

*Piştre ew her du bira bi dizî ji malê derketin û ew bajêr li pey xwe hiştin û gihîştin bajarekî din. Li deriyê malekê dan, xwediya malê derî vekir. Pîrejinek bû û ew bi tenê dijiya. Pirsiyara wan kir, wan jî got, 'Em bêkes in.' Hingê kêfa pîrejinê gelek hat û got, 'Xwedê hûn bo min birêkirine ez jî bêzarok im, ez bibim dayika we hûn jî zarokên min.' Pîrejinê bi salan ew li nik xwe bêdudilî heçko zarokên wê yên resen bin xwedî kirin. Heta ku rojekê padîşahê welatê wan dimire. Ji bo ku padîşahê xwe yê nû hilbijêrin hemû ciwanên welêt li meydana paytextê welatê wan kom dibin. Vêca dê teyrê dewletê bifirînin teyr li ser serê kê deyne dê wî bo padîşahiyê hilbijêrin. Pîrejin dixwaze ku her du kurên wê jî biçin. Ew jî diçin, çend caran teyr berdidin ew têt li ser serê birayê biçûk radiweste. Ji ber ku wî serê teyrê dewletê xwaribû teyr jî li ser serê wî radiweste. Bi hêre ve bi wêre ve li hev geriyan serkêşên welatî, lê qebûl nekirin ku kurê pîrê bibe serokê welatî, lewma jî pihênek lêdan û ew avêtin derveyî bajêr. Ligel birayê xwe û dayika xwe vedigerin malê, lê teyrê dewletê li dû wan têt li ser banê mala wan radiweste. Sê caran teyr firandin careke din hat ser banê wan. Hingê serkêşên welatî li hev dubir bûn. Hingê çûne pişkê, pişka kurê pîrê ji ya hevrikê wî bêhtir bû. Her wiha ew wekî padîşah hat hilbijartin. Piştî ku birayê mezin bo birayê xwe yê biçûk ku bûye padîşahê welatî jin anî û dûre xatirê xwe jê xwest û berê xwe da wexerê û pişta xwe da felekê."*

*Di ber re şirkakê her digot, "Bextê jinan çu nîn e! Jin bêbext in!" Her weha kotirkê jî lê vedigêrand û digot, "Ka tu derewa xwe bêje, jin jî hemû ew jin nîn in; hindî jin in, hin ciwan in, hin melhemên ser birînan in, hin jî xerîmên kuroran in. Tu dê bibînî bextê jinan!"*

*Şirkakê domand, "Vêca birayê mezin bi dinyayê ket. Gihîşt bajarekî, dît ku li bajarî dikin gazî û dibêjin, 'Dîtinhezar heye kî hezar zêrên xwe razî ne dê bikare biçe pêş!' Wê rojê dor negihîşt wî, ji ber ku rojê ji bo kesekî/ê tenê dor hebû. Dotira rojê wî jî hezar zêrên xwe razandin û çû pêş. Pênc şeş rojan wisa bênavber beriya hemûyan çû pêş. Hingê bala Dîtinhezarê kişand û wê gote xidamên xwe, 'Ka herin wî camêrî bînin pa ew çi tov mêr e her roj tête pêş min.' Gelek kêfa wî jî hat, di ber xwe de got, her roj ji bo ku tenê ez laşê wê ji navtengê jor ve bibînim*

*min hezar zêr didan eve ez ê wê başebaş bibînim.' Û bi bayê lezê çû selal, Dîtinhezarê ew pêşwazî kir û gotê, 'Navê te çi ye?' 'Sertac e' lê vegerand kurê mezin ê pîrê. 'Tu çi kes î?' got Dîtinhezarê, 'Ez jî ebdekî Xwedê me; tu bêje derwêş, ez bêjim evdal' lê vegerand Sertac. Dîtinhezarê pirsiyara zêran jê kir, wî got, 'Min hene, ez heyî me.' Hingê Dîtinhezar şerbetê raberî Sertac dike lê dermanê jihişêxistinê jî di nav wer dike. Sertac vedixwe û pê dikeve. Dîtinhezar lê digere dibîne ku dilê teyrê dewletê di berîka Sertac de ye, demildest wî desteser dike. Sertac jî roja paştir spêdê hişyar dibe dinihêre ku li pişt serê wî tu zêr nîn in, hingê pê dihese ku 'dilê teyrê dewletê' jê hatiye wergirtin.*

*Her weha Sertac piştî vê bêbextiya Dîtinhezarê bêhêvî dimîne û berê xwe dide çol û çiyayan. Êdî ji şiyanê dikeve, li rezekî tirî rast tê. Dikeve nav rezî, di ber xwe de fikirî û got, 'Xwedê bike ku ev rez ê dêwan be da ku bên û belaya min ji dinyayê vekin êdî ez ji giyanê xwe vesiyame.' Dikeve nava rezî dibîne ku sê teşeyên tirî pêve ne; tiriyê zerikî, tiriyê mêwanî û tiriyê reş... Ew jî tilmiskeke tiriyê zerikî vedike û dixwe hingê bû ker. Bû zirezira wî ji wî aliyê rezî beziya aliyê din. Laşê wî bûbû laşê keran lê rewaneyê wî yê mirovan bû. Hingê xwe gihand tiriyê mêwanî, ew xwar bû mirov. Vêca çû yê reş xwar xuriyanek kete laşê wî, xwe bi daran dihusiya, xwe bi beran dihusiya lê xuriyan jê neçû. Careke din tiriyê mêwanî xwar xuriyan ji laşî çû. Hingê di ber xwe de fikirî û got, 'Bi Xwedê divê ez vegerim nik Dîtinhezarê û tola xwe jê bistînim.' Ji wan her sê teşeyên tirî bi xwe re anîn û berê xwe da bajarê Dîtinhezarê. Tijî selikekê tirî kir, di destê xwe de girt û bi nav kolanên bajarî ket. Li wî bajarî tirî tune bû. Çawa Dîtinhezarê ew tirîfiroş dît gazî kir. Piştî ku ket qesra wê Dîtinhezarê pirsiyara tirî jê kir, wî lê vegerand û got, 'Erê, ev tirî yê firotinê ye.' Wî jî tiriyê reş dayê ew ê ku laş pê dixurê. Ligel xwarina tirî xuriyan kete laşê wê, lê tu derman peyda nekirin. Hingê Sertac xwe dike hekîm û li nava bajêr digere, di ber derê qesra Dîtinhezarê re derbas dibe, ew dibînin û wî vedixwînin jûrê. Ew jî berê laşê wê pê dide şûştin, hinek melheman lê dide û paşê tirî pê dide xwarin û Dîtinhezar wê gavê saxlem dibe. Piştî rojan careke din bi heman nexweşiyê dikeve. Li ser vê yekê bavê Dîtinhezarê ku paşayê wî bajarî ye careke dîtir gazî Sertac dike, ew jî diçe nik paşa. Paşa jê re dibêje,*

*'Tu keça min saxlem bikî te çi ji min divê bixwaze.' Lê vê carê tiriyê zerikê didiyê. Gava ku wê ew tirî xwar bû cehşe-mahîneke şîn. Hingê ji paşa re dibêje, li odeya xwe nivistiye divê bi rojan neyê acizkirin. Bes çêbûye.' Hingê paşa daxwaza wî jê dike, ew dibêje, 'Li nav hewrê we cehşe-mahîneke şîn heye ez wê dixwazim.' Paşa di ber xwe de difikire, 'gelo ma me mahîneke wisa heye' lewma dide pirsiyarkirin, seyîs lê dinihêrin ku rast e, hingê ew li cehşe-mahîna xwe siwar dibe û berê xwe dide welatê birayê xwe yê biçûk. Li welatê birayê xwe akincî dibe.*

*Rojekê ji nav rojan birayê wî jê pirsiyar kir û got, 'Bira, ka binihêre te kîjan keç bivê ji me re bêje em ji te re bixwazin.' Sertac lê vegerand û got, 'Ez çu keçan naxwazim, li tewlê cehşe-mahîneke min a şînkewzanî heye wê li min mahr bikin.' Birayê wî lê qîrî û got, 'Ez padîşahê vî welatî me, pa ez ê çawa cehşekê li kekê xwe mahr bikim! Ma tu heywan î!' Birayê wî ew hêla û çû. Du sê caran pahîşah ligel heyeta xwe hat û heman pirsiyar jê kir û wî jî her di daxwaza xwe de rik girt, cara sêyê Qazî gote Pahîşahî, 'Ezbenî, hema bo dilê wî em bibêjin bila ku dilê wî xweş bibe. Ma çi hêstir li mirovan nayên mahrkirin.' Padîşahî bêdilî daxwaza wî qebûl kir û cehşe-mahîn li Sertac mahr kir. Paşê Sertac tiriyê mêwanî da mahînê ew bû mirov û bir malê, bi zêr û zînetan xemiland û qasid birêkirin dû birayê xwe da ku bên daweta wî bigerînin. Hingê padîşah bi heyeta xwe re hatin mala wî, çawa çav bi Dîtinhezarê ketin hemû di cihê xwe de behitîn, bi dûv piştê li erdê ketin. Paşê daweteke binavûdeng ji bo Sertac û Hezardîtinê li dar xist.*

*Piştî rojan, rojekê Sertac ji birayê xwe re got, 'Bavê me cihû kuştiye, em vegerin bajarê xwe û tola bavê xwe vekin.' Bi şev malên xwe bar kirin û berê xwe dan bajarê xwe. Gava ku gihîştin dora bajarî li nav milkê bavê xwe, li cihekî veder ji xwe re qesreke du sê qat ava kirin û tê de rûniştin. Piştî heyamekê navûdengê wan li hemû bajarî belav bû lê kesî/ê nezanî ka ew kurê darvanî ne. Rojekê biryar girtin ku biçin nik mîrê bajêr, piştî ku çûn nik mîr secereya xwe jê re vegot. Û lê zêde kir û got, 'Bavê me cihû kuştiye û cendekê wî jî li nava hewşê veşartiye em dixwazin ku hûn bên pêş û meseleya me safî bikin.' Piştî ku hestiyên bavê wan derxistin bi emrê mîr cihû û dayika xwe dan kuştin û paşê jî*

*malê cihû hemû belavî hejar û belengazên bajarî kir." Li vir çîroka şirkakê jî qediya. Hingê kotirkê got, 'Jin jî hemû jin nîn in, hin jin in, hin jan in, hin melhemên ser birînan in. Vêca dora min e ez çîroka xwe ji we re bêjim.'*

*Çîroka kotirkê dest pê kir, "Wextekê ji nav wextan, li welatekî dûr pîrejinek hebû, wê pîrê kurek hebû, hindî feqîr bû jê re Ehmedkê Pîrê dihate gotin. Ehmedkê Pîrê xulamê mîrê wî bajarî bû. Dayika wî jî navmalî û xidametî dikir, hirî şe dikir, aman dişûştin, berder dimaliştin û bi sed kotekî jiyara xwe dikir. Heke salekê, heke duyan, heke sêyan êdî Ehmedkê Pîrê mezin bûbû. Rojekê gote hevalên xwe, 'Vê hefteyê ez ê dewaran xwedî bikim.' Piştî hefteyekê Mîr diçe pêş dewarên xwe ku hêk li ser piştê radiwestin. Mîr pirsiyara dewaran kir, xulaman got, 'Vê hefteyê Ehmedkê Pîrê xwed kirine.' Mîr got, 'Ji Ehmedkê Pîrê re bibêjin bila dest ji xweykirina dewaran bernede ez ê heskûreke maşê û totikeke kurorî jê re zêde bikim.' Hefteya paştir lê nihêrtin ku dewar êdî ji geriyanê bûn hindî qelew bûbûn. Mîr got, 'Heskûreke din a maşê û kurorekî din lê zêde bikim.' Her weha piştî heyameke dirêj çi salek bît çi du sal rojekê Ehmedkê Pîrê got, 'Weleh êdî qûna min bi maşê hulî bû, ez êdî nikarim, ez ê biçim.' Dayika wî got, 'Ma dê bi ku de biçin, me çi cih nîn in.' 'Dê biçime kuncê babê xwe, heke tu neyê jî li vir bimîne ez diçim.' Li dayika xwe vegerand Ehmed. Dayika wî got, 'De rabe em biçin.' Hingê Ehmed diçe ser kuncê bavê xwe, berikeke diriyayî avête nava xanî, kereke libatî avête ser xwe û li wir bi cih bûn. Rojekê mîr diçe li dewarên xwe dinihêre dibîne ku dewarên wî bêxer û lawaz bûne, hingê mîr pirsiyara Ehmed dike, seyîs dibêjin, 'Çûye mîrê min!' Hingê mîr dibêje, 'Herin jê re bibêjin bila bêt dê heskûreke dîtir a maşê bo zêde bikin.' Ehmed daxwaza mîr qebûl nekir. Hefteya paştir mîr lê dinihêre ku dewarên wî hindî hin jar bûne êdî bi kotekî li ser lingan radiwestin. Mîr careke din ji qasidê xwe re dibêje, 'Bila bêt dê heskûreke dîtir a maşê bo zêde bikin." Di ber re jî kotirk her dibêje, 'Hindî jin in, hin ciwan in, hin melhemên ser birînan in.....'*

*Çîroka kotirkê dewam dike, "Rojekê Ehmedkê Pîrê rûnişte xwarê û got, 'Dayê, ka bavê min çi kar dikir, bo min bêje.' Dayika wî*

*got, 'Bavê te gavanî kiriye.' Hingê Ehmed got, 'Ka ji mehl û cîranan re bêjin ez ê sibê biçim ber garana wan.' Dotira rojê Ehmed garana xwe ajot û heta êvarî lingê sengolekê şikest. Gava ku êvarî vegeriya ji dayika xwe re got, 'Dayê, bavê min gavanî nekiriye bo min karekî dîtir bîne.' Dayika wî got, 'Bavê te şivan bû, şivanî kiriye.' Roja paştir çû ber pezî heta êvarî lingê bizinekê şikest. Êvarî gote dayika xwe, 'Weleh karê bavê min ne şivanî bû.' Hingê bi hêrs bû û gote dayika xwe, 'Bo min rastiyê bêje dayê, ka bavê min çi kar kiriye.' Dayika wî got, 'Weleh bavê te masîvan bû.' Ji xwe re li torekê geriya, çû perava rûbarî û tora xwe avêt avê heta êvarî seviyeke masiyan girtin. Masiyên xwe firotin, duwazdeh zêr pê hatin, şeş zêr li xwe û dayika xwe mezaxtin, şeşên dîtir jî kirin berîka xwe. Heta roja heyniyê, wê rojê ji dayika xwe re got, 'Dayê ez îro neçim, bêhna xwe vedim. Roja heynî ye, roja xêrê ye.' Lê dayika wî bi ya wî nekir û wê rojê jî berê wî da dora çemî. Vê carê tora xwe avêt rûbarî tûselek ketê. Ew jê derxist avêt û çû jortir, dîsa tora xwe avêtê û careke din eynî tûsel (kûso) kete tora wî. Heta êvarê ji bilî tûsel tiştek neket tora wî, hema ji kerba ew hilgirt û bir malê da dayika xwe û got, 'Dayê dê ha, bijenge tûsilê xwe!' Hingê tûsil ji torê derket û kete quleke dîwarî.*

*Roja paştir çawa ji xewê hişyar bûn wan dît ku xaniyê wan hatiye malîn, amanên wan hatine şûştin, xwarin hatiye amadekirin. Ehmed pirsiyara wê yekê ji dayika xwe kir, wê got, 'Weleh keçeke cîranan e hatiye mala me daye hev.' Çend rojan wisa dewam kir, rojekê Ehmed di ber xwe de got, 'Eve her hosa nîn e.' Ehmed nivist lê di xew re neçû, deriyê wî jî kun bû, tê re dît ku peleke wek find û fenerê ji xanî derket hin spehî bû mirovî dil neda lê binêre. Ew hat xanî berhev kir, xwarina wan amade kir û paşê careke din vegeriya nik qapê xwe û wekî tûsile kete nava wî û kete qula xwe. Ehmed di ber xwe de got, 'himmm ev e xanî berhev dike.' Roja paştir dayika wî jî meraq kir û got, 'Ev kî ye vê berheviyê bo me dike?' Ehmed bi dilsarî lê vegerand, 'Ma dê çi ji xwe bikî xem, hema bixwe û binive dayê; eve dana Xwedê ye.' Şeva paştir Ehmed li ber danî, çawa dît ku keçik hat hema demildest ew girt. Wê jî got, 'Ehmed te ez girtim êdî ez venagerim. Navê min Perîxan e, ez keça mîrê ecinan im. Here ser derava ku te ez lê girtibûm, li wir sê caran gazî bike, bibêje Ebdulqadir, ew ê bersiva te bide, jê re bibêje xwîşka te Perîxanê gotiye bila*

*textê min bînin vir.' Ligel tavdana spêdê Pîrê hişyar bû ku di qesrekê de ye, li ser nivînên nerm razaye. Gelekî heyirî, got, 'Bi Xwedê em çûne bihuştê.' Ehmed lê vegerand û got, 'Dayê razê, tu çi dibêjî.' Wê bi rikberî got, 'Rabe rabe, ca lê binihêre welehî em çûne bihuştê.' Dotira rojê mesele safî bû, şahid anîn, ew li hev mahr kirin û daweteke nedîtî bo wan gêra.*

*Rojekê mîrê bajêr careke din qasid şandin dû Ehmed da ku biçe seyîsiyê bike. Lê wî qebûl nekir û got, 'Ji mîr re bêjin, bila ew bête vir çi bixwaze ez raberî wî bikim: Goşt, qelî, fêkî, zêr... Kî maşê dixwaze.' Li ser vê yekê mîr hêrs dibe û dibêje, 'Bila bêt hesabê vê bêcuretiya xwe bide.' Ehmed vê carê çû, mîr jî şert avête ber û gotê, 'Heta sê rojan an tu yê ji bo min tiriyê bihuştê bînî an jî dê serê te bikim gog û pê bilîzim.'' Di ber re kotirkê got, 'Şirkak baş lê binihêre, ma jin hemû jin in, hindî jin in hin ciwan in, hin melhemên ser birînan in.'*

*Kotirkê dewamî çîrokê kir, ''Ehmed êvarî bi xemgînî vegeriya malê. Perîxanê pirsiyara wê yekê jê kir, got, 'Mîr tiriyê bihuştê ji min xwestiye ez ê çi bikim!' Perîxanê bi bişirîn lê vegerand û got, 'Xema nexwe, îro bêhna xwe vede, çawa be sê rojan qewlê te heye, sibê here wê derava ku ez ketibûm tora te, gazî Ebdulqadir bike, jê re bêje ku xwîşka te ûşiyek tiriyê bihuştê xwestiye. Ew ê demildest ji te re bîne.' Ehmed rahişt ûşî ku bibe Perîxanê got, 'Raweste hema tilmiskekê jê re bibe bes e, yê mayî em ê bixwin.' Hemû dîwana mîr bi wî tilmiskî têr bûn, hema herçiyê tiliyek jêdikir yekî din li şûnê şîndihat. Hemû kes gelek heyirîn. Piştî hefteyekê careke dîtir mîr qasidê xwe bi rê kir dû Ehmedî da ku bêt sexbêriya dewarên wan bike. Ew ê heskûreke din a maşê bo zêde bikira. Lê Ehmed vê carê li qasidan heyitand û hema dijûn dan û got, 'Mîr kî ye, bila ew bêt, ew çi bixwaze li ser dinyayê ez ê bidimê.' Vê carê mîr got, 'Heke neyê ez ê wî bikujim.' Hingê Ehmedkê Pîrê diçe û dibêje, 'Mîrê min te xêr e?' Mîr got, 'Heke te heta sê hefteyan Pîra Bilûrvan anî vê derê ku bo min bilûrê bide baş e, heke na, dê çavên te bi leşxuran bidim xwarin.' Ehmed dîsa bi xemgîn vegeriya malê. Perîxanê sedem pirsiyar kir, wî jî mesele bo vegot, hingê wê got, 'Xema nexwe, here ser behrê gazî xizmê xwe bike bila hespê bayê bo min bîne.' Hesp anî, hingê Perîxanê got, 'Sibê li hespî siwar bibe û ber bi bayê felekê ve bajo, tu yê*

*bigihîjî qesrekê, jinek dê rastî te bêt, navê wê Xanxan e û ew xwîşka min e. Here wê derê dê xwîşka min rê nîşanî te bide.' Piştî ku Ehmed çûye wê derê Xanxanê şehek, serikeke sabûnê û misînek av dayê û gotê, 'Tu yê ber bi bayê kur ve biajoyý dê bigihîjî qesrekê, Pîra Bilûrvan di nav wê de ye. Peya nebe, jê re bêje ez gelek ji dengê bilûrê hez dikim. Ez ê bi hesp ve li ber bilûrê bireqisim. Gava ku wexta wê qediya şivekê li destê wê bide hingê dê bilûr bikeve erdê rahêjê û were. Ew ê li dû te bêt. Heke nêzikî te bû şeh bavêje berahiyê, ew ê bibe dehl û teraş, heke ji wir jî hat serikê sabûnê bavêje berahiyê ew ê bibe tehtik û lat, heke ji wir jî hat tu misînê avê birijîne pêşiya wê, ew ê bibe derya, hingê dê ji te re bibêje, 'Ez di ku derê re bêm?' Tu jê re bibêje, 'wê qudîka bin piyê xwe bo min bavêje vî rexî ez ê rê nîşanî te bidim.' Lê belê derê qudîkê venekî.'*

*Piştî ku dişa wê ew dîtî jê pirsî û got, 'Te çi kir Ehmed?' Wî lê vegerand, 'Pîrê di deryayê de xeniqî û min qudîk jî ji te re anî.' Gava ku Xanxanê derê qudikê vekir keçikeke gelek xweşik jê derket, Ehmed got, 'Ev kî ye?' Wê got, 'Ev keça pîrê ye, ji ber ku ji wê xweştir bilûr digot wê sihêr lê kiribû.' Roja paştir her sê li hespên xwe siwar bûn û vegeriyan welatê xwe. Gava ku Perîxanê ew her sê bi hev re dîtin gelekî hêrs bû, ji ber ku di navbera wan û Pîrê de xwîndarî hebû. Lê piştî ku Xanxanê mesele jê re got, kerba wê şikest û hemû bi hev re ketin malê. Navê keça Pîrê Qeranfil bû, dotira rojê wexta mîr gazî Ehmed kirî wan destek cilên kevn li Qeranfilê kirin, destek cilên mêran li Perîxanê kirin û her sê bi hev re derketin dîwana mîr. Mîr pirsiyara Perîxanê kir, Ehmed ew wekî nasekî xwe pêşkêş kir. Piştî ku Qeranfilê li bilûrê xistî dîwan rabû reqasê heçko tejî bizivire, an jî babelîska bayê berfê bi nav xwe bixe wisa hemû hişîmend bûn.*

*Hefteya paştir mîr careke dîtir heman daxwaz ji Ehmed kir û wî jî qebûl nekir, vê carê daxwaza mîr ew bû ku Ehmed biçe zarokekî wisa jê re bîne ku hem hêj hatibe dinyayê û hem jî bikaribe biaxive. Careke din Ehmed gazinên xwe digihîne Perîxanê, wê jî jê re got, 'Here ser derava behrê, gazî Ebdulqadir bike û jê re bêje, xwîşkên te Xanxan, Perîxan û Qeranfil li dîwanê rûniştine dixwazin ku tu zarokê xwe yê şeva dî hatiye dinyayê ji wan re bişînî da ku navî deynin ser.' Piştî ku*

*kurik bire dîwanxaneya mîrî, kurikê ku şeva berê hatiye dinyayê rabû ser qûna xwe rûnişt û got, 'Mîrê min, eve çi ye tu bi serê zavayê me de tînî! Ma te dinya nedîtiye? Ehmed here ber derî raweste, şûrê xwe deyne bila ev dîwan hemû di bin şûrê xalê min re derbas bibe ew ê derbas nebe serê wî lêdin!' Ji ber ku mîr serê xwe neçemand serê wî lêda û paşê Ehmed jî bû mîrê wî bajarî."*

*Hingê kundê dadgêr li şirkak û kotirkê nihêrt û got, 'Şirkak here mala xwe nexwe ez ê niha serê te ji qoqirkê bînim derê, kotirk ji te heqtir e.' Paşê kotirk vegeriya ser hêlîna xwe. Di ber xwe de jî her digot, "Hindî jin in, hin ciwan in, hin melhemên ser birînan in, hin jî jana nav dilan in...!"*

*Rehmet li dayik û bavê guhdaran!*

**

Şeveke payîza zû bû, ne sar bû, ne jî germ. Dayika min ji me re, ji zarokên xwe re, çîrokeke bêwext digot, çîrokeke berwext; ji ber ku şevbêrkên çîrokan ne şevên payîzan, şevên kanûnan bûn, lewma çîroka dayika min berwext bû neynika min, wekî jiyana me ya berwext û demxezikî…

Çîroka berwext pir dirêj bû, Rondik û Rojbîn hê di serê çîrokê de di xew re çûbûn, Ronahî û Bînahiyê jî koteki karibûn nîvî bikirina; ji ber ku bala wan li ser çîrokê nebû, xewn û xeyalên wan cuda bûn, wan li cihê guhdarîkirinê xew tercîh kiribû. Lê min û Dilşayê bi sebr û hedar, bi baldarî heta dawiyê guhdariya çîrokê kiribû, lewra, çîrok ji bo me xwedî wateyeke cuda bû.

Piştî çîrokê Dilşa rûnişt û dest bi girî kir, serê xwe danî ser çoka dayika min û çavên xwe girtin û devê xwe vekir, wê jî çîroka xwe got:

Dayika Kewser, ez li bajarekî rojavayê Tirkiyeyê mezin bûm, li Îzmîrê; dayika min keçeke îzmîrî bû, bi eslê xwe rom e, bavê min, berî sih û pênc salan ji bajarê Diyarbekirê koçî Îzmîrê

kiribû; em sê xwîşk û bira bûn; du keç û kurek.

Erê dayika Kewser, em wekî tirkekî mezin bûn, lê bêhna axa bavê min, bêhna çîrokên bavê min berê min da kurdî û min ji xwîşk û birayê xwe cudatir bala xwe da ser zimanê bavê xwe, ligel ku dayika min peyvek bi tenê kurdî nizanibû jî, bi dewleserê bavê xwe, ez hînî kurdî bûm. Lê li wî bajarê mezin ji çu zilaman bêhna çîrokên bavê min nedihat, jixwe piştî mirina wî dinyaya min bi yek carê herift, dayika min zû ew ji bîr kir û bi mêrekî dî re çû; xwîşka min wekî tirkekê dijî û birayê min jî wisa ye.

Em malbateke dewlemend bûn, ligel ku dayika min şû bi mêrekî dîtir kir jî, çu carê em bêpare nehiştin, em dane xwendin. Aha, hingê, gava ku min li Stenbolê dixwend min kurê te Ehmed nasî, aha, ji wî bêhna çîrokên bavê min dihat. Ji ber hindê jî, dereng nema min dilê xwe di behra evîna wî de berze kir, ez bûm bengiyê wî. Ew, mêrekî bi rastî jî camêr bû, zana bû, dilsoz bû, dizanî lê xwedî derkeve, biaqil bû, serwext bû, dizanî, dilan fetih bike, cirxweş bû, xwîngerm bû, dizanî hez bike. Wekî mêrxwasên çîrokên bavê min bû, min ew her dem dişibande Cembeliyê kurê Mîrê Hekariyan, wisa derwêşê hezkirinê bû, ku tiştek bigota li dû diçû, ji bo rastiya xwe serê xwe dida. wekî mêrxwasên çîrokên bavê min… Bawer im, ez berî ku wî nas bikim min jê hez kiribû.

Heyho dada Kotir –bernavê dayika min Kewserê bû- heyho, Ehmed mêrekî wisa bû ku ji bo xatirê wî, min dev ji her tiştê xwe berda, hemû jiyana bajaran li wir hişt û ez li dû wî ketim, çimkî axa wî jî, welatê wî jî dê wekî wî bûya; germ, dê wekî wî bûya; dilovan, dê wekî wî bûya; tijî jiyan, dê wekî wî bûya; dilsoz û mêrxwas… Çimkî ew lehengê çîrokên min bû, ew bêhna axa bavê min bû, ew kok û rehên dil û mêlaka min bû, ew ji min bû, ew evîna min bû. Ku ew nebûya, bi navê Xwedê min nedikarî tenê saetekê jî li vir bijîm; ev e bi ser

kuştina wî re sal bihurîn lê dikim nakim axa wî min bernade; bes, cergê min peritî dadê, ez êdî hew dikarim, hew, he…

*

Dilşa wê şevê pir giriya, wisa giriya, te digot qey dê ji giriyê dilê wê bipeqe, giriyeke wisa nerm kir, te digot qey cendekê Ehmed ji nû ve tête ber çavên wê, bawer bike awêneya min a xweşik, ez jî pê re giriyam, dayika min jî…

Belê Neynika min a xweşkûk!

Wê gavê bîra min hatibû helbesta ku Ehmedê nemir li ser Dilşayê nivîsandibû. Xuya bû Ehmed gelekî ji Dilşayê hez kiribû, di ajandaya xwe de helbesteke wiha li ser wê nivîsîbû:

***D****îdem, dîdem ma tu bêzar nebûyî ji payîna deman!*
***I****stirî bi şûna wuslatê dikevin riya te li her çep û çûran*
***L****i xwe binêr; hişyar bibe û bihêle vê rojiya bêzeman;*
***Ş****îv û paşîva te, ma dê her tim bibe ew jana bi kovan?*
***A****x û fîxan ma dê tim li derdora te biçerxînin perwazan?*
*De bişikêne vê rojiya giran; ne Beraet e, ne jî Remezan!*

*Dîdem, êdî vehêle vê sonda rikîn, vê asoya bêsînor!*
*Wek berxê pindê pê vedayî, gêjevankî digerî li derdor*
*Ev çi rojiya bêwerz e, berê te dide riyeke bi kendekûr?*
*Dil di ser kaniyên sar re dibore bêyî ku qurtekê bidahûr!*
*Çav ji bendemaniyan westiyan, lê rijiyan tev fer û nûr*
*Bila cejna dil bêt; bi dûmahîk bêt, dişewitîne ev tenûr!*

Piştre di nav cihên xwe de, heta berî spêdê xew neket çavên min, hizran ez dibirim nik bavê xwe, nik Ehmed, ez dibirim Xanê, li Gundê Mizgeftê digerandim; geh bayê hizrên min ez dibirim zaroktiya min û geh jî ez digihandim bal

Bîşengê; hingê min ji xwe dipirsî, “Mustefa, tu çima ew qas li kêleka jiyanê mayî, te çima ev êşa giran li dilê xwe hildayî?” Wê şevê xew li min heram bûbû, ew şeveke pir giran bû, pir çir bû, şev nediçû; heçko dê tiştek biqewime wisa tal bû.

Şevexwîneke xewrevînk bû.

Roja paştir Dilşa dê biçûya û vê carê çu tiştê xwe dê li malê nehişta, ew gelek carên dîtir jî çûbû, hin caran bi hefteyan venegeriyabû lê tenê tijî cantikê cil û bergên xwe bi xwe re dibirin, hingê me dizanî ku ew çûye serdana mirovên xwe û dê vegere, lê belê vê carê ji ta heta bi derziyê çu tiştê xwe li malê nehiştibû.

Çûyina berwext û bêdem li derdorê bûbû sedema devjeniyên der û cîranan; hinan digot, bi tîmekî taybet re reviyaye, hinan digot bi dû uzman çawîşekî ketiye, hinan digot çûye gihîştiye şervanan, hinan digot li malbava xwe vegeriyaye. Lê a rastîn, çu kesî/ê nedizanî Dilşa bi ku de çûye; tenê ya rastîn ew bû ku çu tişt li şûna xwe nehiştibû û heçko bibêje bi kuştina Ehmed re êdî cihê min li vir nemaye, ez hew dikarim vê jiyanê ragirim, ma ez ji bo çi û ji bo kê dimînim, wisa bêyî ku av li pey xwe zelal kiribe, çûbû û berze bûbû.

Vê çûyina bêwext dayika min a kovandar bi yek carê kuştibû; dayika min, piştî Ehmed hemû hezkirina xwe dabû wê, bi şev jî li nik wê radiza, heke pariyekî nanî jî bixwara bêyî wê nedixwar, lê ew jî wekî Ehmed, bêyî ku şopa xwe bihêle, di berbangeke payîzê de winda bûbû.

Dayika min piştî Dilşayê, piştî ku dît bi heyî û neyiyê xwe ve wekî stêrkekê rijiyaye û çûye, ket û êdî gotin ji devê wê nehat.

Dayika min felc bibû.

****

# Dîmena heştemîn

# “çûyîn”

*Her çûyîn e, her hêlan e*
*Mirin li dûv hemûyan e*

Piştî pênc şeş deqeyên dîtir min ê berê xwe bida kevnewarê xwe, ez ê ber bi kêlikên goristanan, ber bi jiyana xwe ya ku li bin wan kêlikan bi hezkiriyên min re çal bûbû ve biçûma û min ê bêhna birsê ku heta şanikên min jî têperiyabû, heta li atomên min jî daçûbû, careke dî di bayê hesretê de bêhn bikira.

Erê neynika min, kêm mabû, ez ê biçûma da ku ji dûr ve, bi careke dî, bi çavên serê xwe, li Bîşenga ber dilê xwe têr û têr temaşe bikim. Ew li wir bû; ew li wê axê bû, ez sê carên dîtir jî çûbûm, min berê xwe dabû axa ew lê, lê dilê min negirtibû rûber bibûma. Min ew nedîtibû, min ew li kûrahiya dilê xwe veşartibû û li her kêlîka jiyana xwe min ew hizir kiribû.

Belê awêneya min, ez ê ber bi wê ve biçûma, piştî çend deqeyên dîtir, lê min ê çu tişt ji wê hêvî nekira, min ê çu tişt ji wê nexwesta; tenê ji bo careke dîtir jî wê bibînim ez diçûm. Nizanim çima, lê min bêhesab ji wê hez kiribû. Ji dil…

Ez ê ber bi goristanên ku min li paş xwe hiştin ve biçûma.

***

Payîz bû.

Belgên daran hêdîka bi aramî diweşiyan. Piştî baraneke gur a bi şev, wê rojê hetaveke germ li ser jîngehê dibişirî. Li serê çiyayê Simbî berfa ewilî ya salê bariyabû. Payîza ku zû befir xwe nîşanî mirov dide, sayî derbas dibe, zivistan wê salê dereng tê.

Payîz bû.

Dayika min felc bûbû. Tajdînê me digot bi leqoyê ketiye, divê em wê di jûreke tarî de bi tenê bihêlin. Heta dev û lêv û çavên wê rast dibin. Bi dilê min bû ku min ew bibira doktorî, lê ji bilî çend lîreyên ku min ji xwe re ji bo ku ji Bîşengê re kasêta Şivan Perwer bikirim veşartibûn, çu tişt di destê min de nîn bû.

Payîz bû.

Hingê umrê min nêzî bîst û şeşê dibû, ev çend sal bûn ku me li vî bajarî di şerê man û nemanê de li ber xwe dida. Min biryar dabû, erê, ji bo ku min Tajdînê me qayil bikira da ku pare bide ku me dayika xwe bibira nexweşxaneyê, ez ê bi wî re bişêwirîma. Heta wê rojê, ji bo çi tiştî ez bi wî neşêwirîbûm. Min çu carê tiştek ji wî nexwestibû. Îmana min ji mineta wî diçû, lê min çi bikira, dayik bû ev, nedişibiya kesekî/e dî, nexweş bû, jê re doktor diviya; felc bûbû, jê re mesref diviya; bêhal bû, jê re derman diviyan; dayika me bû, xwedanî jê re diviya.

Payîz bû. Piştî felcbûna dayika min bi hefteyan ji bo ku dayika xwe bibim doktorî ez bi Tajdînê me re axivîbûm. Min jê re got,

"Biraxulam, dayika me her roja ku diçe xirabtir dibe, çavên wê vîr bûne, devê wê xar bûye, rexekî wê nagire; bi dest radikin û datînin, weha nabe, hinek pareyan bide, an jî bi ser

navê xwe sîgorta wê çêke, da em wê bibin nexweşxaneyê." Tajdîn serê xwe di ber xwe de şor kir û got,

"Êşa Xwedê gelekî xweş e, ma em ê ji qedera xwe birevin, min pare nîn in"

"Biraxulam, çawa te pare nîn in, hemû lêçûnên komeleya we li ser milên te ne, ma hûn ji bo alîkariya misilmanan nehatine damezrandin, aha, va ye ji bo te fersendeke mezin, eve dayika te bi xwe li ber mirinê ye, de piçekî devê kîsikê xwe vekin"

"Mustefa, tu min fêm nakî, ew pare yên komeleyê ne, ez neşêm wan bidim, ew gencîneya misilmanan e, ji bo tengaviyê me ew veşartine, hem tiştek bi dayika me nayê, bi leqoyê ketiye, bila meheke dî jî di odeya tarî de bimîne Xwedayê mezin dê şîfayê bidê." Hingê ez pir hêrs bûm û yekem car bi dengekî bilind min li kekê xwe diheyitand,

"Kuro Taco, tu bo çi xwe tênagihînî, ez ji te re dibêjim va ye hirç tu dibêjî min şûnpiyên wê dîtine; serhişko, tu her mehê nîvê meaşê xwe didî wê dernekê (komele), hemûyî bi wan sextekaran didî xwarin, kuro ma em jî nizanin ka dîn çawa ye, panê kes bi qasî bavê me dîndar nebû, lê wî çu carê wisa nedigot, wekî we nedikir, çavên hemû gundiyan li ber destên wî bûn; hewcehiyên hemûyan çareser dikirin û çu carê em jî venedihêlan; tu çima aqilê xwe nadî serê xwe, didin bin hingilên te, kuro xeşîmo, ew hemû ji te dixwin, tu çima çavên xwe venakî! ma dîndarî wisa ye, ma ne divê hûn bi destê misilmanê muhtac bigirin? Ev çi kap e tu ketiyê? De bes e, dayika me nexweş e, felc bûye, divê em wê bibine nexweşxaneyê bila doktor çareyekê jê re bibînin, pareyê min têr nakin, nexwe ma kê dê mineta te bigirta!"

"Mustefa, bes e bes! Tu çawa der barê misilmanan de wisa dibêjî"

“Misilman misilmana te, ma em gawir in!..”

“Hişş be! Erê wele li gorî ayeta Xwedê, “Yên bi hukmê wî hukim nekin gawir in”, em ji bo ku hukmê Xwedê li ser rûyê erdê hakim bibe têdikoşin”

“Kuro têkoşîna çi, heke meaşê dewletê nebe tu dê ji birçîna bimirî. Hûn çi dikin ha, we çi kiriye; her roj heta êvarî li pişt sobeyê li ser berikê fetwayan didin, kuro, tesel min ew e, siberoj li we biqewime, ez meraq dikim bê ka hûn ê xwe di kîjan kundizan re veşêrin. Kuro Taco, çi bi te hatiye, tu wisa nebûyî, tu camêrekî baş bûyî, kê tu wisa xarandiyî; weleh, ew komeleya we jî bi piştevaniya dewletê tê birêvebirin da ku li nava kurdan duberiyê çêbikin, ma tu bo çi tênagihîjî; bi navê Xwedê sond dixwim, siberoj heke tevgera kurdan hate jinavbirin, serê ewil dê we tepeser bikin, xwelîsero, xwe bi qûna we dikenin!... Ji qestî nabêjin, mirov bihurî bi keran dizane, weleh, rast e, wan jî kerên xwe dîtine; hem jê dixwin, hem jî bi rêka wan tovê dubendiyê li nav miletî diçînin. Were em dayika xwe bibin doktorî ev e komele û cemaeta we…”

“Mustefa, tu birayê ji min biçûktir î, ez birayê te yê herî mezin im, xweşkûk bi min re biaxive, wisa zimandirêjiyê neke, kes me naxapîne, me xwe daye riya Xwedê û çu kes nikare me ji ya me bîne xwarê, min çu pare jî nîn in, pareyên komeleyê jî, bi Xwedê, çavên te di serê te re bêne der jî ez filsekê nadim te, mêşê neke gamêş, nexweşiya dado jî ewende giran nîn e, êşên Xwedê xweş in elhemdulîlah!...”

Dawiya dawîn, a Tajdîn daye destê min ev bû: Êşên Xwedê xweş in.

Min kir nekir, min nekarî gotinekê di mêjiyê Tajdîn ê hişk re bibira xwarê, dawiya dawîn, ez jê vesiyam û bi dilekî şikestî, bi hêrs ji derî derketim û min derî gift bi dû xwe re girt û ez çûme nik Bîşengê.

Wê rojê bi qasî nîv saetê ez li nik Bîşengê mam, lê gotinek ji devê min derneket; wê çi digot, tenê min lê guhdarî kir. Piştre min biryar girt ku dayika xwe bibim nexweşxaneyê.

Şukir ji Xwedê re, têra çûyinê pare bi min re hebûn, ku ew jî ew pare bûn, ên ku min ji bo kasêta ku min ê ji Bîşengê re bikira diyarî, veşartibûn.

*

Roja paştir… Rojeke piçekî sar a payîzê; ji mehan çiriya berê, ji rojan roja pêncşemê, saet neh û nîvê min milê dayika xwe girt û ew bire ser riya mezin, piştî çarêkekê serwîs hat, em lê siwar bûn, kotekî tê de cihê me kir û me berê xwe da nexweşxaneyê.

Dayika min bi çavên zil li min dinihêrî: Çavên wê vîr bibûn, devê wê xwar bûbû, rondik wekî taviya barana nîsanê ji çavên wê dibariyan. Dest û lingên wê xav bûbûn. Li nava çavên min dinihêrî, hingê bivê nevê rondikên min jî dindik bi dindik ji ser sûretê min gêr dibûn û diweriyane xwarê.

Bi qasî saetekê em li dorê man, piştre bi delîvekê ez ketim hundir û min rica ji doktorî kir ku li dayika min binêre, lê ji ber ku ne sîgorta ne jî ‘yeşîl kart’a (karta kesk a dewletê daye hejaran) me hebû, bijîşkî em ji nexweşxaneyê derxistin. Pare bi min re nemabûn, nîvro bû, ez birçî bûm, payîz bû, ewrekî reş li asîman diçerixiya, bayekî sar diveziya, sar bû, li serê çiya befir hebû, bayê berfê dihat; hingê, bi hêdîka min dayika xwe da pişta xwe û bi gavên giran ber bi malê ve min xwe da rê. Ji nexweşxaneyê heta mala me riyê nîv saet dikêşa.

Payîz bû, çiriya berê bû, dayika min a felcbûyî li pişta min, bi zikê birçî, hêdî hêdî ber bi taxa Kanîkewkan ve dimeşiyam. Hingê, çend erebe di ber me re diçûn, li me nedinêrîn jî; li bajaran wijdana mirovan zengar digire.

Dengê dirûşmeyan bilind dibû ji komeke qerebalix. Li pêş û paşiya koma ku nêzî sed dused kesî hebûn mişt polîs bûn. Dengê sloganên wan diçûn ber felekê. Dayika min a felcbûyî li pişta min, ez di ber komê re bi gavên westiyayî dimeşiyam, çu kesî/ê hay ji min nebû. Dengê laserkên polîsan sehmeke mezin dixist ruhê min, kengî min ew bidîtina ez jê ditirsiyam, çimkî, wan êvarekê, gava ez ji nik Bîşengê dihatim û diçûm bo mala xwe girtibûm û heta spêdê ez di nezaretxaneyê de hiştibûm. Gelekî bi ser min de hatibûn, gotibûn, em ê te bixesînin, gunên min wisa guvaştibûn min her digot qey ruhê min dikêşin. Piştre jî ez bi tiştekî ve hilawîstibûm û binê piyên min dabûne ber jopan. Heta spêdê ez kutabûm, paşê jî bêyî ku min derxin mehkemeyê ez berdabûm. Min hêj nedizanî ka ez ji ber çi û çima girtibûm.

Payîz bû. Dengê dirûşmeyên komê bi ser bajêr diket, dayika min a felcbûyî li pişta min bû, hingê ez pêhesiyam ku aveke ron a germ pişta min şil dikir, erê, dayika min ji ser hişê xwe çûbû û bi pişta min de mîstibû. Hingê xisika giriyê di gewriya min re asê bûbû. Ez bêçare bûm, ez bi dirûşmeyên komê re digiriyam, lê kes bi halê min nehesiyabû; kom bi dirûşmeyên xwe, polîs jî bi şopandina komê mijûl bû.

Li bajaran şerê mirovan mirovahî dixwar.

Erê neynika min, yê têr qet hay ji yê birçî nebû; payîz bû, çiriya berê bû, belgên daran hema hema gişt weşiyabûn. Befirê serê çiyayan nixumandibû, av sar bûbûn, sobe hatibûn danîn, sotemeniya zivistanê amade bûbû, her danê ku piçekî bi hetav derbas bibûya wekî gencîneyekê bû, wekî xilêmetiyê bû.

Sar bû. Hetav tune bû, hişkebayekî sar dihat, heçko dê befir bibare wisa bû, kom hêdî hêdî li pey min dima, dengê dirûşmeyên wan hê jî dihat, dayika min li pişta min bû, şil bû, sar bû, giran bû, xav bû û ez birçî bûm. Bêpare bûm, bêçare bûm; min dayika xwe ber bi malê ve ve dibir.

Wê gavê bi dehan tişt dihatin bîra min. Min digot ax xwezî bavo, xwezî niha tu sax bûya, ax Ehmed te bo çi wisa zû koç dikir, erê Dilşa tu çima diçûyî, qene bila tu bimaya, dê niha te çareyek jê re bidîta, ku tu neçûyayî belkî niha ez û dayika xwe wisa bêgav û bêçare nemana, ax dayê, ax dayika min a dilovan; xwezî ji xêra Xwedê re, bila ez mirî bûma lê min ev halê me yê weha şerpeze bi çavên serê xwe nedîta! Ez digiriyam.

Erê neynika min, ez bi tenê bûm, bi tikî tenê… Dayika min a felcbûyî li pişta min, ez ber bi malê ve dimeşiyam, rê xilas nedibû, taqeta min kêm dibû û her ku diçû ez ji kîs diketim û bêhal dibûm. Şiyana min nemabû. Min nedikarî bîskekê bêhna xwe jî vedim. Hingê nivîseke Ehmed a li ser tenêtiyê dihate bîra min, weha bû:

*

***Hilmeke sar e 'tenêtî'***

*Serma... sarî... sarbûn... Gelek zehmet e ku mirov li bin hetavê bicemide û di çilê havînê de bi taya sermayê bikeve. Aha çûyîna te jî wisa bû! Tezingeke sar bi ser giyanê min de bire xwarê. Xwî da hemû laşê min; xwîdaneke sar. Û xwîs bûm ez li cihê xwe. Gotinek bi tenê jî ji zimanê min danehisî. Ez cemidîm û tirseke mezin xwe berî nav ruhê min da. Êdî demildest min her tişt xalî dît. her tişt vala hate pêş çavên min: Xweza; çiya, daristan, rûbar, asîman; stêrk, heyv, roj û mirov... Hemû heyîn, hemû tişt li pêş çavên min qulipîn ser dîmeneke şêlû. Hingê hilmeke sar giyanê min vegirt û min xwe di nava heft milyar însanî de bi tenê rabihîst, bi tenê seh kir. Hingê bi pistepisteke nizm çend rêzik ji ser zimanê min daketin xwarê;*

*Rabe dilo,*

*dereng e*

*roj çû*

*bext nemaye*

*Min bi çûyîna te re dest bi gazinan kir. Hemû gazinên min ji bo dilê min bûn. Min dilê xwe da ber tîrên gazinan û ew hincirand.*

*rabe dilo,*

*dereng e*

*şev çû*

*text nemaye*

*Min dilê xwe kire bêjîngekê û raxist nav bêdengiya şevekorê. Li wir, ruhê min cemidî û taya tenêtiyê ez pêçam bi seranser.*

*rabe dilo*

*dereng e*

*umir çû*

*wext nemaye*

*Tenêtî. Di nava dilê xwe de tenêman... Pir zehmet e ku mirov di nava xwe de tenê bimîne. Mirov ji xwe jî tenê bimîne û bibe biyaniyê xwe. Gelekî zehmet e ku mirov xwe li biyabanekê winda bike û nizanibe ka dê bi ku de biçe. Wekî hilmeke sar di nava dilê biyabanê de dilerize û dikeve nava windahiyeke bêpayan. Diqerisin hemû gotin li ser zimanê sirûştê û mirov winda dibe û bi tena xwe diçe û hey diçe...*

*hilmeke sar e tenêtî*

*di ruxsarê heyvê de*

*tirseke har e tenêtî*

*di hembêza şevê de*

*dinale tenêtî*

*di dergûşa mirinê de*

*Mirov diçe û di ruxsarê heyvê de li beramberî evîna xwe ya winda radiweste û jê gazinên xwe dike bi awirvedaneke sar. Heyv dikene bi halê mirov. Hingê ruhê mirov ditirse ji qehqeha heyvê û tirseke har xwe berî nav dilê mirov dide û lê dinişe. Hingê mirov xwe di dergûşa mirinê*

*de dibîne ku ruhistîn landika mirov dihejîne... Wê demê dê kêfa hemû xêrnexwazên mirov bê û dê awirên wan ên tijî kîn ên ji têkçûna mirov kêfxweşbûyî dê li ser mirov bişemitin. Lê tirs hê jî dê dergûşa mirov bihejîne di bin sîbera mirinê de. Hingê mirov dê çavên mirinê bibîne û dê ji tirsa xwe di gerdena tirsê wer ke. Lê tirs her dem landikhejiya mirinê dike.*

*Wê demê neynik dê mirov bidin dest û dê li nav çavên mirov bikenin. Rûyekî tijî qermûçik dê li rûyê mirov bibişire li beramberî neynikê. Hingê çavên mirov dê şor bibin û awir biwestin û xwe berî nav bêdengiyê bidin û dê xwe bispêrin mirina xew û xewnan. Hingê mirov dê bi demê re revaneyê bike û xwe bispêre bêdengiyê û di dergûşa mirinê de ji aliyê tirsê ve bête nivandin. Wê demê dê ronahiya rojê tirsa herî mezin be ji bo mirov û mirov dê her tim jê bireve û xwe bispêre reşetariyê û binive.*

*Binve dilê min binve,*

*Binve ruhê min binve...*

*Piştre dê bête dîtin ku mirov sertewiyayî di nava şêniyan de winda dibe. Dê lingê mirov sist bigihêjin ser erdê û navmilên mirov dê têk biçin wekî guleke çilmisî, dê reng û rûyê mirov bi demê re bibehîtin. Hingê dê neyar û nemamên mirov ji kêfxweşiyê biwestin û êdî dê nema kêfxweş bibin. Ji ber ku êdî dê mirov hêjayî wê yekê jî nebînin. Bêpûtedan... Lê tirs dê hê jî bihejîne landika mirov di bin sîbera mirinê de. Mirin dê wekî hilmeke sar her roj li pey mirovî bigere.*

*Şev û tenêtî...Tenêtî di hembêza şevê de dinale. Ji destê xewê birîndar dikeve ew. Xew mirov ji tenêtiyê dûr dike. Xew mirov ji jiyanê dûr dike. Lê tenêtî di nava jiyanê de mirov ji jiyanê sil dike. Jiyan tamijandina demê ye û tenêtî jî serberdana demê ye. Şev her tiştî vedişêre; mirov jî di nava tenêtiyê de xwe dispêre tariya şevê û ruhê xwe radestî xewê dike. Xew ruhê mirov ê westiyayî dinivîne û wî tena dike. Xew tenatî ye.*

*(...)*

*Piştî çûyîna te ez bi tenê mam û taya tenêtiyê ruhê min vegirt. Ez cemidîm û lerz kete dilê min. Min hilma sar a tenêtiyê di kûrahiya giyanê xwe de seh kir. Piştî çûyîna te ez bêdeng ketim nav xeyalên xwe û min pişta xwe da jiyanê.*

*Hê jî ez dicemidîm li wê derê!.*

*

Erê neynika min a xweşkûk, ez jî dicemidîm û dayika min a felcbûyî li ser pişta min dicemidî.

Erê awêneya min a delal, min termê dayika xwe yê bêruh gihandibû malê. Dîsa bi hezaran cam di hişê min de dişikestin, dişikes… Dîsa derba birîna bavê min, gava bi awirvedaneke tirş a derbxwarî ji me xatir dixwest min di eniya dayika xwe ya bêruh de didît. Dîsa min li ser hemû qermiçûkên rûyê wê yê çilmisî birînên bixwîn ên Ehmedê canemerg didîtin. Dîsa gurîsk û pêtên agirê har ê qesra me ya Xanê dişewitandin di hinavên min de rabûbû pêdarê û kizîneke wisa dixist nava min te digot qey hemû dojeh di nava dilê min de vêdikevin.

Û min serê xwe dikir nav her du zend û lepên xwe û bi her du çavan xwîn digiriyam. Dîsa hilma mirinê ya sar li mala me bû.

Di rojeke sar a payîzê de, di nava heyiyê de bêheyî, di nava kesanên xwe de bêkes, piştî umrekî tijî kul û keser, di şêst û sê saliya temenê xwe de dayika min, Kewsera keça Emer axayê Xanî, li Culemêrgê, li ser pişta min, bi mirineke dilsoj, bêyî ku tiştekî bibêje, felcbûyî koça xwe ya dawîn kir û stûna mala me ya dawîn jî ji binî ve qiriya.

Erê di bîst û pênc saliya xwe de ez bêdayik û bêkes mabûm êdî.

Êdî ji bo ku ez bijîm sedemek tenê mabû, çirûskek tenê

di jiyana min de dibirûsiya, ew jî Bîşeng bû, Bîşenga ku evîniya wê ya yekalî dil li min daxdabû, evîna min a ku rehên xwe heta atomên min jî belavkirî…

Piştî mirina dayika min êdî hêviyên min jî hemû mirîbûn. Piştî ku me ew li Goristana Bêkesan a Serêsolan defin kir, derazinka mala me bi yekcarî ji mêvanan re hate girtin, piştî wê rojê çu kesî/ê derê mala me venekir, sohbet li mala me mirin, kenê koç kir, mêvan jê sil bûn û em –heke gotin lê be- li şûna weliyan bûne xwelî.

****

# Dîmena nehemîn

# “rev”

*Di çarmendoreke teng de*

*Rev û windabûn*

Piştî çar pênc deqeyên dîtir ez ê ber bi revangehên xwe ve biçûma û dê li xwe bigeriyama di reşika çavên Bîşengê de. Bîşeng di keleha jiyana min de birca herî dawîn bû, kunciyê herî veşartî bû, namahrema herî namahrem bû; min ew ji dilê xwe jî dihesidî, min ê ji bo ku qet nebe wek dostanî bimîne ew tim û daîm li kakilê dilê xwe çal bikira. Ez bêyî wê jî bi wê re dijiyam. Lewma ez ê ji wê jî bireviyama, min ê hewl bida ku xwe ji her tiştî bişûşta… Lê niha, ez ê piştî çend deqeyên dî careke dîtir ji bo ku min ew bidîta ber bi axa ew lê ye ve biçûma, ji ber ku min çi bikira jî min nedikarî xwe ji wê bişom.

***

Her destpêkek encamek bû jî, her nû li ser kevnekê ava dibû; herifandin û kevnbûna her nûyekê nûyeke nûtir bi xwe re dianî. Erê neynika min, qet kevn-nebûyiya jiyana min jî Bîşeng bû, lê piştî koçkirina dayika min a bi yekcarî, ez ji wê qet kevn-nebûyiya xwe jî direviyam û min ew li êşgeha dilê xwe wekî dilopeke hêviyê vedişart û ez ê wekî têjika pisingeke nû hatiye dinê, wisa bi çavgirtî, ber bi revangeha xwe ve biçûma û min ê xwe li bajarê mexrîbê, Stenbola xopan li welatê Tirkiyeyê bigirta da ku kulên min ji bîra min biçin û êşên dilê min bikewin…

Du tiştên pîroz min girtibûn nik xwe; Qurana ku xwîna bavê min rijiyaye ser û rênîşandera jiyana min emaneta Ehmedê

Xanî ajandaya gewr… Çenteyekî min ê kevn hebû, ku min ji leşkeriyê bi xwe re anîbû; tenê tijî wî çentikî wercên min hebûn, piştî ku ez li hevalê Ehmed ê ku navnîşana wî di ajandaya Ehmed de hebû geriyam û wî heqê riya min ji min re şandibû û soza karî dabû min; piştî koçkirina dawîn a dayika min bi mehekê, rojeke sar a çiriya dûyê, meha Remezana pîroz min wekî peykeke bêrêgeh, wekî têjika pisingekê ya nûzayî çavgirtî, berê xwe da welatê xerîb û xerîbistanê û piştî rêwîngiya sî saetan min xwe li bajarekî pir mezin dîtibû.

Erê neynika min, ku mirov mecbûr bimîne mirov dê ji lat û kûçan jî avê derxe, rast bû, di jiyanê de gelek tişt ji mecbûriyê çêdibûn, asoya afirandina mirovan bi pêdiviyên mecbûrî û meraqên bêdawî firehtir dibû. Ez jî, Mustefayê dilşikestî ji mecbûriyê ber bi welatekî dûr û deraz ve çûbûm, lê piştî demekê min ê hin caran ji xwe re bigota, “Mistê xwezî tu zûtir bihatayî” çimkî, her çend xerîbî gelekî zor bû jî, li dûriyê serê min rihet bû, zikê min têr bû, ez bi dilê xwe bûm, şûştî û veşûştî bûm, min karê giran nedikir. Ji bêhna birsê û têhna tirsê piçekî veresiyabûm êdî. Di qerebalixa bajarê mezin de winda dibûm, di tenêtiya xwe de ji bîr diçûm; keşfkirin û meraqa tiştên nû, nasîn û lêadaptebûna çand û kultura nû piçekî be jî kul û xemên min ji bîra min dibirin; ez sakîn dibûm û di qerebalixa meraqên xwe de winda dibûm. Jixwe mebesta reva min jî ev bû: Windabûn.

Erê awêneya min, însan zû hînî cihê diçê dibe, zû lê konsantre dibe. Lê ez tenê hînî tiştekî nedibûm: Nedîtina Bîşengê, min tenê bêriya wê dikir.

*

Ez çûbûm.

Li pey min mabû jiyaneke tijîkul û xwerûjan. Kesera dayika min a ku dixwest zavatiya min bi her du çavên xwe

bibîne lê bi wê re çûbû gorê, wekî kulekê li ser dilê min rûdinişt, gava dihate bîra min, kirêneke sojer dixiste nava min; erê neynika min, jiyan ji xeyalên mirovî gelekî bêmirwetir bû.

Piştî çûyîna min bi salan rojeke sar a zivistanê kela hesretê berê min dabû kevnewarê min; di ruhê min de xweziya dîtina welatî, lê di hişê min de kul û keserên ez jê reviyame û ji aliyekî dî ve jî di dilê min de têhna evîna di dilê min de mayî û heyecana ihtîmala dîtina Bîşengê…

Erê neynika min!

Rojeke sar ji rojên zivistanê bû. Befirê bi seranser ev bajarê biçûk ê navçiyayî bi rengê spî hûnandibû. Hewayeke sar û cemidî bi ser mirov de diweşiya. Ewrên spî yên rûtirş li asîman di nava lez û bezekê de bûn. Tîrêjên rojê tîna xwe ji dest dabû. Tav mirî bû. Tenê cendekê wê yê sar li ser rûyê erdê diyar dikir. Bajar wekî her car di nava aramiyeke xapînok de bû; kuçe û kolan hema hema vala bûn. Ji bilî hin kesên bo xizmet lê, kesekî/e din xuya nedikir. Ji lûtkeyên banan dûkêla reş a komirê tebeqeke kirêt li hindava bajêr pêk anîbû jî. Jîngeh bêhenase bû. Zarokan ji mêj ve lepik û goreyên stûr û kincên qalind li xwe kiribûn û pîremêran jî gorên rîsîn yên ku qet ji xwe nedikirin kiribûn du sê cot... Herî bêtir kêfa kûçikan hatibû, ku dengê wan xweş dihat bihîstin. Ewt ewta wan li çar kinarên bajêr deng vedida. Bi kurtebirî wî bajarê biçûk bi hemû bedewiya xwe xwe radestî zivistanê kiribû.

Min bêriya zivistanên Culemêrgê jî kiribû: Bi qasî metro û nîvekê befir bariyabû, her der spî bû, berfê her tişt nixumandibû. Hingê ez piştî salan, di bîst û neh saliya xwe de li bajarê xwe vedigeriyam: Bi dîtina sereke her tişt biçûk dihate pêş çavên min, gava mirov ji cihekî dûr bikeve û ku piştî salan lê vegere, mirov bi guherînên wê derê dihese û hema tavilê ew li ber çavên mirov dikevin.

Tajdînê me hinekî dîtir pîr bûbû; porê wî hema nîvenîv weşayibû, her wiha nêrîn û dîtinên wî yên tûj û tundraw jî nerm bûbûn, komele û cemaeta wan têk çûbû û piştî mirina dayika min xwe wek sûcdar hesibandibû û her roj bi wî ezabî digiriya. Jinbiraya min Esma jî êdî dihat nav mirovan, bi mirov re diaxivî, di nava malê de rûyê xwe vedikir, heta, gava derdiket derve jî dersûka xwe heta bin lamikê girêdida û çarşefa reş ji xwe kiribû. Rondik û Rojbîn jî mezin bûbûn û diçûn dibistanê; kurê wan ê biçûk jî êdî bi axaftinê ketibû. Her wiha heta wê rojê jî kesî/ê çi agahî ji Dilşayê negirtibûn, her wiha piştî mirina dayika min bi du salan Bînahiyê jî xwe bi uzman çawişekî re reviyabû û ew jî bêseroşûn bûbû.

***

Erê neynika min a spehî, gava mirov ji cihekî çû, êdî mirov ji nav hesab û kitêbên wê derê jî radibe û piştî demekê wekî miriyekî bi temamî ji bîr diçe. Ez jî, êdî di nava hesabên malbata xwe de nemabûm û wekî miriyekî ji bîr çûbûm.

Rojeke cimawerî…

Gerembol û boşatiya vexwendiyên ku xemla dawetê li wan bû, mîna lehiya gulanê herikîbûn mala me jî. Roja henê bû; xenaya xwîşka min: Ronahiyê. Belê, wê rojê daweta xwîşka min bû. Û ez; Mustefayê sezûn û dilkovan mêvanekî negazîkirî yê vê dawetê bûm. Min pir meraq dikir, gelo xwîşka min kengî û dabûn kê? Ji aliyekî ve hem min şerm dikir bipirsim, hem jî kesî/ê ew behs nedikir.

Danê êvarî…

Vexwendî li salona malê bûn; her kesek di cîhana xwe ya xweser de, li nik dost û destebirayê xwe ketibû nava sohbeteke kûr. Kabanî bi malovaniyê mijûl bûn. Ciwan li keysa evînê digeriyan. Zarok çaverêyî pariyekî xweş bûn. Heta ku pişîngên bêwar jî li dora mutbexê, li ber bêhnên xwarinên lezîz

lêmisiyabûn; li keysa xwe digeriyan. Denginê têvel ên vexwendiyan di ber guhên mirov re wekî guvêna bayekî sivik deng vedidan. Li derve hewayeke sar ku di bin sifirê de digihîşt pênc şeş pileyan mirov bêgav dihişt ku li hundir bimîne. Bêhna tirş a ku salon vegirtibû têkilî bêhna xwarinan dibû. Heval û nasên me li wir bûn. Hevalên xwîşka min jî li dora wê kom bûbûn: Gelek ji Xanê hatibûn; ji Gundê Axayî, yek ji wan jî keça feqiyê bavê min Feqî Huseyn bû: Sosin, ew keçeke spehî û gelekî xweşkûk bû. Bejna wê darêtî, rûyê wê geş û sorespî, çavên wê jî reş î belek bûn. Kirasekî tebesîr li xwe kiribû, poşiyeke kesk û sor û zer avêtibû ser porê xwe û davên porê hulî yê xemirî di ser wî sûretê xweşkûk de hatibû xwarê, guharên wê yên zîvîn ku şor bûbûn û gerdeniya ku li wê gerdena kêl bêhesab dibaniya jî, bedewiya wê hêj zêdetir dikir, dişibiya stêrka berbangê gelawêjê. Çavên min bêhnekê li ser wê man, hingê min hêdîka di ber xwe de pirsî, “Gelo eve kî ye?” piştre hizra min ez birim nik Bîşengê, lê ew li wir nebû.

Erê neynika min, em kurd der barê tiştekî tenê de bêîstîsna tifaq bûn, ew jî dawet û dîlanên me bûn; bêîstisna me hemûyan jî ji govendê hez dikir. Li dawetan her dem dîmeneke pir î xweş çêdibû, her kes komî ser hev dibû: Erê awêneya min, heke tu rastiyê bixwazî, wê kêliyê hilma hestan bi ser dilê min ketibû; heta ku ez hin ziravhestîn bûbûm, ku di ber re, bi dizkî çend rondik ji çavên min weriyabûn. Hemû lêzimên me li wê derê bûn; li nik hev, bi hev re bûn, hemû: Xal û xwarza, ap û biraza, met û xaletî, pisxalet û pismam û dotmam û kesûkarên dûr û nêzik ên mayîn... Atmosfereke xweş. Dîmeneke rengîn ji malbata me. Xwîngir û mirovanên me… Ma di van du rojên dinyayê de çi tişt ji berhevbûna ser hev a mirovan xweştir e!?

Bes;

Ez?

Mustefayê ku ji nişka ve li ser daweteke negazîkirî

hilbûbû, mixabin wê şeva wisa girîng ez careke dîtir bi tena serê xwe mabûm. Her kesî/ê, di warê xwe de; li gorî têgiha xwe ya jiyanê ji xwe re cîhaneke xomal damezirandibû. Û her kes jî di nava wê cîhana xwe de, bi xweseriyên xwe ve dijiya. Her kesî/ê mijareke xwe hebû, ku bi yaren û dilsozên xwe re hevpar bike. Çi awirên diketin ser min, bi tirşî jê dişikestin. Çimkî kes li benda min nebû; ez dîsa bêwext ketibûm nava lêsereke boş. Hema bêje, çi çavên li min dilikumîn demildest di ber de dişikestin: Eve min di çirûsîna sar a wan çavan de dixwend. Vê yekê jî, ew tîk û derza li dilê min ê mayî firehtir dikir. Her ku diçû ev tîk dibû çaleke fireh û jan dida min. Janeke tûj û giran.

Min ji xwe dipirsî: Gelo min li kê derê xeletî kiriye? Ma xeletiya min çi ye? Çi bû ku di navbera min û –qaşo- yên me de çal û xendek dikola? Em jêk veder dikirin? Birîneke bêsedem –qet nebe hingê min çu sedemên şênber nedizanîn-li kûrahiya dilê min vedikir. Mîna vîrûseke vegir a nesaxiyeke kujer 'mirovên ku min bi wan re jiyan nasî,' ji min dûr dikir. Dûrbûneke bêwate û bêdaraz. Ma ne diviyabû şansek bidana min; hema qet nebe egerên vê sarbûnê, vê dûrketinê bipirsiyana? Ma hin mafê min jî tune bû? Heko mehkûmên êdamê jî sêdare didin, berê; daxwaza wî ya dawîn jê dipirsin, paşê... Ma bi qasî mehkûmekî wisa jî mafê min ê berevaniyê tune bû? Ma min çi sûc kiribû? Qey felek li min hatibû xezebê? Qey stêra min êdî rijiyayî bû? Ma ku mirov di dilên yên ji xwe de hate mehkûmkirin êdî dê çi bike? Gelek gelek mirov heta mala xwe direve; dawiya revê li wir tê. Lê, ma ku jiyan welê bû ku dilek jî nemabe mirov xwe bispêrê êdî çi wateya wê heye? Gelo çi mana wê heye? Ji bo çi ye ew jiyan? Kes ji te bawer nake; kes ji te pirs nake, bes her kes hema wisa bi pêşhukimî te mehkûm dike. Mehkûmiyeke bêsûc û bêsedem. Vêca, de were vî kerî di vî bihûrî re derbas bike! Qey ji vê re dibêjin: "Ez ê her du lingên te bi cot têxim pêlavekê?" Qey, eve leyîza neyarekî min bû?

Piştre ez li xwe vardiqilîm, gelo Mustefa tu çima wisa xeşîmane difikirî, piştre jî careke dîtir çavên min diketin ser Sosinê; reqsa wê pir bi min xweş dihat, kenê wê, pir bi min xweşkûk dihat, dilê min radikir pêdarê, carina çavên wê bi çavên min diketin, hingê bi sedan xwezî di dilê min de şîn dibûn.

Hingê hizra min diçû, wekî keçeke pir xwedîtî xuya dikir, vê jî tim ez ditirsandim, ez nediwêriyam nêzî hindê bibûma. Wê kêlîkê dayika min hate bîra min, li wir, bêyî ku keçên xwe bi destên xwe bide şû, çû. Ew keser jî di dilê wê de mabû; gava ez çav bi çavên Ronahiyê ketim min ev xemgînî di rûyê wê de didît, heçko ew li dayika xwe bigere, heçko li cêwiya xwe bigere; heçko ne bi dilê wê be, pir damayî bû, sernixwîn bû, bêdilî bi hevalên xwe re dikeniya, hin caran bêyî dilê wê rondik ji çavên wê dihatin xwarê. Vê yekê ez jî diêşandim.

Ez gelek tiştan bi hev re dihizirîm: Fikir û gumanên bêstûn. Her tişt bi hewa ve, razber, di quleteyna jêrhişê min de diqewimî. Baweşîna sehma ku ji awiran diweşiya ser min û bêbaweriya jiyanê xistî ser dilê min, di nava hev de dibû kuleke tirş û li ser dilê min rûdinişt. Ez û tirs, ez û bêbawerî, ez û şikbînî û ez û reşbînî gihîştibûn hev, heta ku, hêj wêdetir ketibûn hundirê hev. Hingê, herî bêhtir vê pirsê ez diguvaştim: Gelo, qey ez ne yê vê cîhanê bûm? An na, ne yê vê dewrê bûm? Heye ku ne yê vê çîrokê bûm? An, naxwe ev leyîzek bû û piştî çend kêliyan dê bi dawî bihata? An, çend salan; çend serdeman? Ma, dilê min ê westiyayî dikarî hin li ber xwe bida? Ma min hin sebr û hedar hebû? Wê kêlîkê, di wê eywana teng de, di bin dengê stran û bêhna tirş a parfûmê de henase li min çikiyabû

Erê neynika min, sibê zû min çavên xwe ji xewê hişyar kiribûn, hem heyecaneke bêwate li ser min bû, hem jî bîranînên min ên belek li hişê min diçirûsiyan. Hêj kes hişyar nebûbû, li bajarên verêja rojê piştî tavdanê dest pê dikir; xewa spêdê luksa

herî mezin a bajariyan bû. Yên me jî êdî bi ruh nebe jî, bi qalib û bi jiyara xwe bajarî bûn. Hingê min di nav cihên xwe de çavek li ajandaya Ehmed digerand, li ser rûpeleke spî wiha nivîsandibû:

Hingê,

Li pêş çavên min hemû reng qulipîbûn ser xîçeke geh spî dibû, geh reş. Di navbera wê xîçê de asoyeke bêdawî… Cihê ku aso û asîmanê dilistana min digihîşt hev tenê sîbereke vemirî bû: Cihê ku tav tîrêjên xwe lê ji dest dide... Cihê ku valahiyeke bêpayan lê dest pê dike... Cihê ku guman û sehm lê dinijinin... Cihê pirsiyarên bêbersiv ên li ber bawana dûverojê vebûyî. Di dilê min de ripîneke tînşikestî ya di reşetariya hêviyên min de bêgavmayî. Bêgavî. Westiyan. Canbêzarî. Û Ez!

Piştî salan ez diketim nava nivînên xwe. Li odeyeke teng, bi tenê û di bin sîvanê malbava xwe de. Li nêzî henase û hilma kesûkarên xwe; li mala xwe. Nivînên min sar û bi tenê bûn. Lê bêhna raboriya min jê difûriya. Ji duhî her tişt hebû; lê demê digel xwe gewdeyê min jî stûr û dirêj kiribû, ku vê jî dihişt ku ez di nav nivînên xwe yên kevn de rast nebim. Lewra jî min xwe bi ser hev de guç kiribû. Jûr gelekî sar bû. Her wisa, digel hizrên kûr û dirêj, xeyalên hêvîjen şeva sar û dirêj a kanûnê êdî cihê xwe ji roja nû re hiştibû.

Roja nû. Destpêkeke din. Asoyeke din a hêviyê. Careke din dê ronahiya rojê xwe dahêle hundirê tarîsanê û wê biçirîne; tîrêj dê ji jîngehê re silaveke nû bidin. Helkefteke rûtîn, lê xwerûraz, nediyar û nixumandî. Her roja nû jiyaneke nû ye. Vejîneke nû ye. Hebûneke nû ye. Lewra her ku roja nû dest pê dike hiltavêje dilê min. Bêdilî be jî, ji jiyanê re "merheba" dibêje hestên min. Ji mirovan re "rojbaş" dibêjin bendemaniyên min ên westiyayî. Pêjnek di hundirê min de dikeve destkolê û ji kûrahiyan gazî min dike, dibêje: "Îro dê tiştek çêbibe!", "Xwe ji vejîna nû re amade bike, tu yê biguherî" bes, mixabin gelek

rojên min tenê fotokopiya duhiya xwe bûn. Her çend dilopek guhartin pêk hatibe jî, ez pê nehesiyabûm. Lê, ya herî dilşewat jî ew bû, piştî salan; wextê li cihekî ez rawestiyam û min li raboriya xwe nihêrî, min didît ku qet çu tişt wekî destpêkê nemaye; her tişt guheriye. Hingê min digot, "Pa ji bo çi ez bi vê guhartinê nehesiyame? Qey her tiştek xwe bi xwe qewimiye?" Na! Ew jî ne rast e. Pa, hingê ji bo çi min qet çu tahm û çêj ji guherînan wernegirtiye? Qey min şiyana xwe ya tamstandinê ji dest daye? Na! Ez ji wê jî bawer nakim. Ji ber ku hê jî dilê min diperpite û bayê hezkirinê hêj jî li ser balayên dilê min dibe ececîk û babelîskên hêviyê li hestên min wertên...

Rojeke dirêj li benda me bû. Çawa be em dawetî bûn; me xwîşka xwe dida mêrî. Daweta wê bû. Roja veguhastina bûkê li mala bûkê xemgîn dest pê dike. Kesek ji malê diçe. Tirarek ji sifrê kêm dibe, bes mirovek jî ji nav malê diçe; ma qet tiştek heye ku cihê mirovan bigire. Her kesek, li gorî xwe xwedan cihekî ye. Gava ku çû jî, valabûna şûna wî/ê xwe dide dest û bi qasî hefteyekê duduyan bandora wî/ê li ser malê dimîne. Her wiha, ji bilî amadehî û berheviyên dawetê min tiştek gelek meraq dikir; aya yên me xwîşka min dabûn kê? Ew zavayê me yê hêja kî ye? Kî bû ew kes? Lê belê, rê lê nebû ku min ew pirs bipirsiya. Dê lomên min bihatina kirin. Bes, wekî din, ji aliyekî ve jî, ez her tim guhişîbûm; ka kesek dê li derdorê peyvekê ji nav devê xwe biveresîne an na? Bes, her wekî hemû kes bo vê yekê sondxwarî bin, qet ji çu kesî/ê wirtînek, an jî galgaleke bi vî rengî dernediket. Hingê, min ji xwe re got "sebir bike Mistê, sebir!"

Digel spêdeya zû berfê em pêşwazî kiribûn. Her dever spîtir bûbû. Kirasê spî yê bûkaniyê berî ku xwîşka min li xwe bike xwezayê li xwe kiribû. Perperûşkên berfê giran giran ji asîman ber bi erdê ve diweriyan. Her tiştî spî xuya dikir. Her dever spî diaxivî. Her reng bi spiyî hatibûn nixumandin. Tenê rengê spî serwer bû. Spî û perûşkên spî yên li ser hev dihatin

nijintin. Çiya di bin mijê tarî de veşartibûn. Bajar bi kirasê spî hatibû vegirtin.

Her wiha ber bi nîvroyê ve, vexwendiyên me hêdî hêdî diyar dibûn. Herçî dihat, ewil li ber derî xwe ji berfê dadikuta paşê diket hundir. Lê belê çu tişt li ber rapêçîna keşxwehiyê ya dawetiyan asteng nebû. Keç, afret û jin bi kirasên rengîn û poşiyên xwe yên xweser, law û zilam jî bi şal û şapik û cemedaniyên xwe yên xweser xemilîbûn. Ew vexwendiyên daweta xwîşka min bûn.

Êdî hejmareke hêjayî gotinê li mala me kom bûbû. Bêhna xwarinên xweş û ya vexwendiyan li xwe dakirî, têkil hev dibû. Dengê galegalên têvel û stranên dîwankî salon vegirtibû. Lê, ez hê jî bi tenê bûm. Kesî/ê çu pûke bi min nedida. Kesek bi min re têkildar nedibû. Kesekî xwe nêzî min nedikir. Tenê, bi çavên zîq min li keftûlefta dawetê temaşe dikir. Tenê, bi bêdengî, li goşeyekî veder ez di nava hizrên têvel û awirên bêwate de, wekî dareke hişkbûyî diçikilîm. Ez remitîbûm. Westa rênezanînê heta kûrahî û dehlîzên rîşên min geriyabû. Xem li min periyayî bûn. Ez êdî bûbûm dîlê xemê; ji ber ku min çu ji xwe nedizanî. Kesê xwe nedida aliyê min. Çu rû li gel min nedikenîn.

Wê rojê. Li wê derê. Di nava gerembola mirovan de, bi tenê û damayî... Yanî ez. Ez û şikestin. Ez û xemgînî. Ez û tenêbûn. Ez û vederhiştin. Hestên şêlû û dilekî westiyayî.

Perperûşkên berfa hûr didêviyan ser jîngehê. Rojeke sar ji zivistanê. Pûke û bager, di nava hev de bi ser bajêr de diweşiyan. Kizîna berfê bû. Bager gelekî himbiz dibariya ser bajêr. Bi qasî çend bihostan berfê rûzemîn dagirtibû jî. Pişpêyek... Berf bi misêwa dibariya.

Piştî salan...

Ezekî westiyayî. Dilekî helawistî. Hêviyeke nîvronî.

Xweziyeke bêşiyan û qudûmşikestî. Li kuncekî, ji mirovan veder, bi tena serê xwe… Befir, bêhemdê xwe, ji asîmanê jorî dadiweriviya xwarê; kulîlkên sivik bi bayê re li ba dibûn û li hewa direqisîn. Govenda perperûşkên berfê yên sar û spî. Yên ku dişibiyan rengê mirinê û miriyan. Her ji çi be –nizanim- bes, ji nişka ve dayika min diket bîra min û her wisa bagera hizran di ser hişê min re hêl dibû: "Ax û wax niha li nik min bûya dê çendî baş bûya! Qet nebe dê sebra dilê min pê bihata!

Piştî salan...

Saet diherikîn. Dema veguhastina bûkê hatibû li malbava wê. Wê, yanî xwîşka min deqeyên xwe yên herî dawîn li malbava xwe dijiyan. Mîna çûçikeke demê wê yê firînê hatibe, di navbera çav û birûyan de dê ew bibira û ji hêlîna malbavê bifiriya. Her kesek li dûv rizqê xwe diçe. Mirov koleyên rizqê xwe ne. Rizq! Ji bo jiyanê û berdewamiya jiyanê. Cenga jiyanê: Rizq. Benikê stûyê feqîr û hejaran. Tirsa rizqî; tirsa jiyanê. Hewldana xwe ji tunebûnê parastinê. Têkoşîna hebûnê. Ew jî aniha dê li dû rizqê xwe biketa û mîna çivîka hînî firînêbûyî, bifiriya û biçûya. Ji xwe re hêlînek ava bikira û lê akincî bibûya.

Berf li ser rûyê erdê akincî bûbû êdî. Nijintî bû. Hê jî, bêhemdê xwe dibariya; rêz dabûyê. Wekî rêza berîka aşî.

Piştî salan...

Li ser şaneşîna malê; li ber dîmena barîna berfê... di nava hizrên şêlû de... dilekî helawîstî! Tavilê, dengê stranan û dûre boşatiya mirovan: Keç û law, jin û mêr. Tev bi rapêça dîlanê, di bin kulîkên berfê de ji otoyên xwe peya bûbûn û her ku diçû nêzî me dibûn. Dengedeng bilind dibû, mirovên ku ketibûn ber xezeba berfê êdî hatibûn ber dergehê malê jî. Di bin berfê de govend hatibû girêdan jî. Stranên bideng ên ku komekê digot û ya din jî lê vedigerand dikir ku li dijî xezeba berfê li ber xwe bidin. Lê deng di bagerê re berze dibûn û lê difetisîn. Berfê

deng dadiqurtandin. Pêjn dicûtin. Piştî çend saetan nizanim, lê di nava dengê giriya jinbira min de, bi xemleke bûkanî xwîşka min ji dergehê malê derdixistin û ew dibirin. Li her du milên wê du jinên xemilandî ku navsere dixuyan, ew dibir û gav bi gav ji malê derdiketin. Çûçik êdî ji malê difiriya û ber bi wexera xwe ve diçû.

Aha, wê kêliyê, di nava wê gerembolê de; di nava dengê girî û stranan de ew. Rûyekî nasyar, xemleke lêhatî, bejneke bilind û darêtî, meşeke giran û du çav: Di navbera çav û birûyan de awireke bişewat. Dilê min şewitî; agir û pêt pê ket. Ji nişka ve, -demildest- di wê kêliyê de keleke sarogerm bi dilê min ket. Çimkî ji nêz ve, pir ji nêz ve çavên min li awirên germ ên Sosinê dialiqîn.

Piştî salan...

Piştî derbasbûna dewr û heyamên dûvdirêj. Piştî cebirîna hin birînên kûr. Piştî tûgirtina kulên bisoj. Piştî sarbûna ariya bizotê dilê birîndar. Yanî, bi kurtebirî; piştî salan. Piştî werçerxana hestên tolaz û sava. Piştî şikestina hemû hêviyan. Piştî herifîna hemû xewn û xeyalan. Piştî, heyameke ku tam min digot “Ji bîra min çûye”, “êdî ew rûpel hatiye pêçan”, ligel dêvandina kulîkên sivik û sar ên berfê. Li wê derê, li ser balkona malbava min, di wexta veguhastina xwîşka min a hêja de... Di navbera çav û birûyan de; dîsan ew du çavên watekûr ên dişibiyan çavên Bîşengê, awirên germ ên ku min digot belkî li ser rûyê erdê tenê aîdê Bîşengê bin, li çavên min dialiqîn. Hingê yekser helişkiftin hemû birînên kevn.

Piştî salan...

Dilê min li depê singê min hilnehat. Bêhemdê xwe diperpitî. Hiltavêt. Radijenî. Rajen hilkişiya jorîn. Ez gêj bûm. Lê belê çavên min nedikarîn xwe ji lênihêrîna wê vegirin. Careke din, careke din, careke din... min bala xwe dayê. Çavên

min wekî çavên nêriyê xirabûyî beloq bûbûn. Demildest, li cihê xwe rawestiya; paşê, bi paş xwe ve zivirî. Berê xwe da min. Wê bejn û bala lihevhatî, ku fîstanekî spehî ew hêj spehîtir dikir lê, girnijîneke sivik li ser wan lêvên tenik û lihevhatî, çav wekî çavên xezalan ripî reş î zeytûnî ku kildayî bûn, ketin nav çavên min. Di navbera kêliyekê de ez ji serî heta binî pîvam. Dûre, bi sivikî lêva xwe ya jêrîn da ber didanên xwe yên jorîn û ew gezî. Paşê, bi zimanê xwe lêva xwe paqij kir; alast. Kenî. Keneke germ û têper. Te digot ka bi wê kenê mexrûr re dilê min diperixîne. Çavên min mane ser bejn û bala wê. Porê wê dirêj bû, bi ser milên xwe de dahêlabû û bi bayê re difiriya. Wekî guliyên şengebiyekê. Bi îşareta çavan silavek da min. Silavek! Çend caran serê xwe bi sivikî hejand. Ji spîkên çavên wê çirûskên germ diçirûsiyan. Rû dikenî; rûyê geş li ber lehiya girnijînê bişkivîbû.

Hingê, bayê dudiliyê ez pêçam. Di nava xwe de ez hizirîm, dilê min bêhemdê xwe hiljenî. Xwîna min ber bi wê ve te digot qey diherike. Hingê min jî hêdîka serê xwe hejand û silava wê wergirt.

Piştî çûyina dawetiyan bi çend deqeyan ez li ser şaneşînê mabûm û min çûyina wan temaşe kiribû. Hingê Sosinê heta li otoyê siwar bû sê caran serê xwe zivirand û li min nihêrî. Erê neynika min, wê kêlîkê ez li umrê xwe yê borî fikirîm, min heyfa xwe bi salên ku wê kêlîkê ez wisa hizirîm ku vala û pûç borî ne, anî, di terazûya hişê min de Bîşeng û Sosin hatin û çûn, wê demê ez fikirîm ku dilê xwe bi singeke germ vedim û kela zayendî ruhê min vegirt.

Kela zayendî...

Tola zayendî. Hişm û kerba zayendî. Yekîtiya dijberan a zayendî. Neynika min, ez çawa bibêjim; dijberiya zayendî ya ji qedîm ve ye di bin ajo û palderên me de veşartî. Te dît, ji nişka ve hilçû; mêr kete dû cazîbeya kêşînde ya jinê û jin jî li bin

beraşê hişk ê mêrî hate perçiqandin. Jin mêjînde ye, lê mêr perçiqîner... Yek dimêje, yê din diperçiqîne. Jin dikişîne herzêl û dehlîzên xwe, mêr dikeve nava wan herzêlan, jin di nava xwe de dihewîne û tovê jiyanê dimeyine, mêr tovê xwe direşîne, wê aîdê xwe dibîne… Pevçûna di navbera hişkayî û nermahiya jiyanê de. Jin wekî gerasîska li mendahiya aveke rawestiyayî ye; mêr dişibe pêlên har ên ava herikbar a di paxila sûlavekê de diherike. Lewra, di babelîsa kela zayendî de dilê min li bin siya azweriyê rabûbû serhildanekê. Li dijî nermijokiya jinê. Lê, min qet dil nebû ku lomên xelkê bianiya xwe û navê xwe qulipandiba 'sistemêr'iyê. Lewma, ji bo min, rûmeta zayendî jî girîng bû. Her giya li ser ripinê xwe bimaya dê xweşiktir bûya. Dê bikêrtir bûya, dê sûdewertir jî bûya.

Heyho heyho awêneya min, heyho bo vê dinyayê!

Her jîndarekî beblê (hevrikê) xwe heye. Her yek li hemberî tiştekî daşikestî ye. Heye ku ez jî wisa li hemberî awireke germ a jineke xweşkûk daşikestî bûm. Ji ber çi û ji bo çi? Min qet bersiva vê nezanî. Ez bawer jî nakim ku dê bizanibim jî, bes; hema ya ez pê serwext bûm ew bû ku: Wê ripên dixist dilê min, qelbê min li ber wê diperpitî, xwîna min her wekî cezbkirî, bi ber wê ve diherikî, çavê min di rasta wê de ji cihê xwe derdiketin; wekî du stêrên berbangê yên ku xwe dadihêlin nava asîmanê çikî sayî, wisa dibiriqîn û hişê min li hemberî wê dixetimî; wê ez vedigirtim û wekî gerasîska goleke mend ez dikişandim nava tenûrkên (dehlîz) xwe. Heke te rastî bivê; bi rastî jî min gelekî hewceyî bi jinekê hebû.

Ez di cihê xwe de sekinîbûm. Wekî dareke hişkbûyî behitîbûm. Dawetî ji mêj ve li erebeyên xwe siwar bûbûn û ji ber derê mala me dûr ketibûn jî. Sosin jî her wisa.

Li nik me edet bû, piştî dawetê bi sê rojan vegêran hebû: Zava û malbata xwe ligel keça malê dihatin vegêranê.

Surprîz...

Hin caran xweş, hin caran jî gelekî tewş in ew. Hin caran geş dikin lê hin caran jî reş dikin ew. Ango dohnê wan hin caran lê dihat, hin caran jî lê dihelingaft. Kê dizanî ka kîjan aliyê madalyonê li benda min bû? Pa kê dizanî! "Mêvanê mala bavê min, mêvanekî pir î pir ezîz e lo!..." Wisa dest pê dike û didome straneke kevn. Her ji çi, wê gavê gotinên wê strana kevn dihatin bîra min… "Mêvanê ezîz!" dê hatiba. Zavayê me; mêrê xwîşka min. Di navbera van hizran de, dengê çenga derî hatibû bihîstin. Berê, gimegimek kete guhê min; bixêrhatin û dengê keneke ter û bilind. Ev deng ji milê hola ber bi odeya em lê ve, bilind dibû. Êdî derî vebûbû û mêvan ketibûn jûrê. Berê çend jinên navsere, keçeke ciwan xuya bûn; bi dû re, du zilam û herî dawyê jî xwîşka min û ew. Ango zavayê me. Kesê ku min nasnameya wî pir meraq dikir.

Zavayê me, mêrê xwîşka min, kesekî nas bû; nasekî ku hêj ji zaroktiyê ve îmana min jê diçû. Çawa çavên min û wî li hev teşqilîn, xecele li min ket; ez di cih de veciniqîm. Zû bi vî halê min serwext bû, lewra zû xwe da hev û girnijîneke sar li ser rûyê wî yê kirêt venişt. Mirûza wî tirş bû. Kuxiya. Her wekî pariyek di qirikê de asê bûbe, wisa kuxiya. Belê neynika min belê, vêca, ka tu li vê siûda xirab binêre! Ji kerema xwe tu vê trajediyê danasîne! Ez bextê te, ca tu pênase bike, ka navê vê çîrokê çi ye? Ev bext û siûda neçê li ku heye? Mirovê bêbext, Saloyê Keşkanî, kujerê bav û birayê min, îro dibû mêrê xwîşka min. Bêlome awêneya min bêlome, heke dayika min sax bûya îro ev tişt nedihate serê me. Hê jî zêmara dayika min li ber guhê min bû û lewma careke dîtir bi hezaran cam di mejiyê min de dişikestin.

Bi rastî, çavên min bar negirtin, ez gelekî li nik wî nehezî rûneniştim, lewma jî, bi kerb ez ji cihê xwe rabûm û min di wê zivistana tûj de, bêyî ku hinekî bêhna xwe vedim, bêyî ku biçim

Bîşenga xwe bibînim, an jî li dûv Sosinê biçim, qasidan rêkim, bi hincetekê biçim Xanê lê bigerim ka çi tov keç e; hema yekrê min berê xwe da çarsûyê, ji wir jî ez çûm ji bo dotira rojê min bilêta xwe birî û bêhna kurt min li bajarê Stenbolê veda.

Erê neynika min, jiyana min êdî gişt bûbû rev; ancax reviyanê ez hinekî tenha dikirim. Piştî salan, vegera min a yekem a bo welatî wekî kulekê di dilê min de dima û ji kerb û qehra xwe min careke dî xwe bi bayê dûriyê wer dikir û hemû tiştên lipeymayî di wêrana dilê xwe de çal dikir.

Min êdî nedixwest rûyê tirş ê jiyanê bibînim û bêhna genî ya devê nemerdan bêhn bikim. Lewma jî min riya reviyanê hildibijart da ku di siberojên vegeriyanê de bihêztir û xurtir bibim.

****

# Dîmena dehemîn “rondik”

*Rondik ji cihê ku tên*
*Kerb û tola di êtûna evînê de*

Piştî sê çar deqeyên dî ez ê ber bi herzêlê dilê xwe ve biçûma û min ê berê xwe bida nav êş û kulên ku li herzêla dilî veşartî mane. Êdî dilê min li xerîbiyê bi ‘heke’yan ve bûbû kela pirsan û di nava xwe de dikeliya. Lê ji aliyekî ve jî ez pir westiyabûm, bêyî ku bi tirsên xwe rûber bibim jê bizdiyabûm; ez gelekî tirsiyabûm û vê tirsê jî ez gelek newêrek kiribûm, xasma heta niha çu kesî/ê tov û bizirê ‘heke’yê neçandibû, lewma piştî dudileyeke bêeman, ez ê ber bi welatê xwe yê ku dê ava cuha jiyana min lê biherikiya ve biçûma.

***

Neynika min!

Dem diçû; salek, du sal, piştî daweta xwîşka xwe bi sê salan, îcarê rojeke xweş û germ a çilê havînê bayê dilê min dîsa berê min dabû welatê çiya, bajarê şair û edîban, hêlîna evînî û evîndariyê, warê kûstan û zozanên deşt û pan ên li ber keviyên befirê, terazin û mêrga bi hezaran celeb kulîlkan, welatê rondikên gulnixwînê, Hekariya mîran…

Culemêrg dişibiya banûya çîrokên kevn; çavekî wê dikeniya,

çavek digiriya; bi havînê ne bawer im ku cihekî dî ew qas xweşik bikemile, ez ne bawer im, ku cihekî dî li ser rûyê erdê wisa xweşik û bêhnveker hebe.

Erê neynika min, li vî bajarê biçûk ê ji bîra her kesî/ê çûyî, mirovên rûken û xwîngerm mirov wisa dikirin aşiqê wê derê, her bihosta wê êşeke cudatir bide mirovî jî, bêyî wê mirov nikare debar bike, bêyî wê jiyan sar, dil kul, çav her bendewar in.

Rojeke xweş a havînê…

Li mala me ya bajarî. Ez û Tajdîn. Danekî berêvarê, dema ku tîrêjên rojê hêdî hêdî ber bi xatirxwestinê ve diçûn. Li ber siya dara spîndara ber derî. Bi tenê, çend çivîkan li ser spîndarê dileyîst. Alîça ber derî stewiyabû, madê mirov diçûyê. Li derve hewayeke pir û pir xweş hebû. Peyalên me yên çayê nîvî li ber me bûn. Ji mehan tîrmeh. Dar û dehl êdî tarî bûbûn, tû û sêvtalkên havînê, helhelok û alîçe gihîştibûn jî. Hingê hizra min ez dibirime Xanê, sêvên wê derê yên navdar ên tahma wan piçekî bertirşî dihatin bîra min.

Ez berî çend deqeyan gihîştibûm, min ji xwe re wisa plan kiribû; piştî ku min çenteyê xwe daniya malê ez ê yekrê biçûma dîtina Bîşengê, lê gava ku ez hatim, ji ber ku Tajdîn li malê bû, li ser şaneşînê çay vedixwar, min jî şerm kir ku rabim, ji ber hindê jî piçekî bêdilî xwe ez li kêleka Tajdîn rûniştim û piştî bixêrhatin û sax û silametiyê me bi hev re dest bi vexwarina çayê kiribû. Di dilê xwe de ez difikirîm û min ji xwe re digot, “Çawa be, hêj ez gelekî li vir im, rojên Xwedê gelek in, ku saxî hebe, dê roj têra her tiştî bikin.”

Tajdîn ez matmayî hiştibûm, digot, “Mustefa, umrê te ji sihê derbas bû, êdî qewlê te hatiye ku em dawetekê ji te re bigerînin. Dinya pûç e, ma tu jî heta dawiya umrê xwe li dûriyê nabî, ku li wir bî jî, divê tu jî bi mal û menzel bî, bi zar û zêc

bî. Tu zanî, jin jiyana mirovî diguhêrin, bi tenê nabe, lazim e tu demekê ji demekê zûtir tiliya xwe dirêjî keçekê bikî da ku em jî biçin wê ji te re bixwazin. Dibêjin, Feqî Huseyn keçeke baş heye, tu jî van rojan bi hinceta seradanê here gundî, here sera jinxala xwe jî, bi hinceta serxweşiya Xalê Ferzende."

"Çiii!" ez di cihê xwe de behitîbûm, "Tajdîn, biraxulam, ew tu çi dibêjî, behiya çi, serxweşiya te; bextê Xwedê, ma xalo miriye…"

"Mustefa bira, em mirov hemû dawiya dawîn her tovê axê ne, her dê bimirin." Hingê dengê Esmayê ji wê de hat û ji nişka ve têkilî axaftina me bû,

"Ne wele Tajdîn, wisa nîn e, hemû mirin jî ne mirin in, mirina bi destê zalim û bêbextan.."

"Çi, Esma xwîşkê, tu çi dibêjî…"

"Mustefa Esma rast dibêje, xalê me ji aliyê cendirmeyan ve hat kuştin."

"Çii!!!"

"Ne wele Tajdîn, "Heke kurmê darê ji darê nebe çu zewala wê nîn e." Zavayê we yê bextreş xalê we daye kuştin."

Wê kêlîkê heçko aveke sar bi serê min de kin, ez wisa veciniqîm, şikêlikê serê min rabû, çavên min sor bûn, îfadeyeke har kete ser awirên min, peyala çayê ji destê min ket û min destên xwe guvaştin, guvaştin û hingê bi hezaran cam dîsa di mejiyê min de şikestin.

Careke dîtir suprîzeke tal ez pêşwazî kiribûm, careke dîtir hatina min a malê, hêj li ser derazinkê di qirika min re mabû û hêviya dîtina Bîşengê ji bîra min çûbû.

Wê şevê xew bi çavên min neket, heta sibê ez di navbera

duh û îroyê de, di navbera birînên bav û birayî de, di navbera mirina dilsoj a dayikê û kuştina xalê de û di navbera Sosin û Bîşengê de dihatim û diçûm. Terazûya dilê min geh bi vî alî ve xwar dibû geh li wî aliyî. Li herzêlên dilê min êşên tûgirtî hemûyan bi hev re jan didan.

Spêdê ez çûbûm rawestgeha mînîbusan a Xanê. Dilê min li depê singa min hilnedihat, heyecaneke bêeman ez vegirtibûm. Piştî salan, eve cara yekem bû min berê xwe dida Xana Sêgundan. Kelejana germa tîrmehê bû. Piştî nîvroyê saet li derdorê du û nîvê min xwe li Xanê dîtibû.

*

Ez piştî salan li Xanê bûm. Rojeke germ a havînê, asîman çiksayî bû, dar û ber di xemlana xwe de bûn, sêvtalk stewiyabûn, çend libên zer ketibûn mişmişan, xiyar bûbûn tûtik, bacanan kerik dabûn û tû gihîştîbûn.

Havîn bû, ez piştî salan ji riyeke dûr hatibûm. Li serê Çelê Dugeh belekiyên befirê hê jî hebûn, dar û daristanên li çarmendorên Xanê dişibiyan bûkeke xemilî. Havîn bû, germ bû û bi salan şûnde, ez wekî mêvanekî serxweşiyê li Xanê bûm.

Bi dîtina piştî salan hestekî pir rengiz û erjeng li min peyda bûbû; min wê kêlîkê êşeke giran li kûrahiya dilê xwe seh kiribû. Ez ji serî heta binê piyê êşiyabûm.

Havîn bû, germ bû; rondikên min bêyî hemdê min di hinarikên min de gêr bûbûn ser gerdena min, di bîskekê de, her tişt hatibû pêş çavên min: Bavê min, dayika min, Ehmed, qesra me, û umrê min ê ku li vî warî bihurî… Min bi baldarî çavên xwe li derdorê gerandin: Bi min pir ecêb hatibû, min qet bawer nedikir ku min ê bi çavê serê xwe careke dî Xanê bidîta, lewma jî min ji çavên xwe bawer nedikir ku ez va ye li wir im. Bi dîtina ewil, her tişt ji berê biçûktir hatibû pêş çavên min, lê nizanim bo çi, belê axa mirov lê mezinbûyî, ava mirovî jê

vexwarî, çiyayên gundê mirovî gelekî bi mirovî şirîn dihatin.

Min axîneke kûr berda, nefeseke dirêj hilkêşa; wisa bû, heçko ez ji nû ve têm ser darê dinyayê, heyecaneke têkel xemgînî, hestekî di navbera kovandarî û dilşadiyê de ez bi seranpê vegirtibûm.

Ez piştî salan li Xanê bûm. Li Gundê Axayî; sê taxên vî gundî hebûn: Qesrê, Berojî û Biharkê. Mala xalê min li Gundê Axayî, li Taxa Qesrê bû, Feqî Huseyn jî piştî sotina Gundê Mizgeftê hatibû vê derê li Taxa beramberî Taxa Qesrê li Taxa Berojî bi cih bûbû. Ez bi şev mêvanê Feqî Huseyn bûm: Li ser derazinka malê ewil çavên min bi bejna xweşik a ku gîsiya xwe li dilê min hiştibû, du çavên tijî ken ên di daweta xwîşka min de sewda ji serê min biribûn, ketibûn, piştî bixêrhatineke germ a Sosinê, dayika wê ya navsere Gulê ji hundir hatibû pêşiya me, bi îşareta çavan gotibû Sosinê ka mînderan bîne, piştre ez û Feqî Huseyn li ser behweya wan, li bin siya darbîşengê rûniştibûn.

Feqî Huseyn hingê nêzî heftê û pênc saliyê hebû, jina wî hinekî ji wî ciwantir xuya dikir; lê Sosin ku ew keç tenê wan hebû jî, di bîst û du saliya xwe de bû, bi qasî heşt salan ji min biçûktir bû.

Ji ser behweyê ve Taxa Qesrê gelekî xweşik xuya dikir, heta Birêlkî mirovî her der didît û ji aliyê jêr ve jî, heta Dûpirkê, kavilên gundê Mizgeftê ji wê derê ve çavên mirovî pir xweşik dihingaftin. Zevî giş çandibûn, Deşta Xanê bi seranpê bi keskeşînî dibiriqî, hûnebayekî sivik belgên daran hêdîka dihejandin, ji aliyekî dî ve dengê çûçikan, banga dîkan û xuşîna dilveker a avê têkel hev dibûn. Gundî pir bêdeng xuya dikir, mirov li vir dihate ser hemd û hişê xwe, mirovî hay ji xwe dibû.

Berî ku ji me re çayê bînin, meta Gulê di destî de cerek û sê çar şerbik ji nav baxçeyî hat; şerbik danîn, tijî dewê sibitkirî

kir û got, “Kurê min, tu ji riyeke dûr hatî, germ e, niha devê te ziwa bûye; vî dewî vexwe da ku piçekî bêhna te verise.” Bi yekqurt min dew bi ser devê xwe de kir. Piştre careke dî şerbikê min dagirt û bibişirîn got, “Mustefa, dûvê zemanan çendî dirêj e, min qet bawer nedikir ku dê yekî/ê bi saxî ji mala we bibînim; ya rebî, eve çi bela ne hatine serê we…” Hingê min bi hûrgilî bala xwe dayê: Rûyê meta Gulê daçikiyayî bû, pişta wê piçekî xwîs bûbû, porê wê yê kej û spî di bin xêliya wê ya reş de kêm xuya dikir, biskên xwe badabûn, ew di sûretê wê de şor bûbûn xwarê. Hingê gava min başebaş lê nihêrî wê dayika min anîbû bîra min.

*

Êvarî em her çar bi hev re çûbûn mala xalê min, piştî serxweşiyê hingorê şevê em dîsa vegeriyabûn malê. Behweya Feqî Huseyn gelekî xweş bû, cihekî bênhatî bû.

Pîremêr û pîrejin zû radizên, gewdeyê wan ê westiyayî zû teslîmî xewê dibe. Lewma ez û Sosin bi tenê mabûn hişyar. Bêdeng me li ser behweyê çay vedixwar, ji bilî dengê sîsirkan ku wekî senfoniyeke lihevhatî bêdengiya şevê diçirand, çu deng nedihatin. Gund pir bêdeng bû; ronahiya qesr û avahiyên taxa Qesrê û taxa Biharkê gelekî xweşkûk diçirûsîn, aliyê Gundê Mizgeftê jî di nava reşetariyekê de bû; Xana navdar a qedîm jî, wekî bêhnvedangeheke navbajarî xuya dikir.

Havîn bû. Şev bêdeng, ez bêdeng, Sosin bêdeng û hişê min bêdeng bû; carina hizra min diçû nik Bîşengê, min wê gavê pir meraq dikir ka ew bi çi halî ye… Hingê Sosinê bêyî ku navê min bibêje got, “Tu dê li ku derê razêyî, ez cihê te li ku raxim?” Min hêdîka serê xwe zivirand, rûyê wê baş xuya nedikir, tarî bû, min got, “Ferq nake.” Tiştek negot, hêdîka çaydank û peyale rakirin û birin hundir, piştî çarêkekê heta navderiyê şaneşînê hat, ji wir dîsa bêyî ku navê min bibêje, got, “Min nivînên te li vê odeya milê rastê raxistine, ku çûyî odeyê deriyê

derve nehêle vekirî.”

Ez sibê zû bi dengê dîkan re hişyar bûm, -nî dilê min- pir zû bû, lê ku ez rabûm, Feqî Huseyn û meta Gulê ji mêj ve çayên xwe jî vexwaribûn û li ser behweyê, berî tavdana spêdê rûniştibûn. Hingê ji nişka ve bîra min hatibû dayik û bavê min, ew jî tim wisa bûn, berî me hemûyan radibûn û her tişt didan hev; Xwedêyo çi mirovên bi rêk û pêk bûn! Ew jî wekî wan bi dengekî bilind diaxivîn û nîvî bêhtir sohbeta wan bi ken û galgal bû.

Spêdê Xanê gelekî xweşik xuya dikir; her der şîn, her der tijî jîn bû. Bi hezaran bêhnên dilveker ên gil û giya ji derdorê difiriyan. Her der şên bû, şeng bû, rengoreng bû.

**

Hefteyek du hefte, hema bêje ew bûbû sê hefte ku ez li wir bûm, mêvanê Feqî Huseyn bûm. Em pir axivîbûn, li ser gelek meseleyan me gotin beyirandibûn. Ez li serê çaxeriyekê, di nava lêgerînekê de bûm, her wiha tovê tolhildana kuştina bav, bira û xalê min jî di dilê min de her ku diçû mezintir dibû. Çimkî her ku diçû min rastiya meseleyê çêtir dizanî û gelek tiştên ku haya min jê nebû, ez pê agahdar dibûm. Bav, bira û xalê min, wekî jinbiraya min Esmayê gotî bi bêbextiyên zavayê me hatibûn kuştin. Ez ê li dûv meseleyê biçûma.

Havîn bû, ji mehan tebax, li Xanê, li Gundê Axayî, ez mêvan bûm. Gelek caran ez dibûm şahidê sohbeta gundiyan; li dinyayê çi diqewime, ji bo wan zêde ne xem bû. Berê qet bala min nekişandibû lê niha gelekî bala min dikişand, sedî heştê sohbeta wan li dor fermandarê qereqolê digeriya. Ka fermandarê nû çawa ye? heke fermandar baş bûya eve bo heyamekê gundî rihet û aram bûn, lê heke fermandar ne baş bûya, eve fermana serê wan bû. Li gund hema bêje her kesî tivingek an du hebûn, eve jî bivê nevê bû; li vir mecbûr bû ku

te xwe biparasta, wekî dîtir jî divê tu biçûyayî nêçîra kew an jî pezkoviyan, ew jî edet bû.

Feqî Huseyn camêrekî gelekî nande bû, nedixwest ez biçim, nehişt ku ez şevekê bi tenê jî li mala xalê xwe bimînim, heta, ez pê dihesiyam ku dixwest keça xwe bide min, çimkî gelek caran ez û ew bi tenê dihiştin û bi hincetekê ji wê derê diçûn. Her wiha, her ku diçû min bêhtir Sosin nas dikir, gelek caran em bi saetan diketin nava sohbetên dûr û dirêj. Bi kurmanciya xweşik a hekariyê ji min re axaftinên gelekî germ dikirin, her roja paştir xwîna min bêhtir lê germ dibû.

Roj diçûn; havîn bû, germ bû, gelek caran ji bo avjeniyê ez jî bi gundiyan re diçûm Geliyê Jêrî. Av li wê derê germ dibû. Lê her çi gava ez di ber Gundê Mizgeftê re derbas dibûm û min çav bi wan kavilan diket agir berdida hinavên min. Çend caran jî ez çûbûm ser gora bav û birayê xwe, min mistek rondikan jî li wir dibarand.

Rojekê ez û Feqî Huseyn çûn nav kavilên me; qesra me kiribûn cihê kotana pezî, birka ber derî ziwa bûbû û tijî pişkul bûbû, baxçeyê me ji bilî dara tûyê hema bibêje rût û rewal bûbû. Agir bi dilê min ket. Li nava kavilan bîranînên min diêşiyan; pêjna dayika min, bavê min dihat bihîstin, bîst û yek salên min ên li wir, di carekê de di dilê min de dişewitîn û di zêhna min de careke dîtir bi hezaran cam dişikestin.

Ez li Gundê Mizgeftê bûm, nîvro bû, germ bû, erd disincirî, ji kavilên qesra me bêhna rêxa pezî diçû ber felekê; kêzên gûgivêr li ber sergînan dihatin û diçûn, li ser dîwarê Mizgefta gundî ku tenê kavilê wê mabû, kundekî dixwend.

Gundê Mizgeft bi wî halê xwe dişibiya berojê kimkiman (gumgumok), kêlûle û beqmaran dîlan lê digerand. Têhna tirsê lê hêwirîbû, bêhna mirinê jê difiriya. Bi wî halê xwe wekî birîna birîndarekî kêmgirtî jan vedida.

Ez li ser tenişta birkê rûniştim, qidûm li min şikestibûn, bêhna min çikiyabû, qiriktaliya giriyê gewriya min ziwa kiribû, rondikên germ û sû, li çavên min dilop bi dilop diniqutîn. Feqî Huseyn li ber dîwarê mizgeftê dewra xwe dixwend, ez li ser tenişta birkê li bin siya tûyê rûniştibûm, binê wê tijî tû bûbûn, hinek jê bûbûn tûhişk û moriyan ew bi penda xwe ji bo kulînên xwe vediguhastin. Her tişt di hizra min de radibû çargavan, heçko dayika min li wê derê ye, heçko bavê min dê bêhneke dî ji mizgeftê bê, heçko Tajdîn û Ehmed dê bêhneke dîtir bên li ser şaneşînê rûnên û dest bi şerê fîl û ferezan bikin û satrancê bileyîzin, heçko dê bêhneke dîtir Rondik û Rojbîn li nav baxçeyî ji xwe re bûkanê bileyîzin, heçko Ronahî û Bînahî dê bîskeke dîtir firavînê bipêjin… Heçko û heçko….

Erê, Neynika min, ez li ser kavilên qesrê hey digiriyam û hey digiriyam; piştre min xwe daqul dikir erdê, axa kavilan li rûyê xwe husî, bêhna şewata hinavên min ji axê dihat.

Havîn bû, meha tebaxê, li Gundê Mizgeftê di bin kelijîna germê de, ez û Feqî Huseyn li nav kavilên gundê şewitî, kavilên kavilkirî, milk û aqarê talankirî, digeriyan. Ez bi destê Feqî Huseyn ê ku danî serê milê min re veciniqîbûm, min hêdîka li rûyê wî nihêrî; rihê spî yê dirêj ku gelekî li rûyê wî yê şirîn dibaniya, ji rondikan şil bûbûn, ew jî têr giriyabû. Piştre ew jî li tenişta min rûnişt û me her duyan serê xwe kirin nav zendên xwe û em têr giriyan.

*

Piştî wê rojê bi sê rojan ez û Feqî Huseyn bi hev re çûn Gareyî. Bi wî temenê xwe yê navsalçûyî ew hê jî gelekî peyt bû, gelekî bi çist û çeleng bû û jîr bû. Di rê de min ji wî bêhtir bêhna xwe vedida. Em heta Geliyê Jêrî bi mînîbusa Gûzereşê çûn, li Ava Spî ku Feqî digot, eve sînorê me û Gûzereşiyan e, peya bûn; du xedareyên bingez bi me re bûn, me ew dan milê xwe û bi gavên giran me berê xwe da dilê Gareyî.

Rojeke germ a tebaxê.

Li çiyayan. Ber bi çiyayan ve. Li ber hewaya hûnik, li ser avên sar. Li nav mêrg û bîşiyan li ber bêhna nêrgiz, sosin, alal û beybûnan. Dav û ûşiyên nefelê li serê zinaran dihejiya bi bayê re. Gêndel û çevir, kerkol û heliz di kamlana xwe de bûn. Tîrêjên hetavê li ser Ava Spî û kanî û sûlavên ku ji her derê hiltavêtin leylan didan. Dengê kew û teyrê bazî li nizar û berojan bênavber ji lat û şikêran olan dida. West ketibû ser me. Ji mêj ve bû ku em ewende nemeşiyabûn. Milik bi milik, gêdûk bi gêdûk me xwe berdabû nava dilê çiyayan. Em ketibûn hundirê wê bihuşta bêhemta. Li şûna zozanan. Çiya xwedî ruhekî xweser bû: "Berahiya çiyayan çendî xweş e. Rûyê wan ê geş û zelal...", bi qasî ku hunermendekî navdar dipesinand, hebû. Heta ku hêj xweşiktir bû. Cihê şikê lê nebû ku, çu tekst û gotinên şair û edîban nikaribûn wê muhteşemiyê vebêjin, gotinan têr nedikir, diviyabû mirovî bijiya, ji ber ku ew gelekî ji tekstên şairan wêdetir bû. Bedewiyeke nedîtî. Dibe ku ya digotinê 'bihûşta baqî' ev der bû.

Gare xwedan spehîtiyeke bêhempa bû. Her ku em li tenişta Ava Spî ber bi jorahiyên Rêjgarê ve hildikişiyan dilê me ron û geştir dibû. Çend çevrebî li dora Ava Spî hebûn, cih bi cih kanî û bîşî derdiketin pêşberî me, her qurta avê ku me vedixwar em têhntir dikirîn, mirov ji ava Gareyî têr nedibû. Nermebayekî hûnik rûyê me diperixand. Her ku em nêzî dilê Gareyî dibûn, dengê teyran li şikêr û latên ku bi qasî dused metiran bilind bûn deng vedida. Pênc latên navdar ên Gareyî hebûn: Ji milê rojavayê ber bi Sersûlê ve Lata Bangî, Lîsê Teyran, Lata Hecîmendî û du latên ku li dorên Geliyê Bilkî werhatibûn, wekî govendê mil dabûn hev. Li singa Lata Hecîmendî ber-reh û ber-razeke wekî navderê hebû, li gorî Feqî Huseyn ew cihê Hecîmendê Latê bû. Wî çîroka Hecîmendî jî ji min re gotibû:

*Hecîmend li Pîrî bû. Pîrî gundekî êkmale ye, li binê Gareyî ye; saetekê bi peyayî dûrî Gûzereş û yekê jî dûrî Xanê ye. Li wir perestgeheke gelekî kevnar heye, ew mal jî wekî micawir û zêravanê wê perestgehê li wir bû. Binyadê wan êzidî ne, ji pîrên wan bûn ji ber hindê jî navê cihî jî bûye Pîrî. Dibêjin, wan her êvarê çiraya Hecîmendî vêdixist; ango Hecîmend navê muşayîxê wê perestgehê bû. Tabir bû, kê miraz û mexsedek hebûya dihae ser wî; demildest çêdibû, mirazên mirazxwazan hasil dibûn û êş û tayên tayiyan bir dibûn. Dara Tewkê ya li ber deriyê Hecîmendî ji kindir û pateyên rengoreng diteyisî. Dibêjin ku li ber derê Hecîmendî dareke kevotê hebûye û du guhanên wê darê hebûne, ji çiçikek wê hingiv ji ya dî nivîşk hatiye. Ev nivîşk û hingiv qudretî bûne. Semta Hecîmendî dikeve navbera Xanê û Gûzereşê, hingê ew gelî rêbiwara koçer û bazirganan bûye; ji Mûsilê ber bi Geverê ve bazirgan di vê riyê re derbas bûne; bi xwedayî wisa bûye ku çend kes bihatina Hecîmendî têra wan hingiv û nivîşk ji guhanên wê darê zaye. Dibêjin, rojekê ji rojan axayê Çelê riya wî ketiye wî milî, li wir zêrevanê Hecîmendî jê re ji wî hingivî û nivîşkî pêşkêş kiriye, lê axayî li halê zêrevanî nihêrye û gotiye, "Evdalê Pîrî, ez dibînim tu gelekî halxweş nîn î, te ev hingiv û nivîşk ji ku aniye, bo min çîroka wê bêje." Evdal jê re negotiye, lê axa zordar bû, gelekî bi ser de çûye, wî jî ji tirsa sir û raza Hecîmendî aşkera kiriye, dibêjin demildest axa li wê derê kor bûye lê ji wê rojê ve ye jî çiçikên darê ziwa bûne.*

Ji wê derê ve Pîrî xuya nedikir. Ez û Feqî Huseyn êdî li biniya Latê Lîsê Teyran li ser Kaniya Berçiyayî rûniştibûn. Me mastê xwe kiribû nav ava sar a kaniyê û me ew dîmenên bêhemta yên tropîkal temaşe dikirin. Hingê Feqiyê heftê û pênc salî axîneke kûr berda, destê xwe da bin guhê xwe û bi wî dengê xwe yê zîz û zelal ku mirovî digot qey hêj sî salî ye, dest bi strandina heyraneke der barê Rêjgarê de kir:

*Gareyî bilind e pêşberî hindî dinê*
*Refên kewderiyan bir bi bir difirinê*
*Li kêrî milên jorî belekiyên befirê pal didinê*

*Li geliyê xwarê rûbarê Xanê xwerik dikevinê*
*Kes nizane ka bêhna*
*Gul û nêrgizan*
*Sosin û asmînan*
*Alal û beybûnan xweştir e*
*An sing û ber û bedenên şengedosta minê!...*

Erê neynika min, em li joriya çiyayan bûn; li wir çar demsal bi hev re hebûn; li jêriya çiyayan, li palikên beroj pûşikê havîne behiyabû û rengê payîzê dabûyê. Li nava newalan darên fêkî di kamlana xwe de bûn, tam havîn bû; Kora Selî ji befirê zeft bû û li binê latan te digot hêj serê bihara zû ye: Rêvas hê jî li wê derê hebûn, li ber keviyan pûnga taze, catir, mendê, alal hêj hema dikemilî, li hin cihan berfînan hêj hema serî radikir… Li şikêran nêrgizên çiyayî, sosin û asmînan hezar birîn di giyana mirovî de dikuştin.

Geliyê xwarê, li miqabilî me, newaleke kûr ber bi jêr ve dikişiya. Ji dûr ve rêzikên malan ku mirovî tê dernedixist ka ava ne, an kavil in, ên di nava hêşinahiya zeviyên çandî de, li dora rûbarekî zelal ku wekî xwerikên marekî bûn, mirov mest dikir. Feqî Huseyn digot, ev der gundê Gûzereşê ye û wî serhatiyeke xwe ya li ser Gûzereşê jî ji min re vegot:

Xalê Mustefa, gelek salan berê, hingê hêj ez di sî saliya xwe de bûm, ez û bavê te ji Mûsilê dihatin. Em çûbûn bazirganiyê, me hirî, gûz, hingiv, mazî û penêr bi xwe re biribûn û li beramberî wê jî ji xwe re perûk û çend telîsên şekir û hinek jî qesp kiribûn, lê şolê Xwedê xweş e, em li Gûzereşê asê bûbûn; ev geliyê navbera me û Gûzereşê gelekî ber-renî ye, ku pişpiyeke befirê bibare mirovî bawerî nîn e xwe bidê. Xalo, îcar em nêzî hefteyekê mêvanê wan bûn, hindî bibêjî nande ne, comerd in, lê di nava hefteyekê de me nezanî ku mezinên wan kî ne, bêserek bûn. Spêdeyê ji me re gulol lêdina, gulolên wan

bi rastî jî xwedan tameke cudatir in. Bi şev jî, her şevê em li malekê bûn, zilamên gundî hema bibêje giş li wir kom dibûn; şevbihurkên wan gelekî rengîn bûn; çi mêvan bî, çi jî gundî divê tu tiştekî bibêjî; çi stran, çi metelok, çi bizarîkirin, çi serhatî. Hema dor bigihîşta te, yekî digot, “Mêvan, ka tu jî gîskê xwe bide!” Her wiha hindî bibêjî mirovên dîndar bûn. Stranên wan ên dîwankî gelekî xweş bûn. Gûzên wan xwedî tameke cuda ne, wan bi hingiv re tînin. Lê niha tu dibînî, gundê wisa xweşkûk wêran bûye, bi qasî heft salan kes lê nebû, bûbû çol û çolistan, lê eve du sal in, ku piçekî tenahî ketiye dinyayê, ew jî havînan tên ser milkê xwe û zivistanê jî ji bilî bîst malan kes li vir namîne. Erê Xalê Mustefa erê, dinya wiha ye; wekî nanê sêlê ye ne ber e ne jî pişt.

Heyho awêneya min a xweşkûk, em pir axivîn, lê çi gotina ji devê Feqî Huseyn derdiket li êşeke dîtir dihingêvî; her der wekî gundê me bû, li vê erdnîgariyê barana zilmê li ser hemû banan bariyabû. Lewma Feqî digot:

“Lawê min, Serderî çemiyan binderî rabûn; pêleke berevajî ev welat vegirt; mirovên bêbizmar bûne serkêşê cihan, terazûya edaletê ber bi xirabiyê ve xwar bû, lewma jî dubendiyê mal û malbatên ciwamêran ji hev belav kirin. Tu dibînî kurê min, çerxa felekê li me vajî digere, eve çi bedbînî ye; Saloyê Keşkanî yê ku li ser coxîna me zikê xwe têr dikir, îro bi piştevaniya hikûmetê bûye nîrê ser stûyê me. Gundê me da xirabkirin, mirovên me dane kuştin û niha jî wekî nijdevanan her roj talana xwelîserekî radikin. Mustefa, berxê min, bêlome, heko mirovên ku tirsa Xwedê di dilê wan de nebe wisa rabibin serê jorîn çi tiştê xirab heye wê bikin.”

“Xalê Feqî, tu rast dibêjî, lê em çi bikin; em dişên çi bikin?”

“Heyho kurê min heyho, te meseleya Kerbelayê bihîstiye?” Min deng nekir. Piştî ku bîskekê bêdeng li rûyê min

nihêrî, bi sivikî bişirî û piştre wî domand,

“Kurê min, Huseynê neviyê Pxemberî li Medîneyê xwe vedişart; ji pasevanên Yezîd direviya; çima, çimkî li ser riya heq bû, bîadî Yezîd nekiribû, nekir jî. Her kesî/ê î rastî dizanî, lê Xwedê bela xwe bidê, hin dem û heyam hene, tirs ruhê însanan dîl digire, aha di demên wisa de xweşmêr diafirin. Mirov wê heyamê gişt çavtirsiyayî bûbûn û hemûyan li ber neheqiyê serê xwe tewandibû. Başî bûbû bêdengî, hema bibêje her kes difikirî ku ‘serê keçel di kum de baş e’ lê Îmam Huseynê nemir wisa negot, wî got, bila kum ji serê keçel rabe û serî hilda. Piştre têhnî û bêbextiya Kerbelayê rûda. Kurê min, umrê min heftê û pênc e, bi navê Xwedê heke îro mêrçakek rabe ji min re bibêje, da biçin ji vê neheqiyê re bibêjin bes e, ez ê duyê me. Ax xwezî niha ez di umrê te de bûma!”

“Va ye ez…”

“Çi…” Li min nihêrî, bi eniya min ve maçî kir, keneke xweşkûk li rûyê wî venişt, çirûskeke wisa germ ji çavên wî biriqî wê gavê min xwe wekî şêrê bîşiyan seh kir. Piştre dîsa li nav çavên min nihêrî û got, “Min dizanî, cuha av lê herikî her dê lê biherike; şêrê kurê şêran, welehî têjika şerî jî her şêr e. Mustefa tête bîra te, dayika te ya gorbihuşt her dem peyvek digot?”

“Erê Xalo, wê digot, ‘Şêr ji bo warê xwe têdikoşin’, bila dayika min qet xema nexwe û rihet di gora xwe de binive, eve kurê wê yê herî bêkêr jî, roja hilkeftinê wekî pilingê latan e.”

“Kurê min, eve ez û tu li serê riyeke zor û zehmet in; ji bo vê zehmetkêşiyê bila kêlîkekê jî dudilî li te peyda nebe, lê dua bike; ji bîr neke ku dua hawara herî nêzik e.”

“Çawa?”

“Dua xalo… Dua hawara herî nêzîk e ji bo ruhê mirov, hawara herî nêzîk e ji bo dilê mirov, hawara herî nêzîk e ji bo

jiyana mirov. Dua bike.”

Havîn bû, meha tebaxê, ez û Feqî Huseyn li serê çiyayê Gareyî bûn. Li miqabilî me Çiyayê Girî bi hemû spehîtiya xwe bi me re dibişirî; eynî wekî Ehmedê canemerg gotî, çiyayan li çiyayan dinihêrî; di dilê çiyayan de esaleteke veşartî ya nepenî xuya dikir. Ji serê Gareyî ve Çiyayê Govendê bi hemû delaliya xwe xuya dikir, li aliyê dîtir ji Çarçelan bigire heta Simbî, ji Çiyayê Reşkê bigire heta Sermedarê rengîn… Teyr difiriyan ref bi ref, ji her derê kaniyên avê hiltavêtin, avzem diherikîn, keviyên befirê diketin nav riya me; dengê bilind ê kewderiyan ji tehtan olan dida. Havîn bû, germ bû, lê wê derê hûnik bû, hûnebayekî bêhnveker rûyê me dialast.

Havîn bû; serê tebaxê, piştî xwarina firavînê ez û mamê Feqî di Geliyê Sehm re me xwe gihandibû lûtkeya Gareyê serberz, ku di payîzokan de dengbêjan gotibû, “Li pêşberî hemû dinê.” Hindî ku çavên mirovî qeter dikir, dîmen dawiya dawîn li pêş çavên mirovî dadigeriyan mijê û mirovî dûrahî di nav mijekî tarî de didît û piştre jî ew ji pêş çavan winda dibû. Çiyê paldabû çiyayî, geliyên bêbinî yên ku di nava çiyayan de dihatin nixumandin, piştre li mirov vedigeriyan.

Havîn bû, germ bû; ez û xalê Feqî li ser sertarên herî bilind ên Lîsê Teyran bûn; ev der lûtkeya herî jorîn a Gareyî bû. Bi sedan celebên teyran li wir kom bûbûn. Li pişt me goleke kûr a di nava şikêran de hebû; çarmendorên golê bi keviyên befirê hatibû vepêçandin. Ez û Feqî li kêleka hev rûniştibûn, serên me di nav zendên me de, çavên me li dûriyê dinihêrî û hûnebayê sivik rûyê me dipeland.

Em li serê Gareyî bûn. Gelî li ber gelî rêz dibû; hemû ser û sertarên çiyayên beramber li jêriya me bûn; ji wir ve Rûbarê Xanê wekî cuheke avê xuya dikir, dar û daristan mirovî digot qey giyayê nav hewşê ye. Bergeheke rengîn a keskeşîn serdestî Xana Sêgundan bû.

Havîn bû, meha tebaxê bi hemû spehîtiya xwe kemilîbû; germ bû, lê li dilê Gareyî hûnebayeke nerm bi ser rûyê mirovî de hêl dibû û bi dilovaniya dayikekê gûşiyên nêrgiz û sosinan dipelandin. Hingê ez li lûtkeya herî bilind a Lîsê Teyran rûniştibûm û li ajandaya Ehmed digeriyan çavên min, nameyek ji çiyayan re nivîsandibû, dîsa wekî her carê di wê nameyê de jî tercûmeya hestên min ên wê gavê kiribû. Erê neynika min, nameya Ehmedê Xanî wiha bû:

*Gava ku çav li çavan nenêrin,*

*Çiya li çiyayan dinêrin*

*Nameya min ji çiyayan re. Ji bêhna axê, ji dengê avê, ji tîna rojê re… Nameya min ji evîndara min re. Ji gula çiyayan re. Ji stêrka berbangê re. Ji gelawêja awirbangîn re. Ji karwankuja berşevîn re. Ji cotstêrkên miradan re. Ji hûrdestêrkên şevexwînan re. Ji kupê axa sar re. Ji ava ber keviyan re. Ji axa ku ew girtiye nava xwe re. Ji axa ku bêhna wê jê difûre re. Ji wan kulîlkên li ser girê axê şînhatî re… Ji wê re… Ji çi tiştê ku bêhna wê, tîna wê, pêjna wê jê tê re... Ji dilê min re; ji dildara min re…*

*Çiya bilind in, li çiyayan dinêrin.*

*Qontêra çiyayan tev bi zinar û şikêr in*

*Danê sibehan heta danê êvarî*

*Min çav bi rêka te ve kor kirin*

*Çiya li hev dinêrin. Ew bi heybet in. Bi sehm in. Bi deng in; deng ji çiyayan tê; dengên hezar salan. Dengê hezar celebê jîndaran. Dengê jiyanê, dengê mirinê û dengê xweziyan ji çiyayan tê. Dengê azadî û serbestiyê. Dengê miletan ji çiyayan tê. Dengê te ji çiyayan tê.*

*Çiya bilind in, li çiyayan difikirin*

*Rondikên min tên û qet xwe nagirin*

*Heke tu dûr bî, ez ji te dûrtir im*

*Heke tu xerîb bî, ez ji te xerîbtir im.*

*Çiyayan tu digirtî nava xwe; tu cezb kiribûn û tu bi xwe re dibirin. Çiyayan gotinên te ji te dizîbûn. Dilê te bi xwe ve girêdabûn. Tu ji min dûr dixistin; çiya hesûd bûn. Li ser evîna xwe dilerizî. Ji bo evîna xwe har dibû. Wê evîn tenê ji xwe re diviya; çiya çavnebar bûn li hemberî hezkirina min a ji bo te. Çiyayan tu ji min dizîn û tu bi xwe ve girêdabûn. Wê rojê min radibihîst ku tiştek bi te hatiye.*

*Gotinên te sist bûn wê rojê,*
*Keneke tirş li ser rûyê te niştibû*
*Awirên te pir sar bûn*
*Hişkebayên payîzî ji peyvên te dihatin*
*Tu li ser çûyînê bûyî*
*Li ser riya oxireke nediyar*

*Erê, ez ê vê nameya xwe ji çiyayan re binivîsim. Ji bo çiyayan dadirêsim gotinên xwe. Bila peyvên min ji çiyayan re biherikin. Ez ê çiyayan bînim ser gotinê û ez ê bo çiyayan bigerînim zêmarê û ji bo çiyayan li dar xînim govendê, semahê… Ez ê ji bo çiyayan xeml û rapêça zavatiyê li xwe bipêçim û ez ê ji bo çiyayan evînê bihewînim di nava dilê xwe de.*

*Çiya bilind in ez te nabînim*
*Teyr û tilûr li ser zinaran datînin*
*Kew û kewderî li hindav dixwînin*
*Nêçîrvan dewsê li dû xezalan digerînin*

*Çiya bi derd in; derdê wan giran e. Derdê çiyayan deştên pahn in, geliyên kûr in, avên sar in. Çiya dinalin. Çiya bêhal in. Derdê çiyayan viyan e. Ew bi viyanê hene; bi viyanê li ser xwe ne. Çiya bêyî viyan tune ne, mirî ne.*

*Çiya bilind in mijî baldayê*
*Keviyên berfê rêz girêdayê*
*Dilê malwêran ketiye derdê evînê*
*Dinale heçko dûpişkan pê vedayê*

*Çiyayan tu vexwarî. Tu bûye çiya û di nava çiyayan de berze bûyî. Wê rojê min dizanî ku tu yê ber bi wî dengî ve biçî. Dengekî berz ji çiyayan dihat. Lê min qet ji wî dengî hez nekiribû; mîna velerzekê di hişê min de diteqiya. Tezing dida laşê min. Ez digevizîm; nexasim wê kêliya ku min li nav çavên te nihêrtî her tiştî tê de xwe dida der. Tu li ser çûyînê bûyî. Tîna çavên te ne ez lê ew dixwest; ew, ango çiya… Lewma hingê qirpînek ji dilê min çû, xwîdanê ez pêçam, tayeke sar xwe berî dilê min da û hema demildest cihê xwe ji tayeke germ re guhast… Ji ber ku min winda dikir; tu diçûyî.*

*Wê rojê rûyê te guherîbû*
*Awirên te sist dinihêrtin*
*Kena ser lêvên te tal bû*
*Gotinên te her tişt vedigotin*

*Çiya li ber hev rawestiyane. Tu dibêjî qey li benda kesekî/ê ne; jivana wan heye qey! Erê, niha çiya careke din ketine bêdengiyê; careke din ew bi ser ketin; ji ber ku wan tu ji min stendî. Ew bi evîna te şa bûn. Ew bi evîna te vejiyan. Qey kulîlkên wê bêtov mabûn? Qey axa wê bêxwîn mabû? Lewra wisa har bûbû… Erê, min radibihîst ku ew harbûn ne harbûna xêrê ye. Wan evîna min ji min dixwest. Wan tu ji min dixwestî… Va ye tu stendî… Ma tu qet têr nabî ji evîna dilan çiya! De bila li te pîroz be!*

*Çiya li ber çiyayan çendî stûxwar in*
*Bi terazin û mêrg in, tev avên sar in*
*Rûbar dikişin tu dibêjî qey mar in*
*Gelî li ber gelî ji bo te cih û war in …*

**

Erê neynika min, Mustefa kirêt û bikêrnehatî li serê duriyanekê, di nava lêgerîna modela jiyanê de dê bi pîremêrekî heftê û pênc salî re biçûya ser mala zavayê xwe û ew birevanda, an jî bikuşta. Kê dizanî, belkî jî her di wê serdagirtinê de ew bi xwe bihata kuştin. Wisa xuya bû ku Feqiyê bavê min, dil hebû

keça xwe bida min û ev jî şertê wî bû.

Erê xwedîka min a spehî, mirovî çi bikira berî her tiştî divê mirovî xwe bida çespandin. Çi tişt hêsan nebû. Ji bo her tiştî berdêl diviyan. Ji bo her tiştî xwîdan diviya. Ji bo her tiştî rondik diviya; îza diviya, êş û cefa diviya, jan diviya, hesret diviya, ked diviya, ku hewce bikira xwîn diviya. Ez di nava agirê tenêtiyê de li perava deryaya evînê, bi kulên dilê xwe re di nava hesta tolhildan û xweçespandinê de, bi dilekî evînlêçalkirî dê biçûma ser mala zavayê xwe…

Min biryar dabû, mirin hebû veger ne mimkûn bû; an man bû an jî neman, çu rê û rêbazên dî nebûn.

****

# Dîmena yazdemîn "tolhildan"

*Dinya bi dor e*

*Çiraya kesî/ê heta sibê vêneketiye*

Piştî du sê deqeyên din ez ê ber bi otogarê ve biçûma da ku ez berê xwe bidim kevnewarê xwe û biçûma belkî vê carê qet nebe ji dûr ve min Bîşeng bidîta û piştre jî di şikêra herî asê ya jiyanê de, li ser lîsê dilê xwe ji xwe re hêlînek ava bikira. Min gelekî hewceyî bi hevjînekê hebû: Jin, zarok, mal û avahî û jiyaneke nû…

***

Bi banga îşayê re ez û xalê Feqî gihîştibûn Xanê. Em gelekî westiyabûn. Piştî xwarineke sivik Feqî nimêja xwe kir û dûre ew û meta Gulê çûn li odeya xwe nivistin.

Me bi xwe re rêvas, kuvark û siyabo anîbûn. Her wiha çend binên gulnixwînê û pê re jî min çend destikên nêrgizên latan anîbûn. Hingê ez û Sosin bi tenê di keratiya şevê de li ser behweya wan rûniştibûn. Germebayek diveziya nava bêdengiyê.

Sosin bêdeng rûniştibû, ez jî wisa, hingê wisa ji dilê min

hat, ez rabûm min desteya nêrgizan hêdîka da destê Sosinê; bire ber kepê xwe, bêhn kir, piştre spasî kir û ew qevda nêrgizan bir kire di şerbikekî avê de û ew danî ber pencereyê. Dûre careke dîtir hate nik min, ronahiya şaneşînê vemirand û got, "Mustefa ez gelekî ji şevê hez dikim; şevên vir gelekî bêdeng in", piştre jî li ser tenişta şaneşînê rûnişt û piyên xwe di ber xwe de berdan xwarê. Ez li ser piyan bûm.

Havîn bû, her derê min civa bûbû, ez gelekî westiyabûm. Hingê di tarîtiya şevê de dûvstêrk difiriyan. Wê kêlîkê Sosinê got, "Ayy Mustefa, şîrbirînk!"

"Çiii!"

"Şîrbirînk şîrbirînk…"

"Ha, dûvstêrk?"

"Erê…"

"Heko em biçûk bûn me jê re teyîsok digot…"

"Erê ez zanim. Lê dayika min ji wan re şîrbirînk dibêje."

"Çima?"

"Dayika min got, wexta em diçûn zozan, gava ku ev dûvstêrk derketina şîrê pezî kêm dibû. Ji ber hindê jî wan jê re digot şîrbirînk."

Şev bû, me her duyan bêdeng li dûvstêrkan temaşe dikir; te digot qey stêrk dirijin, wisa xweşkûk li derdorê diteyisîn û di bêdengiya şevê de direqisîn; dans dikirin. Dengê sîsirkan jî ahengeke hêj xweşkûktir dida wê dansa dûvstêrkan.

Piştre ez jî hêdîka li tenişta Sosinê rûniştim, rîşiyên bîşengê bi ser serê me de hêl bûbûn. Şev bêdeng bû, lal bû, kerr bû, germ bû û hemû laşê min herişîbû. Ez pir westiyabûm. Sosinê bi hemdê xwe got, "Mustefa, bajarên mezin çawan in?"

Ez qet li benda pirseke wisa nebûm, lê ew qas bi meraq pirsî, heçko ji mêj ve dixwest vê pirsê ji min bike. Ez bîskekê fikirîm û piştre min got, "Tenê navê wan mezin e. Nexwe ew bi xwe pir biçûk in."

"Çawa, ez tênegihîştim."

"Çawa bibêjim, nizanim, lê, bawer bike tenê navê wan mezin e, gelek mirov lê dijîn, qerebalix in, cezbeke wan heye, mirovî dikêşe nava xwe û piştre mirov xwe tê de berze dike; tu dikî nakî destên te jê nabin, lê tu tê de gêj dibî, germahiya dilê te tenê dimîne sersariyeke ruhdotî. Sohbet li bajarên mezin tên kuştin, mirov gava bi hev re diaxivin li rûyê hev nanihêrin; erê, peyvên herî nerm û kubar didin dûv hev, lê li bajarên mezin, her ku mirov lê zêde dibin mirov xwe tê de tenêtir seh dike. Mirov tenêtir dibe. Bajarên mezin, navê wan mezin e; lê ew bi xwe biçûk in, heta hîç û pûç in, çimkî ew mirovxur in. Mirovên mezin jî di hinavên wê de biçûk dibn."

"Tenê?"

"Ez çawa bibêjim, nizanim, erê, mirov tenê ye, çi bike jî, dawiya dawîn her bi serê xwe tenê dimîne. Her ku mirov bi xwe dihese, tenêtiya mirovî kûrtir dibe. Her ku mirov tenê dibe jî, bêhna mirov diçike, mirov di nava labîrentên xwe de difetise. Çawa bibêjim, her ku mirov di labîrentên xwe de li xwe digere, mirov pê dihese ku hewceyî bi keseke dî heye; keseke ku mirov bikaribe pê re jiyanê dabîn bike."

"Belê Mustefa, tu difikirî ku çi bikî?"

"Ezzz…"

"Îro hûn gelek westiyan?"

"Ma ji halê me jî xuya nake." Bêhnekê keniya, piştre got, "Tu zanî, bavê min gelekî ji çiyayan hez dike, bêhna wî lê têt;

Omer tête bîra te, birayê min ê mezin, bi Ehmedê we re çûbû, lê heta niha jî em çi jê nizanin; dijît, hatiye kuştin, birîndar bûye… Mustefa, eve tam yazdeh duwazde sal e em jê bêxeber in.”

Dûvstêrk di tarîtiya şeva tebaxê ya bêdeng de wekî stêrkekê dirijiyan nav reşetariyê.

Bêhnekê em her du wisa bêdeng rûniştin, heçko me her duyan jî dixwest deriyê sohbeteke nû vekin lê me her duyan jî cesaret nedikir. Hingê ji bo çend kêliyan hizra min diçû ser plana min û Feqî Huseyn a ku roja paştir me dil hebû ku pêk bianiya. Lê ji aliyê dîtir ve jî, min dixwest nava dilê Sosinê keşf bikim. Dûvstêrk wekî kîlaska agirî ya bi bayê re belav dibe, wisa di nava reşetariyê de direqisîn.

Hingê şev gelekî bêdeng bû, li joriya çiyayan tava heyvê hêdî hêdî xwe berdida xwarê. Dîmeneke gelekî spehî dihate pê, dilê mirovî pê aram û asûde dibû. Ez westiyabûm. Lê min dil nebû ku biçûma raketama, li nik Sosinê hestekî germ ê pêbawer li min peyda dibû. Hingê Sosin axivî:

“Mustefa, tu zanî, dayik û bavê min gelekî ji te hez dikin.”

“Ma ji bo te gelekî girîng e hezkirina wan?”

“Erê, pa çawa.”

“Ango?”

“Mustefa, wan ez tenê heme, heta niha gelek xwazgîniyên min hatine, lê dilê min neketiye ser kesî, dayik û bavê min jî dil nebû ku ez bidama mêrê neçê û nebaş. Tu zanî, ji bajarî jî gelek xwazgîniyên min hatine, lê ez naxwazim ji vir biçim; ez heft salan li bajarî mam, min lîse dixwend li wê derê, min gelek kes nasîn, lê dilê min li çu kesî germ nebû. Min qet

bawer nedikir ku ez ê rojekê kesekî li gorî dilê xwe bibînim.”

“Ma kesê li gorî dilê te çawa ye?”

“Mustefa, tu qet naşibî gêncên ku heta îro min nas kirine. Ruhê te paqij e, gava ez çav bi çavên te dikevim, bawer bike, îfadeyeke pak dibînim, zarokê di awirên te de nemiriye.”

“Sosin, eve ji dilqenciya te ye. Tu wisa dibînî; ez wisa nîn im. Tu zanî, heke tu dê şû min bikî, ez ji vir naçim, ez ê kavilê qesra me ava bikim.”

“Mustefa, ez ê sibê niyeta te ji dayika xwe re bibêjim bila xeberê bigihîne bavê min jî. Lê ez bawer im ku ew hêj ji duhî de hazir in, wan gelek ji te hez kiriye. Bawer bike, min jî.” Hingê, hêdîka Sosin ji tenişta min rabû û çû ket hundir.

Şev bû, ez tenê mabûm li ser şaneşînê; tava heyvê heta nîveka çiyayan xwe dahêlabû xwarê, hemû laşê min herişîbû. Dûvstêrk direqisîn, stêrk li asîman dibiriqîn; bawer nakim ku li çu devera dinyayê stêrk wekî vê derê xweşkûk xuya bikin. Asîmanê bi cûneşîn bûbû sêla stêrkan, stêrk li ser diçilvilîn. Hişê min xewîn bû, min mizgîniya herî xweş a jiyana xwe wergirtibû, zewaca bi Sosinê re ji bo min dê tiştekî pir cuda bûya; min çu carê bawer nedikir ku keçikek dê min biecibîne û rojekê ez ê jî bibêjim eve yara min e, destgirtiya min e û ez ê bi wê re jiyaneke xweş biborînim. Lê, xeyala min hêdî hêdî dibû rastî, miraza min hasil dibû, lê belê ez tam li serê duryanekê bûm, dotira rojê belkî bi eynî saetên ku ez û Sosin li hev hatin, ez ê li ser xaçeriya zirav a man û nemanê bûma.

Destgirtin.

Neynika min a xweşkûk, me kurdan ji lihevhatina jin û mêrekî re destgirtin gotiye. Destgirtin destpêka avakirina malîn û hêlînê bû, gava seretayî ya vê peymana heta mirinê ya bêveger bû. Destgirtin, dihat wateya pêkvejiyana di her şert û mercî de.

Destgirtin dihat wateya qebûlkirina hev û du ya bi her awayî. Destgirtin sergirêdana bi hev a jiyanekê bû. Destgirtin mohrkirina peymana pêkvejiyanê bû.

**

Meha tebaxê, roja duşemê…

Piştî nimêja îşayê, em derketin ji malê. Li derve bêdengî serdest bû. Ne dengek, ne jî pêjnek dihat bihîstin. Gund kerr bûbû êdî. Kerrîtiyeke sehmrêj. Kerrîtiyeke kûr. Ji mişarên zeviyan dengê waqwaqa beqan, huşêna rûbarî û wîtwîta bêyom a kundê dadiket hundirê reşetariyê. Ya herî nexweş vizêna pêşûyan bû, ku hin caran bi êrîşên wan derziyên xwe yên tûj jan didan giyanê mirovî. Laşê mirovî tev ji ber jan dida. Li asîmanê çiksayî çilvilîna reqsa stêran hêjayî dîtinê bû. Her wiha, tava heyvê jî tîrêjên xwe berdabûn ser çiyayê bilind. Jixwe, li milê rojhilata gundî zereroniya ku li cihê ku heyv dê lê derkeve, reqsa stêran betal dikir. Li milê çiyayên rojavayî, li ser gopilkan ronahiya heyvê wekî kembereke zer, na; şaşikeke zer a ku dişibiya şaşika 'heciyan' şewq dida.

Piştî ku me çekên xwe cara dawîn jî kontrol kirin, êdî dema çalakiyê hatibû. Her tişt amade bû; çek, berik û plan... Êdî divê em ranewestiyana. Eve cara yekem bû ku me tiştekî wisa dikir, lewra jî dilê me nema dikarî li depê singa me xwe ragirta. Wekî çivîkeke birîndar diperpitî. Peroşmendiya me li lûtkeyê bû. Hestekî di navbera tirs û endîşeyê de ketibû ser me. Çavên me dibiriqîn.

Bi vê de, bi wê de; êdî me xwe gihandibû ber deriyê mala wî. Xaniyekî mezin î duqat. Berevajî xaniyên din ên gund, dişibiya xaniyên bajêr. Rûyê derve yê avahiyê jî bi rengê keskê tarî hatibû boyaxkirin. Li ber derî lampeyeke geş diteyisî. Lewma jî vê ronahiyê nedihişt ku em gelekî nêzî malê bibin. Ji milê wê de jî projektorên ku ji qereqola Keşkanê diburisîn jî em

hinekî dî tengav dikirin. Li ber deriyê avahiyê baxçeyekî mezin hebû. Baxçe bi têla rêsayî hatibû pêçan. Li goşê baxçeyî jî otoyek dixuya; otoyeke xweşik û giranbuha. Rûyê wê li ber tîrêja lampê leylan dida. Çend ronahiyên avahiyê vêxistî bûn. Lê, ji ber ku perde dabûn ber me hundir nedidît. Lê, hin caran gava ku mirov dimeşiyan, an jî derbasî jûreke din dibûn, siya wan dihat kifşê.

Gelo me çi bikira? Avahî daba ber guleyan; lê kesine bêguneh? Hema, me ji nişka ve êrîşî malê bikira, pa heke wî ji me zûtir desthilandiba? Rîska pevçûnê, rîska kuştinê, birîndarketinê, kuştina sava û bêgunehan? Eve, ne riyeke rast bû. Divê me ji xwe re azîneyeke wisa peyda bikira ku, hem bi bêdengî ev kar bi encam bûya, hem jî ji bilî wî serê çu kesî/ê neêşiya. Bes çawa? Hê jî me çavdêriya avahiyê dikir.

Me riya wî bi çarçavkî dipa. Em du zêrevanên di kemînê de. Ez û pîremêrekî heftê û pênc salî… Em du dilên hestiyar û mirovhez, lê ji bo ku tola kuştiyên xwe bistînin û dawiyê li bêbextiyê bînin, di nêçîr û rava kuştinê de melisîbûn. Ji bo jiyanê kuştin! Gotineke ku bêhna bêgaviyê jê difûriya. Bes bivê nevê, an te dê serşorî bipejiranda, an jî te dê serî rakira. Şerê man û nemanê; divê me bi destê xwe gûyê xwe paqij bikira.

Ez, li ber deriyê mala xwîşka xwe hildemisî, wekî pisinga di kemînê de rawestiyayî, çavrêyî zavayê xwe bûm. Çavrêyî ji malê derketina wî. Gelo ev berberî ji ku dihat? Ev êşa jiyanê ji bo çi bû? Mebesta vê tolê? Gelo çi bû ev mebest?

Heyho neynika min a rûgeş, heyho bo te! Tu dizanî, li ser rûyê erdê, di nava gerembola mirovan de jiyîn hin zor e, hin nexweş e ku carina mirov tiştên wisa dike, mecbûr e bike, ku mêjiyê mirov bi xwe jî ji ber radiweste. Ne karê aqilan e. Bes, ya herî nexweş, tu jî mirov î û li ser rûyê erdê dijî; ango, ma ku tu heyî tu yê bijî. Ma ku tu dijî tu yê têbikoşî; hin caran dişikênî, hin caran diherifînî, lê hin caran jî ava dikî. Bes, cihê

mixabiniyê ye ku, yên afirîner û çêker gelekî kêm in. Xerîb in, ya herî kambax bêpişt in. Xasma, "dar bi belgan, mirov bi kesan birû ye." Tu dizanî, di jiyanê de mirov bi mirovan re heye; heke kesûkarên mirovî li rexûrûyên mirovî hebin, hingê rûyê mirovî jî heye. Berevajiyê vê heke li rexên te kesek tune be, li pişta te hevalekî te nebe, hingê jî çu giraniya te nîn e. Jixwe wê demê ma tu ji bo çi dijî! Nexasim, ku jiyanê buxtan li te kiribe, ew êdî dev ji te bernade; dê her tim te bajo ber bi cihên nexweş ve. Dê biryarên ku dê agir bi dilê te bixe bi te bide stendin.

Her ku diçû ronahiya tava heyvê xwe ji paxila çiya dadihêla jêrî. Vê yekê jî derav li me teng dikir. Diviya berî tavdana heyvê me ev karê xwe bi encam bidaya. Naxwe! Naxwe dê hemû îza û cefaya me bi avê de biçûya. Yanî livbaziyeke biserneketî! Me eve qet pesend nedikir. Ji ber ku me baş dizanî ku 'nanê serşoriyê heram e.'

Tava heyvê dadiket, saetên şevê dadigeriyan; şevên havînê kurt bûn jî. Pêşbaziya bi demê re; em bi demê re dibeziyan. Divê wextê zora me nebira, naxwe em dê bi ser neketina. Dengê bêdengiya şevê ya kerr bi ser me de diweşiya. Tirseke xurt xwe berdabû hundirê me. Tirs, guman û metirsî her ku diçû bilindtir dibû. Hêviyên me êdî cihê xwe ji metirsînê re hiştibûn. Em hêj jî di kemînê de bûn. Me hêj jî zêrevaniya pêlîskên avahiyê dikir. Çavrêyiya malê dikir. Her liv, her sîber ji bo me dibû şikek. Mêjiyekî ku di bin lehiya tirs û gumanan ketî... Hewa hûnik bû, lê dijwariya leq û gezên pûşiyan çu rihetî nedida me. Hema her derê laşê me werimîbû. Aha, hingê min û xalê Feqî, çend caran çavên xwe li nav çavên hev vedan. Awirên me li hev qelibîn; tîneke germ, hestekî piştrastiyê ez vegirtim. Xaleke heftê û pênc salî xwe dabû vê riyê, bi min re bû. Gava ku mirovên navsalçûyî bi mirov re bin, baweriya mirov bi mirovî qewîtir dibe.

Saet diçûn. Tava heyvê dadiket. Pêşûyan em dixwarin.

Sebr û hedara me di nava tixûbên xwe de dihat û diçû. Dil helawistî, mêjî şikbar û xeyal di navbara duh û îroyê de dihatin veguhastin. Aha, hingê, di navbera çav û birûyan de, di kêliyên ku sebr û hedar diheliya de, di bin êrîşa pêşûyan de, dengek, livek, xişînek; na, na sîtavkek diyar dibû. Rasterast hemû hêmanên laşê me raperîn û yekser berê me qulipî wî aliyî; aliyê pêlîskan. Kesek hat ber dîtbariya me: Mirovek. Ji malê derket. Bêyî ku bizane ka çi li bendê ye, hêdîka, sakîn û jixwepiştrast, ji pêlîskan daket jêr. Êdî ew li ber derê avahiyê bû. Bi çend metiran ji me wêdetir. Bi cil û bergên razanê.

Belê, ew kes, ne xwîşka min, lê mêrê wê bû. Ango ew bû: Salîm! Her wekî "Bizina ecelê wê tê, ku nanê şivanî dixwe", ew jî wisa dihat ecelê xwe. Tam, di kêliyeke ku em dê jêgeriyana, wî xwe bi xwe, devodev xwe davêt nav lepên me. Wisa bi bisteyî ber bi aliyê avahiyê yê rojhilatê ve dimeşiya. Heta ku taqê avahiyê qedandibû û li wê derê, li ber dîwarê malê, di quncikekî tarî de, berê xwe da dîwarî û çemiya. Hingê me tenê pişta wî didît; jixwe ji bo me jî fersendeke wisa diviya. Tam wextê bizaftinê bû. Bi çarlepkî, hêdîka bêyî ku xişîna piyan bînin, me xwe gihandê. Bi du milan ve, hêdîka li pişt wî sekinîn. Wî hê jî dimîst. Em li pişt bûn û lûleyên tivingên ku berparêza wan vekirî bû êdî gihîştibûn pişta wî. Hingê, heye ku bi tîna asinê tivingê ya sar hesiyabe, wisa bi lewnekî behîtî, hêdîka li ser milê xwe zivirî. Bê delîve hatibû dorpêçkirin. Jixwe çu liv jê nedihat. Tevgereke wî ya biçûk, -heke ji refleksê bûya- dê bûbûya sedema guvaştina celepka tivingê û dawiyê: Teeqq!... Dengekî kûr û çaleke hêj kûrtir li mêjiyê wî vekira. Çawa zivirî, demildest rengê wî qulipî. Sar bû, behitî, req bû, hişk bû, lal bû! Çav di serî de man vekirî. Xelece lê ket; spîkên çavan lê vêl bûn. Çav lê fireh bûn. Bûbû fitefita qûna wî. Reng û bezmê wî qulipîbû ser cangekî. Li me nihêrî; li rexên xwe nihêrî, tenê du kesên rûpêçayî dîtin. Ango, melkemotên xwe.

Berî her tiştî me lê venêrt. Dev lê zeft kir û da pêşiya

xwe û berê xwe da geliyê jêr, ber bi wî çiyayê bilind ê ku roja berê em ketibûn paxilê û lê bûbûn mêvan… Tava heyvê serê spîndaran girtibû. Stêrk êdî ji şiyana çilvilîna xwe ketibûn. Asîman mabû ji heyvê re. Em dimeşiyan; geh bi ser çemandî, geh rast, geh çarlepkî, heta ku hin caran me xwe dixişand. Jixwe, navber dibû ku em bihelkundiriyana, tenê me xwe veşarta û li benda derava xwe mabûna. Di nav cuh û cobaran de, di ber siya dîwar û givanan re, li gel şilatiya avê û kur û heriya bercuhan êdî em ji Keşkanê derdiketin û li dûv Pira Aqederê, li Tengiyan hildiperiyan.

Her dem em guhişî bûn, ka ji gund dengek tê, kesek pê hesiyaye; hawar rabûye? Lê, ji vê derê pêve êdî çu mafê me yê hizirînê nemabû; em têketibûnê û di encamê de jî me dê karibûya gûyê xwe bialasta jî. Jixwe çu riyên dîtir jî nebûn!

Di ber peraxên rûbarî re, gelî bi gelî em diçûn. Tava heyvê êdî hemû cih vegirtibû. Di nav çiqilên biyan re cih bi cih xwe nîşanî me jî dida. Lê em bi gavên lezgîn dimeşiyan.

Em ber bi dilê çiyayan ve, li nav rijde û kendalan dimeşiyan. Dengê sîsirkan ji lat û şikêran deng vedida. Tîrêjên tava heyvê li ser giya diçilvilî. Li ser avê şewq vedida. Heyv di çardehiya xwe de bû. Ronahiyeke boş direşand ser jîngehê. Her ku em diçûn hewa bêhtir hûnik dibû. Dengê şirikên avê, dengê huşîna sûlavan hişê mirov vedigirt. Hin caran, di nav qevdên giya re fitêna kuliyan mirov dibizdand. Dilê mirovî ji pişta mirovî vedikir. Sîsirk disîrsîriyan. Kulî li ber lingê me, di nav giyayê di bin solên me re diherişî de, bi çend metiran xwe gav dida. Ew ji me, em ji wan ditirsiyan.

Hê jî devê Saloyê Keşkanî zeft kirî bû. Kes li hawara wî jî nehatibû. Qet nebe em pê nedihesiyan. Evrazekî dûr û deraz û bi kend û xwerû bi rijde li benda me bû. Diviya bû em zû bigihîştina meqerê xwe da ku qet nebe me bêhna xwe vedaba. Êdî em ji piyan ketibûn. Jixwe, bêhna me li nav milên me dida;

ji lezûbêzê, ji tirsê dilê me nema di depê singê me de hildihat.

Êdî em li meqerê xwe bûn. Sê barên şevê qulipîbûn. Heyvê êdî xwe gihandibû hindava çiyayên rojavayê. Wekî sêleke zer a gulover li asîman digirnijî. Hinek stêrkên geş li dora wê bûn, bîneriya govenda wê dikir: Karwankuj, gelawêj, stêra şivanan, leyla û mecnûn, terazî û çendên din... Asîman sayî bû; çiya bêdeng û kerr. Bayekî hûnik rûyê me dialîst. Li wê bilindahiyê çu pêşû nebûn. Heta ku hewa pîçekî sar bû; tezing dixist nava mirovî. Em, li ber kepê latê Hecîmendî ku ber-raza wê bi qasî pazdeh metiran bilind bû, li wê rizdeya asê, li hindava rijde û kendalekî, di nav şikêr û zinaran re, li hisara çiya, rûniştibûn. Hê jî xweliya me li wir bû, kuçik li benda me rawestiyayî bû. Hê jî li ser xwe bû. Jixwe 'li gorî hingê', pêr me ew hiştibû. Dengê rûbarê Ava Spî ku ji tava heyvê dibiriqî, li latên bilind ên Gareyî deng vedida. Piştî ku me dîlê xwe, li paşiya şikeftê girêdabû êdî me jî ser avêtibû xewê. Wisa ji xwe piştrast. Nizanim ji xeşîmiyê, an jî ji zêdebaweriyê me bêyî ku nobê li xwe bigirin, serê xwe avêtibû xewê. Dibe ku ev helwesta me ji asêtî û nepenîtiya cihê me hatibe, me ev cesaret ji wê çendê girtibe; lê, bi rastî me agir têk vedida; xasma mezinên kurdan gotibûn, "Destê xwe bikin qûna xwe lê agirê hil têk venedin."

Digel tîrêjên spêdê min çavên xwe bi kilîskên agir re vedikirin. Li dora agirî Feqî Huseyn, li ser agirî lûliya çaydanka reş dilûliya û bayekî hûnik jî hêdîka rûyê mirovî dipeland. Dîlê me li wir bû, bi çend gavan wê de, destgirêdayî, gelekî şerpeze xuya dikir. Bi awirên tirsok li me dinihêrt. Berî her tiştî min careke din derdora me baş, bi baldarî çavand. Li jor û jêr, li rast û çep, qet şopa çu kesî/ê diyar nedikir. Çu kes li hawara wî nehatibû. Lewma jî, êdî em bi dilê xwe bûn. Çu leza me nebû. Çawa bûya dîlê me di destê me de bû.

Piştî bawişkeke nerm, piştî ku hilma xewê ji ser min

çûbû, dora hacetê hatibû. Piştî hacetê min ê dest û rûyê xwe bi wê ava sar a ku ji bin keviya berfê hiltavêt bişûşta. Vê ava sar rûyê mirovî diqelaşt. Ava ku dema mirovî tijî çengê xwe dikir xwerû lîlav bû. Bi kelegerma havînê vexwarina lîlavê. Her wekî dil dixwaze, aha; tiştekî wisa bû.

Tîrêjên rojê xwe berdabûn ser çiyayan. Çay li ber me bû, pêxwarin jî li gel... Saloyê bextreş bi awirên tirsîn, li me dinihêrt û di ber re jî lêvên xwe dialîstin. Diyar bû birsî bûbû. Her çend dîlê me bû jî, dilê me pê şewitî; me jî her wekî pariyekî nanî davêjin ber seyekî wisa avêt ber wî jî. Hilgirtin û xwarina wî ya nanî bû yek kêlî. Destên wî êdî vekirî bûn. Lê, gewdê wî di bin siya lûleyên tivingên me de dilerizî. Şaşiyeke wî dê bibûya egera kuştina wî. Tenê şaşiyeke biçûk. Hewldaneke revînê, hewldaneke bêserûberkirina me. Li min nihêrî; her wekî dixwest tiştekî bibêje, lê deng nekir. Careke din nihêrî, careke din...

Rojeke nû dest pê dikir êdî. Ji bo me roja tolhildanê, ji bo Salo roja mirinê. Li ser tixûbê mirin û jiyanê em. Li ser balayên Gareyî, di nav şikêr û zinarên asê de, li ber kepê şikeftekê, li dora agirê ku hêdî hêdî vedimiriya, li ser sifra xwarinê min piyên xwe di ber xwe de berdabû, Xalê Feqî bi çarmêrkî rûniştibû. Bergeha me têra xwe fireh bû, ji Tengiyan bigire heta Gûzereşê me her der pir zelal didît; heke bi hezar metir wê de jî kesin bihatina me dê bi rihetî ew bidîtina. Em rûniştî, yên ku bihatina li beredayî bûn. Yanî dê li ber guleyên me bihatina hincirandin. Jixwe heke balefir jî bihata, qet çu şansê wê nebû ku em bidîtina. Deh rojan jî derdorên me gulebarandana dîsa çu bandor li me nedikir. Ango, me baş xwe asê kiribû û dîlek jî di lepê me de bû.

Yanî;

Salo: Kesê ku di zaroktiyê de çend caran serê min şikandibû, paşê di kuştina bav, bira û xalê min û şewitandina

Gundê Mizgeftê de tiliya wî hebû. Hê jî gîsiya li hindava birûyê min jan dida. Wî gundê min dabû kavilkirin, bav, bira û xalê min dabûn kuştin, hawara Xwedê dê çawa dilê min lê vebibûya… Wî gelekî bêhesab zêdegavî kiribûn. Desteserî û zêdegaviyeke bi vî rengî êdî nedihat qebûlkirin. Divê tola van tiştan hemûyan bihata stendin.

Hingê, wê kêliya ku çavên min di nav çavên wî veniştin; mûyê serê min qij bû û kerbê ez vegirtim. Awirên min tûj bûn. Kela dilê min rakişiya. Ez di nava xwîdana hêrsê de hilpekiyam. Careke din min dest û pê lê zeft kirin. Pala wî da şikêrekê û lûleya tivingê xistê. Pihîneke hişk, çend quwet di min de hebû, min bi wê hişkiyê pihînek li devê wî xist û dûre yeke din, yeke din... Bi sotiniya dilê xwe yeke din jî... Hingê, Feqî ez zeft kirim. Weha got: "Mustefa kurê min, raweste. Tu dizanî, wisa nabe. Hela, bi ser xwe ve were. De ka vî şerbikê avê vexwe." Aveke xwerû lîlav, sar û qerisî ku didanên mirovî pê dicemidîn, bi yek qurtê de min daqurtand. Piçekî zuhatiya devê min şikest. Piştî ku min bi heman avê rûyê xwe jî şûşt, êdî kerba min piçekî şikest.

Salo, di nav xwînê de, bi heman awiran li min nihêrî; dîsa gotina xwe daqurtand, anî serê lêvê lê negot, bi şûn de vecût. Ez gihîştimê, min destê xwe da bin lama wî û guvaşt, awirên xwe li nav awirên wî vedan û bi dengekî bilind, ez lê qîriyam: "Kuro tûlê ji tûlikan veketî, Saloyê xayîn, tu van çiyayan dibînî; eve hemû warê min in. Eve axa min û bavê min e. Eve welatê min e. Ji bilî kuştina min çu kes nikare min ji vî welatî derxe! Tu dibihîzî, kurê dêhlê, bîjiyê binteraşan, seyê fêşika seyî, te hay ji min e; çu hêz nikare min ji vî welatî derxe!" Dûre, min qûndara tivingê bi tûzkî rakir û danî nav çavên wî. Ji dev û difna wî botikên xwînê peşiyan. Dilê min gelekî sotî bû, hinavên min dişewitîn. Lewra, min nedikarî xwe zeft bikim. Ez bêyî hemdê xwe dibizêvîm. Di destên min de keleş hebû; me jê re xedare digot. Şûna ku min kar û barê dawetê bikira, xwazgîniyên xwe

bişandana berevajî min li zavayê xwe dixist.

Ez wekî zebaniyên dojehê har bûbûm, çavên min di serê min de sor bûbûn û min her carê xwe vejen dida, xwe dadipîva xwîşk û dayika wî û dûre jî bi yekî qeweta xwe qûndara xedarê li ser û çavên Saloyê bêbext vediwejand. Dengê min ji wan lat û şikêran deng vedida: Kurê dêhlê, bêje te çima mala me xira kir! Te çima bav û bira û xal li min dane kuştin; erê, ma Ebdurehmanê biçûk, zarokê hêj di çilkê de çi li te kiribû, çi dayik û xwîşk li te gabûn, bêjeeeeeeeeeeeeee!!!

Hingê min dît Salo wekî zarokekî sava giriya û xwe avête binê piyê Feqî Huseyn û dest bi hêviyan kir:

"Xalê Huseyn, ez bextê te me, tu min ji destê vî teredînî xilas bikî." Hingê Feqî tuf kirê û got, "Tuh, lanet li şîrê te xwarî, lanet li kîrê tu jê veketî! Kuro Salokê Eyşoka derlingdiriyayî, kurê seyî, ma tu şerm ji bavê xwe nakî, heta duhî jî we zikê xwe li ser coxînên me têr dikir. Mirov ji piyê bavê xwe derdikeve lê evçend jî nabe. Ka bêje fêşika berazî, bêje; me çi bi we kiribû; me hûn kirine mirov û îro jî hûn radibin mêrên me yên herî bijarte bi kesên biyanî didin kuştin…"

Hingê, Salo wekî zarokekî giriya û got, "Xalê Huseyn, mezinên hewe her dem tiştek digotin, wan digot, "Kurocaxî heke têr xwar an dê jinekê birevîne, an jî dê mêrekî bikuje", hindî me fam bi xwe kirî, nîrê hewe her dem li ser stûyê me bû. Gundê we avîn û xweş bû, zilamên we mêrçak û baş bûn, jinên we wekî xatûnan bûn; qesrên we hebûn, lê em veder bûn, çu tiştê me nebû, çavên me her tim li ber destên we bûn; heke hewe kûteke ji ber we mayî bidaya me bo me wisa bû, heçko dinya bûbûya ya me. We keçên me yên herî spehî û delal ji jinên xwe re bo serhewî dibirin û wekî qerwaş û xidam didane şolê. Erê xalê Feqî, ez bêbextiyan nakim, wekî dîtir ji bo nav alemê we em diparastin, ji ber we me jî di nav xelkî de rû û rûmet didît. Lê bawer bike, di dilê her keşkaniyekî de serjêstendina

xaniyekî hebû. Bo me çu tişt ji hindê birûmetir nebû ku me zora xaniyekî bibira. Biçûkatiyê gava ku min serê Mustefayê xizmê xwe şikandibû, hemû serkêşên me bi hefteyekê hatibûn mala bavê min bo pîrozbahiyê û hingê Derwêşê Qaso ku pîremêrê herî navsalçûyî yê Keşkanê bû, digot, "Mizgîniya min li we, êdî rojeke nû li Keşkanê hiltavêje, eve hêj ji bo me û wan hilket, êdî em ê serî ji wan bistînin. Keşkanîno, pend û şîreta min li we, li xaniyan nekin nemerdî, îro felek li aliyê me ye, êdî me jî bes e, hingê rawestin heta qesrên xaniyan bikin cihê mexela pezî…"

Hingê çavên min di serê min de dizivirîn, hema min careke dî bi yekî qeweta xwe qûndara tivingê danî nav dev û difna Salo û ew di nav xwînê de gevizî. Piştre min destê xwe da hefka wî û tuf kire nav çavan û ez lê qîriyam:

"Kuro Saloyê bênamûs, ma me çi bi we kiribû? Ma roja hevroj me nedikarî dayikên we hemûyan bigên, we ji ser axa xwe biqewitînin, ka bêje ma me nedikarî!"

"Belê xizmo, lê we nedikir, çimkî çu kîna we bi me re nebû, we çu carê em li ber singa xwe nedidîtin, em li hemberê we nebûn, we çu carê çu pûke bi me nedikir. Tenê di nav tirane û henekên we de em dibûn mijar; her wiha ji bo şivanetiyê, paletiyê û ji bo ku di dawetên we de li pîk û zirnayê bixin, daholê bikutin, we em gazî dikirin. Lê ji bo me hûn çiyayên herî asê bûn; heçî ji me keçek ji we bianiya ew dibû fêrisê zemanî, heçî ji me ji yekî ji we jîrtir bûya, di qedemeke jorvetir de cih bigirta ew ji bo me şanaziyeke bêhempa bû. Bawer bike Mustefa, heke tu ji keşkaniyekî re bêjî kerem ke tu dixwazî bibî qeymeqamê dewletê, an jî bibî çawişekî li ser serê xaniyekî; yê Keşkanî bêtexsîr dê çawişî qebûl bikira."

Hingê Feqî milê min girt û got, "Xalo, ka bisekine" piştre berê xwe da Salo, got, "Erê baş e, ez vê kîna we têgihîştim, lê me çu carê xwîn li ser hev nebû, wekî dîtir hevrikî tiştekî

normal e. Ê axir, lê we çima mêrên me dan kuştin?”

Salo bîskekê fikirî, bû kuskusa çavên wî, dûre bi huçikê xwe dev û difna xwe paqij kir û axivî:

“Xalê Feqî, ma ne mezinan gotiye, “Heke ji kurmê darê nebe çu zewala darê jî nabe”, ma hema ez xayîn bûm, min xwe firotibû, lê her wisa min refa xwe jî aşkera kiribû û cangê xwe girtibû destê xwe, ez li gel dewletê bûm. Lê baweriya te bi Xwedayê ku tu rojê pênc caran jê re secdeyê dibî bêt, Salîmê Keşkanê çu carê mêr nekuştine; lê ez çi bikim, yên ku navgînî dikirin, piştî ku nan digihandin meqereyê şervanan yekrê dihatin nik min û çi kiribin, hemû ji min re digotin û min jî gotina wan bi guhê fermandarî dixist.”

“Saloyê bextqulipî, hey kîrê wî fermandarî bi qûna te û hindî kesûkarên te ketiyo, ma te çawa bextê xwe xira dikir û ji bêbextan bawer dikir!”

“Mustefa ka deqekê raweste, piçekî bêhna xwe fireh bike…”

“Xalê Feqî…”

“Naxêr, Mustefa raweste, ev bêdîn û îman, tiştên sosret dibêje, hela em guhê xwe bidinê.” Piştî ku axîneke kûr berda Apê Feqî li Saloyê bêbext zivirî û bi zimanekî nerm got:

“Salîm, dibe ku tu rast bibêjî. Pêşiyên me gotine, “Çêleka rîxo hemû garanê diherimîne”, erê, rast e, gava ku baran bariya dibe herî jî, ez heta vê derê têgihîştim. Jixwe heke ruhfiroşên di nava me de jî xwe nefirotina, we nikaribû heta nava malên me jî bên. Lê ew çû, êdî hîç fayde nake, bes, niha tu di destê me de yî. Çu rizgariya te nîn e, carekê wê ji bîra xwe bibe. Kes jî li hawara te nehat, wisa xuya ye kesanên ku te ji wan re pêalîskî dikir û gundî û cîranên xwe hemû firotinê, ew qas jî binanûxwê nîn in. Kuro, kurê dêhlê, ma tu jî nizanî yê ku bi kêrî xwe neyê,

bi kêrî çu kesî/ê nayê. Ma mezinên me ji qesta negotine, "Seyê xwe be lê axayê xelkî nebe", hey Saloyê miletfiroş hey gidyano, em çi bi te bikin; tu mirineke çawa dixwazî?"

Serê xwe çemand: Rengê bêhêvîtiyê di wê rûniştina wî ya melûl de xuya dikir.

Tav saetekê bilind bûbû. Hûnebayekî nerm rûyê jîngehê dialast. Li asîman çend ewrên stewr ku mamê Feqî jê re digot ewrên pêşemanan digeriyan. Em li dilê Rêjgarê bûn. Havîn bû, meha tebaxê.

Hingê me çavên Salo bi cawekî reş girêdan, destên wî bi pişte ve asê kirin, serê wî çemand, hingê min pîstonê tivingê kişand, gule çû ber, berparêza wê vekir û tiliya xwe bire ser lolebkê; ha biguvaşta dê mejiyê Salo bi wan lat û zinaran de birijiya. Hingê ez fikirîm: "Xwedêyo, kuştin çendî bi hêsanî ketiye," piştre di navbera çav û birûyan de hizra min ez biribûm nava rêwîtiyeke dembirûsk a heyaman; di dîmeneke belek a reş û spî de bavê min ê hêja, sebr û arama dilê me; birayê min ê xweşdivî, ezîzê ber dilê me hemûyan Ehmed; Ebdurehmanê berşîr ê di çilkê de, xalê min ê Ferzende, dayika min a kovanî, şewata Gundê Mizgeftê, hemû di hizra min de hatin û bihurîn. Wê kêlîkê ez fikirîm ku ez kelexê vî bêbextî li ber cergê tavê raxim û serê wî jêkim û bibim deynim bin piyên bav û birayê xwe, lê demildest tezingeke sar bi ser min de çû xwarê, tiliyên min lerizîn û hêdîka min lûleya tivingê ji patika wî vekir û çend teqle min berdane hewayê.

Min çavên wî vekirin û min pihîneke xurt dîsa li dev û difna wî xist. Di nav xwîna xwe de gevizî.

Hingê min careke dîtir lûleya tivingê xist devê wî û min pala wî da latê, ez lê xurîm: "Kuro deyûz, kuro bêşeref, de ka bêje, ma hewe çi bext û wijdan nîn e; ma hewe çi dîn û îman nîn e, ma te nedizanî ku cendirme bi têgihîştina 'mirov bihurî

ji keran dizane' hûn didane pêş û bira bi destê birayî didan kuştin. Çi hewceyî bi vê bigirbikêşanê hebû? Îcar niha ez çi bi te bikim kurê seyî!..."

Tavilê, di wê kêliyê de; bi dengekî lavaker û kelegirî li xwe mikur hat. Deriyê kîsikê xwe yê guneh û curûman vekir. Weha got: "Mustefa xizmo, ez bextê te guhê xwe nede şeytanî; me kir tu neke. Erê, min gelek xeletî kirin, ez ji piyê bavê xwe derketim, lê tu jî zanî, ez êkane bûm, bi layê dilê xwe, di nava heyiyê de mezin bûm. Kengî min çi xwest; ji bo çi tiştî 'min got ka, dayik û bavê min gotin ha!' Lewra jî êdî ez ji mişarê derketibûm..."

Heye ku di heyata xwe de, ev cara yekem bû ku ew rast dipeyivî. Çi kiribû tev vegot. Ji serî heta binî. Ka çend caran û giliyê kê kiriye, digot, "Me tîmeke boş ava kiribû: Ji Bazê, Gûzereşê, Talê, Ertûşê, Bilêcan, Jiyaniş, Şîvişkê, Çelê, Marûfan, Tixûbê, Marûnisê, Peyanisê, Qewalê, Bileh û Binevşan, Lêwînê, Aşûtê, Geverê, Şemzînan, Rûbarokê, Kewîjê, Xirwatê, Oremarê, Geverokê, Culemêrgê; ji her derê kesên ruhfiroş di nava tîma me de hebûn. Gelek kesên ku berê şervan bûn, hatibûn teslîm bûbûn û piştre jî bûbûn îtîrafkar jî di nava me de cih digirtin. Hemû kuştin bi destê wan dihat kirin, her weha çend sûbay û serbazên wekî yuzbaşî û bînbaşî, tîmên taybet û uzman çawîş jî di nava me de hebûn. Wan em bi rê ve dibirin. Em diçûne gelek cihan, gelek caran me cilên şervanan li xwe dikirin, em diçûn gundan, me nan ji gundiyan dixwest, piştre jî em diçûn îcar jî me ew digirtin, an jî dikuştin. Xizmo, kuştin ji bo me pir hêsan bûbû…" Hingê min bi çavên serê xwe dît ku zilamekî miletfiroş çawa digirî, çawa poşman û bêçar bû.

Erê neynika min, dûre li nav çavên min nihêrî û devê xwe vekir: "Xizmo, baweriya te bi wê Qurana ku bavê te xwendiye bêt, bi wî çavkê rojê yê ku ronahiyê dide me, hayê min ji kuştina bav û birayê te nebû. Wê êvarê, piştî xutbê -ez

navê wî nabêjim-, bêbextek ji Gundê Mizgeftê hat –her mirovê we bû- ji min re got, Salîm tu dikarî bi min re heta qereqolê bêyî, ez çûm; wî der barê bavê te de gelek giliyên xirab kirin; piştre fermandar bişirî û got, "Îşev em ê wî bitirsînin." Wê şevê heta Dûpirkê ez jî bi wan re hatibûm, min digot qey tenê ew ê bavê te bitirsînin, lê wan ew kuşt. Ehmed jî, me her hay jê nebû. Payîza dereng bû; me digot niha kes li van deran nîn e, lê di êvarekê de, kesekî ku milîsîtiya şervanan dikir, hat nik me, hingê fermandar mêvanê me bû; hêj di derî de got, "fermandarê min, heke ez ji te re çend kuloxan (serê mirovan) bînim, tu yê min bi çi xelat bikî?" Fermandar ripo rabû ser çokên xwe û got, "Her serê mirovî ez ê milyarekê pê bidim…" Piştre, semtê wan got û bi şevilnav çû nik wan, ew hêmin kirin, birin Birêlkî, piştre jî çepek da xwe û xwe filitand, wê navê jî bi bafirokan remil kire wan û di encamê de hemû hatin kuştin. Dûre fermandarî em birin ser kelexê wan; dev û difnê wan jêkirin, dûre Ehmed nasî, got vî deynin serê riyê û yên dîtir jî hemûyan li çalekê veşêrin. Me jî emrê wî pêk anî û di encamê de jî her yekî ji me kîsekî pareyan wergirtin."

Erê awêneya min, wê kêlîkê çav li min tarî bûn, min heta dixwest wî bi saxî veşêrim, an bi agirî bişewitînim, an bi kêreke nebir a ko di patikê re serjê bikim, an jî bi kêr û gûzanê tûzî tûzî bikim… Min bi hindî qweweta xwe careke dî qûndara tivingê danî nav çavên wî, lehiya xwînê ji dev û difna wî çû. Kete ser pişta xwe, min tuf kirê, hingê, bi kelogirîn dîsa xwe li piyên min aland û got: "Mustefa, ez bextê te me, tu tiştekî bi min neke: Ne ji bo min, ji bo xatirê xwîşka xwe û zarokên me. Yanî xwarzayê xwe yê ku dê çend rojeke din bête dinyayê!... Ma çi heqê Xwedê ye ku ew biçûkê sava yê bêguneh êtîm mezin bibe. Bo xatirê Xwedê; bila ew bi kîna hemberî xalê ku dê bibe mêrkujê bavê wî mezin nebe! Pa xwîşka te; tu yê çawa serê xwe li wê rakî? Min kir tu neke, bila mezinahî li nik te be; bextê te me, zarokê min êtîm, jina min bî nehêle! Mustefa xizmo, weha neke!..." Hingê xunaveke sar avête ser rûyê min, ez di cihê xwe de teviziyam.

Ev çi gotin bûn Xwedêyo; ev çi gotin bûn ku wekî xencereke tûj li dil û kezeba min çikilîn!... Ez pê hejiyam demildest. Du dilop rondik… Em pêkve giriyan. Şewatek bi dilê min ket; jixwe, ji berê ve ye ez gelekî bihestiyar bûm. Min nedişiya li hemberî gotinên bişewat xwe ragirim. Dilê min dibihujî. Ez lê xurîm. Bi dengekî berz min gotê, "Malkambaxo! Bila Xwedê ji te bistîne. Meger, hinêr di lêborînê de ye. Heye ku cezayê herî giran jî 'efûkirin' bi xwe be. Ma em –haşa- Xwedê ne da ku giyanê jîndaran bistînin?! Na, eve; ne şehnê me ye. Bes, ji bîr neke ku 'şêr ji bo warê xwe têdikoşin' bi navê Xwedê, bi sonda mezin, bi serê xwarzayê min î nazdar ê ku dê piştî çend rojên din bête dinê; min tu daye ber xatirê wî. Bes, ji bîr neke, ez ê her dem wekî sî û sîberekê li dû te bigerim; welehî, bi serê xwarzayê xwe yê nazdar dikim, îcar ne Xwedê, ne jî pêxember dikare te ji lepên min bifilitîne. Here! Nanekî bixwe, yekê bi xêra mindalê xwe yê ku hûn çavrê ne, bide." Malneket, bila Xwedê ji te bistîne!

Nêzî nîvro me Salo berda û piştre min û Feqî Huseyn berê xwe da nav lûtkeyên Gareyî; ji Deriyê Bilkî em ber bi Gola Navçiya ve serketin û li wir, li serê Lîsê Teyran, di kelegerma tebaxê de me ji xwe re hinek goştê ter î taze ku ji gund bi xwe re anîbû, danî ser seleberê û zikê xwe têr kir. Hingê Feqî li rûyê min nihêrî û got, "Xalo, min zanî tu çi mêran nakujî, jixwe kuştin çareya herî dawin e; lê mixabin îro her wekî tû ji darê dikevin, wisa teretol, keçên di temenê bûkaniyê de yên nûgihayî, lawên hêj hema simbêlristî dikevin axê. Xwedê xêr ke, înşelah ev bigirbikêşanê ji nav me rabe, aramî û tenahî bikeve dinyayê; mirov bi axaftin û gotinê pirsgirêkên xwe çareser bikin. Mustefa, te ya herî baş kir, ev tirs besî wî ye; ma te jî da xatirê xwîşk û xwarzayê xwe, ma guneha wan çi ye; bila ew vê êşê nebînin, te êtîmî dîtiye, tu baş dizanî, ma te dixwest ku xwarzayê te yê sava jî wê êşê bikêşe, nexêr, ez ne bawer im."

Eywax neynika min eywax!... Çi dewr û dewran? Çi

jiyaneke têvel, çi çîrokeke bêgane? Ma kê gotibû dilê te hin mend be? Te digot tol, ma tu bi xwe jî nizanî ku tu wekî wan nikarî? Heyho Mustefayê Xanî heyho? Heyho neynika min a rûgeş heyho! Li ber nekeve Mustefa, em wisan in; sirûşta me wisa ye: Dilekî wekî pola, lê bextekî wekî deryayê jî bi me ve heye; em wekî wan ne canbazê lêb û lût, fen û fûtan in, destê me ne yê tivingê, lê yê edaletê ye, em serederiyê tim bi qenciyê dikin, zimanê ku em pê diaxivin, zimanê qencî û edaletê ye. Ma ne hêj di zaroktiya me de, gava ku em diçûn ser avê jî dayik û bavê me her daîm ji me re digotin, "Lawê min, penda min li we be, hewe emanet qenciyê. Çimkî heke mirov qenciyê bavêje avê jî av nabe. "

**

Gava ku êvarî em gihîştin malê Tajdîn û Esma li benda me bûn. Meta Gulê her di rojê de caba wan rêkiribû da ku bên Sosinê ji min re bixwazin.

****

# Dîmena duwazdemîn
# “miraznedîtî”

*Ber bi mirazê ve*
*Berpênga jiyanê*

Piştî du deqeyên dîtir ez ê ber bi kula dilê xwe ve biçûma. Min ê berê xwe bida otogarê û ez ê biçûma ser kulistana xwe, belkî deriyekî nû li ber min vebûya, belkî min vê carê kula dilê xwe, gîsiya êşê, evîna ku li ber dilê min bûye kesereke bêdawî Bîşenga narîn û nazelîn bidîta û vê carê min xwe dahêlaba herzêla dilê wê…

Erê neynika min, piştî du deqeyên dî min dil hebû ku ber bi welatê xwe ve biçûma. Ligel ku her cara ez li welêt vegeriyabûm êşeke dîtir li êşên min zêde bûbûn jî, welat wisa bû, êşên wê jî ji bextewariya xerîbiyê xweştir bûn.

***

Xwestin û veguhastin di nava hefteyekê de çêbûbû. Dawiya tebaxê bû, kelegerma fetisok a havînê hêdî hêdî cihê xwe ji hênikahiya payîzê re dihişt. Roja dawetê bû.

Di jiyana mirovî de rojên girîng hene, rojên wisa hene ku heta dawiya umrê xwe ji bîra mirovî naçin. Ez dizewicîm: Êdî em ê ji xwe re bibûna mal û menzel û me dê ji xwe re hêlînek ava bikira da ku doma nifşê me li ser rûyê erdê berdewam bike.

Wê spêdeya dawetê, ez, Mustefayê kurê Hecî Ebdurehmanê Xanî, li ber neynikê rawestiyabûm. Bîskeke dîtir, berezavayî dê

ez bibirima serşoyê û dê di ber serşûştina min re strana Zavayî Bibine Serşoyê binihwêrandina.

Erê neynika min, li ber xwedîkê min li neynika dilê xwe dinihêrî: Li çavên xwe… Çav neynika dilî bûn, hemû gîsî û birînên jiyanê yên ku li dilistana mirovî bi cih bûne, di çirûsîna çavan de bi bistehî xwe didan der. Hemû hêvî û baweriya mirovan di birusîna spîka çavên wan de veşartî bû; yê dizanî binihêre ew didît, dixwend, di neynika dilî re mirovî hundirê xwe didît. Her tiştê însanî di îfadeya çavên wan de veşartî bûn; ku mirovî bizaniya binihêrta mirovî dê ji çirûska çavên însanekî nexşeya ruh û giyana wî/wê derxista. Însan bi heyî û neyiyê xwe di çirûska çavên xwe de veşartî bû; çimkî çavan çu carê derew nedikirin. Ew, neynik û çirûskvedana ruh û dilî ne, her tiştê ku di kûrahiyên mejiyê mirovî de nixumandî di çavên mirovî de xwe dida der; çimkî mirov çend biguheriya jî çavên mirovî nediguherîn.

Ez di spêdeya zavatiya xwe de, bi dilekî ku wekî dilê çûçikekê xwe hiltavêt, bi kovana êtîmî û sêwîtiyê, di sih û yek saliya xwe de, li ber neynika dilê xwe rawestiyabûm û min li xwe dinihêrî; min li kûrahiya çavên xwe temaşe dikir, li neynika dilê xwe ketibûm seyrê.

Berezavayê min kurxalê min Ebdula bû: Ew di sih û pênc saliya xwe de bû, xwedanê sê zarokan bû; bejna wî bilind, porê wî xemirûk û gelekî lawîn bû. Zilamekî devken bû, simbêlên xwe berdidan, hinekî qelew bû jî. Berbûk jî Şukriyaya jina wî bû; ew jî jineke xweşik bû.

Min li ber awêneyê li xwe dinihêrî; spêde bû, dawiya tebaxê bû. Hingê min bi baldarî li hemû xêz û gîrên rûyê xwe nihêrî: Rûyekî piçekî gilover, çavên reşê bi zerî ve, birûyên min hingê normal xuya dikirin, mijlankên min piçekî dirêj bûn, difna min stûr û pan bû, lê li rûyê min dibaniya, ximximkên min piçekî bel bûn, lêvên min stûr û gir bûn, diranên min

piçekî ji berê dûztir xuya dikirin, lê piçekî zer bûn, min baş nedişûştin. Min cigare nedikişand. Porê min hinekî beyar bûbû, eniya min ya pan rût bûbû, gelek davên spî li rûyê min hildabûn. Ev yekem car bû bala min dikêşa ku li serê çene û lamika min çend davên spî xwe di nav riha min de bi cih kiribûn. Min rih û simbêl bernedidan. Wê spêdê piçekî hatibûn, jixwe piştî bêhneke dîtir, ez ê bibirima serşoyê û dê ew kur bikirina.

Piştre min ji serî heta binî li bejn û bala xwe nihêrî: Bejneke wasat li min bû, ez gelekî dirêj nebûm, tiliyên min stûr, piyên min biçûk, navmilên min pan bûn. Nizanim çendî rast e, lê tête bîra min ku dayika min digot, em ji nifşê şêrî ne, yên ji nifşê şêrî bin, zilamên wan navmilpan in, xwînşirîn in, dilovan in; her wiha yên ku navmilên wan dûz û wekî destconî bin, ew ji nifşê gurî ne, ew wek çeqelan in, gelekî har û bêwijdan in, yên ku navmilên wan daçûyî bin, ew toximê roviyan in, şixulê wan fêlbazî û derew û bêbextî ye, her weha yên ku ji toximê keran bin jî, navmilên wan depdepe ne; ew jî gelekî guhşor in.

Di spêdeya zavatiyê de hestekî di navbera ken û giriyê de ez vegirtibûm. Zavatiya bêkesî ne xweş bû, sar bû; çavên min ji her kesî/ê bêhtir li dayika min digeriyan, xwezî û sed xwezî ji xêra Xwedê re wê ez wisa bidîtima. Zavatiya min wekî kesereke mezin di dilê xwe de biribû gorê, vê rastiyê janeke giran dixist dilê min.

Min li xwe dinihêrî, li kûrahiya çavên xwe, li neynika dilê xwe: Tê de xemên serpeçûmkirî hebûn, diêşiyan; tê de kulên giran hebûn, wekî zindî bin dilivliviyan; tê de mirazeke berze hebû, digiriya; tê de dayikeke bi êş û jan, bav û birayê kuştî û gundekî xwelî hebûn, dikaliyan; tê de Mustefayekî xemgîn hebû, wekî rojbanûya çîrokên dayika min çavekî wê dikeniya, yek digiriya.

Di deq û gîrên rûyê min de şerm hebû, heyecan hebû;

şerm û heyecan di nav hev de hebûn. Şerma ji bêçaretiyê, lê ji aliyekî ve jî heyecana hêviyeke nû, bi hev re neynika dilê min didan ber tîran. Hingê hizra min ez dibirim ser nivîseke Ehmedê ku piştî mirina xwe jî her dem jiyana min ronî dikir, rêzanê jiyana min, kekê min ê canemerg, ku li ser destpêka jiyaneke nû weha nivîsîbû:

**

*dîsa dengê şevê tê...*

*şev li benda min e..*

*şev û bêdengiya tirsoken*

*ez ê biçim, xwe bavêjim hembêza tirsên şevê*

*ez ê biçim, ji pêsîra şevê şîrê pêmirinê bimêjim*

*ez ê biçim, ji dilê şevê jehra bendemanê binoşim*

*ez ê biçim, ji vê şevê ve dest bi jiyaneke nû bikim*

*Rojekê min ê dest bi jiyanê bikira. Bi cidî min ê destên xwe bidana bin barê jiyanê. Min ê bi hemû tîn û germa dilê xwe jiyan hembêz bikira. Wekî her kesî/ê min ê jî di nava jiyanê de ji xwe re warek ava bikira û dê hemû hêviyên xwe li baxçeyê wî warî biçandina. Min ê jî di nava jiyanê de wek her kesî/ê ji xwe re tevnek birêsta û dê hemû xweziyên xwe li ser wê tevnê bineqişandina. Bi kurtebirî rojekê min ê dest bi jiyanê bikira.*

*Bi hêviya wê rojê min hemû xweziyên xwe li nav çala dilê xwe veşartin û hemû hêviyên xwe xesandin.*

*Rojekê min ê jî wekî her kesî/ê jiyan hebûna û ez ê jî bi vedizî, bi rûyekî şermoken çaverêyî xweşdiviya xwe bimama. Min ê jî wekî her kesî/ê yarek hebûya. Rojekê min ê bawanên dilê xwe li ber evînên azeb vekira û li zeviya beyar a yareke çavxezal tovê evînê biçanda. Min ê jî micidî xwe bi nav pêlên jiyanê wer bikira; ez ê jî bi êş û janên jiyanê re biêşiyama û bi govend û şadimaniyên jiyanê re dilşad bibûma. Min ê jî barê dozekê pişt bikira û ez ê jî di nava helkeft û rûdanên jiyanê de hebûma. Li cihekî dê navê min hebûya û li ber dîwarekî kuçkê min jî hilbûya.*

*Bi hêviya wê rojê min li nav çavên çu kesî/ê nenihêrî û min nezera hemû çavxezalan li xwe heram kir.*

*Ji ber ku min sozek dabû dilê xwe: Wê rojê min ê bi paqijiya dilê xwe yê azeb dest bi jiyanê bikira. Min ê ev dilê xwe li ber çu bawanan nedaba bayî û min ê hemû xweserî û paqijiyên dilê xwe ji te re veşartina; ji 'te'ya ku min ê di wê jiyana nû de, piştî ku min bi micidî dest bi jiyanê kir, hez bikira. Min ê jî wekî her kesî/ê yarek hebûya û min ê dilê xwe ji wê re bikira hêlîna jiyanê. Ez ê di wê jiyanê de çu carê nebûma dûvikê çu tiştî û min ê di wê jiyanê de hemû xweziyên dilê xwe li ser tevna jiyanê bineqişanda. Min ê li ser tevna jiyanê gul û gulçikên evîneke bêbazar bixemilanda.*

*Bi hêviya wê rojê min hemû çirayên jiyanê di spîka çavên xwe de vemirandin û li hemû birûskên dilî ji nedîtî ve hatim.*

*Rojekê min ê jî cidî dest bi jiyanê bikira. Min ê ev kirasê biçûkatiyê ji xwe bikira û wekî zilamekî barê jiyanê bigirta ser milên xwe. Rojekê min ê bi xwîdana eniya xwe ji xwe re malek ava bikira û dîwarê wê ji kevirên birî lêkira. Min ê banê wê bi nîre û garîteyan vegirta û min ê bi axa çiyayê xwe vepaya: Da ku şevexwînên baranî bi dengê dilopan hişyar bim û bi dil û hişekî xewar û xewîniyeke xilmaş banê xaniyê evîna me bigêrim.*

*Bi hêviya wê rojê min hemû west û jihevketinên xwe bêyî ku rûyê xwe tirş bikim daqurtandin û ez bi wê hêviyê di bêhneke nîvleyîz de jiyam.*

*Rojekê min ê cidî barê jiyanê pişt bikira. Ez ê bi şevilnav (nîva şevê) bi dengê giriya zarokan re hişyar bibûma û li ser dergûşê, bi sewdaserî; bi hişekî xewîn î westiyayî, bi devgazineke nîvtinazî, lê bi dilekî asûde min ê hilma jiyanê bikişanda kezeba xwe. Êdî ev dê jiyana min bûya. Min ê bi hemû dilî ji jiyana xwe hez bikira; ji ber ku ev dê cîhana min bûya. Min ê bi micidî ev barê jiyanê pişt bikira û ez ê li jiyana xwe ya rastîn vegeriyama. Ev dê li xwe vegerîneke bêeman bûya. Ez ê di vê vegerê de bibûma destpêka jidestçûyiyên xwe. Min ê jidestçûnên*

*xwe ji bo destpêkeke nû bikirina hîm û jêrxanê jiyanê. Ji vir pê ve, êdî jiyan dê ji bo min ji nû ve dest pê bikira.*

*Bi hêviya wê rojê min di nava tevnên jiyanên heyî de wekî leyîzekê li jiyanê nihêrî û ez di nava wê leyîzê de hatim mezaxtin.*

*Rojekê min ê dest bi jiyanê bikira. Min ê barê jiyanê pişt bikira. Lê kengî bû ew roj min qet nedizanî. Tenê hesta heçko rojeke wisa heye, heçko dê rojekê, bi delîvekê her tişt ji serî ve dest pê bike li min peyda dibe. Ev çi hest e, nizanim. Ev hesta çi ye, wê jî nizanim; lê rojekê ez ê* 'tu'yekê *binasim û dê bi vê nasînê hemû hêviyên min ên xesandî ji nû ve raperin û dê hemû gul û kulîlkên ku li bihara jiyana min çilmisîne, ji serî ve bibişkivin.*

*Bi hêviya wê rojê min berê xwe neda çu asoyan û her û her min xwe li hêviya tiştekî an jî pêjneke nenas vegirt. Ez her di nava vê verêjê de vemam û ji rastiyê veder mam.*

*Rojekê min ê bi dilê rastiyê ramûsa. Min ê rastî li ber jiyana xwe bitewanda û min ê rastiya xwe biafiranda; rojekê ez ê jî hebûma. Dê deng û pêjna min jî hebûya. Dê şikl û şemalê min jî hebûya. Dê stran û awazên min jî hebûna. Wê rojê jiyan dê bi tama evînê bûya û dê her tişt, hemû tevîn û tevnên jiyana min a cidî li ser reh û demarên evînê saz bibûna. Demara xwînê ya jiyanê dê bi evînê biherikiya; jiyanê dê sirûda evînê bistranda.*

*Bi hêviya wê rojê min hemû lêgerînên xwe di nava tenêtiya dilê xwe de tepisandin û min hemû heyecanên xwe serjê kirin.*

*Rojekê min ê çavên xwe bimiçandina û xwe di nav pêlên jiyanê wer bikira. Min ê jî wekî her kesî/ê ji xwe re tevneke jiyanê raçanda. Dê ji bo min jî aso û mebest hebûna û ez ê jî ji bo ku bigihîştima wan têbikoşiyama. Wekî her kesî/ê; ne tiştekî kêm dixwazim ne zêde. Ez ê jî bibûma kesekî ji rêzê û min ê ji bo jirêzêtiyê hemû xewn û xeyalên xwe biguranda û hemû îdealên xwe feda bikirina. Kê dizanî, belkî bi jirêzêtiyê ez bilind bibûma; asoyên min fireh bibûna û min ji pêsîra jiyanê şîrê dewlemendiyê bimêta. Lê, ez ê çu car wisa nelewitîma ku min dilê xwe*

*ji bîr bikira; her li ku û di kîjan tevn û verêja jiyanê de bûma jî, ez ê her dem bi pêjn û bayê dilê xwe re hişîmend bûma. Min mehra xwe bi dilê xwe re kiribû; lewma min soz dabû dilê xwe yê dil-soz... Di çargavên raperîn û sermestiya dilî de li tarîsanên jiyanê digeriyam: Ez ê hebûma di nava hilma çend peyvên serkutkirî de. Straneke min jî hebû li ser jiyanê di kunedizên kavilediلekî sozdayî de:*

*tarî...*
*li her derê bêdengî*

*tu...*
*li dilê min mêvana negazîkirî*

*jiyan...*
*hilmeke qerisî*

*mirin...*
*tarî dibin hemû perde.*

*Wê rojê, li wê jiyanê, piştî bişkiftina hêviyên xesandî ez û tu; em ê bi hev re, li ser tevnên jiyanê, di nava dilê evîneke destnedayî de hev bibînin.*

*Li benda min be Dilşa!...*

**

Jiyaneke nû li benda min bû.

Wê rojê min dest bi jiyanê dikir, ew roja daweta min bû: Ez bêmal bûm, li mala xalê xwe dimam; ez betal bûm, li dûriyê dimam; ez bêkes bûm, ji bo behiya xalê xwe hatibûm. Îro daweta min bû, ez ê bi Sosinê re bizewiciyama, min ê bi wê re ji xwe re hêlînek ava bikira û me dê bi hev re, bi ken û girî, bi xweşî û talî, bi man û nemanê jiyaneke nû ku tenê aîdê me ye, ava bikira.

Sosin mêvana negazîkirî ya jiyana min bû; her tişt di kurtedemekê de qewimîbû û dilê me zû hev hewandibû, xwîna me zû germî hev bûbû û me pir zû biryara pêkvejiyana xwe dabû; me pir zû peymana destgirtina xwe pêk anîbû, wekî barana havînê; hêj erd şil nekirî, ku vewesiya bûbe, destgirtineke wisa demildest bû. Duh xena bû, îro jî dawet…

Xena cihekî girîng digirin di jiyana me de, gava herî dawîn a berî hasilbûna mirad e. Xena derazinka herî jor a zewacê bû. Xenaya ku li tiliyên dest û piyên me dihate husîn, nîşana pêkvegirêdana ruh û giyanê me bû. Êdî soza herî dawîn jî pêk hatibû, êdî, dest xena kiribûn, sibê dê bûk bihata veguhastin bo mala zavayî. Mak diçû ser hêlînê, çimkî makê hêlîn ava dikir. Me jî, di rojên destgirtiyê de cihê hêlîna xwe diyar kiribû jî; min û Sosinê dê qesra me ya şewitî ya li Gundê Mizgeftê ji nû ve ava bikira; me dê li ser xweliya wê, qesra evîna xwe lêkira. Lê belê pêşiyên me gotine, “xirakirin hêsan e, lê avakirin zehmet e” gelo me du dilên ku pir zû hev hewandî dê karibûya dil û ruhê xwe bida ber wê zehmetiyê?

Erê neynika min a dilî, ez û Sosin dibûn malxwey û kabanî.

Erê neynika min a spehî, spêdeya dawetê bû; bîskeke dî bi şûnde, berezava dê bihata û ez bibirima serşoyê, dûre jî por û rihên min dê kur bikirina, piştre jî cil û bergên zavatiyê min ê li xwe bikirina û em ê bi hev re biçûna mala berezavayî, dê şahî û govendê dest pê bikira.

Ez li serşokê bûm, bi min re zarokek jî anîbûn, ew jî şans û bextê zavayî bû. Li aliyekî Ebdula av bi serê min de dikir, li aliyê din bi hev re strana serê zavayî distran:

*Zavayî bibine serşoyê*
*lawo hey lawo*
*Cindî bibine serşoyê*

*Mustefa zavawo*
*Lê bireşînin nîmoyê*
*Lawo hey lawo*
*Mêvanê xumarûyê*
*Mustefa zavawo*
*Zavayî bibine sûlavê*
*Lawo hey lawo*
*Cindî bibine sûlavê*
*Mustefa zavawo*
*Lê bireşînin gulavê*
*Lawo hey lawo*
*Mêvanê belekçavê*
*Mustefa zavawo*

Ev stran gelekî bi min xweş hatibû. Ava sarogerm ku dê temenê min ê azeb li wir bişûşta û pêngava jiyaneke nû biavêta, di bin dengê nerm î helûn ê stranên serşoyê de hûnebayekî nerm li ser dilê min radikir.

*

Şal û şapikên merezî pir li bejna min hatibûn. Şûtika reş min li ser girê dabû, cemedaniyeke reş a xalên spî lê jî min li serê xwe alandibû. Dûre awirên min qulipîn ser Qurana bixwîn a bavê min, min ew ramûsa û danî ser eniya xwe, piştre min ajandaya Ehmed maçî kir, fotoyekî dayika min jî li wir bû, min ew jî maçî kir. Gava ku li ber neynikê min li xwe nihêrî hindik mabû ku min xwe nas nekira. Ez zava bûm, dest xenakirî, rih û por kurkirî, bi rapêçeke kurdewar, li ser kursiya zavatiyê rûniştibûm.

Heta nêzî nîvroyê zeviya ber Şikefta Şoqê ku me jê re Şatoya Hêviyan digot, tijî bûbû. Wê salê xalanên min li wê

zeviyê nefel çandibûn, her çend sêbelg piştpiyek rabûbû jî, kurxalê min got, "Bila gorî çavên xalzayê min be, ma em her roj wî nakin zava, dawetî dê li wir bin." Li bengeha zeviyê çend darên benavê, çend spîndarên ku mêwa tirî ya bêsiyane hilkişiyabû ser û hêdî hêdî distewiya hebûn. Kursîka zavayî li bin sîbera benavê bû.

Wê rojê asîman çik sayî bû, dawiya tebaxê bû. Rojeke germ bû, ji bo dawetê hêj hinekî berwext bû, çimkî li vir dawet bi taybetî piştî rabûna derametî dihatin lidarxistin.

Ligel germa tebaxê jî, xaniyan mil dabûn hev û govend şidandibûn. Çar kesan stran digot çaran jî lê vedigerand. Du kes jî li nava gerên govendê direqisîn. Hemû bi cil û bergên kurdanî bûn: Yên navsalçûyî şal û şepik li xwe kiribûn, yên dîtir jî pêşmerge lê bûn. Bir bi bir jin jî dihatin; fîstanên biriqok ên rengoreng rengekî xweşkûktir dida govendê: Êdî li Xanê jî dawet bi cergebez dihatin kirin, lê berê qedexe bû, ev yek, di serî de bi min sosret hatibû; ji ber ku berî deh salan gava hêj gundê me ava bû dawet wisa nebûn; hingê ez fikirîm, min ji xwe re got, "Nebêje gava ku pêlek li cihekî dikeve her tişt diguhere, heta bi demê re edet û kevneşopî jî diguherin."

Havîn bû, li Gundê Axayî, li Taxa Qesrê, li ber Şikefta Şoqê, li nav zeviya nefelê dengê stranan diçû ber felekê. Piştre sê bir Keşkanî jî hatin, piştî bixêrhatin û pîrozbahiya serpê wan jî xwe bi gerên govendê wer kir. Miletê me gelekî sergerm bû, bêyî ferq û cudayî, kêfa her kesî/ê ji dawetan re dihat; gundiyan wan du sê rojên dawetê hemû rik û kerba xwe li cih dihişt û hemûyan bi hev re kurmê xwe diweşandin. Di nava miletî de gotinek hebû, digot, "Roja xweşiyê bi dû dilê xwe kêfê bikin, jixwe roja xemê her xem e." Lewma di rojên kêfê de kesî/ê çu miraz li ser dilê xwe nedihişt: Ji feqîrê herî jar ê gundî bigire, heta zengînê herî heyî, her kes diçû dawetê.

Daweta min bû: Ez eve gelek sal bûn ku ji welatî bi dûr

ketibûm, ne dawet, ne şer, di nav çu tiştî de nebûm, min gelekî bêriya dawetên welatê xwe kiribû, lê ma min çi dizanî daweta ewil a ku ez ê li ser hilbûma daweta min bi xwe bû. Ev yek ji bo min xwedan wate û tameke cuda bû. Hestekî gelekî xweş bû. Hatin û vegereke gelekî pîroz bû.

Havîn bû, meha tebaxê. Ez jî rakirim govendê, baş bû ku min dizanî bileyîzim, nexwe dê hetika min biçûya. Çavên min li ser rêzên govendê digeriyan: Gelek kes min nedinasîn, gelek rûyên ji min re biyanî hebûn. Ev gelek sal bûn ku ez li dûriyê bûm, gelek ciwan gihîştibûn, gelek kes miribûn. Tajdîn û Esma bi zarokên xwe ve li wir bûn, Rojbîn û Rondik li destên min bûn, yekê fîstanekî şîn ê gulgulî lê bû, ya dî fîstanekî sor ê gulgulî…

Govend digeriya: Ebdula milên Tajdînê me girt, ew bi xurtî derxist nava govendê; şivek li tenişta wî xist û got, de mela bireqise, ka tu dê zora min bibî an ez… Tajdîn piçekî xwe ragirt lê Ebdula dawiyê ew reqisand. Hingê min dît, Salîmê Keşkanî hêdîka xwe gihand min, xwîşka min Ronahî jî pê re bû; hate serûstûyê min, her duyan ez pîroz kirim, xelatê xwe dan û em bi hev re reqisîn. Vê yekê bandoreke mezin li min kir.

Nîvro bû: Daweta şêxanî rawestiya, zilamên Taxa Qesrê hemû li nava gerên govendê li hev civiyan; teybîra mêvanan dikirin. Hingê daweta milanê dest pê kir. Mêvan hatin belavkirin; her malekê çend kes bi xwe re birin û ber bi malên xwe ve meşiyan; jin jî belavî Taxa Biharkê bûn, Taxa Berojî jî mala bûkê bû.

Mêvan diçûn firavînê; ji germê Xanê disincirî. Xwîdanê heta binê piyan ez şil kiribûm, hema her kesî/ê pelek di destî de bû, baweşîn dikir, li ser cuhê serê xwe şil dikir. Hingê çavên min bi asîmanê şîn ketin: Li aliyê rojava çend pirtên ewran serî hilanîbûn. Piştre me bêhna xwe li mala berezavayî veda. Firavîna me taybet hatibû hazirkirin: Goştê berxan, pelava

birincî, doxeba, şorvaya kutilkan, fêkî, dewê sibitkirî û nanê genimî.

Erê neynika min, daweta min bû. Rojeke germ a tebaxê, ez li Xanê bûm, li mala xalê xwe, ji bo behîdariyê hatibûm û îro jî zava bûm. Çavên min her li dayika min digeriyan, hestên min li perava jiyaneke nediyar digindirîn, carina hizra min heta nik Bîşengê diçû; heta ku min digot, xwezî min tiştek jê bizaniya. Piştre Ehmed dihat bîra min, Dilşa û daweta wan. Piştre Bînahiya ku bêseroşûn bûye dihat bîra min û min dixwest ku vê rojê hemû jî li vê derê bin: Li nik min…

Erê neynika min, mirov di jiyanê de hînî her tiştî dibû: Hinek tişt diqewimîn ku mirovî çi bikira jî nedikarî biguherîne.

Daweta min bû. Cil û bergên zavatiyê li min, dest xenakirî, gustîla zavatiyê di tiliyê de, ez li Xanê, li mala xalê xwe bûm.

Nêzî berêvarê taviyeke baranê pê darêtibû. Bêhna axê ji erdê difûriya. Dawetî li ber baranê bûbûn limsik, lê her ku baran dişidiya wan xweştir dileyîst û govend bêhtir dişarand.

Her weha sê rojan dawet bû, sê rojan dengê def û zirneyê, dengê dawol û sazê qet ji Xana Sêgundan birnedibû. Bi şev stranên dîwankî, bi roj def û zirne, dahol û saz; êdî her kes têra dilê xwe reqisîbû. Dengê dengbêjan ketibû, daholvan westiyabûn, piyên gênc û ciwanan ji reqsê civa bûbûn. Hezkiriyan hemû kesera ser dilê xwe verevandibû; gelek destgirtiyên nû bi xêra dawetê hev nasîbûn û li hev hatibûn, gelek jî ji hev geriyabûn; cuda bûbûn. Bi xêra du sê rojên dawetê ku xwarin mişe bûbû, feqîr û hejarên gundî zikê xwe têr kiribûn û kêfa zarokên sêwî hatibû. Paleyan wan çend rojan têr bêhna xwe vedabû û gelek kesên ku mirov û lêzimên wan li bajarî bûn, bi vî awayî hev dîtibûn û dilê wan xweş bûbû.

Bûk êdî ji bo mala zavayî hatibû veguhastin.

Erê neynika min, daweta min bû. Ez wê rojê qet ji bîr nakim: 28'ê tebaxê. Roja pêncşemê bû. Êdî dora hevşabûna bûk û zavayî bû: Dawetî li malên xwe vegeriyabûn, şev kerr bûbû, piştî qerebalix û kêfxweşiyeke sê rojan êdî bêdengiyeke şirîn Xanê vegirtibû. Berê me şerbeta xwe vexwar, piştre gerdaniya ku Tajdîn ji min re anîbû, min kiribû gerdena wê û dûre jî di bêdengiya şevê de em bi hev şa bûbûn. Yekem car laşê min bi laşê jinekê re gihîştibû hev. Ez êdî gihîştibûm parçeya dîtir a sêva xwe, êdî bagerên dilê min li bêndera Sosinê veniştibûn. Bêhna wê wekî navê wê xweş bû, têhna wê ruhê min hişîmend dikir. Ez bi wê re bi hebûna xwe hesiyabûm û dilê me pir zû dilê hev hewandibû, laşê me pir zû laşê hev hewandibû, xwîna me pir zû xwîna hev hewandibû.

Dotira rojê em bi hev re bi kêfxweşiyeke dilzîz hişyar bûbûn. Seradan û pîrozbahiyên gundiyan çend rojan dewam kirin. Piştî vegêranê kurxalê min dîsa em li wir hiştibûn û odeyeke qesra xwe dabû me, gotibû, "Heta çil rojan divê bûk û zava dernekevin, hûn ê li vir bin, piştre heke we dil hebe ku biçin nik Tajdîn Xwedê li gel we be, lê heke hûn naçin, ez qata jêrîn ya qesrê ji we re terxan bikim, kerem kin, li we aza be." Me jî gotibû, "Hela Xwedê mezin e…" ji aliyê dîtir ve jî xalê Feqî ku êdî xezûrê min bû, sond xwaribû ku em biçûna li mala wî bimana, gotibû: "Heta niha me tenê ev keç hebû, ji niha pê ve êdî me kurek jî heye." Me dîsa gotibû, "Hela roja nû dibe xêr dibe, Xwedê delîlê bêdelîlan e."

**

Heta me çavên xwe girtin û vekirin çil roj derbas bûbûn jî. Em li serê duryanekê bûn, avakirin zor bû, lê me ji mêj de biryara xwe dabû: Me dê Gundê Mizgeftê ava bikira. Serê çiriya dûyê bû. Berfê serê çiyayên bilind nixumandibû. Baran dibariya. Hewa sar bûbû. Dexil û deramet hema hema giş hatibû rakirin; her roj gêre bûn, her roj gundiyan bi dehan

piştiyên daran ji Birêlkî vedikêşan, li ber derên xwe dinijinandin. Serê dihan hatibû pêçan û gundiyan xwe ji zivistanê re amade dikir.

Payîz bû, hewa piçekî sar bûbû. Rojekê xezûr û xesûya min hatin, em ji mala xalê min wan birine nik xwe û got, mala we ev e, êdî hûn ê li vir bimînin. Bi rastî me her duyan jî deng nekir, nebêje Xwedê ji bo me wisa hez kiribû, her çi be, dawiyê me jî maleke xwe hebû.

Payîz bû, deramet dihate rakirin, lod û dihe dihatin nijinandin, miletî êzing û xwerdemeniya xwe ya zivistanê kom dikir, aha, di wan rojan de, me jî, di çargoşeya Dûpirkê de, li dûvê pirê ku xaçeriya çar gundan bû, bi xelatên dawetê ji xwe re dikaneke biçûk vekiribû. Ew der zeviya me bû. Riyên gundan ji wir ji hev vediqetiyan: Riyek ji wê derê ber bi Keşkanê ve diçû, yek ber bi Xana Tixûbiyan û ji wir jî diçû Talê û di ser Talê re diçû Culemêrgê, riyek ber bi Gundê Axayî, di ser wê derê re diçû Ertûşê, her weha milekî wê jî di ser Birêlkî re diçû Bazê û riya sernişîv jî ber bi Gûzereş û Çelê ve diçû.

Di deh rojan de min ji xwe re li wir kepirkek ava kiribû, bi piştevaniya Salîm jî me tijî tê de kelûmerc kiribûn. Bi roj, heta êvarî roja me li wir derbas dibû, êvarî jî em li Gundê Axayî vedigeriyan. Her weha çend caran fermandarê qereqolê hatibû, pirsa me kiribû, di dil de aciz bûbû û gotibû, "Ev camêr çawa wisa bêpûke tê ji xwe re li vir dezgehî vedike", lê piştî ku zanibû ku ev der tapûya bavê min e, gelekî bi ser min de nehatibû.

Payîz bû. Bêhnvedangeha me bûbû cihê kêfxweşiya rêwîngan, her roj miletî li wir, bi xwarin û pêxwarinên lezîz, bi doşav û xoşavên cemidî zikê xwe têr dikir. Lê vê yekê têra min nedikir, her ku ji wê derê ve çavên min bi kavilên me diketin misteke xwînê li ser dilê min dipengiya û min soz dida xwe ku ez hingê rawestim heta ku qesra xwe ji nû ve ava bikim. Xezûrê min digot, "Kurê min, bêhna xwe fireh bike, nehatiye dîtin ku

kesî/ê di payîzan de çu avahî lêkirine, ya te serxwerî ye, şikur ji bo Xwedê banek heye ku hûn lê sitare bibin"; lê her ku çavên min bi kavilan diket, ez har dibûm, li rika xwe siwar dibûm û min sond dixwar ku ez ê wê derê ava bikim.

Erê neynika min, gava min a ewil jî ew bû, ku rojekê berêvarî ez çûm nav kavilan, min dîwarê kotana pezê Keşkaniyan hilweşand û piştî ku şivanî pez anî, min nehişt ku pezê xwe bînin wê derê.

Payîz bû, şev sar bû; şivanî pezê xwe li aliyê Xana Tixûbiyan, li dora rûbarî dabû mexelî, dengê zîz ê bilûrê bi hemû zîziya xwe bi ser bêdengiya şevê de dibariya. Dengê bilûrê wisa bû, ku sewalê herî hov pê kedî dibûn; mar pê ji kuna xwe derdiket, şêr dibû pisîngeke miskîn û her weha dar û ber ji ber diheliyan.

Erê neynika min, êdî min marê di xew de hişyar kiribû, min dûzana heyî hejandibû, min kêf û rihetiya ku li ser xwîn û bêbextiyê, li ser xweliya kavilên me hatibû pê, xira kiribû. Ez wekî moriya ku bikeve mejiyê şêrî, ez jî wisa ketibûm nav tevînên wan û min hemû rik û hêrsa derdorê kişandibû ser xwe. Ji ber ku min nehiştibû pezê keşkaniyan bête nav kavilên me, berê hemû kesî/ê dageriyabû ser min. Mezinên me digotin, "Bihêle, de heta biharê sebir bike", Keşkanî ketibûn nava tirsê û wan dest bi raçandina tevna bêbextiyê kiribû û xezûrê min, Ebdulayê kurxalê min jî ji aliyekî ve digot, "Mustefa madem ku te deng jê anî, em heta mirinê li pişta te ne, ji ya xwe neyê xwarê" ji aliyekî ve jî Sosinê serê xwe datanî ser milê min û digot, "Ezgorî, bila cendekê min û te li nik ê bav û birayên te bin; serê me gorî vê axê be; em şêr in û em ê ji bo axa xwe bimirin jî."

*

Neynika min a xweşkûk, dest gihîştibûn ser kavlanan,

çeper hatibûn kolan, birîneke kevn, termekî bertavêhiştî, careke dîtir hatibû helişkaftin. Me gava xwe ya yekem avêtibû, niha jî dora wan bû: Ji serî ser, ji xwînê re xwîn; me mafê erdê xwe dikir, keşkaniyan jî, doza erdeke bi zorê desteserkirî, gundekî ku kiribûn kotana pezê xwe dikir. Gelo kî dê bi ser biketa: Me gotibû, destê we ji we re, ya ji we tê texsîr nekin; kanê em ê bibînin bê kîjan ji me bi kol û koç e, kîjan ji me bi şax û qiloç e!

****

# Dîmena sêzdemîn
# “berzebûn”

*Miraza berwext*
*Serê evîndarê/a xwe dixwe*

Tenê deqeyeke min mabû, piştî deqeyeke dîtir ez ê ber bi otogarê ve biketima rê da ku min berê xwe bida welatê dilê xwe û heye ku vê carê jiyan bi min re bikeniya û miradê min ku tenê dîtina Bîşengê bû hasil bibûya.

Çu tiştê min nemabû, her ji çi be nizanim, lê çi çiqilê min destê xwe didayê dişikest; di jiyanê de ez her dem an zû tevdigeriyam an jî dereng dimam, êdî jiyana min mabû ser tevnên dîtir, ez tenê wekî dava navberê dijiyam.

***

Awêneya min a delal, bi her hal jiyan zor û zehmet e û bi her hal barê wê giran e.

Payîz bû, serê çiriya dûyê. Wê şevê ez neçûbûm malê, heta sibê ez di nav kavilî de mabûm. Şev sar bû û heta sibê li min gelekî sar bûbû. Spêdê ez bi dengê Sosin û xezûrê xwe re hişyar bûbûm. Piştî pirsa hal û xatir, me bi hev re pariyekî nanî

xwaribû, piştre xezûrê min çûbû ber dikanê û ez û Sosin li nav kavilan mabûn.

Barê min pir giran bû: Min ê ji xweliya kavilan avahiyek ava bikira, gelekî zehmet bû. Berê min bi malîna cuhan dest pê kir, ez bi tenê bûm, pir diwestiyam. Sosin jî her dem bi min re bû, alîkariya min dikir, wê jî bi min re cuh dikola, kevir radikirin, xwarin hazir dikir û ya herî girîng jî, hebûna wê, dîtina wan her du çavên xezalî pişta min germ dikir, dilê min xweş dikir û hêz û qewet dida min.

Keşkanî her roj di ber me re dihatin û diçûn, lê carekê qewetxweşî jî bi me nedidan, her weha hawara Gundê Axayî jî dûr bû, her kes bi karê xwe mijûl bû, qet çu kesî/ê tenê rojekê jî berek harî me ji nav kavilan ranekir. Sibê heta êvarî ez bûm û delaliya xwe Sosin. Lê bi her hal em cidî bûn û me kiribû dilê xwe ku heta dawiyê bişixulin.

Roja sêyê bû. Nêzî danê têşdegan, fermandarê qereqolê bi birek leşkerî hatin derdor li me pêçan. Piştî qewetxweşiyeke sar, fermandar li hindava serê min rawestiya, hingê min cuh dimalî. Sosin çûbû dikanê nik bavê xwe, firavîn li wê derê hazir dikir. Ez bi tenê bûm. Dengê fermandarî ez veciniqandibûm: “Qewetxweş efendî”

“Sax bî ezbenî”

“Me dît ev du sê roj in tu li vir dixebitî, me jî got em biçin bipirsin ka ev camêr çi dike.”

“Hûn bi xêr hatin…”

“Xêr mêr, nizanim, lê haya me ji te nîn e, tu wisa bi serê xwe çi dikî li vê derê?”

“Çawa?”

“Te îzin ji kê stendiye?”

"Îzna çi?"

"Îzna îzin, ma îzna çi; ma em kerên bavê te ne li vê derê."

"Îzna çawa, ma mirov ji bo ku erdê bavê xwe ava bike jî divê îznan werbigire."

"Ê, lawo, te hay ji xwe heye, tu zanî tu bi kê re diaxivî?"

"Erê, ezbenî baş dizanim. Lê tu jî dizanî ku ev gund erdê min e, ez li ser axa xwe me û xaniyê xwe yê şewitandî ji nû ve ava dikim."

"Navê te çi ye zirto!"

"Navê min Mustefa ye, kurê Hecî Ebdurehman."

"Kurê Hecîlokî, ez dibînim ku zimanê te gelekî dirêj bûye."

"Min çi zimandirêjî nekiriye, eve mafê min ê qanûnî ye, li ser erdê xwe me; li derdorê hemû gund ava ne, li hindava serê me jî qereqola we heye, di warê ewlehiyê de jî çu problem nîn in, jixwe bawer im hûn karê xwe dikin."

"Kuro deyûz!.."

"Dijûnan nede min, çu heqê te li ser min nîn e."

Fermandarî bersiva min neda. Li ser piyê xwe zivirî û berê xwe da qereqolê. Gelekî zivêr bûbû, agir ji nav çavan dibariya. Dît ku ez pir micid im û bi gefeke biçûk jî dev ji karê xwe bernadim. Çû. Piştî çûyina wan, ez li rexê cuhê rûniştim, pir jî westiyabûm. Min mera xwe danî, piyên xwe di ber xwe de berdan û min awirek li derdorê gerand:

Payîzê rengê xwe dabû her derê; her der zer bûbû, hemû gil û giya behiyabûn. Li sertarên çiyayê Gareyî û aliyê Sermedarî li serê Çelê Dugeh befirê spî kiribû. Ewrekî mirewir li asîman

serî hilanîbû, hûnebayekî zîk rûyê mirovî dialast. Belgên daran nîvenîv weşiyabûn. Hingê çavên min bi hatina Sosinê ketin; ew li jêriya min, li binê zeviyê bi penda xwe ber bi min ve dimeşiya. Çawa gihîşt pirsiyara leşkeran kir, min jî hemû hal û hewal jê re gotin; hingê piçekî rûyê wê tirş bû û bi dengekî nizim di ber xwe de got, "Mustefa, ez ditirsim ku ev bêbav berhingarî serê me bibin, ew ê bela xwe di me din."

"Netirse, çavxezala min."

Li rûyê min nihêrî, ez hembêz kirim, piştre ramûsanek da ser sûretê min, piştre hat li tenişta min rûnişt û serê xwe hêdîka bi singa min veda. Payîz bû, hewayê dinyayê şikestibû, di ser zewaca me re hêj du meh derbas nebûbûn: Em du nûbûk û nûzavayên salê, ji bo jiyaneke ji rêzê, li ser kavilên gundê xwe, di hewla avakirinê de…

Wê rojê bi guman me şev bi ser xwe de anî, êvarî em her sê bi hev re çûn Gundê Axayî. Wê êvarê em zû nivistin, da ku sibê zû rabin, çimkî gelek karê me hebû. Tenê malîna cuhan qediyabû, me êdî av anîbû nav qesran. Lê hêj divê me binaxên avahiyê derxistina, me kevir û kuçên nava kavilî giş vavartina da ku hêdî hêdî binaxê xwe lê bikin. Me niyet bû ku îsal bo zivistanê odeyeke jêr a qesrê vegirta da ku zivistana xwe li wir bibihurînin. Odeyekê dê têra me bikira. Jixwe karê me yê dikanê jî baş diçû, biharê heke Xwedê hez bikira me dê qesra xwe eynî wekî berê ava kiriba.

Wê şevê xeweke kirêt dilê min girtibû, ji reşe û xewnereşkan heta sibê ez çend caran hişyar bûbûm; şev dirêj bû, şev tal bû, şevexwîn bû:

Ez li Gundê Mizgeftê li ser şaneşîna qesrê rûniştime, bavê min Quranê dixwîne, dayika min, bêdeng, biposîde li ser teništa behwê rûniştiye, teşiyê dirêse, guliyên wê li ser sûretê wê şor bûne, guliyên wê spî bûn; Ehmed û Dilşa jî li kêleka dayika

min in, wekî bûk û zavayê bihuştê ne, wekî qumriyan serê xwe bi hev du dadane û ji min xeyidîne, min dît Dilşa dibêje, Mustefa, tu çi mirovekî nebaş î, te daweta xwe kir, ka bêje te ji bo çi gazî me nekir! ne kirrr, nekii…

Ez veciniqîbûm û min demildest nivînên xwe ji ser xwe avêtibûn. Qey bêhemdê xwe min kiriye qîrîn, lewma Sosin bi qîrîna min re hişyar bûbû, aveke sar gihand min, piştî min av vexwar, Sosinê bi desmalê rûyê min malişt, got, “Mustefa, dilê min, te çi reşe dîtin, tu di xwîdanê de hefinî?” Bêyî ku ez bersiva wê bidim min ew careke dîtir hembêz kiribû û dûre jî bi hizrên xewnê re min çavên xwe miçiqandibûn, lê hingê dengê banga melayî ya nerm li hawara min hatibû. Ez ji bo nimêja sibê ji nav cihan rabûbûm û piştre jî heta rojronka berî tavdanê me têşta xwe xwaribû û dûre jî me bi hev re berê xwe dabû Dûpirkê.

Payîz bû. Wê şevê baran bariyabû lewma erd şil bû, befira ku hinekî dîtir jî xwe ji paxila çiyayan dahêlabû xwarê demildest li ber çavên mirov diket. Lê em wekî her roj bi dilekî rihet ber bi dikana xwe ve diçûn. Heta tavdanê em li wir diman, piştre em diçûn tewara xanî.

Gava em gihîştibûn Dûpirkê dîmeneke ji her roj cudatir em pêşwazî kiribûn: Her tişt belave bû, dezgehê me yê şolî hatibû şikandin, tiştên me li derdorê bijikiyabûn, kepirka me herifandî bû. Xuya bû ku gefên fermandarî yên duh hêdî hêdî bêhn jê dihat. Lê me qet moralê xwe xira nekir, hema demildest me ew der hemû dane hev, tiştên xwe komî ser hev kirin û dezgehê xwe careke dîtir çêkir û heçko çu tişt neqewimiye, wekî her roj, me dest bi karê xwe yê rojane kir.

Piştî nîvro fermandarî vê carê Salo hinartibû pê me, Salo û xwîşka min bi hev re hatibûn. Piştî qewetxweşiyê, çayeke me vexwaribûn, piştre jî gotibû, “Xizmo, ev fermandar gelekî bi te piştrik bûye, bawer im wê rojê tu lê rabûyî. Tu dûzana van

deran nizanî, wekî Stenbolê nîn e, divê mirov her bi piyê jêr biçe meseleyan. Li van deran her tişt bi gotina van kesan tê kirin. Heta biharê were, sond be, ez ê qateke mala xwe bidime we, werin li nik me bimînin, jixwe dikana we jî heye, heta biharê bêhna xwe fireh bikin, biharê Xwedê mezin e, li gorî hin dengûbehsan biharê dê gundan serbest bikin, paşê milet jî dê lê vegere, bi navê Xwedê, piştre çi bikeve ser milê me em ê ji we re bikin, tenê tu niha dest ji avakirina qesrê berde."

"Na xizmo na, me çi tiştekî nelirê nekiriye. Em ê tenê odeyekê ji xwe re ava bikin, bila dûkêl ji vê derê bilind bibe, ez tiştekî dî naxwazim. Eve warê me ye, milkê me ye, axa me ye. Tu jî dizanî, şêr şerî ji bo warê xwe dikin, wekî dî çavê me li çu tiştî nîn e."

"Xwedê bi we re be xizmo, lê xwezî tu nermtir bi wî terezbavî re biaxiviyayî, tirsa min ew e ku belayekê bîne serê we."

**

Erê neynika min, roja paştir jî eynî dîmenê em pêşwazî kirin; du sê çar, na na şeş rojan li ser hev dikana me wisa dihat bêseroberkirin, lê me bi sebreke mezin deng nedikir û heçko tiştek neqewimîbe karê xwe dewam dikir. Roja heftan îcar dikana me ji binî ve hatibû şewitandin, her weha ava cuha me ya qesrê hatibû birîn û her dîsa xîmê qesrê ku me binaxê wê lêkiribû jî tijî kevir kiribûn. Lê ligel van bêbextiyan jî, me careke dîtir ji serî ve dikana xwe çêkir, bi qer û deynan dagirt û careke dîtir dest bi karê xwe kir. Êdî berê me û leşkeran ketibû hev, wan xira dikir, me ava dikir, wan hildiweşand, me lêdikir, wan diherifand me çêdikir.

Li vî warî êdî serê du beranan li dîzekê hilnedihat.

Kî nêr bû, kî koç, hêdî hêdî belî dibû. Ez, Sosin û xezûrê xwe yê heftê û pênc salî Feqî Huseyn li aliyekî, fermandarê

qereqolê û çend cerdevan li aliyekî; çeka me dilê me bû, çeka wan agir jê dibariya; çeka me sebra me bû, ji ya wan xwîn dirijiya; çeka me îman û baweriya me bû, ya wan çov û dar…

Payîz bû, her ku diçû hewa sar dibû. Çiriya dûyê nîvî bûbû. Me êdî xwe li ser piyên xwe girtibû, dahatina me baş bû, Xwedê bereketa xwe dabûyê. Rêwîngên çend gundan li bêhnvedangeha me dibûn mêvan û lewma jî, pareyên me mişe bûn.

Min dîwarê qesrê heta binpencereyê lêkiribû. Rojeke sar a payîzê bû. Tav diçû ava, wê rojê xezûrê min zû çûbû malê, Sosinê jî karê dikanê qedandibû dê bîskeke dî bihata nik me da ku em bi hev re biçine mala xwe. Hingê erebeyeke leşkerî ji aliyê Keşkanê ve hat, ji pira Navdeştê derbas bû û nêzî min rawestiya. Deh leşker tê de bûn. Fermandarê wan peya bû û yekrê textena min kir. Çar leşker pê re bûn. Gihîştin nik min, min wê gavê tevir û merên xwe radikirin, cilên şolî min guhartibûn, ez li benda Sosinê bûm, ku bihata em ê biçûna. Du leşkeran ripo milên min girtin, min got, çi dibe, xêr e; fermandar, kulmek li devê min xist û kire qîrîn: “Kurê seyî, ma tu çi zimanan tênagihî, tu çi nifş î, hey min dayik û jin li te gayo!” Dûre pihînek li zikê min xist, serê min çemiya, dûre jî her yekî ji aliyekî ve ez dam ber mist û tepolan, pihîn û jopan. Qûndarên tivingên wan ên asin li ser dev û difna min radibûn û diçemiyan. Ji her dera min xwîn dipeşiya. Her dera min diêşiya. Heta ker cihê xwe yê berê bibîne li min xistin, dûre, nizanim çawa û kengî û çûn. Hingê ez bêhal, birîndar li nav kavilan vedihejiyam, çavên min geh tarî dibûn, geh zelal, dinya li pêş çavên min geh nêzik dibû, geh dûr diket.

Sosin bi hawarkî gihîşt ser termê min, bi çarlepkî, bi alîkariya şivanê Keşkaniyan ez gihandibûm malê. Ez êdî li ber mirinê bûm. Her dera min diêşiya: Xesûya min li hindava serê min birînên min dikewandin, di ber re jî nifir li leşkeran dikir,

digot, “Ew destên li te xistin bixilin, bişikên, ya rebî, tu bikî wan ji malê çi tê nemîne!…” Sosinê li ber serê min rondikên xwe vedimaliştin. Ebdulayê kurxalê min her roj li bajarî bû, ku parêzerek bidîta da ku dozê lê vekin, lê kesî/ê xwe nedida ber, kesî/ê nediwêribû.

Bi hefteyan ez di nav nivînan de bûm, di zavatiya umrê xwe de min xwîn dimîst. Li şûna min xezûrê min her roj di heftê û pênc saliya xwe de diçû ber dikanê û karê xwe dikir, digot, “Kurê min, me çu minet pê nîn e, lê ez kêfa xêrnexwaz û nemaman li ser me naynim, sond bi navê Xwedê, kuştina me jî li ser be, ew dikan dê bixebite, ew milk û war dê avadan bibe.”

Êdî befir hatibû. Ez hêdî hêdî bi ser xwe ve dihatim, birînên min dikewiyan û ez êdî bêalîkarî dikaribûm heta ser şaneşînê biçûma, heta min dikaribû biçûma destavê jî. Rojeke sar bû, befir bêmuhlet dibariya.

Ez li pişt sobê di nav nivînên xwe de bûm, Sosin li ber serê min digeriya, meta Gulê li ber pencereyê rê dipa, digot, “Ka, bû derengî Feqî nehat!” Hingê erebeya kurxalê min li ber derî sekinîbû: Dîsa hawar bi Gundê Axayî diket. Meta Gulê li ber pencereyê qîjîneke bilind berda, bi qîjîna wê bi hezaran cam di mêjiyê min de şikestin. Em ripo ji cihê xwe rabûn; hemû laşê min hê jî diêşiya, lê ma kê hay ji êşê mabû. Cendekekî bi xwîn ji derazinka malê bi ser dixist û dianî hundir.

Xezûrê min li ser nimêja mexrebê ji aliyê gulebarana qereqolê ve di secdeyê de hatibû kuştin.

Dengê girîn û zêmarê li Taxa Berojî olan dida. Zivistan bû, sar bû, piştpiyek befir hatibû, her der spî bû, xwîn dikete befirê, pîremêrê heftê û pênc salî, li ser nimêjê bi guleyên bêbext hatibû kuştin.

Xesûya min, meta Gulê xwe bi ser termê pîremêrî de dabû û zêmar dikir:

*Hawar e sed hawar e,*
*Zivistan e, çendî bi min sar e*
*Pîremêrê heftêpênc salî kuşt*
*Xwedêyo ev çi zilma dijwar e.*

*Hawar e, bo çi hawar nîn e*
*Zivistan e, çu mecala me nîn e*
*Feqiyê min, di secdeyê de kuşt*
*Xwedêyo zilma weha li dinê nîn e*

Sosin li ser milê min ji xwe çûyî bû, hay ji dinyayê nemabû. Carina çavên xwe vedikirin, bi awirên har, bêdeng li min temaşe dikir, dûre rûbarê rondikên wê dihatin xwarê û piştre jî serê xwe bi singa min ve dida û wisa bêdeng radiwestiya.

Befir hê jî dibariya. Di xeleka heyaman de hizrên min ez dibirim û dianîm: Bavê min, Ehmed, dayika min û Ebdurehmanê biçûk, yek bi yek, dihatin pêş çavên min. Min li rûyê xezûrê xwe nihêrî: Rûyekî geş ê qermiçî, simbêlên dirêj ên kej û bejna kin a li ber dijwariya salan bi ser xwe de çemiyayî… Dibêjin, mirovî li ser rûyê erdê sê dayik û bav hene; yek dayik û bavê mirovî yên esil in, du xezûr û xesûya mirovî, ya dîtir jî mamoste û seydayê mirovî ye. Ew jî bavê min bû, ji berê de feqiyê bavê min bû; wekî dîtir jî pismamê me bû, em ji ocaxekê bûn.

Niha li ber çavên min, belkî jî ji ber înad û rika min a serxwer, li vir di nava xwîna sor de bêruh raketibû.

Min serê xwe danî ser cendekê wî, min destê wî ramûsa, piştre, min eniya wî jî maçî kir. Min dikir nedikir min nedikarî rondikên xwe rawestînim, ew wekî barana nîsanê dilop bi dilop ji çavên min dihatin xwarê.

Bavekî min hebû, ew jî çû. Xwedêyo niha min ê çi bikira, min ê çawa bikaribûya ji ber vî ezabî bijiyama. Li ser vê axê min ê çawa jiyana xwe debar bikira.

**

Piştî behîdariyê bi çend rojan meta Gulê jî gihîşt mêrê xwe, êdî li malê ez û Sosinê tenê mabûn. Lê piştî mirina dayik û bavê xwe Sosin nehat ser xwe, qet nekeniya, hema her tim damayî bû, bi hizr û xeyal bû, bi awirên vala li rûyê min dinihêrî û dûre jî çend rondik ji çavan diherikiyan.

Xwedê wisa hez kir, wê salê piştî befira yekem heyamekê dinya xweş bû, beroj dîsa reş bûn, nava gundî befir nema ji bilî tilên li pişt banan. Aha wan rojan, spêdeyekê ez hişyar bûm ku Sosin ne li malê ye, li vir, li wir, ez geriyam lê min li çu derê ew nedît. Piştre min kaxizek di nav cilên wê de dît, ew nameya xatirxwestinê bû, weha nivîsîbû:

*Mustefa, evîndarê dilê min ê bêdem, dilê min, sebra min nema, li min bibore ha, ez çi bikim, nebêje çarenûsa me jî weha ye, me xêr bi xwe nedît. Me xêr ji evîna xwe nedît, me xêr ji bûk û zavatiya xwe nedît. Ez sebeban napirsim, nabêjim heke me wisa nekira wisa nedibû jî, hema tenê dê bibêjim qeder, erê Mustefa, qedera min û te…*

*Min xatir ji te nexwest, ez zanim, heke min biceribanda ne dilê min digirt, ne jî te dê bihişta. Baweriya te bi Xwedê bêt, ew rojên bi te re, rojên herî xweş ên umrê min bûn, ez çu carê wan rojan ji bîr nakim. Zilamê ku ez lê digeriyam tu bûyî, lê çi bikim, nebû; em bêjin Xwedê hez nekir, çênebû, em têr bi hev şanebûn, me xêr ji bûk û zavatiya xwe nedît…*

*Mustefa, ez ê niha ber bi riyeke bêveger ve biçim; biçim belkî tiştekî ji birayê xwe bizanibim. Ji mala me ew tenê maye, erê heke mabe; min divê ez tiştekî ji wî bizanibim bila piştre ez jî bimirim. Bi xatrê te… Sosin.*

Heyho neynika min heyho, çi çiqilê min destê xwe didayê dişikest. Piştî xwendina nameya Sosinê ez tenê saetekê li Xanê mam, min her tişt li cih hişt û bêyî ku xatirê xwe ji kesekî/ê bixwazim, bi mînîbusa gundekî dî min berê xwe da Culemêrgê. Li wir jî, bêyî ku biçim seradana birayê xwe, hema yekrê min xwe li Stenbolê girt. Piştre min bihîst ku bihara paştir Gundê Mizgeftê hatiye avakirin, çend mal lê vegeriyane. Vê agahiyê hem ji aliyekî ve ez xemgîn kirim, hem jî kêfa min hat, çimkî têkoşîna me di avê de neçûbû, me nedîtibe jî, em nebin jî, hinekî dîtir pê şa bûn.

*

Awêneya min, neynika dilê min, li vî bajarê dûr, li vî bajarê ku mirov bêyî ku li rûyê hev binihêrin bi hev re diaxivin, serê min rihet dibe, êşên min ditewin û di nava bêdengiyê de xwe berze dikim. Her ku berze dibim, pê dihesim ku tiştên li pey mane jî ji jiyana min berze dibin.

Min gelek dixwest ku min birka hizr û bîra xwe ji binî ve vala bikim da ku her tişt ji bîra min biçe, lê ne mimkûn e. Carina tiştên mirov li nêzikahiyan jê direve û xwe jê dûr dixe, li dûrahiyan jî tên bi hefka mirovî dinişin.

Her ku ez straneke kevn dibihîzim Sosin tê bîra min, çimkî piştî ku ez çûm Stenbolê bi du salan, min di rojnameya Azadiya Welatî de xwend ku Sosin bûye serkêşa şervanan, lê di rojeke biharê de, li Pîrî, ku xezûrê min çîrokê wê ji min re gotibû, bi nav pêlên rûbarê Xanê wer bûye, her weha birayê wê jî di şerekî bêeman de hatiye kuştin. Nivîs bi jêrnavê:

**Avetîrk û şehîdeke Bênav derketibû. Di bin de îmzeya Omer Dilsoz hebû. Wisa xuya ye ku Sosinê xwe wekî Bênav bi nav kiriye.**

Nivîs weha bû:

**Gava av di kevanê demê re dibe tîrek û li nava dilê mirov diçikile…**

*Ji nîvroyê ve baranê lê kiribû. Baran her ku diçû gurtir dibariya. Lêmişt û lêseran serê xwe dixwar. Rûbar har û şêt bûbûn. Gurmîniya rûbar li lat û zinaran deng vedida. Dema avetîrkan bû. Av ji pêsîra keviyên berfê vediheliya û di newala kûr de tîr dibû. Geliyê Rêjgarê geliyekî kûr e; rûbarekî boş tê re diherike. Li serê Rêjgarê hêj jî berf dibariya. Rojeke gelekî tengav bû.*

*Em ê jê re Bênav bêjin; Bênavê gelekî ji baranê hez dikir. Wê ji biçûkatiya xwe ve çi gava baran dibarî diçû porê xwe dida ber baranê; nemaze barana avrêlê: Avetîrkan. Li gorî kevnebaweriyekê dilopên ava barana avetîrkan ji sed derdan re derman bûn. Her wiha bi wê porê keçan dirêj dibû. Lewma çi gava baran dibarî Bênav jî diçû ber baranê û porê xwe dida ber da ku porê wê hinekî din dirêj bibe. Çi gava baran dibarî Bênavê wekî ku di zaroktiya xwe de dikir, dîsa diçû porê xwe dida ber baranê.*

*Ji nişka ve awirên wê ketin ser dêm û rûyên hevalên wê; yek bi yek li rûyên hemûyan nihêrî, heçko dê tiştek biqewime, heçko dê bêhneke dîtir xatirê xwe ji wan bixwaze. Bişirîneke cidî li ser dêmên wê veda; ew serkêşa komê bû. Heke serê yekî/ê ji wan biêşiya dê dilê wê biêşiya. Piştre heçko dixwest gelek tiştan bêje, li nik hevalên xwe dihat û diçû lê deng nedikir.*

*Her ku diçû baran gurtir dibariya. Êdî her der gelekî tarî bûbû; carina ji nişkê ve gava ku birûsk vedijeniyan, ew der ronî dibûn û ji nişka ve careke dîtir jîngehê kirasê reşetariyê li xwe dipêça. Te digot qey asîman qul bûye, baran wisa bêrawestan dibariya.*

*Ji nişkê ve giraniyek ket ser bedena Bênavê; xeweke şirîn a bêdem bedena wê vegirt. Dikir nedikir nedikarî çavên xwe veke; wisa bi vehejkî çû ji cuha avê ya di ber stargeha wan re derbas dibû rûyê xwe veşûşt. Piçekî giraniya xewê ji ser çavên wê reviyabû. Piştî sivkexwarinekê, di cihê xwe de, serê xwe danî ser milê xwe û di xew re çû. Dilopek li ser*

*dêmê wê dahisî û ji nişkê ve veciniqî, piştre bi lezgînî, bi edayeke nîvtirs, nîvxem çavên xwe vekirin. çavên wê bel bûbûn. Li hevala ku li kêlakê wê bû, nihêrî, 'Birayê min' got, 'Erê erê, min ew…' Hevala ku li kêleka wê rûniştibû, tiştek ji gotina wê fêm nekir, lewma deng nekir, hingê Bênavê got, 'Birayê min, par şehîd ketibû, gazî min dikir. Piştre jî dayika min…', 'Xewn e, borî çû…' bi dilsarî lê vegerand hevala ku li kêleka wê rûniştibû. Dûre awirên wan di wê tariya şevê de, li hev aliqîn; her du bi hev re bi sivikî girnijîn.*

*Baran hê jî dibariya. Şev reş bû; şev tarî bû û baran bênavber dibariya. Bênav ji nişka ve rabû ser xwe, çek û rextên xwe girêdan; xwe peyt kir û li saeta xwe nihêrî, piştre li hevalan vegeriya û banî wan kir da ku her kes demildest xwe amade bike. Ew ê biçûna, êdî dem hatibû. Dema meşê; ew her tim bi şev dimeşiyan. Şev hevala wan a herî dilsoz bû; bi şev jiyanê ji bo wan dest pê dikir. Jiyaneke ku her kêliya wê xwedî liv û tevgereke cudatir. Her kêliya wê xwedî suprîzeke nediyar. Kê dizanî dê di meşa îşev de çi rûbida.*

*Agir hat tefandin. Av di kuçik û tifikê de hat dakirin. Her kesî/ê piştiyê xwe da pişta xwe, rext û çekên xwe pêçan û ketin rê. Rê dûr û dirêj bû; baran jî bêrawestan dibariya. Bênav berî her kesî gihîştibû dora çem; av gelekî boş bûbû, sîpelan li tal û zinarên dora xwe dixist û deng vedida. Qurmîniyek ji çem dihat; av gelekî şêlû bûbû. Pêlên wê bi har û dînî bi nava hev diketin û bi ser hev de diçûn xwarê. Biyeke kevnar daqul bûbû û wekî pirê bi ser rûbar de daşikestibû. Bi dengekî berz û piçekî jî bi henekwarî got, 'hevalino, xwe ji bo avjenî û melevaniyan amade bikin, em ê bi ser vî qurmê biyê re derbas bibin' hingê, 'Xema nexwe heval, çi çem û rûbar bi me nikarin' lê vegerand hevalekê.*

*Bênav di yek carê de di ser wê pirê re derbas bû, piştre li hevalên xwe vegeriya û banî wan kir û got, 'netirsin, qurm saxlem e.' Dûre hevalan dest bi derbaskirina aliyê dîtir ê çem kir. Bênav li dûvê pirê, li benda hevalên xwe rawestiyabû; yek bi yek destên hemûyan digirt û wekî dayikeke ku nehêle zarokên wê tûşî sergêjiyekê bibin, herçî hevala/ê dihat, hem li ber dilê wan dida, hem jî bi destê wan digirt heta ku pê li bejahiyê bikin.*

*Baran bişid dibariya; tenê hevalek mabû. Ew piçekî ji avê ditirsiya. Heta nîveka qurmî hat, li wir piçekî vema. Bêmal piçekî dîtir ber bi wê ve çû; çeka wê girt û da hevala li milê xwe yê din û ew derbas kir, dûre bi destê hevala herî dawîn girt û ew hêdîka ber bi xwe ve anî, heta ku derbasî aliyê dîtir kirî, hingê, ji nişka ve giraniyek ket ser bedena Bênavê; ling lê recifîn. 'Dayê' got bi dengekî kelogirîn, dûre bi dû pişta xwe hilpekiya û bi nav pêlên har wer bû. Wê hemû hevalên xwe derbas kiribûn lê ew ji sîrata mirinê derbas nebûbû.*

*Baran dibariya. Hemû heval li aliyê dîtir ê çem, li bin barana bişid hişk û req bûbûn. Hingê her yekî/ê ji aliyê xwe ve kire qîrîn, her yek ji aliyê xwe ve li rexê çem beziya. Lê, rûbar gelekî boş bû, gelekî şêlû bû û ax û kevir, qurmên daran, parçeyên keviyên berfê bi ser pêlên rûbar diketin. Bênav, fermandara çiyayê Kurdistanê êdî bi nav sîpelên rûbarê har wer bûbû.*

***

*Her roj komek dihat yek diçû, her roj kevir bi kevir, quncik bi quncik li Bênavê digeriyan lê wê li tu deran xuya nedikir. Kesî/ê ew nedidît, ne bi saxî, ne jî mirî. Avê ew daqurtandibû. Pêlên har ew bi xwe re biribûn û li dilê xwe veşartibûn. Roj diçûn, meh diçûn; av kêm dibû, lê Bênav hê jî nehatibû dîtin.*

*Du kîlometere li jêrê cihê bûyer lê qewimîbû ziyaretgeheke bi navê Şexsî heye. Kes nizane kesê li wir radizê kî ye; navê wî yê rastîn çi bûye, xwediyê kîjan dozê bûye û ji bo çi li wir hatiye veşartin. Tenê, li gorî gotinên pîremêr û pîrejinan kesekî xerîb bûye; di wexteke ku kes nizane kengî ye, li wê derê ji bo doz û miraza pê rabûye giyana xwe ji dest daye û li wê derê, li wî geliyê kûr, li binê qûntara çiyayê Rêjgarê, li dora rûbar hatiye veşartin. Her wiha bi salan e ku jinên bêzarok, keç û kurên miraz lê xezikî, tên, patekê li dara tewkê ku gora Şexsî li binî ye, vedikin. Li gorî gotinan, heta niha mirazên gelek mirazxwazan bi vî awayî hasil bûye.*

*Payîz hatibû êdî. Daran hêdî hêdî pelên xwe diweşandin. Rûbar*

*êdî ne wekî wî rûbarê har ê biharê, berevajî bi qasî cuha aşekê kêm bûbû. Rojekê gundî li dora çem ji xwe re êzing û qirş û qalan didin hev. Keçikeke gundî hem ji bo miraza xwe pate li Şexsî veke, hem jî êzingan bide hev li dora rûbarî digeriya. Tam gihîştibû kêleka Şexsî, li dora çem tiştek li pêş çavên wê ket. Demildest wê bi yekî dengê xwe kire qîjîn û gazî hevala xwe kir; got, 'Hawaaaaaaaarrrr! Va ye min li vê derê cendekek dît!'*

*Hê jî rextên wê li ser bejna wê bûn, hê jî laşê wê nerizîbû… Kê dizanî, belkî ew û Şexsî bi miraza dilê xwe şabûbûn…*

*Du dilên bêguneh. Du dozdarên xwedî dozên cuda. Du dozdarên xwedî dem û heyamên cuda. Du dilên pak û tijî evîn ên xerîb. Du mêvanên Rêjgarê; Bênav û Şexsî… Du şehîdên evîneke di ser dem, mekan û cihan re.*

*Piştî vedîtina cendekê Bênavê, ew, wekî şehîdekê bi cil û berg û rapêça xwe li tenişta Şexsî hate definkirin. Wekî Mem û Zînên ku çu carê hev nedîtine, lê sîpelên demê, barana avetîrkan ku Bênavê wisa bawer dikir ku porê keçikan pê dirêj dibe, ew gihandibûn hev. Avetîrkan axa wan kiribû yek. Ji demên cuda, ji êş û mebestên cuda, ji war û têgînên cuda evînek dihat afirandin. Evînek ji tîrên avê vediresiya û li dilê Rêjgarê dem û heyamên cuda digihandin hev.*

***Ew, evîndarên avetîrkan êdî bûbûn mirazgeha rêbarê Rêjgarê…***

**

Heywax neynika min, heywax, kî dizane belkî niha Sosin li dora çemê Gûzereşê wek sosinekê hêşîn dibe. Ji bo Sosinê, ji bo rûbarê ku Sosin di dilê xwe de hewandiye, îro ez dixwazim bi te re strana rûbaro binehwirînim.

Neynika min, strana rûbaro ez ê bibêjim, tu guhdar î:

*Hey herê rûbaro, tu çendî bi min şerab î*

*Li ser û serhedên jorîn tê û li çu geliyan razî nabî*
*Hindî şilq û sîpelên xwe tavêjî*
*Temendî xemeke dilê min nabî*

*Hey herê rûbaro, tu çendî bi min şirîn î*
*Li ser û serhedên jorîn tê û li çu geliyan razî nîn î*
*Hindî şilq û sîpelên xwe tavêjî*
*Temendî xemeke dilê min nîn î*

**

Piştre ez radibûm, bi tikî tenê bûm, çanteyê min di milê min de bû, bajarê mezin wekî her carê wek rêzika moriyan dixulxulî. Ez tê de berze dibûm, berze dibûm û ber…

# Ferhengok

**A**

**Alal:** Navê kulîlkekê ye.

**Avetîrk:** Baranên Nîsanê

**Ayînde:** Dahatû, paşeroj, rojên dê bên.

**B**

**Bangivêr:** Bangêran, kevirê gilover ê ku ban pê tê gêran. Kevirê ji çiya ji ber çimê pezan vedirese.

**Bawan:** Kindirê ber bê. Çadira ku bi lêdana bê vedibe, yelken.

**Behî:** Şîn û tazî.

**Behîdar:** Kesên têne serxweşiya mala mirî.

**Behîn, behîyan:** Ziwabûn, çilmisîna dar û berî, ji bêaviyê çilmisîn.

**Behwe:** Şaneşîn, cihê hewadar. Cihê bervekirî, banikên ber malê; şahnişîn, şaneşîn, balkon.

**Bengeh:** Navbera zeviyan a ber berroj.

**Beraş:** Kevirê aşî, berê aşî.

**Berhingarî:** Bela xwe tê dan, gava yek bibe belayê serê yekî.

**Berîk:** Berûk, berîk, cêb.

**Beybûn:** Navê kulîlkekê ye.

**Bêgane:** Bê eman, gelek dijwar, bêçare.

**Bêwexer:** Bêoxir, bêşans.

**Birs:** Birçîtî.

**Bişkurîn:** Bişirîn, tebessûm

**Bixêrî:** Di avahiyên kevn de cihê ku agir lê vêdixist, şomîne.

**Bîjî:** Kesê/a bavê wî nediyar; kesê/a bi têkiliya nemeşrû peyda bûyî; pîç.

**Bîjîavêjk:** Jina ku ji têkiliya nemeşrû zarokî tîne dinê. Qehbe, orispî.

**Bîşî:** Dehlê avî, daristana biçûk a bi mêrg û kanî.

**Bîwar:** War, cih

**Bûşî:** Mûyên li ser stûyê hespan

## C

**Canemerg:** Navê kulîlkekê ye, li ber keviyên berfê şîn dibe; berfîn.

**Canhêl:** Ciwan, kesên ku nû nû digihin.

**Cergebez:** Govenda têkel a jin û mêran

**Civa (bûn):** tevizîn

**Coxîn:** Bêder, cihê ku gêre lê kirin.

## Ç

**Çarmendor:** Dorhêl, çar alî, kenar.

**Çemiyan:** Tewiyan, di ber xwe de xwarbûn.

**Çerwar:** Cihê çerê, çêrgeh; mera.

**Çevrebî:** Celebeke dara biyê ye.

**Çir:** Tiştê zeliqoq, ji bo kesê bi daringê baş negihîştî jî dibêjin.

## D

**Damen:** Daw, etek.

**Dang:** Aliyê jêr, aliyê bin de.

**Darse:** Kesê nehez, kesê fîzîkî wî nelihev be.

**Dav:** Tayekî gulê, tayekî porî.

**Depdepe:** Kesê gewdê wî qalind û girs.

**Dersûk:** Xêlî, serpoş, poşî.

**Destkol:** Bizav, hewldan, pê rabûn, pê mijûlbûn.

**Dexil û deramet:** Qût, xwerdemenî, ardû.

**Dêvandin:** Barîna hêdî hêdî, ya dilop dilop.

**Dih:** Lodên giya.

**Diltezîn:** Dilsoj, dramatîk, qewmîna tesîrê li ser giyanê mirovî dike.

**Doşk:** Palpişta li ber avahiyên kevin ên gundan.

**Doxeba:** Xwarineke herêma Culemêrgê ye; ji dew û kutilkan çêdibe.

**Dû:** Dûman

## E

**Evra:** Pîroz, muqeddes

## Ê

**Êk:** Yek, hev. (daçek e)

## F

**Fêşik:** Dol, dolê filankesê, sperm.

## G

**Garîte, karîte:** Beşt; darên dirêj ên datînin ser banan

**Gêdûk:** Bihor; di navbera du çiyan de cihê derbasbûnê.

**Gêndel û çevir, kerkol û heliz:** Navên giya ne.

**Gift:** Sert

**Gizîn:** Êşa dilî

**Gîsî:** Şûna birînê, dewsa birînê ya xuya dike.

**Guç:** Bi ser hev de qefilîn

**Guhişîn:** Ji tirsa dêhn û bala xwe bidin ser derdorê. Lê guhdarkirin.

**Guhor:** Cihê bêhnvedanê pezî.

**Gulên:** Dema beranberdanê; dema hevşabûna zindiyan, daxwaza ganî, daxwaza têkiliya cinsî.

## H

**Hefinîn:** Bêhnçikiyan, tengijîn.

**Hefk:** Gewrî, qirik.

**Helingaftin:** Lê aliqîn, gav pê ketin.

**Hêlîvank:** Lûs, hêlîn.

**Hêminî:** Piştrastî, êminî, bi bawerî.

**Hergîz:** Eseh, teqez, mutleq

**Heskûr:** Kevçikê dar ê mezin.

**Hewd:** Hewş

**Hilawîstin:** Dardakirin, bidarvekirin, daliqandin

**Hildemisîn:** Li ser çokên xwe rûniştin, li cihê xwe rûniştin.

**Himbiz:** Di hev re, gava tiştek gelekî bin guhê hev ketibe û têk re be.

**Hingil:** Dest û piyên postî.

**Hingor:** Ji îşa pê de; demeke şevê, navbera saetên neh û yekê de.

**Hosa:** Wisa, weha (daçek)

**Husîn:** Pê ve kirin; gava tiştekî tîr li tiştekî hişk bête pê ve kirin.

## Î

**Îza:** Ezîyet, zehmetî, bargiranî.

## J

**Jengîn, (bijenge/raweka fermanî) :** Yanî xwarina te wek jengê be, jeng, zengar, wek nifir e.

**Jivan:** Civan, hevdîtin, çavpêketin.

**Jiyar:** Îdare, debar

**Jûr:** Ode, menzel

## K

**Karîte, garîte:** Beşt; darên dirêj ên datînin ser banan

**Kavanî:** Kebanî, jina ber malê, bermalî.

**Kepseviyo:** Kesê ku bivêla wî mezin be. (Teşbîh e)

**Keşxwehî:** Cil û bergên rojên taybet. Ji bo keyfxweşiyê tê gotin.

**Kêrî:** Bala û lûtkeya çiya, sermilê çiya, aso.

**Kincir:** Kinc, cilên kevn û veqetiyayî.

**Kotan:** Cihê ku li zozanan pezî lê distêrin.

**Kûstan:** Warên hêşîn, hênik û bilind; zozan.

**Kûte:** Kurtêl, xwarina ji ber devî mayî.

**Kulî:** Liba berfê.

**Kutan:** Lêxistin, lêdan

**Kwîr:** Nêrîyê sê salî

## L

**Lamik:** Çene

**Leqo:** Felc, nexweşîyek e.

**Lerxînî:** Xurinî, pariyê berî taştê tê xwarin.

**Lêmisiyan, lemisîn:** Ji ber tirsekê gava kesek xwe bide paş û xwe komî ser hev bike.

**Limsk:** Şilopil, gava zêde şil bibe.

**Lixav:** Dîzgîn, dîzgîna hespan.

## M

**Mayê xwe tê kirin:** Bêyî ku mafê mirov hebe ku mirov têkvedanê di karên xelkê de bike, zêdegavî.

**Mend:** Ava kûr û rawestiyayî.

**Mer:** Bêr, amûrek e.

**Mezirge:** Nanpêjiyê pê dikin; darê rastkirina girkên hevîrî.

**Mêjot:** Berxa hatiye mijandin.

**Mişe:** Zehf, mişt, bol

**Miştê:** Alifê zivistanê yê heywanan

## N

**Nemam:** Neyar

**Nêrgiz:** Navê kulîlkekê ye.

**Nijinandin, nijinîn:** Dayina ser hev a tiştekî. Li ser hev bar kirin, stok kirin.

**Nîmo:** Lewente.

**Niquloz:** Berî xewê gava mirov xewije.

**Nîre:** Reht, beştên biçûk.

**Nivistin:** Razan.

## P

**Pate:** Poçik, kincir, kinc.

**Pejan:** Çîtê ber malan, yê li ber zevîyan.

**Persîv:** Şobe, bapeş, nexweşîyek e.

**Pêçaftin:** Pêçan, girêdana tiştekî bi qusûr.

**Pêlevan:** Pehlîvan, kesê ku di karê xwe de şareza be.

**Pêndek:** Pîrebok, heywanek e.

**Pilît:** şivika leyîz pê kirin.

**Piştrik:** Lê neyar bûn.

**Posîde:** Xemgîn, halê ruhî yê şikestî; bêmoralî.

## Q

**Qer:** Deyn.

**Qeter:** Borandina mesafeyê.

**Qiriyan:** Şikestina dara çikilandî.

**Qoqirk:** Hestiyê qirikê.

**Qulîçke:** Hedef, kêla ji armanc hatiye danîn.

## R

**Ravêj:** Reftar, hal û hereket.

**Remitîn:** Behecîn, refleksa tirsîn a ji ber bûyerekê.

**Remûzat:** Nexweşik, kirêt.

**Renîn, Renîyan:** Ji kokê de jêbirin.

**Rexûçan:** Derdor

**Ribsekirin:** Paqijkirina zevîyê ya ji gilêş û keviran, ji bo cotkirinê amadekirin.

**Ripin:** Kok, reh

**Riwêşt:** Irs, koka malbatî.

**Rûs:** Tazî, bê cil.

**Ruh û binîş:** Kok

## S

**Sava:** Berşîr, tifal, sebî.

**Senger:** Çeper, kozik

**Serxurî:** Bêyomî, bedî.

**Sevî:** Selika mezin.

**Sibit:** Navê giyayekî bêhnxweş e û tehma xwarinan xweş dike, wekî catir û pûngî.

**Solîn:** Cuha avê ya bi selan hatiye pêçaftin; cuha avê ya binerdê.

**Sosin:** Navê kulîlkekê ye.

## Ş

**Şamper:** Perwaz, bask.

**Şarandin:** Sor kirin, ji sorkirina tenûrê re tê gotin.

**Şeqlaqe:** Darên sêpê yên dirêj.

**Şikêlik:** Qoqa serî.

**Şirkak:** Teyrek e.

**Şiyan:** Qudret.

**Şîrbirînk:** Kêzika tebaxê ya diteyîse. Gûstêrk.

**Şîrojo:** Hema bi şîr ketiye, berşîr, sebî.

**Sîsirk:** Sîrsîrik, çirçirok. Circir bocegî.

**Şor[1]:** Berjêr.

**Şor[2]:** Bixwê.

**Şorvaya kutilkan:** Navê xwarinekê.

**Şû (kirin) :** Mêr kirin, zewicîn (ji bo jinan tenê tê bikaranîn)

## T

**Taşik:** Ran, çîp.
**Temendî:** Bi qasî.
**Tena:** Sakîn, sukunet, aramî.
**Teraş:** Çali.
**Terêf:** Gicik, kesê nehez.
**Teretol:** Pir gênc û ciwan.
**Tewar:** Di hewarê de çûn, bi ser de çûn, bela anîn serî.
**Texten:** Qesta fila cihî kirin. Berveçûn.
**Teybîr:** Tedbîr, tevdîr.
**Tezing:** Ricifîn.
**Têşdewgan:** Danekî rojê; berî nîvro.
**Tirar:** Tebaqeke xwarinê.
**Tîşkdan:** Tav dan, bi derketina tavê re.
**Totik:** Libeke nanê pehtî.
**Tûsel:** Kosî, heywanek e.
**Tûzkî:** Berwarkî, bi xwarî.

## V

**Vavartin:** veder kirin, dan alî, ji hev bijartin.
**Verêj:** Herikîna avê.
**Veresiyan, veristin:** Jê qetiyan, jê ketin, jê bizdiyan.
**Verotin:** Keroştin, kojtin, kojîn.
**Veziyan:** Hatina bê, vizvizîna bê.

## W

**Werc:** Eşya, kelûmerc.

## X

**Xafilxefkî:** Ji nişkê ve.

**Xecele:** Ricifîn.

**Xemirûk:** Şekir.

**Xena:** Henê, hine.

**Xidamî:** Xizmetkara jin, xizmetkar, xizmetçî.

**Xifs:** Bêyomî, lanet.

**Xirandin (bixirînim/ raweka fermanî):** Kaş kirin, bi erdê re kişandin.

**Xumarû:** Rûqemer.

**Xwedîk:** Neynik, awêne.

**Z**

**Zêmar:** Girîna li ser mirî, agit.

**Zivêr:** Acizî.